# *Dîroka bûyîna mirov, dema neolîtîkê û pêvajoyên destpêkê ên şariştaniyê*

•

*Abdusamet Yîgît*

.
.
.
.
.
.
.
.
.
.
.
.
.
.
.
.
.
.
.
.

*Weşanên Han*

**Dîroka bûyîna mirov, dema neolîtîkê û pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê**

gûlan 2016

Weşanên han

.

gulana 2016
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
https://www.facebook.com/kovaraxwenas
.
Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-981668-67-0

**Pêşgotin**

Nivîsandina ´dîroka bûyîna mirov, dema neolîtîkê û demên destpêkê ên şariştanîyê´ wê, di serî de wê zanebûneka mazin wê ji mirov bixwezê. Armanca vê xabatê ew a ku ew pêvajoyên pêşketina bi dîrok û bi peresendina mirov re wê, ji destpêka bûyîna *homonîdan* hilde li dest û heta demên neolîtîkê û pêşketinên wê yên bi komî û piştre ên bi jîyane civakî a şariştanî re wê werênê li ser ziman. Herêmên ber diclê û firatê ên kurdistanê wê, li giştîya wan hemûyan wê, nîşanakên jîyane dema neolîtîkê de wê were dîtin. Ber vê yekê weke ku me di dewama nivîsandina xwe de hanî li ser ziman wê kurdistan wê, weke welatê neolîtîkî wê xwediyê rewş û wateyeka bi pêşveçûnên xwe yên bi dîrokê re bê. Gotina *welatê neolîtîkî kurdistan*(*) jî wê, temenê wê ew bê ku mirov li her deverên wê, nîşanekên jîyane dema neolîtîkê wê li wê bibînê. Di dewama wê de jî wê, pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê û demên wê, werênê li ser ziman.

Me li vir mijara xwe tang girt. Bi teybetî me bi pêvajoyên mejûya bûyîna mirov, demên neolîtîkê û pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê ên li ber diclê û firatê re me, bi sînor girt. Bêgûman, sedemeka vê hebû. Heta roja me wê, herkesekî li gorî xwe wê dîroka herêmê wê bêî rastîya herêmê a bi xalk û civakên wê re bi nav bikin wê li gorî xwe û têgînên xwe yên bîrdozîkî wê werina li ser ziman. Ber vê yekê min, pêwîstî bi wê dît ku ez vê bi serekeyî jî bê wê weke pêvajoyekê wê hildime li dest û werênima li ser ziman. Ku

mirov ji kîjan aliyê ve li wê binerê wê, li herêmê ev pêvajoyên ku me li vir bi serekeyî her yekê bi çend gotinan hanîna li ser ziman wê, xwediyê pêvajoyên jîyane civakî û pêvajoyên pêşketina şariştanîyê ên bi hezarana salan bin.

Bi teybetî wê, di vê xabatê de wê, di beşa pêşî de wê pêvajoyên peresendina bûyîna mirov wê werina hildan li dest. Di vê çerçoveyê de wê, rastîya wê, bi pêvajoyên wê yên peresendinê re wê, bê kirin ku ew werina fahmkirin. Beşa duyem wê, di çerçoveya têgîna ´serdema civake neolîtîkê´ de wê, bi çerçoveyekê wê werênê li ser ziman. Di vê pêvajoyê de jî wê, bi teybetî piştî serdema peleolîtîkê û pê de wê, bi demên mezolîtîkê û heta yên neolîtîkê wê, di vê çerçoveyê de wê, pêvajoyên pêşketin û bûyîna jîyanê, piştre bi komî û wê di dewame wê de wê bi civakî pêşketina wê û heta ku wê bigihijê pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê re wê, di xate pêşketin û pêşveçûna pêvajoyên li ber
diclê û firatê de wê di çerçoveya ardnîgarîya kurdistanê de wê hilde li dest.

Li vir mirov, çendî ku wê, bi lêkolînî wê di wê de wê kûrbibê wê, ev wê were

-------

(*) Li kurdistanê wê li gelek deverên wê ên weke xirabêşêref, girêhaciya, nawala çolê, xirabreşkê û hwd wê, nîşanaka jîyane ji demên neîlitikê wê li wan wê hebê. Wê bi wê re wê bi dehan deverên li herêmên botanê wê weke herêmên ber çemê diclê û firatê wê li wan ew nîşanak wê hebin.

dîtin ku wê, ardnîgarîya kurdistanê wê, weke ardnîgarîyeka giştkî ku wê li ser wê jîyane neolîtîkî wê pêşbikeve bê. Li her deverên wê, wê nîşanakên ji demên serdema neolîtîkê û jîyane wê, li wê werina dîtin. Ber vê yekê weke ku me di beşa pêşî a pirtûkê de wê, hanî li ser ziman wê, bi rastî jî wê kurdistan wê, weke welatekî neolîtîkî bê. Li gorî pêşketin û pêşveçûnên dîrokî ku mirov li wê dihizirê wê, ev wê were dîtin ku wê, kurdistan wê, weke welatekî neolîtîkî bê. Gotina welatê neolîtîkî kurdistan jî wê, temenê wê ew bê ku mirov li her deverên wê, nîşanekên jîyane dema neolîtîkê wê li wê bibînê. Di vê çerçoveyê de wê, ev wê weke rewş û aliyekî giring a ku mirov wê, li vir binxatbikê bê.

Herêmên anatolîa wê, pirr-piştre wê, di demên ku wê li ber diclê û firatê wê jîyane şariştanî wê destpêka wê were û pê de wê, demna neolîtîkî ên tang wê li wan bijî. Wê ew jî wê, li ser berhem û bermehîyên dema neolîtîkê ên li kurdistanê ên li ber diclê û firatê ên mesopotamîkî bê. Di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rewşekê bê. Serdemên neolîtîkî ên anatolîa ku mirov, serdemên herêmên mesopotamîya ên li ber diclê û firatê wan fahmnekê wê, ew zêde newina fahmkirin. Bi serê xwe wê, weke pêvajoyek dîrokî wê, zor bê ku mirov wê hilde li dest. Li herêmên kurdistanê wê, ji herêmên başûrê kurdistanê û heta ên rojavayê kurdistanê ên weke Afrînê û hwd wê, di xatekê de wê, jîyane ´mirovê dihizirê´ ê homo neandertal û homo sapîens wê li herêmê wê pêşbikeve.

Di vê çerçoveyê de wê, mirovê ku ew li kurdistanê û ankû mesopotamîya jîya me ew, bi navê ”*mirovê şanîdarê*(*)” ew hanî li ser ziman. Ber ku ew hinek xosletên wî yên teybet wê hebin. Di rewşa jîyane wî ya li herêmê de wê, li ser herêmek ku ew li wê daristan pêşketina, bejehîyek şîn û avî û hwd heya wê, ew wê bijî. Wê şikeftên ku kûr û dirêj ku ew bi şamitîna axê a li herêmê re ku ew afirîna wê wan wê bijî. Wê bi demê re wê, di wan şikeftan de wê, fêrî îzolekirina beş bi beş a wan şikeftan wê bibê. Ev jî wê, rewşek ku taqabûlî mal û ankû xanîyên ku wê piştre wê mirov wê ji xwe re wê çêbikê wê, bikê. Di vê çerçoveyê de wê, jîyane mirovê herêmê wê, di nava şert û mercên wê de wê, xwediyê xosletna ku mirov wan bi pêvajoyên jeolojîkî ên li herêmê re wan werênê li ser ziman bê.

Heta roja me, ev herêm wê, çendî ku wê navê wan wê pirr zêde wê baş wê û zêde wê were li ser ziman jî lê wê, bi awayekî rêkûpêk wê dîroka herêmê wê bi mejûya wê re wê bi awayekî rast wê newê nivîsandin û li ser ziman.Di zane min de wê, di roja me de wê, gelek pirsgirêkên civakî, şariştanî û desthilatdarî û hwd, ku ew hena jî wê, di temenê wan de wê ev bi zanebûnî bê û ne bi zanebûnî bê, xelat nivîsandina dîroka herêmê jî wê hebê.

Di rewşa nivîsandina dîrokê de wê, temenê hemû pirsgirêkên roja me jî wê

-----------

(*)Şanîdarê dikeve başûrê kurdistanê det.

were dîtin. Di vê çerçoveyê de ew çerçoveya ku weke nivîsandina dîrokê ku ew hatîya afirandin wê, ramyarîya wê ya ku ew bi sazûmanî di nava sînor de ku ew dihê kirin wê, di vê çerçoveyê de wê, encama wê, pêşxistina ji dîrokê birina hebûna civakan, çandan û zimanan bê.

Kurdên berê wê, gotineka wan ya baş wê hebê. Wan dihanî li ser ziman ku ”mirov, çawa hanî li ser ziman wê, wusa biqawimê.” Di vê çerçoveyê de wan, bi vê gotinê ew qast dikirin ku mirov çawa nivîsand

wê bi wê re wê, encama wê jî wê, weke navaroka wê nivîsandinê bê. Yanî li vir ew nivîsandina dîrokê ku ew rastîyek ji rewşek rûdayî a rast bê û ankû derewek ku ew ti rastiyên wê nebin jî bê wê, di wê çerçoveyê de wê, xwediyê heman rewşê bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Mirov wê, di vê çerçoveyê de wê, weke ku wê, bi xelatîyên xwe re wê, zordarekî wê li ser serê xwe wê biafirênê. Ev di rewşa jîyane mrov, nivîsandina mirov û hwd de jî wê, wusa bê. Karê nivîsandinê wê, di vê çerçoveyê de wê, karekî pirr xesas û zîz bê. Wê giring û pirr hêja bê. Wê dîrokî bê. Her gotina ku mirov wê, nivîsand weke ku wê, pêşîyên kurdan wê bibêjin ”mirov, divê ku li pêşî û paşîya wê gotinê bihizirê û piştre wê bibêjê.” Yanî bi vê re wê, ew biheta hizirkirin ku mirov çi got mirov wê, zanibê ku wê çi encamê wê bi xwe re wê werênê. Wê encama wê çi bê, ku mirov wê zanibê. Di vê çerçoveyê de mirov, wê vê yekê jî wê bibînê ku wê, di nava civatên kurdan de ku ew di wan de ew li hevdû di rûniştin wê, di gotina xwe de wê, li rastiyê, hişmendiya ku ew gotin bi rastî û bi wê hatîya gotin û hwd wê, li wê biheta lêgerîn. ..

Di vê çerçoveyê de wê, weke gotineka pîrên kurdan ên li civatan ba ku wan digot ku ”li gûhê xwe bikina weke gûhar” wê, bihanîyan li ser ziman ku ”wê, çi hanî li ser ziman, di hiş û farqîya wê de bin. Di zanîna wê de bin. Gotina vala û nerast nebêjin.” Di vê çerçoveyê de wê, ew bihanîyan li ser ziman. Wan ti carî ne hanî li ser ziman ku ”ev gotin derew a wê, ti encama wê di jîyanê de wê nebê.” Vajî wê, wan dihanî li ser ziman ”ku ew derew jî bê ku ew hanî li ser ziman wê, bandûra wê weke ya rast hatîya li ser ziman wê, hebê. Heta ku wê ji wê zêdetir jî wê hebê.” Di vê çerçoveyê de wê, têkilîya gotinê û jîyanê wê bi hevdû re wê danîyan. Li gorî wan têkiliyek giring a gotinê û jîyanê wê bi hevdû re wê ji navikê ve wê hebê. Li gorî wan wê hem gotinên ku mirov wan bi çi awayê ku wan bibêjê wê ew mayînda bin û hem jî wê hertimî wê encamên wan gotinan wê di jîyanê de wê hebin.

Ev rewşên bi têgînî ên ku ew di nava civatên kurdan de ew dihên li ser ziman wê, di rewşa nêzîkatîya nivîsandina me de jî wê, weke çavkanîyekê jî bê. Di rewşa têgîna çavkanîyan de wê, lêgerîn û lêkolînên me yên bi dîtînên me yên li herêmên kurdistanê û agahiyên ku me ji herêmên kurdan bi devkî û hwd ku me xwe gihandina wan bin. Wekî din jî wê, piştî salên 1980 û heta salên 1990 û piştre wê, gelek lêkolînên di warê jeolojikî de jî wê, li herêmê wê, werina kirin. Di wan erdkolanên ´erkolojikî´ de wê, bermehîyên ku ew derdikevina li holê wê, heta roja me wê, tenê weke aliyekî piçûk ê mejû û dîroka herêmê wê bi xwe re wê, werênina li ser ziman.

Gelek bermehîyên jîyane civakî ên xalkên herêmê jî di pêvajoya lêkolîn û lêgerînên li herêmê de me, kifşkir ku ew di nava pêvajoya şerê ku rejima tirk û hwd ku ew li dijî civake kurd li herêmê di meşênê de wê werina tûnakirin. Nîşanakên ku ew zêde kifş ên ku ew hebûna vê civake herêmî salix dikin û dihênina li ser ziman ew hatina tûnekirin. Ne hatîya hiştin ku ew bermehî qaydên wan werina girtin. Ev jî wê, weke aliyekî giring ê ku me kifşkir û li vir em divê ku wê, bi gotinekê jî bê wê, werênina li ser ziman bê. Hinek deverên ku wê hinek zaningên derve ên weke ´zanîngeha chicago” ku ew wê, wan qayd bikê wê di çerçoveya herêmên neolîtîkî û jeolojikî de jî wê, tenê, çend ji wan deverên bêjehî bin. Lê ji wan pirr zêdetirî deverên ku ew hatina kifşkirin û ne hatina qaydkirin û hatina tûnakirin li herêmê wê hebin.

Di vê xabatê de wê weke çavkanîyek giştî a herêmê wê hebûna civake kurd jî wê, bi mejûya wê ya civakî û pêşketinên wê yên civakî û şariştanî û hwd re ku ew bi wê re ew heta roja me dihên ew hatina esas girtin. Di vê çerçoveyê de em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, rastîya hebûna civake kurd bi rewşên wê yên zimanî ên wê re wê, li vir wê karibê bibê çavkanîyek pirr zêde giring û dîrokî a ku mirov bi wê di van waran de dîroka herêmê a ji serdemên destpêka pêşketina jîyane komî û piştre di dewama wê de pêşketina civaketîyê ku wê, fahmbike bê. Rastîya herêmê weke kurdistanê wê, dema ku mirov demên neolîtîkê lêkolîn dike û wan dike ku wan fahm bike wê bi wê re wê were dîtin ku wê kurdistan wê, weke welatekî neolîtîkî bê. Li pirranîya herêmên wê, wê cihên ku wê di demên neolîtîkê de wê di demên pirr zû de wê bicihbûn wê li wan pêşbikeve û wê jîyane civakî wê li wan xwe bide dîyarkirin bê.

Di vê çerçoveyê de wê herêmên kurdistanê wê, weke herêmna navendî ên civake neolitîkî(*) bin. Di çerçoveya lêkolînên antropolojikî, jeolojikî û hwd jî wê, were dîtin ku wê, li herêmê wê pirr zêde zû wê jîyane komî û piştre civaketî û di dewama wê de wê, pêvajoyên şariştanîyî wê pêşbikevîn. Derfetên jîyanê wê, li van herêman wê zû pêşkeve.

Kurdistan, weke welatek civake neolîtîkî wê, civake wê, heta roja me jî wê bi xoslet û teybetîyên xwe yên ku ew bi wan hê dijî re wê, weke wan xosletên civakî ên demên neolîtîkê û hinekî peresendina li ser wan re bê bê. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di rewşa civakên neolîtîkî ên li herêmê de wê, rewşa jîyane civake herêmê a kurdistanî wê, karibê têgîn û têgihiştineka baş a civakî bi mejûya wê re bide me. Me jî di

-------------

(*)Li ser gotina ´civake neolîtîkê´wê pirr zêde wê, di nava antropologan de wê hizrên cûda wê werina li ser ziman. Di serî de wê, ev civak ku ew hebê wê çawa wê were salixkirin wê, di wê warê de bê. Lê piştre wê, gotina ´civaka neolîtîkê´ wê were bikarhanîn. Birêz Ocalan wê gotina ´şoreşa neolîtîk´ wê bikarbênê. Di wê çerçoveyê de wê, weke civake ku ew xwediyê girêdanên xwe yên bi xwezayê û dayuksaleriyê ve girêdayî û ew pêşengê wê ya wê, were ser ziman. Civake neolîtîk wê weke civakek ku wê di wê de wê jin wê li pêşbê wê, were ser ziman. Ev aliyê wê, pirr zêde wê, were li ser ziman.

vê rewşa nivîsandina xwe ya vê xabatê de de ew weke armamenc esasgirt. Xosletên jîyane civakî ên ku mirov wan fahm dike wê, di vê çerçoveyê de wê, me bi xwe re wê bibina heta demên berî şariştanîyê ên demên neolîtîkê û hwd. Wê çawa wê di xatekê de wê, peresendin wê, bi jîyane komî û piştre bi ya civakî re wê bibê mirov, ku î ro jî wê li rengê jîyane civake binerê wê, gelek xosletên wê kifş bikê. Di vê çerçoveyê de wê, herêmê wê, hê weke herêmeka ku ew dîroka wê, bi rastî û mejûya wê ya civakî a rast re ku ew ne hatîya nivîsandin ew li holê disekinê bê.

Dîrok, wê ji vê herêmê wê destpê bike. Pêşveçûnên civakî û şariştanî wê, di nava şert û mercên wê yên herêmî de wê, weke pêşbikevin. Di vê çerçoveyê de me, mijar bi herêmên ber diclê û firatê ên kurdistanê re bi sînor û tang girt.

**Abdusamet yigit**

,

**Beş yek: dîroka bûyîna mirov**

Dîrok, wê weke rêyeka ku wê têrê hatin wê bibê bê. Di dîrokê de wê, heta roja me ku wê çi bûbê ku mirov wê li nava rûpelên dîrokê dinerê, mirov wê kifş dike. Bi wê re jî divê ku mirov wê jî werênê li ser ziman ku serdemên berî-dîrokê ên ku ew di wan de jîyan hin bi hin di çerçoveya mirovê hemdem de wê pêş bikeve, wê di wan de wê hin bi hin wê mirov wê bi dest serdestbûna li xwezaya xwe bike. Berî serdemên neolîtîkê, dema ku mirov hinekî bi berêtir ve diçê, mirov wê herê serdema mezolîtîkê wê werê. Serdema mezolîtîkê, wê weke serdemek bûhûrîner ji ya dema peleolîtîkê li ya neolîtîkê bê. Serdema Neolîtîkê di serdema wê ya destpêkê de wê, mirov wê bidest bikarhanîna amûr û tiştan bik**e**. Ji xwe, wê ya ku wê reng û wateyê wê bide serdema peleolîtîkê jî wê ew bê ku mirov wê bidest bikar hanîna amûrên weke yên xwe parastinê bike bê. Pêvajoyên serdema dawî a peleolîtîkê li dora 40 û heta 30 hezar salî wê berî zayînê wê bibin û wê pêşbikevin. Ev serdem, wê wê weke serdemek ku wê hin bi hin wê ardnîgarî wê bi halîna kaş û çîyayên qaşayê re ku wê derfetên jîyanê wê vebin, wê bi wê re wê xwe bi awayekî wê bide nîşandin. Pêvajoyên serdema peleolîtîkê ku mirov wan hinekî lêkolîn dikê, mirov wê dibînê ku wê serdemên peleolîtîkê wê zû û bi awayekî pêşketî wê li kurdistanê wê xwe bidina nîşandin û pêşxistin. Î ro, di roja me de li gorî derfetên ku em bi wan lêkolînan dikin de wê, bi wan re wê were dîtin ku wê li kurdistanê wê bi zêdeyî wê di derbarê pêşveçûnên serdemên peleolîtîkê ên destpêkê navîn û dawîyê de wê bi hevdû re wê gelek nîşanakên mazin wê bidina me.

Bi teybetî herêmên ber firatê, wê di vê warê de wê, xwediyê gelek nîşanakên mazin ên ji serdema peleolîtîkê bin. Bi teybetî, herêmên kurdistanê ên weke entebê, ku wê heta Afrînê wê di wê xatê de wê, di wan de wê gelek nîşanakên di derbarê jîyane dema peleolîtîkê bê. Î ro, bi lêkolînên ku lêkolînvanan li wan

------------

(*)Bi teybetî wê herêmên rojava ên weke Afrînê, marê û heta qamişlo û nisêbînê wê, weke herêmên hem avî û hem jî wê weke herêmên ku wê li wan wê jîyan wê zû bicihbibê û wê pêşkeve bê. Herema botanê wê weke warekê dema neolîtîkê wê nîşanakan wê bide nîşandin bi herêmên xwe yên berfireh re.

kirina, wê herêmên kurdistanê ên weke semsûrê, herêma Rehayê, herêmên li dora Entebê, herêma rojavayê kurdistanê Marê, herêma Mimbiçê, herêma Afrînê, wê çend ji wan herêmên kurdistanê ên ku wê pirr zêde wê bermehîyên ji dema peleolîtîkê wê bidina me bin. Li herêma mimbicê, di roja me de wê bi lêkolînan heta roja me ser çar madenên kevirhastan(*) re ew hatina kifşkirin. Kevirhast, wê weke rengekî kevir ku ew mirov dikarî, wê qat bi qat, weke qalikan ji ser hevdû rakê û wê bi keviyên wê yên tûj ên ku wê biheta çêkirin re wê birrîn wê biheta kirin. Ji herêma mimbiçê, marê û Afrînê heta herêma Raqqa wê, di wê qadê de wê, bi lêkolînan jî wê were piştrastkirin ku wê serdemên peleolîtîkê wê li herêmê wê xwe pirr baş wê bidina pêşxistin. Ji aliyê amûrên ku wê werina bikarhanîna ve wê ev herêm wê derfetek baş wê bidina me.

Herêma Semsûrê a bi navê Şehremûzê, wê weke herêmek dewlemend a ji kevirhastên ku wê di wê de wê biheta bikarhanîn bûna bû. Ev kevir, ku ew dişikihê, wêkevîya ku wê ji wê şikeştin bibê, wê tûj bibê. Bi awayekî din jî ev kevir, weke ku wê kurd heta roja me jî wê di nava xwe de wê bikarbênin ku ew bi hevdû hat xiritandin, wê êgir drxê ji xwe. Gelek nîşanakên ku wê ji vê herêmê wê werina dîtin wê di derbarê demên navîn û dawîn ên **Pleistosen** de wê bermehîyan zêde wê bide li dest. Ev herêmên kurdistanê ku me navê wan hanî li ser ziman wê, vê jî wê bi xwe re wê bi teybetî wê bidina nîşandin ku wê di serdema destpêkê û ya navîn de wê **Neandertal** û ankû homo sapîens wê bi herikina van herêman wê di şikeft û deverên wusa ên ku ew derfeta jîyanê didin wê li wan bicih bicih bibin û wê bijîn. Neandertal, ber ku ew wê tevlî homo sapîens û ankû wê bi ber homo sapîens ve wê pêşveçûna fîzyolojikî wê bi xwe re wê bijî, wê bi demê re wê tenê weke yê serdest û hebûna xwe ku ew diparêzê wê homo

sapîens wê li holê bimênê. Di derbarê windabûn û ankû dawîya neandertal de wê, zanînên ku ew di dest de ên di derbarê dawîya jîyane neandertal de wê ne zêde vegotinbar bin. Neandertal, wê li şûn xwe wê gelek pirsan wê bihêlê û wê weke ku wê cihê xwe ji homo sapîens re wê bihêlê. Hinek antropolog, wê vê rewşa *´ji holê windabûna neandertal´* û li şûnê serdestbûna homo sapîens, wê bi teorîya tekoşîneka di nava wan de ku ew rû dide û di wê de homo sapîens serdest dibê re wê bikin ku wê werênina li ser ziman. Lê ya ku em bi têgînîya xwe wê kifş dikin, wê di ketina nava hevdû û bi hevdû re tevgerîn wê kifş bike. Her wusa, hinek nîşanakên vê jî wê ew bin ku wê li hin herêmên Asya, wê hinek îskeletê wê demê wê werina dîtin û di dahûrkirinên bîolojikî û hwd de wê bê kifşkirin û wê bê gihiştin wê qanaatê ku wê ji bi hevdû re bûna mirovê neandertal û yê homo sapîens wê bên dunyê **bê**. Li van herêmên kurdistanê, wê bi zêdeyî wê çanda yabrûdîen ku wê li dora 350 û 250 hezar sal berê wê destpê bike, wê ev herêm wê weke herêmek navend bê ji wê re. Piştre

-------------

(*)Kevirhast wê, cûreyekê kevir ê li kurdistanê û li herêmên weke afrînê û hwd wê pirr zêde wê hebê bê. Li deverên din kurdistanê wê zêdeyî wê hebê. Ev kevir wê hem bo birrînê û hem jî wê bo agir pêxistinê wê were bikarhanîn.

di dewama yabrûdîen de wê dema hûmalîen wê rastî dema navîn a peleolîtîkê wê were û wê di vê demê de wê bê kifşkirin û dîtin ku wê li herêmê wê çanda wê zêdetirî wê nîşanakên wê, wê werina dîtin. Di vê demê de wê hinekî herikîn wê bibin û wê bi wan herîkînan re wê di ardê de wê şikeft û deverên bi wê rengê ên bilatan wê biafirin. Ev jî wê, weke deverna weke stergeh in ku mirov dikarê wan bi teybetî bahse wan bike.

Herêmên kurdistanî ên li ber firatê wê bi teybetî wê di vê warê de wê derfet û rewşek teybet wê bidina me ku em fahmkirina xwe di vê warê de berfirehtir bikin. Li dora serdema çarem a jeolojîkî de wê, bi herikînên ardî ku wê bibin wê çem û rewşên weke yên bahran wê biafirin. Ji dema destpêkê a **Pleistosen´**ê heta holosen´ê wê wê ev rewş wê bi zêdeyî wê hin bi hin wê pêşbikevin. Rewşa pêşveçûnên ardnîgarî, wê zêdetirî wê xwe bidina dîyarkirin. Li ser çemê Xabûrê lêkolînên ku ew hatina kirin, wê di wan de wê bi zêdeyî wê bermehîyên ji demên destpêkê û navîn a peleolîtîkê wê bi zêdeyî wê werina dîtin. Di van deman de wê tabaqaya ardê wê ya hişk wê biafirê. Di derbarê Afrînê û lêkolînên wê de wê ya ku wê werê dîtin, wê bermehîyên wê yên aîdî karhanîna kevneşopîya levallois-mousterien bê. Li vê herêmê wê neandertal wê zû werinê û wê bijîn. Di şikefta **dederîyehê**(*) de wê hastûyên neandertal ên ji wê herêmê wê werina dîtin.

Di herêmên kurdistanê de wê li dora serdemên destpêkê û ên piştre wê rewşên xiritandina kevir û bi wê re çêkirina amûran û bi wê re wê rengdayîna wê, wê xwe li gelek deverên wê ên ku wê li wan lêkolîn werina kirin, wê werina dîtin. Li şikefta şiwato li mihabadê, şikefta şanîdarê li başûrê kurdistanê, li herêmên zagrosê, herêma amar merdeg ku dikeve keviya zagrosan de, **Gakîa** ku li kirmaşanê ya, şikefta **martarik** li kirmaşanê, şikefta do-eşkaft li kirmaşanê, şikefta Warwasî li kirmaşanê, herêma erzorumê(*) û wê çend ji wan deverên giring ên ku mirov rastî bermehîyên ji serdemên destpêkê, navîn û dawî ên peleolîtîkê ên li kurdistanê tên bin.

Pêşveçûnên serdema peleolîtîkê ên zû li herêmê, wê li herêmê wê nîşanaka tiştekî din bê. Ew jî wê ew bê ku wê herêm, wê hê zû wê qadên wê ji jîyanê re wê zû wê vebin. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê jî wê werênê li ser ziman ku wê di vê demê de wê ev deverên kurdistanê û gelek deverên din ên ku ew hena, wê li wan wê temenê kombûnê wê biafirênê. Di serdema peleolîtîkê de wê komên mirovê neadertal û ankû homo Sapîens wê li herêmê wê bijîn, wê xwe bidina dîyarkirin. Nîşanakên hatina homo Erectus li herêmê ji herêmên Afrîqa wê li dora 450 hezar salî bê.

Bi wê re jî mirov divê ku wê jî werênê li ser ziman ku wê li dora semsûrê û herêmên wê, Afrînê, Reha, Elezîzê û hinek deverên din û hwd, di lêkolînên ku

------------

(*)Dideriyeh wê şikeftek li dora afrînê bi aliyê helebê ve bê.

(*) Li van herêmên rojhilatê kurdistanê û bakşrê kurdistanê wê nêşanaka bicihbûna neandertal wê bi zêdeyî wê hebê.

ew hatina kirin de wê bê dîtin ku wê nîşanakên bi komî tevgerînê, wê rastî dema dawî a peleolîtîkê û dema mezolîtîkê a bûhûrîner wê were. Di nava van deman de wê werê dîtin ku wê amûrên ku wê werina dîtin ên ku wê ji kevir û hwd wê werina çêkirin wê zêde wê hebin. Î ro di destê me de wê, zêdeyî wê di lêkolînên ku wê li kurdistanê li van deverên ku me navê wan hanî li ser ziman de wê, zêdeyî wê hastûyên

ku ew hatina bikarhanîn weke amûrên kulkirinê û kolanê û hwd, kevirên ku ew hatina tûjkirin ên weke kevirhast û hwd, wê pirr zêde wê minaqên wan wê werina dîtin.

Di vê demê de wê gelek herikîn wê bibin. Kaş û çîyayên qaşayê wê bihalihin. Wê rewşa ardê wê, derfeta şînbûna li gorî demê wê bibê. Her wusa, em li vir, divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, di vê demê wê bi gûharînên ku wê di birehê de wê çêbibin re wê di rengên şînahî û şînbûna rewşa wan de jî wê gûharîn wê bibin. Peresendina bîolojîkî ku wê hikmê xwê wê li ser rewşên jîyanê ên zindî û nezindî wê bide dîyarkirin, wê di wê çerçoveyê de wê gûharînên bingihînî wê bide çêkirin.

Qawartin û xiritandina kevir û hwd jî wê di vê demê de wê hin bi hin wê bi destê zindîyan wê çêbibê. Mirovê hemdem û xwedîhizir homo sapîens, wê di vê demê de wê hin bi hin wê bidest bikarhanîna amûrên bi vî rengî wê bike. Wê ji xwezayê wê bixwûn. Lê wê nikaribin berhevkirinê hê bikin. Di herîkînên ardê de wê rewşên bixwezayî ên weke ku ew bidest çênebûna, wê xwe bidina dîyarkirin. Wê zindî jî wê ji wan wê sûd bigirin. Şikeft, wê, biafirin. Ew jî wê, deverna ku wê di wan de sitarbûn wê pêşbikeve bê. Di nava şert û mercên dijwar ên xwezayê de wê, ev rewş, wê weke rewşna alikar ên giring bin.

Wê, di vê serdema peleolîtîkê de wê di nava neandertal û homo sapîens de wê, demek kin û ankû demek di zikhevdû de ku wê derbas bibê, wê pêvajoyek wê bibê. Ev pêvajo, wê di temenê wan de wê bi şert û mercên demê û rewşa zindîtiyê re wê bi gûharînên bîolojikî ên weke li ser genetikê û hwd re wê, afirîna rewşa mirovê ku ew dikarê êdî ew bihizirê û ankû weke ku wê di dema wê antropolog wê werênina li ser ziman ku wê ´mirovê ku ew dihizirê, wê bi wê re wê biafirênê. Ev serdem, wê li gorî derfetên xwezayê ku ew dide jîyane mirov û pêşketina wê, wê rewş û pêşketin wê di jîyane mirov de wê biafirê û wê bibê. Wê homo sapîens, wê piştî serdema navîn a peleolîtîkê wê bi awayekî zû, wê li herêmê zêde bibê û belav bibê. Gelek antropolog wê rewşa bi homo sapîens re wê weke ´dagirkirinekê´ jî wê bi nav bikin û wê werênina li ser ziman. Di vê demê de wê, şert û mercên xwezayê ku ew afirîna wê, derfetê ji jîyanê re wê hin bi hin wê biafirênin. Her wusa, berê bi li dora 500 milyon salê berê re hin bi hin bi bûyîna ji hevdû qat û pêşketina *her çar parzemînên li dunyê* wê biafirin. Di pêvajoya afirîna dunyê de wê wê serdema **Mezozoyîkê**(*) ku wê destpêkên afirînê wê bibin û wê dewama wê bi serdemên paleozîyîkê û

-------------

(*)Mezoziyik wê, weke demeka jeolojikî a qasayê bê. Lê wê di wê demê de wê hin bi hin wê şînahî û zindî wê biafirin û derkevin li holê. Wê gelek cûreyên wan wê çêbibin.

senozoyîkê re wê bi bûyîna zindiya re wê bidomê. Di paleozîyîkê de wê zindiyê bêmazmazkî û ankû bêcannerman wê wê hindik wê hebin. Weke masî û masîhût hin bi hin wê biafirin. Di dema mezozoyîkê de wê hin bi hin wê ajalên bi mazmazk(*´mammalian´*) wê derkevina li holê û wê zêde bibin. Heta ku dem tê serdema şenozoyîkê, wê ajal û sawalên ku ew gelek ji wan perîsîn(peresendin)a li roja me, weke hasp, xezal, mar û hwd bi gelek sawal û ajalên din ên avî û neavî wê derkevin li holê û wê xweza jî bi wan re di ahengekê de wê biafirê. Bi wê re jî wê hinek zindiyên ku em di derbarê wan de ne xwediyê agahiyê na wê hebin. Wê di vê demê de wê jîyane bejehî wê pêşbikeve. Di serdema mezozoyîkê de ew tûfan û felaketa ku ew bû, wê di wê de sawal û ajalên weke dînazoran û hwd wê tûne bibin. Wê li şûna wan, wê zindiyê bêmazmazk wê ji nû ve wê pêşbikevin û wê şûna wan dagirin. Di serdema **şenozoyîkê** de wê dunya, ew rewş û rengê roja me ku wê pêşbikeve li wê, wê pêşketina wê bibê. Ji hevdû cûdabûn û dûrketina parzemînên, pêşketina bahr û deryayan, çem, gol, girav û kûrehîyên ku wê reng bidina ardnîgarîyê, wê biafirin. Li gorî herêman û bi bandûra radîoaktivê gûharînên genetikî û hwd, wê weke bi rengê ´motasyonê(*)´ û hwd wê zêdetir wê temenê wan biafirê û pêşbikevin. Gûharînên di şaneyên şînîyan de wê, di ahengekê de wê gûharînê di rewşa sawal û ajalan de jî wê bi xwe re wê werênê li holê. Wê bi van pêşveçûnên gûharînîkî re wê li dora pênc milyon sal berê wê zindîyên weke Australopitechus û hwd jî wê derkevin li holê. Ev jî wê, weke destpêka mirovan a di nava xwezayê de ku wê pêşî weke meymunan û piştre wê bi peresendinê wê bi ber mirovtiyê ve wê herê, wê pêşbikev**e**. Lê wê bi demê re wê heta ku wê dem wê were serdema peleolîtîkê, wê hin bi hin wê bi ji hevdû dûrketinê a parzemînan re wê rewşa wê ya roja me wê bi xwe re wê biafirênin. Di temenê ji hevdû hin bi hin dûrketina parzemînan de wê, halîna qaşayê û zêdebûna avê û bi wê re afirîna bahr û deryeyan jî wê weke fektorekê wê hebê.

------------------
(*) Ev motasyon wê bi genetikî wê, were ser ziman.

.

**Hebûna *mirovê şikeftê* neandertal ..**

Di nava şert û mercên xwezaya demê a dema peleolîtîkê a dema wê ya destpêkê de wê hin bi hin wê rengê mirovê neandertal wê xwe bide nîşandin. Mirovê neandertal, wê di vê demê de wê derkeve li holê. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî li wê bihizirê ku mirovê neandeertal, heta ku ew were wê astê, wê pêvajoyna din wê ji destpêka serdema qaşayê a **Pleistosen**´ê jî wê weke demên destpêkê wê bidina dîyarkirin.

Neandertal, nîşanakên wî yên weke ku ew hastûyên wî hatina dîtin, wê bi teybetî li ber firatê û li hin deverên mesopotamîya jêr û jor bê. Ev jî wê dide nîşandin ku wê di vê demê de wê li van herêman wê bijî. Ava bahre sipî jî wê, piştî halîna çîyayên qaşayê ên mazin ên wê demê re wê zêde bibê û wê bilind bibê. Wê bi wê re wê qada xwe ya weke bahrê wê mazintir bike. Î ro, di destê me de nîşanak hena ku wê bahre reş wê pirr piştre wê ava wê zêde bibê û wê qada wê zêde mazin bibê û weke ´bahre reş´ wê xwe bide nîşandin. Em vê jî bi wê re di dewama wê de wê werênina li ser ziman ku wê gelek herêmên ku ew î ro dibin avê de na, wê di wan deman destpêka serdema peleolîtîkê de wê weke herêmna ku wê li wan mirovê neandertal wê xwe bigihênê wan bê.

Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê çerçoveya ava firatê, divê ku mirov bi teybetîya wê ya wê demê re li wê bihzirê. Çerçoveya firatê, wê herêmê wê berfirehtir û maztir bê. Li herêmên wê ên keviyên wê, wê bi herîkînê re wê li deverên nêzî avê wê şikeft wê pêşbikevin. Bi wê re jî wê derfetên jîyanê wê zûtirîn wê li wan wê biafirin. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê jî wê werênê li ser ziman ku herêmên kurdistanê ên weke Entebê, marê, mimbiçê, Afrînê, Rehayê û hwd, wan weke herêmna ku wê hinekî berî dema destpêka a pêşî a peleolîtîkê ku wê derfetên jîyankirinê ku wê li wan pêşbikevin bin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa kevirhastên li kurdistanê ku mirov, dema ku wê bike ku wê bibînê wê li gelek deveran wê bibînê, wê ev kevir, wê piştî wan herîkînên ardê re wê li gorî rewşa birehê bi hin elementên di nava axê de wê biafirin, wê mirovê neandertal jî wê wan kifş bike. Rewşa mirovê neandertal ku ew wê weke zindiyê ku ew dikarê li ser lingan bisekinê û destên xwe bi awayekî pirr baş wan bikarbênê, wê xwe bide nîşandin bê. Di alê xwe de wê serdemek seretayî wê di serdema peleolîtîkê de wê li kurdistanê wê di vê demê de wê bi rewşeka weke mirovê neandertal û hwd wê bê jîyîn. Li vir, qada jîyanê wê di vê demê de wê ji serdema destpêkê a peleolîtîkê û heta ya navîn û ya piştre jî wê temenê jîyankirinê bi pêşketina cûreyên şînahî û zindiyên din re wê pêşbikevê. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku mirov, ji ber van sedemên zû pêşketina jîyanê û derfetên wê, mirov dihizirê û dixwezê ku wê bibêjê wê mirovê neandertal wê mirovê şikeftê ê vê herêmê bê. Ber ku ev herêm, wê temenê jîyanê wê zêdetirî wê bi xwe re wê biafirênê. Çend ku di nava daristan, zevî û herêmên wê de ku mirov wê bi şert û mercên wê demê re wê têrê herê, wê rastî avîkên piçûk ku mirov wan vexwe wê were re wê, bi wê re wê qadaka jîyanê a pirr berfireh a jîyanê wê biafirê.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku mirov, li wan nîşanakên weke dîtina bi hastûyan, amûrên weke kevirhastan û hwd ku mirov wan dibînê, mirov wê hizrê di serê xwe de wê zêdetir

xorttir dikê. Mirovê neandertal, wê di serdema dawî a **Pleistosen**´ê de wê, hin bi hin wê rengê xwe yê ku ew bi wê re wê di dema peleolîtîkê de wê bijî wê bistênê. Wê dinanên wî yên pêşî wê piçûk bibin. Rûyê wî, piçûktir bû. Zenîya wî zirev bû bi xwerê ve xwe da pêşxistin. Birhên wî rengê xwe yên li ser çav standin û hinekî zirev bûn. Bêhvil, zêde piçûk nebû. Bêhvila neanddertal wê hinekî maztir bimênê. Wê anîya wî hinekî din zêdetir wê vebê. Valahîya cihê mejî, hinekî bilind bû, gilover bû û hin bi hin bidest mazinbûnê bi xwe re kir. Qûlên hastûyên çavên neandertal wê hinekî din wê zêde fireh bin. Wê hinekî jî wê pişta serî wê bi paş ve wê dirêj bibê. Nîşanaka vê jî wê, di lêkolînên li ser hastû(îskelet)yên neandertal ku wê werina kirin de wê were dîtin ku wê zerika serê wî maztir bê. Ev jî wê, weke nîşanaka pêşketina mejiyê wî wê bê şîrovekirin.

Gûharînên di laşê neandertal de mirov, dema ku wan ji destpêka wê ya ji dema meynûnan wan hilde li dest û wan werênê li ser ziman, divê ku mirov wan li ser gûharînên di genetikê re wan hilde li dest û werênê li ser ziman. Ber ku wê hemû rewşên ku wê biafirin, wê rewşa genetikê wê di temenê xwe de wê bihawênin. Her wusa, ji aliyê rewşên fîzyolojikî ve ew gûharînên ku wê di laşê neandertal de wê çê bibin, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wateyekê bin.

Li vir, ev rewş, wê tiştekî din jî wê bi xwe re wê bide nîşandin. Wê demê mirov dikarê wê jî bihizirê ku şert û mercên hawayê, weke germ, sar, cemed û hwd, wê di rewşa mirov a fîzyolojikî de wê bandûrên wê li ser rewşên weke genetikê û hwd, wê hebin. Ev jî wê, bi demê re wê wan gûharînan wê bi xwe re wê werênê. Li gorî rewşa hewayê a demê, wê çermê neandertal wê hinekî din stûrtir û bizaxmtir bê. Di vê çerçoveyê de ew dikarê di nava wê sermaya demê de ew bijî.

Rewşa jîyane neandertal û ankû ´homo neandertal´ wê li herêmê wê pirr zêde wê bidomê. (*) Li herêmê, bi teybetî li ser xate firatê re ji mesopotamîya jêr bi ber ya jor ve wê demê ku mirov wê dihizirê, wê ev xat, wê li dûnyê û di wê demê de wê weke herêma zûtirin ku ew ji jîyanê re pêş dikeve bê. Bo vê yekê,

--------------

(*)Di derbarê jîyane neandertal de wê, heta roja me jî wê gelek sipikulasyon wê bibn ku ew çawa dijî û çawa dawî lê hat û ew çû kûdere. Li ku wê antropologên weke Gordien Childe wê bênina li ser ziman wê, dema ku wê Neandertal li herêmê bi jîyan a wê, homo sapiens wê ji herêmên afriqa wê goçî herêmê bikê. Di wê rewşê de wê du teori werina vegotin. Yek wê ew bê ku wê bê gotin ku wê, bi ji holê rakirina neanndertal re wê, homo sapiens wê serdest bibê. Ya din wê ew bê û wê bê gotin ku wê piştî hatina neandertal re wê tevlîhevdûbûna neandertalana û homo sapiens wê bibê.

dîroka serdemên jîyanê ên li ber firatê, wê bigihijina serdema berî ya peleolîtîkê jî. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê ev şert û mercên jîyanî ên ku ew zêde û zû pêş dikevin bin, wê piştre wê bê temenê wê ku wê hin bi hin ku ew tê bawerkirin ku ew ji afrîqa tê, wê homo sapîens wê werê herêmê. Homo sapîens, wê heta ku wê dema xwe ya ´mirovê ku ew dihizirê´ wê, herî hindik bi serekeyî wê ser panzdeh pêvajo û ankû serdemên dîrêj ên dîrokî bi peresendina demê a bi xwe re wê derbas bike. Pêvajoyên navberî ên kin û dîrêj ên din jî wê di dewama van pêvajoyan de wê hebin. Ji homo gautengensis ku wê weke destpêkekê wê bê hanîn li ser ziman, wê homo gautengensis li dora du milyon sal berê wê destpêka peresendina homo gautengensis wê bibê. Dibê ku mirov vê demê zêdetir kevntir jî bibê. Piştî homo gautengensis re wê homo habilis wê weke kalk mirovên ê pêşî û herî dûr wê bibê. Homo habilis, wê weke *´mirovê kêrhatî´* û *weke ´mirovê pêşî, ku ew bidest bikarhanîna amûrên destî dike´* jî wê were bi navkirin. Li dora milyonek nehsed milyon salî ew dem û pêvajoya xwe wê bijî. Homo rudolfensis wê piştî homo habilis re wê were û wê homo rudolfensis wê weke mirovê ku ew bihêz a, wê xwe bide nîşandin. Homo rudolfensis, wê di xate pêvajoya peresendina ji meymuntiyê bi ber mirovtiyê ve wê pêvajoyek giring bê. Homo rudolfensis, wê di dema homo habilis de wê bijî û wê rewşa dawî a di nava neandertal û homo sapîens de ku wê bê jîyîn û wê di rewşa homo habilis û ya Homo rudolfensis de jî wê bê jîyîn. Wê di serdema dawîya homo habilis de wê homo habilis, wê bi Homo rudolfensis re wê xwe bi serdestîya xwe wê bike yek û wê dema xwe bi wê serdestîya xwe re wê radestî dema mirovê kêrhatî û bihêz a hemo Ergaster bike. Lê ev cûre hemû wê weke cûreyên homo habilis bin. Piştre cûreyên din ên weke rengê homo Erectus wê xwe bide dîyarkirin û wê hemû pêvajoyên piştre wê homo cepranensis, homo antecessur, homo heldelbergensis, homo neandertalensis, rhodesiensis, homo floresiensis, homo û heta ku wê were homo sapîens, wê dem bi dem wê ji hemû erectus wê pêvajoyên peresendinê wê werina derbas kirin. Her wusa wê homo sapîens jî wê pêvajoyna li ser xwe bi xwe re wê derbas bike. Em ku ji pêvajoya peleolîtîkê a destpêkê hildina li dest, wê bi neandertal re wê cûreyê homo sapîens ê destpêkê,

cûreyê duyem ê ´idaltu(*)´ û di dawîya dawî de ku wê ew weke mirovê dihizirê ku wê were bi navkirin wê homo sapîens ´sapîens´ wê pêşbikeve. Pêvajoya *homo sapîens ´sapîens´* wê, weke pêvajoya dawî a pêşketî ya mirovê dihizirê bê. Wê di vê demê de wê homo sapîens, wê hin bi hin wê nevnasînê bi xûyên mirovê hemdem ê roja me re wê hevnasînê bike û wê bi wan êdî wê bidest pêşketina xwe re wê bike.

--------------

(*)Dema ku homoi sapiens idaltu wê weke demek pêşketî a di nava dema homo sapiens û yê mirovê roja me de ku wê were li ser ziman bê. Ev dem wê weke demek ku wê piştî wê re wê, weke mirovê hemdem wê homo sapiens wê dest û ling û amûran bikarbênê û mejiyê wî jî wê bidest hizirkirinê wê bikê. Wê hin bi hin wê bidest ahlkirina sawalan li rex xwe wê bikê. Wê kucik û ankû sa wê sawalek ji wan sawalên herî pêşî ku ew ahlbûya û hatîya kedikirin bê. Kedikirin wê nîşanaka jîyane bicihbûyî bê.

Em dema ku van pêvajoyên peresendinê heta homo sapîens wan bikin ku wan fahm bikin, em divê ku em ji aliyê fîzyolojikî û biolojikî ve jî wê mijarê hildina li dest. Her çend ku wê ji aliyê genetîk û DNA´yên wê ve wê di roja me de wê zor jî bê ku em vegotinek ahengbar di mijarê de wê çêbikin, werênina li ser ziman û bi wê re mijarê werênina li ser ziman jî, ev rengên ku em dihênina li ser ziman, wê hem encamên zanînî û her wusa di wê çerçoveyê de bi aqil gihiştina encamên ku wê li ser wê xate pêvajoyên peresendinê û hwd bin. Di DNA´yê de rewşa motasyonê ku ew xwe hertimî dikarê bi rengên gûharînên ji binî ve wê bide dîyarkirin, wê di rewşa vê xate peresendina li ser nifşên mirov ve jî wê xwediyê rewş û wateyekê bê. Heta ku em dikarin wê, pirr zêde jî wê, xwediyê wê wateyekê bê. Li ser têgîna DNA´yê re weke têgîneka bi encamî ku em bi aqilê xwe digihijênê de em li vir wê werênina li ser ziman ku wê hertimî wê pêvajoya demê a pêşketî wê ji wê astê wê bidest hebûna xwe bi pêşketina xwe re wê bike. Ev jî wê di şêwayekî geometrîkî de wê rewşa asta pêşketina bi DNA´yê û hwd re wê, bide nîşandin. Yanî, wê hertimî wê asta dawî a pêşketî wê bi çerçoveya xwe re wê ji temen ve wê kifşkar bê. Bêgûman, dema ku em pêvajoyên peresendinê ên di xate mirov û pêşketina mirov de wê werênina li ser ziman, di vê çerçoveyê de em nikarin vê rewşê ji berçav dûr bikin û ji nedîtî ve werin. Peresendina li ser ´prîmat´an re wê di vê çerçoveyê de wê ji destpêka wê di nava şert û mercên demên xwe de wê heta roja me wê were. Li ser destpêka homo sapîens û motasyona wî, mirov dikarê bi zane li dora şeş(6) û deh(10) milyon sal berê ku wê destpêkirîya wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê jî wê werênê li ser ziman ku wê heta li dora şêştûpênc(65) milyon sal berê wê li ser hebûna prîmatan a ´plasiadapîs´an re wê sopandin wê karibê wê herê. Di demên ´paleosen´ û ´eosen´ de wê ku ew qatbûn û qalîşîn(derzîna)a parzemînan ku ew ji hevdû dûrketîya de wê, di nava şert û derfetên jîyanê ên ku ew diafirin li herêmên roja me ên weke berdiclê û firatê, avrasya, afrîqa, parzemîna emerika roja me û hwd, wê li wan wê bijîn. Bi wê re em di dewama wê de wê jî wê werênina li ser ziman ku wê cûreyên mirovkî wê destpêka wan wê weke ´homînodea´ wê ji temenê parzemîna afrîqa û gîştîya asya ku ew bi hevdû ve girêdayî û hê zêde ji hevdû ne dûr in, wê ji wan destpê bike û wê belav bibê. Ev jî wê weke dema herî zû a´ mîyosen´e afrîqa û asya bê. Di van deman de ku mirov şîrove bike û wan fahm bike, divê ku mirov afrîqa û asya bi hevdû ve girêdayî wan hilde li dest weke parzemenek giştî a mazin. Bi teybetî jî rojhilatê afrîqa ku wê di serdemên piştre wê bikeve dehma herêma mesopotamîya û ku wê ji wê nedûr bê, wê ji wir wê belav bûn wê bibê. Di aslê xwe de mirov, li vir, ku wê rêwîtîya ji wir û bi ber mesopotamîya de wê hilde li dest, wê di vê çerçoveyê de wê ji aliyekî ve wê bo rewşa mesopotamîya jî wê pirr zêde wê vegotinbar û giring bê. Wê di serdema mîyosen´ de wê cûreyên pêşî ên weke mirovî û ankû mirovkî wê xwe bidina dîyarkirin. Ku ew weke ´arkaîk´ jî wê werina binavkirin, wê di dema mîyosen de ku ew piştre tûxmê wan dawî lê hatîya wê tûxmên weke bi navên afropitekus, kenyapitekus, griphopitekus, pierolapitekus, dryopitekus û oreopitekus û hwd wê pêşbikevin û wê xwe bidina dîyarkirin. Lê çendî ku ew tûxm, hatibibina ji çûyin jî wê, ji wan li ser bîolojîya wan û ankû DNA´ya wan û hwd re wê weke asta xwe ya dawî, wê zindiyên dewama wan ên piştre wê hebûna xwe wê bidina domandin. Di vê çerçoveyê de wê xelek û zincîre peresendinê a bi bîolojikî wê hebûna xwe wê bide domandin.

Di dema ku homo sapîens tê herêmê, wê neandertal, wê weke koman wê bi malbatî wê bijîn. Wê di şikefta de wê bijîn. Hê ji dema homo erectus ve wê heta dema homo sapîens û ankû mirovê ku ew dihizirê, wê homo sapîens wê fêrî jîyane şikeftan û di wan de jîyankirinê jî wê bibê. Bi wê re jî wê, di vê çerçoveyê de wê dema ku ew dihên herêmê wê, hingî wê li deverên weke stergeh ku ew weke şikeft, qûlên mazin ku ew pirr berfireh û kûr di ardê de diçin, bin latên mazin û dorgirtî û hwd, wê xwe li wan bigirin. Lê di wê demê wê, di nava jîyane xwezayê de wê zindiyên din jî wê bibin. Ew jî wê, weke zindiyna ku wê xaterîyê ji jîyane wan re wê çê bikê bê. Mirovê şikeftê homo sapîens ku ew fêrî jîyane

şikeftê dibê, wê ev di mejî û laş de bi fîzyolojikî jî wê bê temenê hinek gûharînan ku wê ew bi xwe re wê bi bîolojikî wê bijî. Di vê çerçoveyê de wê ew rewşa fêrbûnê, wê bi qayîmînîya laş û ankû qaysgirtina weke rewşa ku ew di wê de bi jîyanî dijî re wê xwe bi bîolojikî jî wê bide pêşxistin. Homo sapîens, wê weke mirovê ku ew li ser lingan dimeşê, wê li gorî mirovê roja me, wê xwediyê gelek xoslet û rewşên fîzyolojikî ên ku wî bi xwe re pêşxistin bê. Homo sapîens, wê weke mirovê ku ew tevgerên xwezayê wan dike ku wan li gorî xwe kifş bike û bi wan re ew bijî bê. Rewşa rengê jîyane homo sapîens, wê pirr cuda bê. Homo sapîens, wê zû pêşbikeve. Ew dikarê xwe ji rewşan biparêzê. Bo vê yekê wê, ew serwerîya xwe li neandertal jî wê çê bike. Mirovê neandertal, wê weke ku ew di rewşa xwe ya laşî û ankû fîzîkî de wî peresendina xwe hanîya asta mirovê roja me. Lê dema ku ew di rabê li ser lingan, wê hinekî bi pêş ve wê xwehr wê bimeşê. Wê serdema peleolîtîkê wê wê di pêvajoyên wê yên destpêkê navîn û dawî de wê homo sapîens wê, weke pêvajoyên wî yên pêşketinê jî bin. Di serdema dawî a peleolîtikê de wê li dora 60 û 50 hezar salî wê, bidest nîşandina tevger, kirin û xûyên mirovê hemdem û nîşandina wan wê bikê. Tabî, ev têgîn, di aslê xwe de wê karibê, wê gelek gûharînan di têgînên weke yên di derbarê ahlkirina şînahîyan de jî wê bide me. Her çendî ku wê bi zankirinê wê bê gotin ku wê li dora 10 hezaran salan wê ahlkirina şînahîyan û hwd wê bê pêşxistin jî em, dikarin vê dîrokê kevntir bibin û ji serdema neolîtîkê derbas bikin û bibina dema mezolîtîkê û dibê ku hinekî ji wê wirdetir li dema dema dawî a peleolîtîkê jî. Dema ku mirov hizir bike ku wê homo sapîens wê li dora 60 û 50 hezar salî wê bidest nîşankirina tevger, kirin û xûyên mirovê hemdem wê bikê ku mirov wê bihizirê, wê demê, li ser vê têgînê re mirov dikarê wê kevntir bibê. Ber ku wê, ahlkirin jî û kedîkirin jî wê, bi pêşveçûna mirov û mejiyê mirov ve wê girêdayî bê.

Di serdema peleolîtîkê a dawî de wê mirovê ku ew dihizirê homo sapîens, wê ji gelek aliyan ve wê peresendina xwe wê li gorî mirovê roja me ê hemdem wê temem bikê. Wê bidest danîşana xûyên mirov hemdem bike. Ev jî wê rastî beşa dema dawî a peleolîtikê wê were. Beşa dema dawî a peleolîtîkê, wê di vê çerçoveyê de wê di xwezayê de wê gûharînên mazin bibin. Gelek gûharînên dawî ku wê piştre wê weke heta roja me wê hebûna xwe wê bidina domandin wê bibin. Bi wê re jî wê, germehî wê zêdetir bibê. Ev jî wê nîşanaka wê ya ku wê di birehe de wê gûharînên mazin wê çê bibin. Rewşa çolbûnê û hwd, wê di van deman de wê pêşbikeve. Wê piştre wê hin bi hin wê bi pêşveçûnên di birehê de re wê di ahengekê de wê hebûna xwe wê bide domandin. Darîstan wê biafirin. Di daristanan de wê sawal û ajalên mazin wê bijîn. Homo sapîens jî wê bi wan re wê bijî. Wê bi wê re wê ev zindîyên ku ew di xwezayê de dijîn, wê xaterîyê li ser jîyane wî jî wê çê bikin. Lê, biqasî ku mirov ji rengê pêşveçûn û pêşketina homo sapîens a demê fahm dikê, mirov wê jî dibînê ku wê homo sapîens wê fêrî nêçîrkirinê bibê. Wê ew bidest nêçîra sawal û ajalên din ên di xwezayê de bike. Her wusa, wê tişta ku nêçîrkir jî wê wan bixwe. Nêçîrkirin wê di vê demê de wê bikeve jîyane homo sapîens de. Rewşa nêçîrkirinê, wê di çerçoveya temînkirina xwarinê a bo jîyanê wê were kirin. Di rewşa jîyanê xwe de wê, homo sapîens, wê weke komên klanî wê bi hevdû re wê bijîn. Di aslê xwe de wê, di vê demê de wê komîya bi hevdû re bi jîyankirinê ku ew pêş dikeve wê, zêdetirî wê derkeve li pêş. Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî wê werênê li ser ziman ku wê ev kombûn, wê weke kombûna mirovê dihizirê a di jîyane şikeftê de bê.

Rewşa kombûnê wê weke gavek giring a di jîyane homo sapîens de wê weke gavek giring bê. Her wusa bi wê re divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, kombûna mirov sapîens, wê wî di jîyanê de jî wê xorttir bike li hemberî telûkeyên ku wê derkevina ber wî.

Di aslê xwe de wê rewşa kerîtîyê wê berê jî wê di nava nifşên pêşî ên homo sapîens de wê hebê. Di çerçoveya kerîtîyê de wê çawa wê li ser jîyankirinê re wê bi hevdû re bin, wê di wê çerçoveyê de wê bi hevdû re bin. Ji aliyekî din ve jî wê di vê rewşê de wê ev kevneşopîya ku wê li dora yekî nêr wê çend mê wê li hevdû kom bibin, em î ro jî bi şampezeyan re wê dibînin. Lê ev rewş, wê di nava mirovê ku ew dihizirê homo sapîens de wê di rewşê pêşketîtir de bê. Li vir, wê girêdanîyek bi ajoyî û hîsî wê di nava komê de wê çê bibê. Mirovê komê, kengî xwest wê bi jinên komê re wê têkiliya zayendî wê dênin. Wê bi hevdû re wê herina nêçîrê. Wê di telûkeyekê de wê bi hevdû re wê tevbigerihin. Ev rewş, wê piştre wê li ser encamên wê re wê homo sapîens, wê bîbînê ku wê ew bi hêztir bibê. Piştre wê, vê jî bibînê ku ew çendî di nava komê de ya temenê jîyane wî dirêjtira.

Di vê rewşê de wê bo vê yekê wê ew êdî wê di nava komê de wê weke yekî ji komê wê xwe hîs bike. Mirovê sapîens, dema ku ew di nava komê de ya, wê gelek sedem, di temenê wê bi hevdûbûnîya bi komî wê bikin ku ew her dayimî di nava komê de wê biafirin. Wê mrovê wê homo sapîens, wê wan encaman bi jîyankirinê re wê fêrî wan bibê. Di vê çerçoveyê de ew tiştên ku ew dijî, wê bixwezê ku ew cardin wan bijî. Wê nexwezê ku ew xwe ji wan bike û ankû ew xwe ji wan mahrûm bihêlê. Bo vê yekê jî wê ew wê çerçoveyê de wê ew wê rewşê wê bi xwe re wê bijî. Di rewşa jîyane bi komî de wê, di wê jîyane şikeft a komê de wê ev rewş, wê weke rewşek teybet a jîyanî bê. Her wusa, ew şikefta ku ew di wê de dijî, wê di wê de wê gelek wê bi hevdû re wê bijîn. Her çendî ku wê ji gelek aliyan ve wê ji me re fahmkirina wê, wê hinekî zor jî wê were, lê wê weke ku mirov kifş dike wê şêwayekî sist ê hîyararşîkî wê hin bi hin wê di nava wan de wê hebê. Ev jî wê, weke ji yên piçûk û heta yên kal, ji yên zayîf û heta yên bi hêz û hwd de wê, xwe bide nîşandin.

Di nava komê de wê, temenê komê wê weke ku mirov wê kifş dike wê jina homo sapîens wê derkeve li pêş. Ew dayika zarokan a. Zarok ji kê mêr û ankû yê nêr a, ew ne kifş a û ne jî giring a.

Jina homo sapîens, wê weke jineka ku wê, di vê çerçoveyê de wê ew li dora xwe wê kombûnê wê bide çêkirin bê. Her wusa bi têkiliyên zayendî ên bi wê re bê, bi li dora xwe girtin û mazinbûna zarokan bê, bi girêdanîya wan ya bi hevdû û hwd re bê. Ev rewş, wê weke rewşna ku wê hin bi hin wê weke xûy wê xwe bidina pêşxistin. Wê mejîyê mirovê homo sapîens ê nêr, wê weke çerçova û rengê wê rewşa bi xûyî ku ew xwe dide dîyarkirin wê di xwe de wê qayd bike. Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê her kirin, wê weke kirineka ku wê bi dûbare kirina wê re wê temenê bûyîna wê weke xûyekê jî wê biafirênê. Ev jî wê, ji aliyekî ve wê weke pêşketineka giring û dîrokî bê. Di aslê xwe de mirov dikarê rewşa pêşketina xûyê, weke pêvajoya pêşî a hizirkirinê jî wê hilde li dest. Wê li dûv wê pêvajoyê, wê li ser ajoyan re wê hîskirin, wê piştre wê pêşbikeve. Piştre jî wê li ser wê hîskirinê jî wê di dewama wê de wê hizirkirin wê temenê wê biafirê û wê hizirkirin êdî wê piştre wê bibê.

Xûy, wê di jîyanê de wê weke şêwa û rengekî fêrbûnê bê. Di vê çerçoveyê de wê giringîya wê hebê. Bi gotineka din, mirov dikarê xûyê, weke rewşa ezmûnkirinê jî wê werênê li ser ziman. Dema ku mirovê homo sapîens, çû nêçîrekê bi komî, dema ku wan bi hevdû re ew nêçîrkir û piştre ew nêçîr hanîna şikeftê li nava komê, wê bi hevdû re wê, ew wê nêçîrê, wê bixwûn. Di nava komê de wê, yên ku ew nikarin ew weke yên mazin nêçîrkirinê bikin û ankû ne weke wan in, wê zarok wê hebin. Zarok, bi mejiyê xwe re wê, tişta ku ew bibînê ji mazinên xwe re wê ew li ser wê re wê bihizirê. Wê ew wê fêr bibê. Bi demê re wê ew jî wê weke mazinên xwe wê nêçîrê bike.

Bi demê re wê ev rewş wê temenê pêşketina xûyên komê pêşketina wan jî bin. Xûyên komê, rewşa bi hevdû re bûyînê ji aliyê fîzyolojikî û ankû derûnî ve wê çawa xwediyê bandûrekê bê bi alimandinî û hwd, wê ev rewş wê xwe bidina dîyarkirin. Tabî rewşa alimîna jîyane komê, wê di vê çerçoveyê de wê giring bê. Bi demê re mirovê ku ew di nava komê de ew hatîya dunyê û wî piştî ku ew mazin bûya ku wî hemû endamên din ên komê li dora xwe dîtina û naskirina, wê ew girêdayînîyeka derûnî, hîsî û alimandinî a li hevdû jî wê bi xwe re wê bi wê re wê biafirênê. Ev rewş wê, weke rewşna ku wê, di vê çerçoveyê de wê, di rewşa dawî a homo sapîens de wê rewşa mirovê homo sapîens ê komê jî wê xwe bide dîyarkirin. Ew dema ku ew bûya, ew dinava komê de bûya. Bi wê rewşê re ew mazin bûya. Piştre jî ew dikeve zorê de ku ew dervî komê, derfetên komê û wê rewşa alîmîna wê, bijî. Bo vê jî wê rewşa jîyane komê, wê di vê çerçoveyê de wê bi demê re wê weke rewşek giring wê xwe bide dîyarkirin bi mirov re.

Tabî divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê mirovê homo sapîens ê komê, wê weke mirovê ku ew bi rewşa xwe ya jîyanî a komî re ew dike ku bi ser şert û mercên xwezayî ê ku ew di nava wê de dijî re were. Di vê çerçoveyê de wê rewşa mirovê homo sapîens ê komê, wê ew piştre ew ji aliyekî jî ve wê nikaribê, ku ew dervî komê bijî. Dema ku ew ket dervî komê û ankû ji komê dûrket, wê xwe bêhêz, lawaz û bitirsê wê hîs bike. Ev jî wê temenê wê bê ku wê care pêşî wê mirovê homo sapîens ê komê ku wê bi hîs û hêsta tirsê re wê care pêşî wê hevnasînê bike.

Mirovê homo sapîens ê komê, wê di rewşa xwe ya jîyanê de wê, di nava komê de wê xwe bihêz û xort hîs bikê û bibînê. Ew jî wê, vê yekê wê di jîyane xwe de wê hin bi hin wê li ser serborîyan re wê ew wê kifş bike. Bi wê re wê, ew wê bijî. Di vê rewşê de wê ew êdî wê di rewşa xwe ya jîyanê de wê, bi demê re wê salixkirinekê bi xûyî wê li ser wê rewşa jîyane komî ku ew di wê de xwe bi xort û hêz hîskirinê re wê bike. Dema ku ew rewşa vajî wê dijî û ankû ku ew bi tenê dimênê, wê hingî wê li hemberî telûkeyan wê

ne bi hêz û xort bê. Bo vê yekê jî wê ew, dema ku ew bi tenê ma, wê bi hîs û hêstên din re wê hevnasînê bike. Mejiyê mirovê homo sapîens ê komê, wê weke ku wê di vê demê de wê leyistikên mazin wê bi wî bide kirin. Mejî, wê hîs û hêstên tirsê wê wî bi wan re wê bide naskirin. Li hemberî telûkeyan ku ew bi tenê ma, wê çi bike, wê bi wê re wê dilê wî zû li ser hevdû bide avêtin. Wê adranalîn, wê di laş û mejî de wê xwe bide afirandin. Ev rewşa adranalînê û afirîna wê, di aslê xwe de wê weke rewşek giring bê. Adranalîn, wê di çerçoveya wê têgîna alimîna komî û hwd de wê, rewşa fêrbûnê a jidahî jî bê. Adranalîn, wê li ser rewşên ku em wan di zanîn re wê bibê. Lê wê bi xwe re wê rewşek pirr cûda jî wê bide afirandin. Her wusa, wê ji rewşekê wê mirov bike rewşekê de. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman, hevnasîna mirovê homo sapîens ê komê bi rewşa tirsê re wê weke rewşek nû, giring û ku wê bandûra wê li rex ya xûyên wî yê alimînê wê pirr zêde wê hebê bê. Her wusa, wê rewşa tirsê, wê di vê çerçoveyê de wê, gelek tiştan jî wê bi mirovê homo sapîens ê komê wê bide kirin. Minaq, wê girêdanîya wî ya bi komê ve wê zêdetir bike. Wê bi wî bide hîskirin ku ew dervî komê ne bi hêz û xort a. Wê bi wî bide hîskirin ku ew divê ku ew ji komê dûrnekevê. Ev rewş, wê weke rewşna ku wê giringîya komê wê bide nîşandin bê. Kom, wê temenê jîyane wan ya bi hevdû re bê. Di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa jîyane homo sapîens ê komê, wê weke rewşek teybet bê. Wê di vê çerçoveyê de wê mejiyê wî, rewşên ku ew bi vê rengê wan dijî, wê wan di xwe de wê qayd bike. Mejî, di vê demê de bidest qaydkirina bi xwe re kirîya. Ev jî weke aliyekî giring ê ku mirov wê hilde li dest bê. Kom, wê weke rewşeka jîyanî a jîyanê bê. Hîskirina bi nava komê re wê weke hîsek giring a ku mirov wê bi teybetî wê hilde li dest bê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa jîyane mirovê şikeftê a homo sapîens ê komê, wê bi xwe re wê xûyên mirovê hemdem ku ew wê piştre bijî, wê di vê çerçoveyê de wê bi xwe re wê pêşbixê û wê di genên xwe de wê wan bide pêşxistin û qayd bike.

Jîyane di nava komê de wê hin bi hin wê xûyên xwe wê bide çêkirin. Wê ew xûy jî wê, hin bi hin wê weke xûyna hevbeş wê xwe bidina dîyarkirin. Hevbeşîya wan xûyan, wê di aslê xwe de wê nîşanaka tiştekî teybet bê. Wê bi demê re mirovê homo sapîens ê komê wê li ser wê hevbeşîyê re wê rewşek fahmkirinê jî wê bi xwe re wê pêşbixê. Mirovên komê bi hevdû re na. Di nava hevdû de dijîn. Bi hevdû re nêçîrê dikin. Bertek û helwestekên hevdû ên li hevdû, li dijî û bi hevdû re li dijî rewş, ajal, sawal û zindiyên din ên xwezayê dibînin. Ev jî wê temenê rewşek teybet a ku wê bi wê re wê weke hevdû bibînin bin.

Weke hevdû dîtin, wê bi weke hevdû jîyankirinê re wê pêşbikeve. Bi wê re jî wê, rewşan weke hevdû salixkirinê wê bi xwe re wê werênê. Her wusa di nava komê de wê, rewşên ku ew dibînin, wê bi hevdû re wê salix bikin. Di nava komê de wê, her endam wê weke endamekî wê xwediyê rewşa xwe bê. Wê bi hewirdora xwe re wê xwediyê rewşek teybet bê. Wê her tişt wê ji xwe re bê. Wê di kirin, tevgerin û nêzîkatîya li hevdû de wê, kifşkirineka bi aqlî wê tûnebê. Di wê rewşê de jî wê, dema ku mirovekî nêrî û ankû mêr ê komê xwest ku ew bi yek mê re bikeve têkiliya zayendî de wê, ew wê herê û wê bike. Di vê çerçoveyê de wê, ev sînorê wê nebê.

Hê ew têgîna weke ya xwe dîtin û ankû weke malê dîtin, wê pêşneketibê. Lê hin bi hin wê rewşên ajoyî wê zêdetir wê di nava komê de wê xwe li ser rewşn weke yên zayendî û hwd re wê bidina nîşandin. Mirovê komê wê dema ku wî xwest ku ew bi jineka ji nava komê re ew bikeve têkiliyê de û ku wî ew destûr negirt, wê bihêrs bibê. Wê hewl bide ku zorê bikarbênê. Lê ev jî heya ku ew jina komê, wê karibê li berxwe bidê.

Di vê rewşê de wê, jîyane komî wê di çerçoveyekê de wê xwe hin bi hin wê xûyên xwe wê pêşbixê. Wê bi hevdû re çûyîna nêçîrê û nêçîrkirinê wê pêşbixê. Wê bi hevdû re wê sawalên mazin ku wê ti carî yekî tenê bikaribê wan nêçîr bike wê ew wan nêçîr bikin. Ev jî wê, di rewşa wan de wê rengekî bixwe bawerbûnê wê bi wan re wê pêşbixê.

Mirovê homo sapîens, têkiliya wî ya bi neandertal re wê, bi ketina nava hevdû re bê. her wusa, wê di vê çerçoveyê de bê. Em ji rewşê û encamê vê yekê li vir fahm dikin ku wê, mejiyê mirovê homo sapîens, wê di wê rewş û çerçoveyê de bê ku ew zûtirîn karibê xwe li gorî rewşan bi qaym û qays bike bê. Ber vê yekê, wê ev di rewşa wî de wê ji wî re wê bê derfeteka ku ew bi wê xwe serdest bikê bê. Mirovê neandertal, wê weke ku ew di wê demê de ew çendî ku ew bi komî jî bê. Lê wê di endamên wê de wê ew

rewşa komîtîyê wê ne biqasî ya bi homo sapîens re wê xort bê. Wê ew karibê, herê rêwîtîyên dirêj ên dûrî komê. Di wan rêwîtîyan ew, yan di vegerihê û yan jî navegerihê.

Em li vir, divê ku vê yekê li vir di dewama wê de bi neandertal re wê werênina li ser ziman ku wê neandertal wê weke cûreyekî ji dema navîn mirovê homo sapîens ku wê rastî dema destpêka peleolîtîkê û dema navîn a peleolîtîkê wê werê. Neandertal, ber vê yekê wê ew û homo sapîens wê bi cûreyên xwe yên hevbeş ên weke *denîsova* re wê di nava hevdû de wê bijîn. Neandertal, ji nîşanak û îskeletên wî yên li herêma Afrînê, helebê û başûrê kurdistanê ku ew hatina dîtin, mirov ji wan fahm dike ku ew li van herêman, zûtirîn hatîya û jîyaya. Neandertal, li gorî mirovê homo sapîens, biqasî ku mirov wê fahm dike, wê ne zêde mirovê germê bê. Ew çendî ku ew hin bi hin fêrî germê dibê û di wê de dijî jî, lê mirov wê bi awayekî kifş dike ku ew wê xwe di rêzarewşekê de wê di awayê ji herêmên cemed, û heta herêmên hinekî germ, wê li wan bijî. Di vê çerçoveyê de wê herêmên asya ên cemed, sibirya û herêmên mesopotamîya ku ew ne zêde germ in, wê li wan bijî. Di vê rewşê de mirov, dikarê vê jî wê bibêjê ku di serdema ku neandertal dijî de wê parzemîna ewropa ku wê hê gelek deverên wê di bin qaşayê de ya û hin deverên wê hê nû ji jîyanê re divebin û ne zêde germ û ne jî zêde cemdî na, wê herê wan jî. Di vê çerçoveyê de mirov, vê yekê weke rewşekê kifş dike ku wê, neandertal, wê di nava rewşeka cemedîyê û germbûnê de wê herê û werê. Lê wê hin bi hin wê fêrî germbûnê bibê. Di vê çerçoveyê de homo sapîens wê berê li dora dused milyon salê berê wê li afrîqa wê bidest pêşketina xwe bikê. Li vê herêmê wê germbûn wê zûtirîn wê bibê. Di vê çerçoveyê de wê di nava şert û mercên germbûnê de wê homo sapîens wê laşê wî çêtirîn wê di rewşeka ku ew karibê li gorî rewşên herêmê bijî bê. Ji aliyê herêmên weke rojhilat afrîqa ve hatîna homo sapîens bi ber mesopotamîya û ankû kurdistanê ve wê, herêmê jî wê ji wî re wê bike qada jîyanê. Lê li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, neandertal, wê berî hatina homo sapîens a herêmê wê ew li wê herêmê wê bijî bê. Ev jî wê, bi nîşanakên ku ew derdikevina li holê re ew xwe dide nîşan kirin.

Mejiyê mirovê homo sapîens, wê zêdetirî wê weke pêşketî bê. Çendî ku mejî dijî û dibînê û di xwe de qayd dike, wê hingî wê zêdetirî wê di wê de wê kompleks, tûreyên sînîran, qaym û qays girtina li gorî rewşan û hwd wê pêşbikeve. Ev jî wê, weke rewşna ku mirov pêşketina wan, bi homo sapîens re wê zêdetir wê xwe bidina dîyarkirin. Mirovê herêmên germ lê ku ew herêm ne zêde germ bin, wê di rewşên wan yên newrolojikî de wê cûdahîyên bi vê rengê wê xwe bidina pêşxistin. Wê bi mirovê neandertal re jî wê, ev rewş wê hebê.

Em vê jî bibêjin ku em gelek rewşên ku weke mirovan î ro dijîn ên weke zaroktiyek dirêj, pêvajoya bi hamlbûnê û hwd, wê weke rewşna fîzyolojikî bin ku wê bandûra pêşveçûnên mejîyî wê li ser wan wê zêde bibê. Gelek zindiyên di wê rewşê de pêvajoyên wan ên bi hamlbûnê re wê cûdahî wê hebin. Di rewşa zindiyan de em divê ku vê jî wele fektorek giring wê werênina li ser ziman ku wê gûharînên di birehê û hwd de wê, bandûra wan jî wê bibê. Germbûn, wê bi demê re wê, bi rewşa lavan û pijiqîna wan, derketina agiran di daristanan û hwd de wê, bandûra wê zêde wê li birehê bibê. Ev jî wê, di rewşên gûharînî de wê weke rewşna bi bandûr bin.

Wusa mirov, wê kifş dike ku wê homo sapîens, wê weke cûreyê me yê zindî ê ku ew sentezekê wê di xwe de wê ji aliyê fîzyolojikî ve wê bide çêkirin bê. Cûreyê homo sapîens ku em dikarin weke kalkê homo sapîens jî werênina li ser ziman ´*homo sapîens idaltu*´ wê weke cûreyekê pêşî ku ew dikarî hîsên xwe bikarbênê bê. Zerika mejiyê homo sapîens idaltu´ ku wê bi şûn ve wê bi berfireh bibê, wê bi pêşve wê xwediyê çavna dorfireh, bêhvilek ku ew hê zêde bi pêş e dirêj nebûya û hê li ser rû hinekî bela ya, wê xwediyê wê bê. Lê em vê yekê jî wê bibêjin ku wê ji aliyê mîreteya rakendî ve wê homo sapîens wê ji vê cûreyên xwe yên pêşî wê ji aliyê genetîkî û bîolojikî û hwd ve wê gelek tiştan wê bigirê.

Homo sapîens, wê di rewşa xwe de wê weke ku ew zêdetirî zîrek û kêrhatî bê. Lê wê neandertal wê têgîna komîtîyê wê di destpêkê de wê zêdetirî wê bi wê re wê hebê. Homo sapîens, ew dema ku ew minaq dihê mesopotamîya, wê di vê çerçoveyê de wê di pêvajoyên xwe yên dawî de wê van xosletên mirovê neandertal wê bigirê. Her wusa, mirovê neandertal, ew xosletên wî yên weke çûna nêçîrkirinê û tişta ku wî nêçîrkir ku ew wê werênê şikefta ku ew lê dijî û li wir wê bixwazê bê di nava komê de wê were xwarin, wê ev rewş, wê bidina nîşandin ku wê têgînek bicihbûnê û ankû bi naskirina cihê û an jî ku ew xwe aîdî deverekê ku ew xwe bi wê re nas dike re wê xwedîyê pêşketinê bê. Ev xoslet, wê ji mirovê ku ew li herêmên ne zêde germ ku ew dijîn wê zêdetir wê xwe bidina dîyarkirin ji yên mirovên ku ew li

herêmên pirr germ dijîn bin. Wusa tê dîtin û fahmkirin ku piştî ku homo sapîens hat herêmê wê rewşên herêmê jî wê bibînê û wê tişta ku wî dît, wê bi zîrekî, kêrhatî û çalakîya xwe re wê bigihênê li hevdû. Di vê çerçoveyê de pêvajoyên dawî ên homo sapîens ku wê weke pêvajoya homo sapîens a *´mirovê dihizirê´* bê, wê di vê çerçoveyê de wê bi van bandûrîyên li ser homo sapîens re wê xwediyê pêvajoyek pêşketinê a bi xwe re bin. Pêvajoyên jîyane homo sapîens, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bin. Ew li devera ku ew diçiyê de ew xosletên xwe li wan deveran wê bi awa û şekl bike. Nîşanaka vê jî wê, bi hatina wî ya li herêmên mesopotamîya ber firatê ên germ lê ku ew ne zêde germ in, wê neandertal wê bibînê û wê rewşa jîyane wî bibînê û wê piştre wê bi jîyane xwe re wê awayekî peresendinê wê bi pêvajoyên jîyane neandertal re wê derbas bikê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê bi demê re wê mirov homo sapîens wê li herêmê wê bicih bibê. Di dema peleolîtîkê a dawî de ku wê mirovê homo sapîens wê bi xosletên yên weke bi komî ku ew wê bijî de wê, di vê demê de wê nêvî bi nêvî wê rengekî komî wê bi jîyane wî re wê biafirê. Di kombûn û afirîna wê de wê ya ku wê were dîtin wê ew bê ku wê endamên komê wê bi zêdeyî wê bi hevdû ve wê bi xwûnê wê girêdayî bin. Ev rewş, wê weke ku çawa ku di roja me de jî wê di nava sawal, ajal û tayrikan û hwd de ku ew bi komî wê dijîn, wê di vê çerçoveyê de wê di rengekî de wê bijî. Girêdanîyeka ku wê di temen û hîmê wê de wê rewşek fîzyolojikî wê hebê, wê ew li ser wê re wê di nava komê de wê bijî. Ev rewş, wê bi mirovê homo sapîens re wê xwe bide dîyarkirin.

Di vê demê de wê mirovê homo sapîens wê nêçîrê bike. Wê dabara xwe wê bi nêçîrkirinê wê bike. Di vê çerçoveyê de wê di rewşekê de wê, bijî. Dema ku homo sapîens dijî, wê pirr zêde wê cûreyên sawal, ajal û teyrikên ku em î ro dikarin bêjin ku wê gelek ji wan cûreyan wê nebin, wê di wê demê de wê hebin. Wê ew cûre hemû jî wê ji aliyê wan ve wê werina nêçîrkirin. Li vir, em nabêjin ku wê ya hesan wê nêçîr bikê. Wê ya zort, zaxm û xater jî wê nêçîr bike. Ber ku ew wê bi komî wê ji aliyekê gelekan wê bi hevdû re ve wê were nêçîrkirin. Wê, di vê çerçoveyê de wê hêza xwe wê bikina yek. Mirovê homo sapîens, wê li ser wê rewşa xwe ya komî re wê, bi demê re wê di dema dawî a serdema peleolîtkê de wê, hin bi hin wê bidest pêşxistina hîskirinê a bi xwe re wê bike. Wê di temenê kirin, tevger û xûyên wî yên ku ew dide nîşandin de jî wê ajo(weke ajoyên jîyanî ên xwe parastinê û hwd), wê hebê. Lê em li vir, vê yekê bibêjin ku mejiyê mirovê homo sapîens wê ji girtinê re wê êdî wê vekirî bê. Ev rewş jî wê bi demê re wê pêşbikeve. Lê li vir, bi vir ve girêdayî ez dixwezim vê jî werênima li ser ziman ku wê rewşa komîtîyê wê hin bi hin wê li ser serborîyên mirovê homo sapîens re wê, weyn û rolek xêvî jî wê bidest leyistinê wê bike. Di vê çerçoveyê de ev rewşa komî, wê weke rewşek giring ku wê pêşî ew bi pijê, qayimê û bikelê di nava rewşa dîtin, tevger, kirin û xûyên mirovê homo sapîens de.

Tabî li vir, rewşa komê, mirov divê ku wê baş fahm bike. Bo vê yekê, em li vir hinekî din jî li ser wê bisekin in.

Di nava hemû sawal, ajal û tayrikan de wê, rewşa komîtîyê û bi komî tevgerînê wê hebê. Ev rewş, wê weke rewşek xweza a ku wê di temenê wê de wê hinek girêdanîn fîzyolojikî ên bîolojikî û ankû genetikî jî wê hebin. Di vê çerçoveyê de wê rewşa komî, divê ku mirov wê weke rewşek teybet a bi rewşa fîzyolojikî a heyînî re jî wê werênê li ser ziman. Di nava mirovê homo sapîens de wê, ev rewş jî wê hebê. Rewşa komê ku mirov wê hilde li dest, ji sê aliyan ve mirov dikarê di rewşa homo sapîens de wê hilde li dest. Aliyê wê weke vê aliyê li ser rewşa fîzyolojikî a bi bîolojikî û ankû genetîkî re bê. Rewşa duyem wê li ser rewşa têkiliya navxwezayî a komî bê. Ev rewşa duyem, wê di temen û hîmê wê de wê xûyên komî wê hebin. Xûyên komî, wê di vê çerçoveyê de wê aliyekî wan ê kifşkar jî wê hebê. Dema ku em bahse xûyên komî bikin, em van aliyan divê ku di temenê wan aliyek yekem ê bi fîzyolojikî û bîolojikî re di bingeh de wê werênina li ser ziman. Di aliyê duyem de wê wê rewşên sawalî, ajalî û tayrikî ku ew bi hevdû re dijîn û heya, mirov dikarê wê jî di wê çerçoveyê de wê werênê li ser ziman. Ev alî wê, weke aliyekî zindîyî bê. Bi demê re pêşketina xûyan li ser rewşê re wê rewşa komî wê, hin bi hin wê bide pêşxistin. Di nava komê de çûyîna nêçîrê, kirina nêçîrê û ankû ji komê çûyîna deverekê û cardin vegerîna li nava komê, wê di vê çerçoveyê de wê weke xûyek hîsî bê. Di nava sawalên ku ew bi komî tevdigerihin de wê gelek ji wan wê hertimî wê bi hevdû re bin.Herwusa rewşên wan ên fîzyolojikî ên têkilîdanînê ên xwezayî wê hebin. Di vê rewşê de jî wê rewşa komê, wê xwediyê rewşek pêşketinê bê. Di rewşa mirovê homo sapîens de wê, tevger, kirin û xûyên ku ew dide nîşandin, wê ew di çerçoveya komê de wê, ew piştre bi demê re

vegerihina li rengekî xûyî ê hîsî. Ya ku wê bi demê re wê temenê rengekî bi hîskirinê ku em dikarin weke aliyê sêyem jî wê li vir di dewama wê de wê werênina li ser ziman wê ev bê.

Mirovê homo sapîens, î ro di destê me de hinek nîşanak hena ku wê hin bi hin wê bidest bikarhanîna amûran wê bikê. Wê kevirhastên ku ew qat bi qat weke qalikan li ser hevdûya û ku ew ji her hevdû dihê rakirin wê keviya wê şahîk û tûj bê, wê bidest karhanîn wê bikê. Ev jî wê, destpêk giring a dîrokî bê. Mirovê homo sapîens wê, di vê çerçoveyê de wê di pêvajoya pêşketina xwe ya komî a sêyem de wê, reng û wasîfî û nirxîtîya koma wî, wê rengê wê cûda bibê. Wê tevlîbûnên weke bi hîskirin û ezmûnan wê tevlîbibibin. Ev jî wê rengekî weke yê bi aqile ku mirov wê werênê li ser ziman. Di rewşa destpêka biaqil de wê, pêşî ajo, piştre hîs û piştî wê re jî wê destpêka aqil bi fêr û ezmûnan wê bibê. Di vê demê de wê mirovê homo sapîens, wê di nava komê de wê ajo û hîsê wê bi hevdû re wê bijî.

Di aslê xwe de pêşketina rewşa komê û di wê de xwe baş hîskirina mirovê homo sapîens, wê nîşanaka wê bê ku ew weke ji ahlbûn û kedîbûnê re wê ew vekirîya. Mejiyê wî, ji wê re êdî wî vekirîya. Di vê çerçoveyê de wê, ev rewşa wî ya komî wê fahmkirina wê, wê giring bê. Mirovê homo sapîens, wê bi komîtîya xwe wê ji aliyekî ve wê di vê çerçoveyê de wê bide dîyarkirin. Pêvajoya pêşî a komê, wê ew bê ku wê bi hevdû re herina nêçîrê û wê nêçîra ku wan kir, wê ew wê nêçîrê wê yan di cih de wê bi hevdû re wê bixwûn û yan jî wê werênina nava komê û wê bixwûn. Di vê pêvajoyê de wê mirovê homo sapîens, wê tenê li dîtîna xwarinê a bo xwe dabarakirinê wê li wê bigerihê. Wê ew wê, di vê çerçoveyê de wê li xwarinê wê bigerihê. Bi ajoyî, hêsta xwe jîyankirinê wê bibê. Heta ku xwarina hevdû jî mirov, di vê pêvajoyê de dervî dîtin û mantiqê nebînê. Mirovê homo sapîens wê di vê demê de wê di rewşa xwe de wê, bigerihê. Di hatina mesopotamîya de wê, li ber çeman, daristanan û hwd, wê xwe bigirê. Ber ku wê di daristanan de wê gelek sawal û ajalên ku ew nêçîr bike, wê hebin.Li ber çeman jî wê, hewl bidin ku ew ji avê masîyan bikin ku wan bigrin. Lê ev rewşa girtina masîyan, wê rastîya serdema pêşketina homo sapîens a sêyem wê a pêşketî wê were. Wê di temenê wê de wê hinekî fêrbûn wê hebê. Weke ku çawa ku wê hirç, wê ew weke sawalekê wê di nava avê de wê masîyan wê bigirê, wê bi şêwayekî weke wê rengê wê mirovê homo sapîens jî wê masîyan wê bigirê.

Di pêvajoya duyem de wê homo sapîens wê, komîtîya xwe wê pêşbixê. Wê di nava komê de wê, zêdetirî wê fêrî bi hevdû re tevgerînê wê bike. Ber ku wê encamên wê bibînê. Dema ku ew yek bê û ankû hindik bin ku ew diçina nêçîrê, li şûna ku ew nêçîrê bikin, dibê ku ew werina nêçîrkirin ji aliyê sawal û ajalên din ve.Minaq, sêr, kaplan, kiftar, kitik, gûr, sa, û hwd, wê weke sawalna ku wê ew çendî ew dema ku çû nêçîrê wê xaterîyê wê ji wî re wê çê bikin bin. Weke van wê gelek reng û cûreyên din ên weke van sawalan wê hebin.

Cûreyên sawalên weke çêlek, bizin, meh, baraz, mambiz, fîl, hasp û hwd, wê sawalên weke van wê sawalên ku wê bên nêçîrkirin bin. Ev sawalên mazin ku ew dihên nêçîrkirin, wê têrê gelek mirovan bikin di xwarinê de. Vê dema ku ew dihatina nêçîrkirin, wê demê wê hemûyan bi hevdû re wê ji wê hildan bixwaran. Ev weke hevbeşîyek giring a jîyanî bû ku wê bi hevdû re wê bijîyan. Di serdema dûyem a homo sapîens de mirov wê jî dibînê ku wê di nava komê de wê zaro, kal û jinên pîr û bihaml wê hebin ku ew jî bahre xwe ji wan nêçîrên bi hevdû re hatina kirin wê hildin. Ev jî wê, weke aliyekî din ê giring ê ku mirov bi têgîna komê û rengê hebûna koma demê re wê werênê li ser ziman bê.

Mîrov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê wê kom, wi di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Kom, wê hin bi hin wê li se vê rewşên rewşa jîyane bi wê re bi demê re wê xwe bide domandin. Wê li ser wê re wê gelek nifş wê derbas bibin. Wê di vê çerçoveyê de wê têgîna rengê jîyan komê wê di rewşa fîzyolojikî a mirovê homo sapîens de wê, bicih bibê. Wê bi wê re wê, bê xwediyê rengekî pêşketinê. Di rewşa jîyane komî de wê bi bûhûrîna gelek nifşan li ser hevdû re wê, bi demê re wê ´mirovê komê´ wê bide bi awa û rengkirin. Rengê mirovê komê ku wê derkeve li holê, wê ew xwe di nava komê de wê baş hîs bike. Wê di nava komê de wê xwe xort û bi hêz hîs bike. Wê xwediyê rewşeka jîyanî a di nava komê ku ew di wê de û di nava wê de dijî bê. Di dema ku ew diçina nêçîrê wê bi hevdû re wê herina nêçîrê bikin. Wê nêçîrê wê, bi hevdû re wê bikin. Wê bi hevdû re wê bixwûn. Wê, bi vê rengê, wê ji deveran li şûna deveran wê bi komî wê herin.

Mirovê homo sapîens, piştî jîyane wî ya nava komê, wê zêde ji devera ku ew koma wî bicih a, wê ji wir dûr nekeve. Tenê, dem bi dem wê li pay nêçîra xwe wê dûr herê. Heta ku wê ew devera ku ew çûyê de wê ew li wir wê rastî xaterîyên jî mihtemel wê were. Homo sapîens, wê di vê dema xwe pêşketî a duyem de

wê têgîna wî ya komê, hîskirina xwe bi jîyane komê û hwd, wê bi wî re wê pêşbikeve. Wê di vê çerçoveyê de wê di rewşa jîyane xwe de wê xwedîyê rewşek bê. Wê bi wê re wê xwedîyê rengekî pêşketinê bê. Di rewşa dîtin û xwarina xwarinê de wê mirovê homo sapîens, wê di vê dema xwe ya duyem de wê fêrî nêçîra xwe bi xwe re hanîna cihê ku ew li wê dijî jî bê. Wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê.

Bi wê re mirov, wê jî dibînê ku ew wê bidest bikarhanîna rim û hwd jî wê bikê. Kevirên tûj û hwd wê bikarbênê. Di rewşa jîyane bi komê re de wê mejiyê mirovê homo sapîens, wê hin bi hin wê van rewşan wê di rewşa xwe ya jîyanî de wê kifş bike. Wê bi wan re wê çawa wê bikarbênê wê, li ser wê re wê bê xwediyê fêrbûnekê. Mirovê homo sapîens, wê were dîtin ku ew di dema xwe ya duyem a pêşketinê de wê bidest bikarhnîna amûran ên bi destî wê bikê. Her wusa, wê ev jî wê weke rewşek nû bê di jîyane homo sapîens û rewşa wî ya pêşketinê de. Wê çawa wê wan amûran weke rim, kevirhast û hwd karbênê, wê fêrî van jî bê. Ev fêrbûn, ji aliyê pêşketina têgîna têknîkê a di mejiyê homo sapîens de wê weke şoreşekê bê. Homo sapîens, wê di aslê xwe de wê bi vê rengê wê destpêka şoreşa teknikê û têgîna wê, wê bi wî re û wê di dema wî de wê destpê bike. Di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Bidest bikarhanîna amûrên weke yên tûj weke kevirhastan, weke riman, wê di jîyane mirovê homo sapîens de wê li hemberî nêçîrên ku ew bike, wê wî serbixê. Wê li hêza wî wê bê hêz. Ew jî wê, bi xwe re wê bi demê re wê vê yekê wê hîs bike. Wê bi jîyankirinê wê bibînê. Wê di vê çerçoveyê de wê rewşa homo sapîens, wê di dema wê ya pêşketî a duyem de wê di rewşek û pêvajoyek giring a dîrokî de wê derbas bibê. Piştre jî wê ji xwe wê di serdema dawî a peleolîtîkê de wê pêvajoya sêyem a pêşketî a jîyane homo sapîens û piştî wê serdema mezolîtîkê wê di dewama hevdû de wê weke demek nû a ku mirov wê di çerçoveya jîyane homo sapîens û pêşketina wê û ankû pêşketinên ku wê di jîyane wî de wê rûbidin de wê weke demek giring a dîrokî bê.

.

**Mirovê homo sapîens, serdemîn wî yên dawî ên yek, du û sê´yan ên pêşketî**

Pêvajoyên serdestbûna homo sapîens, wê weke pêvajoyna giring ên ku wê di wan de wê aqil wê pêşbikeve. Di serdemên peleolîtîkê de û bi teybetî di dema dawî a peleolîtîkê de wê di wan hersê pêvajoyên pêşketinê ên kin û ku wê di wan de wê gelek pêvajoyên pêşketinê ên demkî wê di wan de wê hebin, wê di wan de wê gavên giring wê werina avêtin. Em dema ku van deman dikin ku wan fahm bikin û werênina li ser ziman, bi wê re em wê jî wê bi wê re kifş dikin ku wê mirovê homo sapîens, wê di nava wê jîyane xwe ya komî de wê pêşketina xwe ya demî a aqilî jî wê bi xwe re wê bide destpêkirin.

Komên din ên weke neandertal, wê bi awayekî wê di nava rengê pêşketina homo sapîens de wê bijîn û ankû wê di nava wê de wê xewr bibin. Yanî bi gotineka din, wê çendî ku ew hebin jî wê di nava wê pêşketinê de wê bi navê homo sapîens, wê bên hanîn li ser ziman. Teorîyên ku ew, di wan dihê hannîn li ser ziman de wê rengê ku wê neandertal wê ji aliyê homo sapîens ve wê werê paqijkirin û ankû tûnekirin jî em, divê ku wê dûbare di berçav de wê derbas bikin. Ev yek, wê weke pêwîstîyekê bê. Li ser vê teorî û têgînê re wê, rengekî din ê fahmkirinê wê pêwîst bê. Mirovê neandertal, î ro di destê me de nîşanaka hena ku ew li herêmên asya, sibirya, mesopotamîya jêr û jorîn ku ew jîya ya. Di vê çerçoveyê de wê jîyane neandertal ku ew di wan deman de wî li van herêman pêşxistîya, wê piştre wê homo sapîens jî wê were û tevlî wê bibê. Ev herêm, weke herêmna avî, bi daristanên gurr û mazin in. Di wan de pirr zêde sawalên ku ew werina nêçîrkirin wê hebin. Herêmên ku wê derfeta jîyanê wê li wan hebê, wê zêdetirî wê qasta li wan wê were kirin. Hetina homo sapîens ji aliyê rojhilatê afrîqa ve li mesopotamîya û hwd jî wê, di vê çerçoveyê de wê wate û encama wê hebe. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê di serdemên dawî ên peleolîtîkê de wê, gûharînên bingihîn ên ardnîgarî ên hîmî wê bibin. Her wusa, wê di vê demê de wê bi bandûra germehîyê ku ew heya, wê çîya û kaşên dawî ên mazin ên qaşayê ên li herêmê wê bidest halîna xwe bikin. Bi teybetî jî wê li herêma ewropa roja me, ku ew di wê demê de wê hê gelek herêmên wê, wê di bin qaşayê de bin, wê di vê demê de wê vebûna wan qadan ji jîyanê re bi halîna qaşayê re wê bibê. Di vê çerçoveyê de ev gûharînên ku ew dibin jî wê bi xwe re wê weke gûharînna ku wê qadên jîyanê wê weke ku wê ji nû ve wê sererast bikin. Minaq, herêmên weke ku ew î ro weke ´bahre reş´ dihên bi navkirin û di bin avê de mana, piştî wan halînên dawî, wê bi bilindbûna avê re wê ew biafirê û wê bahre wê tişî av bibê. Di vê çerçoveyê de wê ev jî wê bi vê rengê wê berê, wê di demekê de wê weke herêmna ku wê li wan jîyan jî wê hebê. Lê piştî ku ew av tişî bû û pê de wê, êdî wê derfeta jîyanê, wê tenê li keviyên wê, êdî wê bi mênê. Di dewama wê de em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman

ku wê piştî hatina mirovê homo sapîens li herêmê wê li herêmê wê ´*komên homînî*´ û ankû ´komên mirovî(*)´ wê biafirin. Ev kom jî wê li herêmê wê bi koman, wê jîyane xwe wê bi hevdû re wê bidina domandin. Piştî halîna çîya û kaşên mazin ên qaşayê, wê gelek herêmên ku wê di wê demê de wê jîyane homo sapîens wê li wan hebê ên weke yên keviyên afrîqa bixwe jî wê ew di bin avê de wê bimênin. Wê ew herêmên ku wê di bin avê de wê bimênin, gelek komên ku ew di wê demê de wan, li wan herêman derfeta jîyanê ji xwe re didît, wê êdî wê derfeta

-----------------

(*)Weke jîyane komî jî mirov dikarê wê binavbikê. Wê bi wê re wê, mirov wê fêrî hevdû bibê. Wê bi hevdû re xwe xort û zaxm bibînê. Wê tirsê ji ser xwe biavêjê. Wê di nava komê de jî wê, komên piçûk wê li dora jinê wê weke zaroyên wê biafirin. Ev wê weke rewşek din a teybet a ku wê rengê girêdane komê a bixwûnê wê bide nîşandin bê.

jîyanê wê ji xwe re wê nebînin. Bo vê yekê, wê ew êdî wê hin bi hin wê ji herêmê wê pênaberî herêmên din bikin. Di vê çerçoveyê de wê, di serdemên navîn û dawî ên peleolîtîkê de wê pênaberîya gelek mirovên homo sapîens wê bi komî wê ji herêmê wê li herêmên din wê bibê. Di vê demê de wê, weke ku me hinekî li jor jî hanî li ser ziman, wê keviyên ber firatê, wê ji jîyane demê a komî re wê derfetên fireh wê bidina çêkirin. Bi wê re jî wê, bi herîkîna ardê û ankû bi bûna ´eresyonê´ re wê, herêmên xweza ên weke şikeftan û hwd wê biafirin ku ew jî wê derfetek jîyanê a pirr zêde baş wê bidina mirovê homo sapîens ku ew dihêna herêmê.

Di rewşa jîyane homo sapîens û pêşketina wê de wê, herêmên ku ew dikarin li wê nêçîrê bikin û ew bi wê karibin xwe bidina jîyandin, wê li wan bigerihin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê mirovê homo sapîens, wê weke ku mirov di demên dawî ên peleolîtîkê de wê bi wî re wê bibînê, wê bê nêçîrvanekî baş. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê çawa nêçîrê bi teknîkên baş ên sawalî û ankû heywanî wê bike û wê xwe biparêzê û hwd, wê ew di wê de wê bê weke pîsporekî.

Bi demê re mirovê homo sapîens, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Wê li herêmê wê komîtîya wî, wê pêşbikevê. Komên neandertal, ku ew li herêm hena, ew jî wê dem bi dem ku wê bi wan re wê werina berhevdû jî lê wê, li herêmê wê hebûna xwe wê bidina domandin. Lê em, vê jî divê ku wê werênina li ser ziman ku wê mirovê neanddertal û yê homo sapîens, wê têkiliyê di nava xwe de wê çê bikin, piştî ku mirovê homo sapîens hat herêmê. Neandertal, dîroka wî ya bi ber mirovtiyê ve ji dora pêncsed û çarsedûpêncih hezar salî wê destpê bike. Li dora dused hezarsalî, wê li herêmê wê weke koman wê bijîn. Ev dem, wê dema destpêka hatina homo sapîens a li herêmê jî bê. Em li vir di dewama wê de em, divê ku wê jî wê werênina li ser ziman ku wê mirovê neandertal, wê weke mirovekî herêmî bê. Wê di dîmenekî bi vî rengî de wê xwe bide nîşandin. Herêmên ber firatê bi teybetî wê, weke herêmên ku wê di wan demên ku ew dijî de wê zêdetirî wê herêmên ku wê derfetên jîyanê wê li wan hebin in. Herêmên rojhilatê afrîqa ku ew hinek ji wan î ro di bin avê de mana û hinek ew hê ardî na û bêj in, wê bi hevdû re wê, qada jîyanê wê biafirênin. Li dora dused hezar salan, gûharînên ku wê di xweza û ardnîgarîyê de wê bibin, wê temenê herîkîna mirovê homo sapîens bê ku ew ji herêmê were û bi herikê herêmên dervî afrîqa û hwd.

Em li vir, divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku em nikarin, neandertal û mirovê homo sapîens ji hevdû cuda werênina li ser ziman. Li ser têkiliyên komî û zayendî û hwd, wê piştî hatina mirovê homo sapîens li herêmê ku wê bi hevdû re dênin zêdetirî wê berî wê, wê ji serdemên homo Erectus û hinekî berî wî jî wê gihiştina wan ya hevdû bi kokî wê hebê.

Heta roja me, hanîna li ser ziman farqe nava homo erectus û homo sapîens, wê bi dîtina ´fosîlên´ re wê bêwate bibê. Homo erectus, wê mirov berî homo sapîens bê. Pêşketina homo sapîens, li gorî ku ew piştî wî re hatîya wê ji ya zêdetir bê. Mirovê homo erectus, wê bi mejî û pêşketina mejî re wê zêde ti farq di nava wan de tûnebê. Wê hinekî mejiyê homo sapîens ji yê homo erectus mazin bê. Ev jî, ber ku ew demên ku wê homo sapîens, dijî wê bi pêşketina wî re wê zerika serî wî wê firehtir bibê û wê maztir bibê. Mirovê homo erectus, wê mirovê demek bûhûrîner bê. Ji xwe wê berî homo erectus wê zêde ne bi xosletên mirovî bê. Lê heta ku dem tê dema homo erectus, wê zêdetirî wê bi ber mirovtîyê ve wê peresendin wê bi homo erectus re wê çê bibê. Cûreyên ku wê piştî homo erectus re wê werina, wê cûreyên wê di wan de wê xosletên bi ber mirovtiyê ve diçin wê zêdetirî wê xwe bidina dîyarkirin. Homo erectus, wê nêvî bi nêvî bê. Homo erectus, wê hastûyên birhên wî bilind bin. Anî, wê ketkî bê. Bêhvil, zenî û dev wê firetir bê. Dinanên homo erectus jî wê stûr û hinekî dirêjtir bin.

Mirovê homo erectus, wê di dema xwe de wê bi vê rengê wê di şikeftê de wê bijî. Serdema ku homo erectus dijî wê serdema qaşayê bê. bo vê yekê wê di deverên weke şikeftê ku ew dijî de jî wê, bo xwe germkirinê, wê li deverên bi agir ên germ jî wê bisekinê. Wê piştre wê were dîtin û kifşkirin ku wê mirovê homo erectus, wê di rewşek ku ew êgir jî bikardihênê bê. Ev jî wê, rewşa wî ya pêşketî wê bide nîşandin. Homo erectus, wê komîyeka ajoyî a sawalî ku wê bi girêdana bîolojikî bê, wê bi hevdû re wê bijîn. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bêjê ku wê komîtî, wê di dema homo erectus jî de jî wê hebê. Lê komîtîya dema homo erectus, wê li gorî xoslet û teybetîyên xwe wê cuda bê ji ya cûreyên piştre ên weke neandertal û homo sapîens û hwd. Homo erectus, di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî wê werênê li ser ziman ku ew di dema xwe wê, li gorî şert û mercên cemidî wê bijî. Lê hê di dema homo erectus de wê, hin bi hin wê çerm tenik bibê. Bo vê yekê, wê ew jî wê li deverên germ wê bigerihê. Çendî ku serdema qaşayê diçê û halîna qaşayê zêde dibê û wê bi xosletên mirovtiyê wê piştî homo erectus wê li ser xate wî, wê di dewama wî de wê pêşveçûnên peresendinî wê bi ber mirovtiyê ve wê bibin, wê çerm jî wê teniktir bibê. Wê di çerm de wê gûharîn wê zêdetir bibin. Ev jî wê xwe bi demê re wê bide nîşandin.

Di serdemên qaşayê ên ku homo erectus ew di wê de dijî, wê bi vê xosletê demê ve girêdayî wê ew di nava şert û mercên xwezayî de wê bijî. Her wusa, wê rojê jî wê zêde nebînê. Ev jî wê bê sedema kêmhebûna ´wîtamîna D(*)´´yê bixwe jî. Kêmbûna wîtamîna D´yê, wê sedema lawazîya pergale parastinê û îskeletê jî wê, bê. Ev jî wê weke ku wê piştre wê bi lêkolînan li ser hastûyan, wê were piştrastkirin ku wê di hastûyên wî de wê erezyonê, deformasyonê û hwd, wê bide çêkirin. Bi vir ve girêdayî, em divê ku vê jî wê werênina li ser ziman ku wê ev şert û mercên xwezayî wê serdemên piştre ên ku wê neandertal, homo sapîens û hwd ku wê bijîn, wê di wan de wê zêdetir wê hebê. Wê serdema

-----------

(*)Witamîna D´yê wê ji rohni û ankû trêja rojê were girtin. Ku ew kêm bê û ankû nebê wê ew kêmbûn û ankû nebûna wê witamînê wê nebê.

qaşayê wê bi zêdeyî wê herê û wê serdema bejehîyê wê destpê bike. Bi wê re jî wê, di birehê de wê gûharîn, wê bi wê re wê di ahengekê de wê bibin. Ev jî wê, bê sedema ku wê qatên bîrehê ên dahûrkirina tîrejên rojê wê zêdetirî wê xwe zelaltir bikin û wê pêşbixin. Wê di melokulên qatên bîrehê de wê gûharîn çê bibê. Ev jî wê dayîna tirêjên rojê ali dunyê wê di wê de wê adilandinekê wê bide çêkirin. Di vê çerçoveyê de wê cûreyên weke neandertal û homo sapîens, wê ji homo erectus û hwd, wê bi baxttir bin ku ew wê xwe di van çerçoveyan de wê baştir wê bijîn.

Tabî, em bi vir ve girêdayî vê jî wê werênina li ser ziman ku wê bi rewşa birehê û gûharînên di wê de re girêdayî, wê di şînahîyên ku ew şîndibin li bejehîyê wê di fotosentezên xwe de wê gûharînê wê bijîn. Wê bi wê re wê cûreyên nû ên weke şînahîyê û hwd wê derkevina li holê. Cûreyên berê wê demê, wê ew jî winda bibin. Zindî û sawalên ku wê nûka derkevina li holê ku ew jî ji wê şînahîyê dixwûn, wê bandûra wan şînahîyan wê li ser metabolîzma wan wê bibê. Ev gûharînên ku ew li dunyê dibin, wê ew gûharînên ku wê bi yek kêm û yek zêde wê heta roja me, wê hebûna xwe wê bidina domandin bin.

Her serdem, ku ew bi dawî dibê, wê bi xwe re wê gûharînên bi vî rengî wê pirr zêde wê werênê. Di vê çerçoveyê de wê li gorî şert û mercên xwe yên hewayî, jîyanî û hwd, wê pêşketin û pêşveçûnan wê bi xwe re wê bijî. Di vê çerçoveyê de rewşa dema homo erectus û ya cûreyên piştre ên weke neandertal, homo sapîens û hwd, mirov di vê rengê û çerçoveyê de jî wê hilde li dest û wê werênê li ser ziman.

Li vir, em vê yekê, wê werênina li ser ziman, di dema mirovê homo sapîens, ew dihê herêmê, wê li herêmê mirovê neandertal, wê di nava jîyane xwe ya li şikeftê de wê, xwediyê rewşek komî a pêşketî bê. Herêmên afrîqa ku ew zû digihijina astek zêde germ, wê ev rewşa germbûnê wê bandûra xwe li rengê pêşketina fîzyolojikî a homo sapîens jî wê bike. Her wusa,em divê ku vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku ew gelek herêmên ku ew î ro weke ´çolê´ na wê, ew jî wê demekê weke daristan bin û wê derfetek jîyanî a pirr zêde wê li wan hebê. Ev herêm jî wê, demekê wê ji neanddertal re jî û wê ji mirovê homo sapîens re wê malavaniyê wê bikin. Lê bi zêdeyî, mirov dikarê bahse navê homo sapîens bike li wan herêman.

Mirovê homo sapîens, wê li herêmê, wê di vê çerçoveyê de wê di serdema xwe ya duyem a pêşketina xwe ya di dema dawî a peleolîtîkê de wê, jîyane komî wê bi gelek pêşveçûnên fîzyolojikî ê bi xwe re wê pêşbixê û wê ew wê bijî. Wê bi demê re wê di vê demê wê ew bidest bikarhanîna ´hastûyên kevî tûj´, ´stirh(qloç)ên sawalan´, ´kevirên kevi tûj(*)´ û hwd jî bikê. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê ev jî wê

bina amûrna ku wê ew bi wan wê nêçîrê bike. Em vê yekê î ro wê dizanin ku wê homo sapîens, wê di dema xwe ya pêşketinê a

--------

(*)Weke kevirhast.

sêyem de wê, bidest bikarhanîna rim û şivan bike. Wê li serê wan jî wê, kevirên tûj, zirev û dirêj, wê girêbide. Bi heman rengî, wê hastûyên tûj jî wê bikarbênê. Şiv û rimên ku ew bikarbênê wê di nêçîrkirina homo sapîens de wê, rewşek hesanî wê bi xwe re wê werênê li holê. Lê ji wê zêdetirî jî wê rewşa ku ew weke ku ew êdî wê karibê wan rengên weke şiv û rim ku ew wan bikarbênê û bigihijê zanîna bikarhanîna wan, wê aliyê herî giringtir bê.

Mirovê homo sapîens, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek giring a ku mirov wê hilde li dest bê. Mirovê homo sapîens, wê li herêmê, wê van rewşan, wê bi xwe re wê pêşbixê. Komên din ên weke neandertal, î ro em dikarin bêjin ku wî jî rim û şiv, kevirên tûj, kevirhast, hastû û hwd bikarhanîn. Mirovê neandertal, weke ku ew dihê hanîn li ser ziman, ew li dora 40 û ankû 30 hezar sal berê ew winda bûya. Li gorî hinek antropologan ev dîrok, dibê ku ew hê jî kevntir herê. Mirovê neandertal, wê li dora 250 û 200 hezar salî wê derkeve li holê. Mirovê neandertal, wê weke mirovê ku ew rim, şiv û hinek ji wan amûrên ku ew weke amûrên ku homo sapîens wan bikardihênê, wê ew jî wan bikarbênê. Ev rewş, wê bi xwe re wê tiştekî din jî wê bi têgînî wê bide dîyarkirin. Ew jî wê ew bê ku ev rewşa bikarhanîna amûrên weke kevirê tûj, kevirhast, hastûyên tûj û hwd, em dikarin, wan li ser dema neandertal re wê hinekî din jî kevntir bibin. Piştre, dema ku wê homo sapîens wê bikarbênê, em dikarin bêjin ku wê, homo sapîens, wê ji van rengên bikarhanîna neandertal, fêrên wî jî wê sûdwergirê. Neandertal û homo sapîens, wê bigihijina hevdû û wê têkiliyê bi hevdû re wê dênin. Ev jî wê, weke rastîyeka ku wê ew çi pêşketin bi wan re wê hebê, wê şanî hevdû jî bidin. Yanî bi gotineka din, ew dema ku ew jîyane hevdû dibînin, wê ew wê jî bibînin ku ew xwediyê çi rengê pêşketinê ê bi xwe re na. Mejiyê neandertal, wê mazin bê. Wê pişta serê wî, wê hinekî ê dirêj bê bi paş ve. Lê em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, mirovê neandertal, wê weke mirovê ku ew xwedîyê jîyanek di şikeftê de ku ew pêşketî bê û wê ew di wê jîyanê de wê weke ku wê were kifşkirin, wê gelek pêşketin jî wê di nava jîyane wî ya komî de wê bibin.

Jîyane komî, temenê hevparkirinê ya. Mirov ku ew çi zanibê û ankû mirov çi ew bi wî re weke pêşketinê ew hebê, wê endamên din ên komê jî wê bibin û yan wê bixwezin ku ew bibina xwediyê û yan jî wê ew wê jî wê bi xwe re wê pêşbixin. Rewşa jîyane hevpar, wê di çerçoveya jîyane komên demê ên ku ew neandertal bê û ankû homo sapîens bê, wê bi wan re wê pêşveçûnek mazin wê bide çêkirin bi xwe re. Mirovê neandertal, wê weke beşek yê herêmê bê. Em nikarin, wê zêde ji homo sapîens cûda wî werênina li ser ziman.

Li gotî herêman, wê rewşa pêşketinê wê xwe di fîzyolojîya zindiyên demê de jî wê bide nîşandin. Weke ku me hinekî li jor jî hanî li ser ziman ku wê dema ku qaşayê ku ew bi ber dawîyê tê, wê bi wê re wê gûharînên ardnîgarî, zindiyî û nezindiyî wê bibin. Şînîyên ku ew şîn dibin, wê di wan de jî wê ew xwarin, wê xwe bide dîyarkirin. Em dema ku vê rewşê, di çerçoveya dana berhevdû a dema homo erectus û ya dema homo sapîens û ankû neandertal ku em bidina berhevdû, wê bi wê re wê weke rewşekê wê xwe bide dîyarkirin. Mirovê homo erectus, di serdemek qaşayê de dijî. Li gorî wê rewşa wî ya fîzyoloji, mejî, çerm, hastû û dîtbarîya wî, wê xwedîyê rewşekê bê. Em ku fektora têgîna peresendinê ji navberê derxin, wê mirovê homo erectus û yê homo sapîens û ankû neandertal, wê weke mirovna cûda bin. Wê xwedîyê xosletên cûda bin. Lê dema ku em li ser têgîna peresendinê re wê, hildina li dest, wê bi wê re wê di rewşek ku ew di dewama hevdû de ew, werina hildina li dest, wê di vê çerçoveyê de wê werina dîtin. Li gorî, mirovê homo erectus, wê mirovê homo sapîens, wê bi mejî û rewşên xwe yên fîzîkî ên laşî û hwd, wê li pêş û pêşketîtir bê. Lê bi demê re wê dema ku wê serdema qaşayê wê bi ber dawîyê ve wê herê, wê di hemû rewşên jîyanî ên zindî û ne zindîyî de wê gûharîn wê bibê. Di rengê fotosenteza şînîyan de jî wê ew gûharîn wê bibê. Zindiyên ku ew wan şînîyan dixwûn, ew jî wê ji wê bi bandûr bibin. Ew zindîyên ku ew wan şînîyan dixwûn, wê ji dû aliyan ve wê bi bandûr bin. Aliyê pêşî wê bi rewşa xwe ya ku ew li gorî demê xwe diadilênê bê. Her wusa, bi tiştên ku ew wan dixwê bê. Mirovê homo erectus, ew di rewşa xwe ya peresendinî de wê di nava rewşa Australopithecus û homo sapîens û ankû neandertal de wê di rewşekê de wê cih bigirê. Bo vê yekê, mirov dikarê bêjê ku wê homo erectus, wê li gorî rewşa homo sapîens, wê zêdetirî nêzî rewşa meymunên li ser ling ku ew disekin, lê ku ew di rewşa xwe zêde peresendin bi wan re

çêbûya û nêvî mirovtî bi wî re çêbûya ya. Ji rewşa homo erectus û belavbûna wî ya li herêman, mirov wê fahm bike ku wê ji ber hebûna çîya û kaşên qaşayê wê zêde av nebê. Wê gelek herêmên ku ew î ro di bin avê de na wê, weke herêmên bej bin. Bo vê yekê, wê li van herêman hemûyan wê homo erectus wê xwe bigihênê wan. Bi wê re mirov dikarê wê jî werênê werênê li ser ziman ku mirov wê jî bi rewşa homo erectus re wê kifş dike ku ew ji hemû cûreyên xwe û nifşên wan ên piştre û hwd, wê ji wan zêdetir wê di dema xwe de wê xwediyê rewşek belavbûyî a li ser bejehîya hemû herêman bê. Ji afrîqa, çîn, cezayir, ewropa, asya û hwd, di qadaka berfireh a bejehî de wê karibê xwe bigihênê her deverê. Bi teybetî jî berfiratê û hwd wê ev herêm, wê weke herêmna ku wê ji wan deman wê destpê bikin û wê derfeta jîyanê wê zêde li wan biafirê. Bo vê yekê ya, î ro li gelek deverên bi vê rengê ên ji hevdû weke ku ew dûr û her dever, weke deverek dunyayê ya, li wan hastûyên homo erectus dihên dîtin. Î ro, li herêmên çînê, jawa, afrîqa, ewropa, asya, îndîya, rojhilata navîn û hwd, wê bi wan re wê li gelek deverên din wê hastûyên ku weke hastûyên homo erectus in û wûsa tên naskirin û pênasekirin, wê werina dîtin.

Rewşa li qadaka pirr zêde berfireh belavbûn û hebûna homo sapîens, wê di derbarê rewşa ardnîgarîyê, hebûna afirîna bahr û deryayan de jî wê têgînê wê bide me. Hemû ava ku î ro ew bahr û deryayan di afirênê, ew di wê demê de kaş û çîyayê qaşayê bû. Bo vê yekê, wê li hemû herêman wê ew were dîtin.

Ev serdema ku em wê weke serdema qaşayê wê bi nav bikin û ku wê di wê de wê rewşa homo erectus wê pêşbikeve, di aslê xwe de em dikarin, wê hinekî din jî wê bi şûn ve wê bibin û bibina dema kalkê homo erectus ku ew homo Ergasterîn a. Kalkê homo ergasterîn jî wê homo habîlîs bê. Di dema homo habîlîs de ku ew çendî weke nêvîpêşketî ew dihê hanîn li ser ziman jî ew di dema xwe de wê, xwediyê wê rewşê bê ku ew nêzî rewşa mirovan ew dikarê nêvî bi nêvî rabê. Mejiyê wî hinekî ji yê mirovê roja me, hinekî piçûktira. Homo habîlîs, ser dused hezar sal berî *´australopithecus garhi´* jîya ya û wê homo habîlîs, wê ew wê dîtbarî û dîmenîyê wê bi xwe û rewşa xwe re wê bide me ku ew weke mirovê pêşî ku wê ji kevir, hastû û hwd ku ew amûran bidest çêkirinê dike. Lê wilqasî zêde ne hosta ya. Homo habîlîs, wê weke mirovê pêşî ê ku ew xwe parastinê bi amûrên ku ew pêşdixê re wê pêşbixê bê. Di vê çerçoveyê de rewşa homo habîlîs, wê piştî wê re wê bi zaroyên wî homo Ergasterîn´an re wê pêşve herê. Wê zêdetir wê pêşbikeve. Heta ku wê dem were dema homo erectus, wê bê dîtin ku wê weke wê hostatîyekê wê ew di wan amûrên ku ew pêş dixê de wê pêşbixê. Rewşa homo erectus, wê ya homo Ergasterîn û berî wî homo habîlîs jî wê hesantir bê. Rewşa cemîdîbûnê û serdema qaşayê wê di dema wan de wê, zortir bê. Lê heta ku wê dem were dema homo erectus, wê gûharîn wê di wê de wê bibê. Homo erectus, wê ji vê rewşê ji aliyê fîzyolojîkî ve wê pirr zêde wê sûdbigirê û wê pêşbikeve û wê li herêman pirr zêde wê bibê gelek û wê belav bibê. Rewşa homo habilîs û kûrê wî homo ergasterîn wê bi ya dema homo erectus re wê di zikhevdû de wê hema bêja wê pêşve herê. Li herêmên weke tanzanya wê hastûyên hersê hemînan jî wê were dîtin. Wê li heman herêmê wê hastûyên Australopithecus boisei jî ku ew berî homo habîlîs jîya ya jî wê were dîtin. *Australopithecus boisei*, wê ji cûreyên xwe yê berî xwe ê bi navê *Australopithecus africanus*(*) wê xwediyê cûdahîyekê bê. Ew jî wê nîşanake wê bê ku ew di nava wan de wê bi peresendinî wê demek û navberek ku ew farqe nava wan bi peresendinê afirandîya wê hebê. Lê em li vir, divê ku em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê xate peresendinê a li homo habilîs, wê ji dewama a *Australopithecus boisei* û piştre jî wê ji *Australopithecus africanus* wê destpê bike û bidomê. Ji australopithecus anamensis û heta australopithecus afarensis û ji wî heta australopithecus africanus, wê pêvajoyên peresendinê wê li dûv hevdû û di zikhevdû de wê bibin. Piştre wê weke cûreyên navber ku wê gûharînê ji van cûreyê ku me navê wan hanî li ser ziman cûda wê bi xwe re wê bidina çêkirin wê cûreyên paranthropus boisei û paranthropus robustus bin. Pişt wan re wê bi zêdeyî, cûreyên ku wê derkevina li holê, heta dema homo habîlîs û hwd, wê reng û xosletên mirovtiyê wê bi xwe re wê di nava xwezaya xwe de wê pêşbixin. Homo habilis, wê nêvî bi nêvî wê weke mirov, wê pêşketinê bi xwe re wê bijî.

-------------

(*)Nîşanaka jîyane wan hem li herêmên australia û afriqa jî hatina dîtin. Di musa xwezayê a Austrarlia de wê, ew hastuyên ku ew hatina dîtin wê werina tomarkirin.

Rûdêna wî hinekî zêdetir di hundûr ve ya. Dinanên wî piçûk bûna. Di rewşa homo habîlîs û ya homo Ergasterîn û homo erectus wê zêde ti farqek mazin wê tûnebê. Heta ku wê, hema bêja wê nêzî hevdû wê weke hevdû bin. Ji homo habilîs û heta homo erectus ku em li ser homo Ergasterîn re biqavizin, emê bi wan re wê bibiînin ku wê nêzî hebin, çendî ku wê di navbera wan de wê homo ergasterîn jî wê hebê.

Di vê rewşê û xate peresendinê de mirov wê dibînê ku wê, xate pêşketinê wê heta ku wê were dema homo erectus, wê bi awayekî dîyarker wê xwe bide nîşandin ku wê pêşveçûna bi ber mirovtiyê ve wê bibê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê homo erectus, wê di aslê xwe de wê weke destpêkekê bê. Piştî wî, wê heta serdema homo sapîens û ankû homo neandertal, wê pêvajoyên xate peresendinê wê bi cûreyên ku wê piştre wê pêşbikevin re wê xwe bide domandin. Rewşa homo sapîens û ya homo neandertal, ku wê weke cudahyekê wê were hanîn li ser ziman, mirov wê dikarê wê cûdahîya wan, wê bişibihênê ya nava *Australopithecus boisei* û *Australopithecus africanus.* Lê em nikarin bêjin ku ew dema ku wê *Australopithecus boisei* û *Australopithecus africanus* wê derbas bibê, wusa demek weke ya di nava homo sapîens û neandertal de wê hebê bi wan û cûreyên piştî wan re.

Serdema homo sapîens û ya neandertal, wê wê bi hevdû re û di zikhevdû de wê heta serdema dawî a homo sapîens. Di vê dema dawî a homo sapîens de wê, weke neanddertal wê winda bibê. Wê piştre wê tenê hebûn û navê homo sapîens, wê hebûna xwe wê bide domandin. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê serdema dawî a homo sapîens ku ew êdî ew gihiştiya xosletên mirovê hemdem û bi wê rengê ew bidest jîyanê dike de wê, neandertal wê nebê. Gelo di rastiyê de wê neandertal wê nebê? Di rastîyê de mirov dikarê vê werênê li ser ziman ku wê neandertal wê di nava homo sapîens de wê hebûna xwe wê bidê domandin. Wê tevlîyek wê, bi zayendî û hwd, wê biafirê. Di aslê xwe de wê rastîya mirovê hemdem a homo sapîens, wê ne rastîyek safî û zelal bê. Wê di nava wê jîyane homo sapîens ku em wê dihênina li ser ziman de wê, ji homo sapîens cûda, wê hinek cûreyên din û her wusa neandertal jî wê hebûna xwe wê bide domandin. Yanî bi gotineka din, wê têgîna hemdemîyê, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rastiyekê bê.

Heta serdema homo sapîens jî wê neandertal wê hebûna xwe wê bide domandin. Mirovê neandertal, wê di dema peleolîtîkê de wê di pêvajoya pêşî û ya duyem a mirovtîyê a homo sapîens de wê navê neandertal wê derbas bibê. Di dawîya li dora pêncih hezar salî de wê, hebûna neandertal wê weke ku ew windabûyî wê were hanîn li ser ziman. Di rewşa neandertal de wê, rewşa mirovê dihizirê wê hebê. Em dikarin wan xosletên ku em bi gotina ´mirovê dihizirê´ ku em bi homo sapîens re dihênina li ser ziman, em dikarin bi heman rengî û xosletan neandertal jî wî werênina li ser ziman. Neandertal, wê weke mirovê herêmî ê şikeftê bê. Di jîyane şikeftê de wê bi awayekî xwezayî wê rewşa jîyane komî wê pêşkeve û wê hebê. Di vê rewşê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê mirovê şikeftê neandertal, wê bi jîyane xwe ya komî re wê, li gorî şert û mercên herêmê wê xwediyê rengekî pêşketinê û jîyanê bê.

Di serdema dawî a pêşketina homo sapîens de wê, homo sapîens, wê di mejiyê xwe de wê bihizirê, wê amûrên nêçîrkirinê wê bikarbênê û wê hîs bike. Di vê çerçoveyê de wê mejiyê homo sapîens, wê bidest ketina dewrê de bê. Mejiyê homo sapîens, wê di dema wî ya pêşketinê a dawî de wê, bidest alîkirina li wî bikê. Di vê dema dawî a pêşketina homo sapîens de wê, homo sapîens wê di jîyane xwe e wê bidest jîyankirina li gorî rewşa bikarhanîna amûran, wê bijî. Bikarhanîna amûran, wê bi zanîna wan ya bikarhanînê re bê. Di vê çerçoveyê de wê rengê jîyane homo sapîens, wê di wê dema wî de wê, wê li gorî xoslet û xûyên mirov bin. Em dema ku em dikin ku dema dawî a jîyane homo sapîens, di dawîya peleolîtîkê de ku em wê dikin ku wê fahm bikin, em bi rengekî komîyeka civakî a serekatî wê kifş dikin. Di vê çerçoveyê de em homo sapîens, bi aqilekî mirovî wê dibînin û wî dikin ku wî werênina li ser ziman. Em ku serdema dawî a peleolîtîkê wê bahse fahm nekin bi pêşveçûnên wê yên demkî re emê, nikaribin bi tememî û bi awayekî baş dema piştre a bûhûrîner a mezolîtîkê û piştre ya dema neolîtîkê û hwd jî wê baş fahm bikin. Di vê çerçoveyê de wê di rewşekê de wê weke ku ev pêvajo, wê di dewama hevdû de wê hebûna xwe wê bidina domandin. Wê bijîn. Wê kombûna dema dawî a peleolîtîkê, wê piştre wê temenê civaktîya seretayî a dema mezolîtîkê û piştre ya ku ew pêş dikeve a dema neolîtîkê jî wê baş fahm bikin.

.

**Mirovê homo sapîens, rewşa wî ya bi pêşketina komê û pêşketina xosletên mirovtiyê ..**

Homo sapîens, wê weke *mirovê dihizirê*(*) wê, ji wî wê were bahskirin. Di serdemn wî yên berê de ew, di çerçoveyekê de wê, xwediyê wateyek pêşketinê bê. Rewşa komîtîya berê, wê di rewşa têgîna kerîtîya sawalî û ankû hinekî ji wê pêşketîtir bê. Lê piştre, weke ku em di serdema wî ya demên wî yên dawî ên di dema dawî a serdema peleolîtîkê de wê, bi wî re wê xosletên mirovtiyê wê bi wî re wê pêşbikevin. Ev rewşa pêşketina xosletên mirovtiyê, di aslê xwe de em, divê ku wê bi rewşa komîtîyê re wê di ahengekê

de wê b hevdû re wê hildina li dest. Wê rewşa komîtîyê de wê, temenê jîyane wî ya bi hevdû re ku ew pêşketîya wê çendî ku ew wê werênê li ser ziman, wê bi heman rengî jî wê rewşa temenê pêşketina xosletên komî ên ku em dikarin bi rewşa mirovtiyê ve girêdayî wan werênina li ser ziman jî bê. Di rewşa mirovê homo sapîens de wê, serdema dawî a peleolîtîkê wê ji wî re û ji pêşketina wî re wê weke serdemek

---------------

(*) Weke mirovê dihizirê homo sapiens sapiens wê derkeve li pêş. Ev dema wî wê weke demeka ku wê ji gelek aliyan ve wê bidest pêşketina xwe wê biikê bê. Ev dem wê weke demek mirovî bê.

giring a bûhûrîner bê. Di vê demê de wê mirovê homo sapîens, wê weke *mirovê seretayî* wê di rewşekê de wê xwediyê xoslet û rewşa xwe ya bi xwe re bê.

Rewşa mirovê seretayî ku mirov bahse wê dike, her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa mirovê komê bê. Her wusa, wê mirovê seretayî, wê di nava wê jîyane xwezayê de wê, xosletên ku ew êdî ew xwe weke xwe dibînê, wê bi wî re wê pêşbikevin. Wê pêşî, wê rewşa xwe û ya zindiyên din ên xwezayî, wê farqîya nava wan wê kifş bike. Wê ew wê bibînê. Li ser wê re wê xwe di mejiyê xwe de wê bi dîtînî, dîmenî û rewşî wê di mejiyê xwe de wê hin bi hin wê salix bike. Di vê çerçoveyê de wê di rewşekê de wê xwe bi rewşa xwe re wê bide nîşandin.

Di rewşa mirovê homo sapîens de wê, jîyane komê û bi wê re rewşa jîyane şikeftê, wê bi xosletên wê re wî bi wê re wê bicih bibê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, rewşa mirovê homo sapîens, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşeka ku mirov wê dikarê bi teybetî wê hilde li dest bê. Di nava komê de ew dijî. Zaroyên wî dibin. Ew zarok, di nava komê de mazin dibin. Ew hêst, hîs û ajoya ku wê bi mirovê ku ew di nava komê de mazin bûya, wê ji ya zindiyên din wê cudatir bê. Li vir, em divê ku wê jî li ser rewşa komê û ankû bi hevdû re bi komî tevgerînê re wê werênina li ser ziman ku wê aliyekî wê yê fîzyolojikî wê hebê. Em di vê jî wê, di serî de wê werênina li ser ziman. Pêvajoyên ku wê mirovê komê wê, bi jîyane xwe re wê derbas bike, wê ew pêvajo, wê hebûn, fîzîk û fîzyolojiya wî, wê bi awa, reng û şekl bike. Di vê çerçoveyê de wê ew jî wê, wi dê çerçoveyê de wê xwe nas bike. Wê farqîya xwe ya di nava mirovê komê û yê ne komî de wê bibînê. Wê bi hîskirinê wê ew wê yekê wê bi xwe re wê ew wê hîs bike. Li ser wê hîskirinê de wê ew girêdana ku ew bi mirovê komê re wê bi fîzyolojikî çê bibê, wê bandûra wê, pirr zêde wê li mejiyê wî bibê. Di serî de wê mejiyî, wê di nava xwe de wê hoyandin, lefleks û kompleksên wê jîyane komî wê bi xwe re wê pêşbixê. Di çerçoveya van xosletên fîzyolojikî de wê metabolîsma´ya mirovê komê wê di wê çerçoveyê de wê di xwe de wê afirandinê wê bide çêkirin. Ew jî wê, bi wê re wê di rewşekê de wê xwedîyê rewşa pêşveçûna bi xwe re bê.

Mirovê komê, wê di van çerçoveyan de wê bi xwe re wê pêşketina xwe wê bijî. Bi demê re wê, li gorî wê jîyanê wê xosletên xwe pêşbixê û wê wan xosletan wê di xwe de wê kifş bike. Wê bi wan xosletan wê tevbigerihê. Gava xwe wê biavêjê. Nêzîkatîyê wê bike. Di rewşa têkiliya wan ya bi komî a bi hevdû re de wê, ew rewşa jîyane komî wê di rewşeka xwezayî de wê rengê têkiliya bi hevdû re jî wê biafirênê. Di serdemên piştre wê ev rengê têkiliyan, wê weke têgînên kevneşopîkî, rewîst û hwd, wê xwe bidina dîyarkirin. Lê di nava jîyane mirovê komê de wê di vê çerçoveyê de wê rewşên nû wê bibin.Ji kîjan aliyê ve ku mirov li wê binerê, mirov wê bi awayekî vekirî wê vê jî wê kifş bike ku wê mirovê komê wê di xwe de wê cuda bê. Her wusa, wê mirovê komê wê bi xosletên xwe re wê di nava jîyane xwe de wê rengê têkiliya xwe wê bide nîşandin. Rengê têkiliya di nava komê de mirov dikarê bi du rengan wan werênê li ser ziman. Aliyê pêşî ê bi zayendî ya. Di vê çerçoveyê de wê têkiliya weke ya jin û mêr û ankû nêr û mê û hwd wê bibê bê. Aliyê din ê têkilîyî jî wê li ser rewşa tevger, kirin û xûyan re bê. Ev jî wê di rengê bihevdû re çûyina nêçîrê, bi hevdû re bi komî nêçîrkirin, bi hevdû re bi komî jîyankirin û hwd bê. Wê bi wê re wê, tişt ji destê wan wê werin. Minaq, wê rim wê êdî wê di dest de wê bigerênin û wê bikarbênin. Rim, wê di rewşa parastina wan ya mirovî a li hemberî zindiyên din ên xaternek, wê destê wan xort bike.

Di vê rewşê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê mirovê komê wê di nava jîyane xwe de wê, têkiliya wan ya navxweyî wê di awayekî de wê ajo û hîsên wan ên ku ew bi hevdû de di çerçoveya hebûna komê de pêşketina wê di temen de wê kifşkar bin. Wekî din jî wê ji xwe re bûnek wê di nava têkiliyan de û di rengê têkiliyan de wê hebê. Sînorê têkiliyê, minaq weke têkiliya zayendî wê nebê.

Mirovê komê, wê li vir, wê di nava jîyane xwe de wê bi demê re wê rêgezên jîyane wî, wê li ser wê *rengê jîyane* wî re wî wê biafirê. Her wusa rengê jîyane wî, wê çawa bê, wê ne ew bide dîyarkirin. Wê şert û mercên xwezayê wê bidina dîyarkirin. Di nava komê de wê, bi hevdû re wê, di rewşekê de wê bijîn.

Î ro, di destê me de hinek nîşanak hena ku wê mirovê komê ê homo sapîens, di dema xwe ya dawî a pêşketina xwe ya di dema dawî a serdema peleolîtîkê de wê bikarbênê. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê, di rewşekê de wê hebûna xwe wê bide dîyarkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa mirovê homo sapîens, wê biqasî ku em ji wan nîşanakan fahm dikin, wê bi xosletên mirovî wê tevbigerihê, nêçîrê bike û nêçîra xwe wê piştre wê werênê şikefta xwe li nava kome ku ew endamê wê ya. Wê di destê wî de wî rim hebê. Serê rim, hatîya tûjkirin. Yan jî kevirekî tûj, bi serê rejimê ve hatîya kirin. Bi wê re jî ew rim, bi bandûrtir dihê bikarhanîn. Bi wê re jî mirov, wê jî wê kifş dike ku wê kevirhast û ankû kevirên tûj ên ku ew weke qalikan ji ser hevdû dirabin û weke kêrê dikarin bikarbênin wê ew wan jî wê bikarbênin. Hevirhast, dema ku ew li hevdû hatxistin û ankû bi hevdû ve hatxişiqandin û xiritandin, wê agir ji wê derkeve. Ev cûreyê kevir ku ew di nava kurdan de ew weke ´kevirhast´ jî di kurdî de ew heya, wê li herêmên kurdistanê û ankû mesopotamîya wê, pirr zêde wê hebin. Her wusa, ev rewşa bikarhanîna kevir weke kêrê, wê rewşek teybet a destpê mirovê seretayî ê komê sapîens bê.

Em li vir, dibêjin *mirovê seretayî ê komê*, ber ku wê di wê rengê de bê. Rewşa mirovê seretayî ê komê, wê di wê çerçoveyê de bê k uew di nava jîyanê de ew di wê rewşê de ya ku ew dikarê hîs bike. Hin bi hin wê bidest pêşketina aqilê xwe bike. Wê tevgerên xwe di çerçoveya jîyane komê de wê bikê. Wê kirinên xwe yên nava komê û ankû dervî komê ku wî kirina wê ji bîrnekê. Ev rewş, wê weke rewşna teybet ê mirovê komê ê seretayî bê. Her wusa wê di nava şert û mercên xwezayê ên dijwar de wê çawa wê bijî, ew dike ku fêrî wê bibê. Her wusa, wê çawa di dijwarîya sermeya zivistanê de wê bijî, wê li rêyên wê bigerihê. Her wusa, mirov dikarê vê jî wê werênê li ser ziman ku wê mirovê komê ê seretayî homo sapîens, wê hin bi hin wê rewşa bikarhanîna êgir wê di nava xwe de wê pêşbixê. Pêşî wê agir, wê bo germbûnê wê bikarbênê. Piştre jî wê, bi wê re wê hin bi hin wê fêrî bikarhanîna êgir reng û cûreyên din de jî. Minaq, wê li ser êgir bijartin û ankû pijandina nêçîrên ku wan kirina, wê wan fêrî xwarina goştê pijandî ê li ser êgir bike. Ev rewşa pijandina goşt, wê, rewşa mirov komê ê seretayî de wê di aslê xwe de wê pêşveçûnên fîzyolojikî ên dîrokî wê bi xwe re wê werênê. Di dev, zenî, dinan, hinavên hundûr û hwd de wê gelek gûharînan wê bi xwe re wê werênê. Rewşa *morfolojîya xwarinê*(*), wê bi teybetî weke rewşeka ku wê di rewşa pêşveçûn û pêşketina wan de wê xwediyê wateyekê bê. Divê ku mirov rewşa morfolojîya xwarinê, weke mijarek giring, di nava rewşa jîyane komî de wê li rex bikarhanîna amûrên destî wê hilde li dest. Her wusa, em divê ku vê yekê jî wê bi teybetî wê werênina li ser ziman, ev rewşa pijandina goşt li ser êgir, wê bikê ku ew di dev de zû ji hevdû bibê û di hundûrê zik û ankû ûrê mirov de zû were mihandin. Wê di rewşa serifendina xwarinê û her wusa cûtinê de wê, gûharînên fîzyolojîkî ên ku wê bibin, wê di çerçoveyek fêrî û alimîna wê de bê. Di vê rewşê de jî wê, mirovê demê, wê hin bi hin wê fêrî jîyankirina bi wê re ew bibê. Her wusa divê ku mirov vê yekê, wê werênê li ser ziman ku wê piştî pêşketina van rewşên weke rewşa xwarina weke li ser êgir çêkirinê û hwd re wê êdî wê rewşa fîzyolojîya mirov wê li gorî wê, êdî wê gûharîna wê bi xwe re wê bide çêkirin û derbas kirin. Di vê pêvajoyê de wê rewşa gûharîna hinavan jî wê bibê. Em ku rewşa pêvajoyên xwarina germ û hwd, wan hildina li dest, di vê çerçoveyê de mirov, divê ku wê di çerçoveya gûharînên fîzyolojîkî û ên di rewşa komî de mirov, wê divê ku wê hilde li dest.

Di rewşa jîyane komê a mirovê seretayî de wê ya ku wê derkeve li holê, wê di vê çerçoveyê de wê di ahengekê de û wê di dewama hevdû de wê pêşketinên nû wê werina çêkirin. Wê kifşên nû, wê werina pêxistin. Wê di vê çerçoveyê de wê dest, wê fêrî bikarhanîna amûran bi teknîkî û hwd, wê bibê. Ev jî wê ji ji aliyekî din ve wê bandûra wê li rewşa pêşketina jîyane mirov wê pirr zêde wê bibê. Rewşa fêrbûna bikarhanîna tiştan weke teknîkî û her wusa rewşa bikarhanîna agir û li ser agir êdî qalandin û ankû pijandina goşt û hwd, wê du rewşên ku em divê ku wan di çerçoveya pêşketina mirovê komê ê seretayî komo sapîens de bi teybetî hildina li dest bin.

Rewşa jîyane komê, wê bi xwe re wê bi demê re wê gelek gûharîna wê werênê. Nifş bi nifş demên ku ew di bûhûrin jî wê, weke demna ku wê di rewşên bîolojikî û ankû genetîka mirov de wê wan gûharînan di fîzyolojîya mirov de wê bicih bikin bin. Ev jî wê bi xwe re wê, di çerçoveya pêvajoya

-----------

(*) Morfolojiya xwarinê wê bo wî bi rengê ku ew dixwê bê. Di wê demê de wê, bi êgir çêkirina xwarinê wê hebê. Ev wê bi fizyolojikî wê di laşe wî de wê gûharînan wê bi carekê wê werênê. Heta ku mirov dikarê van gûharînan bi şoreşî jî werênê li ser ziman.

peresendinê û hwd de wê, rewş û pêvajoyekê wê li ser rewşa jîyane mirov a komî re wê bi xwe re werênê li holê. Bêgûman, em dema ku bahse jîyane komî dikin, em divê ku wê jî di têgihiştina wê de bin ku wê têgîna gotina kombûnê, wê ne tenê ji aliyê bi hevdû re jîyankirin bi tenê bê. Di çerçoveya hemû gûharînên ku wê di wê çerçoveyê de wê bi fîzyolojîkî û hwd ku wê bibê re jî mirov, wê divê ku wê hilde li dest.

Jîyane komê, wê bi demê re wê di çerçoveya pêşxistina rengên têkilîyan, amûrên ku wê bi wan werina jîyankirin û hwd re wê pêşketinê wê bi xwe re wê bide çêkirin. Amûrên ku ew pêş dixin, wê di rewşa mirovê homo sapîens de wê, vê jî wê bi me wê bide têgihiştin ku wê mirovê homo sapîens, wê teknîka xwe ya ku ew bi wê re dijî wê bi demê re wê pêşbixê û wê bi demê re wê pêşketinên nû wê bi pêvajoyên jîyane xwe re wê li wê zêde bike. Di nava şert û mercên xwezaye ku ew di nav dijî de wê, weke rewşek teybet a ku mirov wê hilde li dest wê bi wî û jîyane wî re wê biafirê.

Di rewşa jîyane mirovê homo sapîens de wê, serdema dawî peleolîtîkê wê weke serdemeka ku wê hin bi hin wê bi komî wê pêşbikeve wê derkeve li holê. Hiinek xosletên mirovtiyê wê pêşbikevin. Wê bi wan, wê gava xwe wê biavêjê. Wê li gorî wan, wê jîyane xwe wê îdeme bike û bidomênê. Di vê demê de em gotina ´komê´ dikarin bi awayekî ewla wê di çerçoveya xoslet û rengê jîyane wê û pêşketina wê de wê bikarbênin. Lê bo ku em gotina civakîtîyê bikarbênin hê zû ya. Em divê ku wê dema mezolîtîkê jî hinekî ji wê derbas bikin bi dema dawîya mezolîtîkê(*) û ya neolîtîkê re wê gotinê, êdî wê hin bi hin li ser rengê pêşketina xosletên jîyane komî re wê bikarbênin. Tabî li vir, divê ku em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê rewşa ardnîgarîyê, em divê ku wê bi giringîyekê wê hildina li dest û wê fahm bikin û wê werênina li ser ziman. Herêmên ku wê herî zêde wê temenê jîyane bi komî wê li wan pêşbikeve, wê ev herêmên ku ew ji aliyê xwe ve ku ew wê derfeta jîyane ku ew dikarin bidin bin.Herêmên ber firatê li dora wê, wê weke herêmna ku wê hê di serdemên zû de wê temen û derfeta jîyanê ku wê li wan biafirê bê. Her wusa, em vê dîroka pêşketina derfetên jîyanê li vê herêmê dikarin, wê bibina heta serdema qaşayê a dawî jî. Di wê çerçoveyê de mirov dikarê wê rastîya wê bi teybetî wê werênê li ser ziman. Mirov homo habilîs, piştre homo ergasterîn û piştî wê re jî homo erectus, wê li van herêman wê belav bibin. Wê ev herêm wê weke herêmna ku wê rewşa jîyanê wê li wan pêşketî bê. Wê di rewşa jîyanê de wê ev herêm, wê temenê wê, di van deman de jî wê biafirênin. Em î ro, li gorî lêkolînên jeolojîkî ên ku ew li herêmên ber diclê û firatê ên kurdistanê ku ew dihên kirin de em wê rastiyê bi wan lêkolînan re dibînin ku wê serdema peleolîtîkê de wê hema bêja pirranîya van herêman kurdistanê û ankû mesopotamîya wê li wan derfeta

------------

(*)Dema mezolîtîkê wê weke demek navber a di dema dema dawî a peleolîtîkê û bûhûrîna li dema neolîtîkê. Ev dema bûhûrîner wê, weke dema bi tememî dawî li demên homonîdan hanîn bê. Weke dema wê mirov dikarê bi nav bikê. Bi wê re heka em weke şoreş herêbikin wê rewşa jîyane neolîtîkê wê biafirê û pêşkeve

jîyanê wê hebê. Serdemên qaşayê li wan bi dawî bûna. Ên li kevîya herêmên ku ew li wan jîyane dibê ku ew hebin jî wê bandûrê wê zêde li jîyanê nekin. Tenê, dema ku ew dihalihin, wê gelek herêmên ku wê di wê demê de jî wê li wan jîyan hebê, wê di bin avê de wê bihêlin.

Em vê bi awayekî vekirî dibînin ku wê di serdema navîn û a dawî peleolîtîkê de wê, pirr zêde û zû, wê halîn di kaş û çîyayên qaşayê de wê bibê. Sedema wê jî wê, gûharînên ku ew di birehê de ku ew dibin û ew tîrejên rojê ên ku ew didina dunyê ku ew, wê êdî wê zûtirin wê halandin wê çê bikin. Em dikarin vê jî wê werênina li ser ziman ku wê ji van demên peleolîtîkê û heta roja me jî wê gelek gûharîn wê di birehê de wê bibin. Rewşa birehê ku wê piştî van deman wê pêşbikeve, wê di stalîzekirina rewşa tîrejên rojê de wê, hin bi hin wê rewşa roja me a ku mirov bi wê dijîn wê biafirênin. Lê em li vir, di dewama wê de wê jî wê werênina li ser ziman ku ev pêvajoya gûharînê, di roja me de jî wê di dewama ya wan deman de wê bibê. Ji aliyekî din ve jî mudaheleyên ji jîyane mirov ên li ser teknîkê û rengê bikarhanîna wê re ku ew li wê dibin jî ew, wan pêvajoyên gûharînê zûtirîn dikin.

Pêvajoyên serdemên navîn û dawîn ên peleolîtîkê wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşna gûharîner bê. Di van deman de wê, rewşên dunyayî ên weke daristanan û hwd wê bibin. Ava bahran û deryeyan wê, bi halîna kaş û çîyayên qaşayê re wê bilindtir bibê û wê gelek herêmên din, wê di bin avê de wê bihêlê. Zêdebûna asta avê, wê bê temenê hebûna dûkelîyê ku ew wê zêdetir bibê. Zêdebûna dûkelîyê, wê di hewayê de wê asta rewa û ankû hînikbûnî wê zêde bibê. Ev jî wê, di rewşa rengên nû ên şînahîyê û

bûyîna wan de wê weke temen wê biafirênê. Hînikbûn û ankû rewaya di hewayê de wê, temenê gelek rewşên şînahîyê bin. Her wusa, pêşketina van rewşan di hewayê de wê, bandûra wê li birehê û tirêjên rojê û stalîzbûna wan jî wê bibê. Her wusa, mirov dikarê vê yekê wê werênê li ser ziman ku ev rewşên ku wê di xwezayê de wê pêşbikevin, wê di çerçoveya fîzyolojiya mirovê demê û jîyane wî de jî bandûra wê hebê. Wê temenê hinek rewşên fîzyolojîkî ên ku wê biafirin bin.

Lê em divê ku bandûra dûkelîyê û bi wê re bûyîna rewa û ankû hînikbûnê û hwd, wê di şînahîyan de wê xwe zêde bide dîyarkirin. Gelek sawalên ku ew di xwezayê de dijîn û ew tenê bi şînahîyan dijîn, wê ev rewş di rewşa wan de wê bandûrker bê. Bi zêdeyî jî wê di rewşa sawalên weke bizin, meh, çêlek, hasp, ga, çêlek, mimbiz, xezal, baraz, zelal, mirişk û hwd de sawalên weke van ku ew wê piştre wê hin bi hin wê werina kedîkirin de wê, xwe bide dîyarkirin. Bandûra van rewşan wê di fîzyolojîya wan sawalan de wê xwe bide dîyarkirin.

Di vê demê de wê mirovê şikeftê homo sapîens, wê di jîyane xwe de wê gavên mazin wê di nava van rewşan de wê biavêjê. Wê di laşê wî de jî wê, ev rewşên ku ew, weke rewşên gûharînên di xwezayê de na, ên ku ew bi rewşa dûkelîyê û hwd re dibin re wê, di rewşa fîzyolojiya mirovê şikeftê homo sapîens û hwd de jî wê, gûharînan wê bide çêkirin. Wê di rewşa hewayê, wê li gorî rewa û hînikbûyîna xwe ya nava xwe wê, bandûr li fîzyolojî û çermê zindîyan jî wê bike. Di vê çerçoveyê de rewşa şert û mercên hewayê, divê ku mirov wê weke rewşna dîyarker ên ku em dikarin bi teybetî wê hildina li dest bê.

Di rewşa jîyane mirovê demê homo sapîens de wê rewşa demê wê di rewşa wî ya fîzyolojîkî û jîyanî de wê gûharînên mazin wê bide çêkirin. Di vê demê de wê xweza, wê pirr zêde wê pêşbikeve. Di nava xwezayê de wê kerîyên sawalan wê dîyar bibin û derkevina li holê. Wê gelek zindî, wê di vê demê de wê xwe bidina dîyarkirin. Ev jî wê, di vê demê de wê rewşek jîyanî, wê rewşa jîyane mirovê demê re wê bide çêkirin. Her wusa, mirovê demê homo sapîens, ku ew dinava wê xwezayê de dijî, wê rastî gelek sawal û ajalên ku ew ji wî zêdetir bi hêztir û maztir bin. Lê ew amûrên weke rim, hastûyên tûj, stirhên sawalan ên dirêj û tûj û hwd, wê bidest bikarhanîna wan bike. Wê di vê çerçoveyê de wê, di jîyane xwe de wê di vê demê de wê mirovê demê homo sapîens, wê zêdetirî wê bidest bikarhanîna amûr û tiştan wê bike. Wê her wusa wê di vê çerçoveyê de wê jîyane xwe wê bi wan re wê di rewş û rengekî din de wê bide domandin. Di vê demê de wê jîyankirin û xwe li jîyanê girtin, wê weke rewşa esas û ya girng bê. Di vê çerçoveyê de wê mirovê demê homo sapîens, wê bi wê ew wê di demê de wê bizane bê. Hertimî nêçîrkirina wî, wê di rewşa nêçîrê de wê wî, zane û fêr bike. Wê fêrî ku ew çawa karibê xwe biparêzê jî bikê. Rewşa nêçîrê, wê di rewşa mirovê demê homo sapîens û xwe ji xaterîya ku wê ji ajal sawalên din wê li wî wê werin ku ew li hemberî wan karibê xwe biparêzê, wê fêr û ezmûnên wî yên bi jîyane wî ya nêçîrvaniyê re wê fêrker û wê wî di her rewşê de wê serbixin.

Di nava rewşa jîyane komî a demê de wê, di vê çerçoveyê de wê fêrbûn û ezmûna mirovê demê homo sapîens, wê ji wî re wî hin bi hin wê bê temen û hîmê jîyane wî ku ew karibê xorttir bijî. Her wusa di vê çerçoveyê de ew fêr dibê. Ew dialimê ku ew çawa nêçîrê bike. Bi wê alimînê, ew fêrê bi xwe re dide çêkirin. Piştre jî ew li ser wê re ew rewşa xwe ya jîyanî pêşdixê. Mirovê homo sapîens, wê di vê demê de wê, rewşa wî ya mejiyî, wê hin bi hin wê derkeve li pêş. Wê mejiyê wî, wê tiştan wê di xwe de wê bigirê. Her wusa, wê di mejiyê xwe de wê hin bi hin wê bidest dîtinê bike. Çendî ku ev wê weke rewşek beyenî jî bê ji wî re wê bi demê re wê ev rewş pêşbikeve û wê ew jî wê fêrî vê rwşê bê.

Mirovê demê homo sapîens, jîyane wî ya komê wê di vê çerçoveyê de wê di nava xwe de wê, hin bi hin wê ji van aliyan ve jî wê temenekî jîyanî wê ji wî re wê bide çêkirin û pêşxistin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê ew wê rewşê bi mejiyê xwe re wê bijî. Rewşên gûharînên di hewayê de ên weke bi dûkelîyê, rewa û ankû hînikbûnê û hwd, wê bandûrê li rewşa wî ya fîzyolojikî tevger, kirin û xûyên wî bike. Ev jî wê, weke bandûrna ku wê li mejiyê wî jî bibin bin. Wê mejiyê wî, wê di vê demê de wê hin bi hin wê bidest girtinê bike. Xêva mirovê demê a homo sapîens, girtina wê ya di xwe de wê, bi rewşa wê ya pêşketina re wê heta serdema destpêka peleolîtîkê jî wê herê. Ev dema girtinê a di xêvê de ku em bahse wê dikin, wê çawa ku wê ew wê êdî wê li ser wê re wê bidest pêşxistina di jîyane xwe de wê bike bê. Di vê çerçoveyê de ev pêşveçûnên xêvî, wê piştre wê hin bi hin wê bandûra xwe wê di jîyane mirovê demê homo sapîens de wê bidina dîyarkirin. Minaq, bidest bikarhanîna amûran bo nêçîr û xwe parastinê û hwd, wê tenê encamek ji van ya dîrokî bê. Bi wê re jî wê, di jîyane xwe de ew her wusa ew nêçîra ku ew kir, ew hanîna wî ya li nava komê û her wusa bi wê re bidest bikarhanîna êgir bo xwe germkirin û hin bi hin

bo sorkirin û ankû pijendina goşt li ser wê, wê aliyên din ên jîyanî ku em dikarin li ser wan encamên girtina xêvî ên bi aqilî ên di mejî de ku em werinênina li ser ziman bin.

Di dewama wê de em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê di vê çerçoveyê de w girtina di mejî de wê, bandûra wê, di çerçoveya xwe biriqandina li jîyane mirovê homo sapîens re wê, xwediyê rewşek teybet bê. Bi wê re jî mirov dikarê bahse rewşa jîyane wî bike. Cihên ku ew wan ji xwe re dihilbijêrê weke deverên ber firatê ên ku ew di wê demê de ew êdî ew germ din, cihên weke *şanîdarê* û hwd, wê deverna ku wê di derbarê rengê jîyane wî de wê têgînekê wê bidina me bin. Her wusa, li vir, em vê yekê jî wê divê ku wê werênina li ser ziman ku wê rewşa jîyane mirovê demê homo sapîens, em di vê çerçoveyê de wê bi wê re kifş dikin ku wê hin bi hin wê pêşbikeve.

Di rewşa jîyane mirovê demê de em, jê re navê ´homo sapîens´ bikardihênin. Lê em divê ku vê jî wê bi wê re werênina li ser ziman ku wê di nava wê bi navkirin û gotinkirinê de wê, komên din ên weke neandertal û hwd, wê hebûna xwe wê bidina domandin. Çendî ku wê bê ser ziman ku wê li dora pêncih û ankû çil hezar salî re wê dawî li hebûna neandertal û hwd wê werê jî lê em, divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê di nava jîyane mirovê homo sapîens de wê hebûna xwe wê bidina domandin. Yanî bi gotineka din, em vê divê ku wê werênina li ser ziman ku wê gelek komên ku ew wê di wê demê de wê di vê çerçoveyê de wê bijîn wê hebin. Lê di vê demê de wê ya ku wê derkeve li pêş wê, ne ew bê. Wê ya ku wê derkeve li pêş wê ew bê ku mirov demê ku ew çawa û çiqasî dikarê di rewşa mirovê hemdem de ew tevbigerihê û di rewşa jîyane xwe ya bikomî de ew tevbigerihê û gavên xwe bipêşde ew biavêjê bê. Ya ku wê di vê demê de wê derkeve li pêş, wê xosletên mirovê demê ên ku ew bi ber xosletên mirovtiyê ve diçin bin.Wê ya ku wê derkeve li pêş, wê ew bê ku ew çawa nêçîrê dike û dabare xwe dike. Ya ku wê derkeve li pêş, ku ew xwediyê rengek çawa a komî ya û çawa di nava wê komê de dijî û tevdigerihê bê. Di vê çerçoveyê de wê ya ku wê derkeve li pêş wê pêşketina demê a jîyane mirovê demê a ku em î ro wê bi nav û gotina û homo sapîens re wê dihênina li ser ziman bê.

Navê homo sapîens, wê di çerçoveya serdema hemdem ku wê bûhûrîna li dema mirovtîyê de wê derkeve li pêş. Lê em divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa homo sapîens, wê weke rewşeka pêşketî bê. Berî wî, ji serdema homo erectus û heta ku wê were dema homo sapîens, wê pêşveçûnên giring wê xwe bidina dîyarkirin. Wê di wê navbera ji dema homo erectus û heta serdema homo sapîens, wê gelek cûre wê hebin. Serdema homo sapîens, ku em divê ku wê weke serdema homo sapîens û neandertal, bi hevdû re wê werênina li ser ziman, wê di vê çerçoveyê de wê xosleta wê, wê weke pêşketina xosletên mirovtiyê bê.

Piştî serdema homo ergasterîn û homo erectus wê hosta bê di bikarhanîna agir û amûran de wê homo floresiensis, wê di vê çerçoveyê de wê ew wê têgînê bide me ku em bigihijina wê hizrê ku ew, di dema homo sapîens de jîya ya û ankû weke cûreyekî bin dema homo sapîens bê. Wê bi rewşa xwe re wê homo floresiensis, wê rewşa mirovekî kin û zîrek û kêrhatî wê bide dîyarkirin. Li vir, em vê ji rewşê wê fahm dikin ku wê, rewşa bikarhanîna amûran, agir û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê, weke rewşek mirovî wê weke nîşanaka wê pêşketina wan bê. Homo habilîs wê ji dema australopithecus africanus û heta wê dema xwe ya ku ew di wê de dijî, wê gûharînên mazin wê di xwe de wê bide çêkirin. Ev gûharîn û rengê wan, wê piştî homo habilîs û heta serdema homo Ergasterîn, wê bidomê. Piştre jî wê di dema homo erectus û homo floresiensis, wê ew rengê pêşketinê ê xwe li ser lingan girtin, di şikeftê de jîyankirin, bikarhanîna êgir, di nêçîrkirinê de zêdetirî zîrekbûn û hwd, wê pêşbikevin. Ev rewş û pêşketina wan, wê di xate pêşketina xate peresendinê de ku wê ji aliyê fîzyolojikî ve wê gûharînên mazin wê bi xwe re wê bide çêkirin, wê weke aliyekî ku em li vir wê li berçav bigirin bê. Rewşa homo floresiensis, wê ji aliyê cihê ku ew weke şikeftê ku ew di wê de dijî, wê weke rewşeka ku ew di nava jîyanek komî de bijî wê têgînekê bide me. Bo vê yekê, ji aliyê gelek xosletên xwe ve wê, dema homo sapîens a pêşî ya destpêkê wê werênê berbîra mirov. Ji rewşa dinan homo floresiensis mirov wê fahm dike ku ew xwediyê rewşeka dinanî weke ya mirovê hemdem homo sapîens bê. Di vê çerçoveyê de wê, xwediyê dinanên kin û bi hevdû re di rêzekê de bin. Zerika serê wî, wê hinekî bi şûn ve wê mazin bibê. Lê qûlên çav û cihê bêhvilê wê hema bêja ne dûrî ya mirovê hemdem bê. Ku em homo floresiensis di çerçoveya dema homo erectus de wî hildina li dest, em dikarin wê jî bibêjin ku wê homo erectus wê di rewşek pêşketîtir a ku em li wê dihizirin de bê.

Em li vir, divê ku vê yekê wê werênina li ser ziman ku wê ji serdema homo erectus û heta serdema mirovê hemdem, wê gelek cûre wê bi serdemên xwe yên ku ew tişî dijîn re wê derbas bikin. Em divê ku

wan cûreyan jî di çerçoveya xate peresendina ji dema homo erectus û li ya homo sapîens û hwd de wan weke serdemên navber jî wan werênina li ser ziman.

Wê di serdema homo sapîens de jî wê, gelek cûre wê li rex hevdû û ankû wê di nav hevdû de wê bijîn. Ev cûre hemû jî wê weke cûreyna ku wê heta vê demê de ku ew hatina, wê xwediyê pêvajoyên cûda ên peresendinê bin. Em dikarin vê jî wê werênina li ser ziman ku wê cûreyên weke homo floresiensis kin, lê ew ku ew bi pêşketina wan ya bi peresendina wan re ew ne kêmî homo sapîens û neandertal û cûreyên wan ên weke homo heidelbergensis û hwd re ew pêşketî na jî wê hebin.

Serdema homo sapîens, wê weke serdema mirovê hemdem bê. Her wusa, wê di xate peresendinê de wê ew xwediyê wê asta dawî bê. Wê di nava xwe de wê xwediyê rewşa komê bê. Wê hin bi hin wê xosletên mirovî wê bi wî re pêşbikevin. Di vê çerçoveyê de wê bi şêwayekê wê mirovê homo sapîens, wê di dema xwe de wê, bi awayekî nîvklanî wê bijî. Wê di wê rewşa xwe de wê pêşketina xwe wê bijî û wê bide dîyarkirin. Homo sapîens, em di dema wî de wê dibînin ku ew xwediyê gelek amûrên weke yên ku ew weke kêran hatina bikarhanîn wê hebin. Weke ku me hinekî li jor hanî li ser ziman ku em rewşa hewayê û gûharînên birehê wan jî di çerçoveyê de û bi mijarê re di ahengekê de wan fahm nekin, emê ji aliyekî fahmkirina mijarê bêpar bimênin.Heta ku wê, pirr zêde hûrgil wê ji berçavên mirov wê biravin ku mirov bi wan baştir fahm bikê.Fektora ardnîgarîyê, wê di rewşa van pêşveçûnên ku em wan weke pêşketinên weke yên li ser xate peresendinê re wan werênina li ser ziman de wê xwediyê weynek mazin a giring bê.

.

**Bikarhanîna amûran bidest**

Biqasî ku mirov wê kifş dike, mirov wê dîbinê ku wê bikarhanîna amûran, wê heta serdema homo habilîs wê herê. Homo Habîlîs, weke ´mirovê kêrhatî´ jî ew dihê binavkirin. Homo Habilîs, di rewşa pêşketina xwe de wê rewşê dide nîşandin ku ew pêşketîya. Di şikeftê de dijî û agir jî bikardihênê. Her wusa, piştî wî re wê hinekî van rewşên ku wê homo habilîs di dema xwe de wî pêşxistina, wê homo Ergasterîn û homo erectus wê bi hostayîyekê wê piştî homo habilîs re wê bidina domandin. Di dema homo Ergasterîn û homo erectus de wê gelek cûreyên din ên weke homo floresiensis jî wê hebin û wê bi wan re wê li rex wan wê bijîn. Rewşa kêrhatîya homo floresiensis, mirov matmayî dihêlê. Her wusa, wê di rewşa bikarhanîna amûr û agir de wê, di rewşek pirr zêde pêşketî bê.

Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê serdema homo erectus, wê weke serdemek ku wê nêvî bi nêvî wê serdema qaşayê bê. Di vê çerçoveyê de wê derfeta jîyanê wê çendî ku wê di dema wî de wê hebê jî wê ne zêde weke ya piştre ku wê di dema homo sapîens, neandertal û homo heidelbergensis bê. Di serdema wan de wê herêmên weke almanya, firansa, ingilistan û pirranîya herêmên din ên roja me, wê bi zêdeyî wê gelek herêmên wê di bin çîyayên qaşayê de bin. Lê heta ku wê dem were dema homo sapîens û neandertal, wê ev herêm jî wê hin bi hin wê ji jîyanê re wê vebin. Bi heman rengî, mirov dikarê bahse pirranîya herêmên ewropaya roja me bike.

Mirovê homo sapîens,neandertal û homo heidelbergensis,wê di çerçoveyek mirovê hemdem û ankû hinekî bin wî re wê xwediyê rewşek pêşketinê a bi xwe re bin. Em vê ji kûderê fahm dikin? Em vê ji rewşa li ser lingan mazin sekinîna wan, bikarhanîna agir û amûrên din ên weke kevirên tûj û hwd bo birrînê û xwe parastinê û hwd, mirov wê kifş dike.

Di rewşa jîyane mirovê hemdem homo sapîens, neandertal û homo heidelbergensis de emê, vê rewşê bi zêdeyî wê kifş bikin ku wê bikarhanîna amûran wê bi wan re û wê di jîyane wan de wê bi zêdetîrî wê derkeve li pêş. Wê bi wê re wê jîyane xwe wê bigihênina astekê. Wê di şikeftê de wê bijîn. Wê bi komî wê bijîn. Bi wê re jî wê amûrên tûj wê bikarbênin. Wê bi wê re wê bi wan amûran û hwd re wê nêçîrê bikin. Di serdema mirovê hemdem homo sapîens, neandertal û homo heidelbergensis de wê, derfeta nêçîrê wê pirr zêde wê pêşbikeve. Wê gelek sawalên ku ew dikarin wan nêçîr bikin wê derkevina li holê. Bi wê re jî wê karibin bi hûner û amûrên di dest jî ew xwe ji hêrîşên sawalên mazin ên xaternek biparêzên jî. Ev jî wê bi wan re wê xwe bi awayekî vekirî wê bide dîyarkirin. Mirovê hemdem homo sapîens, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek pêşketî a teybet bê. Ber ku ew dikarê di van rewşan de hûnera bi amûrên di destê xwe de bide nîşandin û nêçîra xwe bi amûrên di destê xwe de wan bike û hwd, wê ew weke mirovê hemdem wê were pênasekirin. Bi wê re wê ew xosletên mirovê hemdem wê bi xwe re wê bide nîşandin.

Di rewşa amûrên ku wê çi û çawa wê bikarbênin de me, hinekî li jor di nava mijarê de cih bi cih bi gotinna ew hanîbû li ser ziman. Lê li vir, em divê ku wê bi çerçoveya wê re wê hildina li dest. Rewşa bikarhanîna amûran, wê rengekî pêşketinê wê bi xwe re wê bide nîşandin. Em dikarin rewşa bikarhanîna amûran wê, di çerçoveya têgîna teknîkê de jî wê hildina li dest. Her wusa, rewşa bikarhanîna amûran, wê bi xwe re wê rewşa pêşketina mirovê demê jî wê werênê li ser ziman. Pêvajoyên pêşketina mirovê demê, wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Di çerçoveya serdema homo sapîens û neandertal de em, dema ku rewşa *mirovê şanîdarê* û dihildina li dest, em bi *mirovê şanîdarê* re wê kifş dikin ku wê rewşa mirovê demê ê mesopotamîya wê baştirin kifş dikê. Rewşa mirovê demê a hemdem, di aslê xwe de wê bi awayekî pirr zêde baş wê bi mirovê şanîdarê ê serdema navîn a peleolîtîkê re wê xwe bide dîyarkirin. Mirovê şanîdarê, wê weke mirovê demê, wê bi amûrên destî û hwd re wê xwediyê rewşna pêşketî bê. Em di şanîdarê de wê dibînin ku mirovê şanîdarê wê, weke mirovê ku ew bi rewşa xwe ya fîzyolojikî ew pêşketîya û xwe bi pêşketina xwe re ew li herêmê dijî.

*Mirovê şanîdarê ê şikeftê* wê, ji herêma şanîdarê li ber firatê ve wê heta ku wê bigihijê herêmên rojavayê kurdistanê ên roja me weke afrînê û ji wan jî heta helebê û hwd, wê li wan bijî. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê werênê li ser ziman ku mirovê şanîdarê wê, di derbarê pêşketina bi ber mirovtiyê ve wê weke pêvajoyek giring a ku mirov wê bi teybetî wê hilde li dest bê.

Mirovê şanîdarê, wê di dema peleolîtîkê a destpêkê de wê li herêmê wê di rewşa mirovê hemdem de wê rewşekê wê ew bi xwe re wê bijî. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê di van deman de wê ev herêma berfiratê wê pirr zêde wê ji jîyanê re wê derfetek pirr zêde mazin wê bide çêkirin. Wê ev herêm germ bê. Ji xwe sedema wê ya ku wê mirovên homo sapîens, wê bidest hatina xwe ya ji rojhilatê afrîqa ve wê bi ber mesopotamîya ve wê werin û wê ji wir wê li herêmê belav bibin û wê bi ber ewropa ve jî wê herin. Di van deman de wê herêmên ewropa û ankû rojava ên ku ew hê nûka li jîyane divebin, wê bikin ew xwe bigihênina wan. Di vê demê de wê zêde wusa herêmên mazin wê di bin avê de bin. Her wusa, rêya ku ew di wê re tên bejehî ya û ew rêyên ku ew di wê re tên wê, di vê çerçoveyê de wê piştre jî wê, bi halîna qaşayê wê, gelek ji wan herêman wê di bin avê de wê bimênin. Wê rewşa bahrê wê li wan wê pêşbikeve û wê ew di bin avê de bimênin. Wê bi wê re jî wê bi zêdebûna avê re wê têkiliya herêman wê ji hevdû qût bibin. Herêmên vê aliyê avê û yên wê alîyê avê wê biafirin. Wê bi rewşa avê re jî wê sînorn parzemînan wê biafirê. Her wusa, çendî ku wê serdema qaşayê wê bi ber dawîyê ve wê herê û wê qaşa, wê bi halihê, êdî wê herêmên ku wê di bin avê de bimênin, wê weke herêmên ku wê têkiliyê qût bikin bin.

Di vê çerçoveyê de wê bi dawîlêhatina serdema qaşayê a dawî re wê rewşa sînorê parzemînan bi bahr û deryeyan re wê pêşkeve û wê stûr bibê. Wê temen û derfeta derbasbûna ji aliyan li aliyan wê zor zehmet bibê. Wê têkiliya herêman wê ji hevdû qût bibê. Wê giravên nava avê wê biafirin. Her wusa, rewşa afrina giravan, wê weke rewşeka ku wê di bin avê de mayîna herêman û ji wê mayîna herêman beşa herî bilind a ku ew maya li ser avê bê.

Ev rewşa halîna qaşayê wê, bi xwe re wê rewşek teybet wê werênê. Li gorî herêmên cihanî ên ku ew di bin kaş û çîyayên qaşayê de na, wê herêmên mesopotamîya wê weke herêmna bilind bin. Ev herêm wê, hem ji serdemên destpêka peleolîtîkê û berî wê ve wê zûtirîn wê halîn li wan wê pêşbikeve û hem jî wê li wan wê temenê afirîna xwezaye ya ekolojîkî a şînahîyê ya weke bi darîstanî û hwd wê zûtirin wê biafirê. Pêvajoyên serdema peleolîtîkê ên li herêmê ku mirov li wan dinerê, hinekî jî di vê çerçoveya pêvajoyên peresendinê ên şînahîyan re jî mirov dikarê wan hilde li dest û şîrove bike. Di vê çerçoveyê de demên peleolîtîkê ên li mesopotamîya wê teybetîyek wan ya cûda wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, di hundurê wan pêvajoyên wê ên dirêj de wê pêvajoyên peresendinê ên herî dirêj wê li ser şînahîyan û xwezaye wê re wê li vê herêmê wê bi jîyane zindîyan re li rex hevdû wê birêvebiçê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa wê, di çerçoveya rewşa şînahîyan de wê, xwediyê rewşek teybet bê. Dema ku rewşa ev bê, wê demê rewşa pêşketin û afirîna komên zindîyên weke ajala û sawalan li vê herêmê wê bi demê re wê zêdetirî wê xwe bide nîşandin. Her wusa, herêmên Asya û Afrîqa, wê di ahenge hevdû de wê xwediyê rewşek bi hevdû re a di vê çerçoveyê de di giştîyê de ku mirov wan hilde li dest jî bê. Li herêma Asya û afrîqa ku mirov bihizirê, di vê çerçoveyê de mirov dikarê di nava hevdû de wan hilde li dest. Herêmên îndîya û ankû hîndîstanê, ku ew deryeya wê ku ew di wan serdemê de wê dora wê bi bejehî zêde vekirî bê, wê weke herêmna ku wê rêyên çûnûhatinê bin. Rewşa mirovê şanîdarê a li herêmê ku ew bi pêvajoyên jîyanê ên

dîrêj re ew derbas dike, wê di çerçoveya pêvajoya jîyane homo sapîens, neandertel û homo heidelbergensis de wê werê li ser ziman. *Mirovê şanîdarê* wê bi rewşa xwe ya pêşketî re wê, weke ku ew ji şikeftên li dora afrînê û ya şanîdarê ew dihê kifşkirin û dîtin, wê di rewşek pêşketî a demê de wê xwediyê rewşa xwe ya pêşketinê bê. Mirovê şanîdarê wê rewşa mirovê demê wê a pêşketî wê bi xwe re wê werênê li holê û bide nîşandin.

Rewşa mirovê şanîdarê, wê di vê demê de wê zêdetirî wê di nava xwezaye wî de wê pêşbikeve. Xwezaya herêmê a ku ew pêş dikeve jî wê ji jîyane wî re wê derfetek zêde mazin wê bide nîşandin. Cûreyên şînahîyê ku wan li ser xwe re pêvajoyên peresendinê ên dirêj li herêmê bi ser xwe ve dana derbaskirin, wê weke ku ew di xwe de wê xwediyê rewşek dewlemend a bi xwe re bin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa mirovê şanîderê, wê li herêmê wê weke rewşek teybet bê. Her wusa li vir, em vê yekê jî wê, werênina li ser ziman rewşa xwezaye herêmê wê bi xwe re wê rewşek pêşketî wê bide nîşandin.

Di nava rewşa xwezaye herêmê de wê, bi demê re wê rewşek pirr zêde pêşketî wê derkeve li holê. Daristanên mazin wê derkevina li holê. W herêmên ber firatê û diclê wê, heman bêja wê hemûya wan wê bê bi daristan. Di nava wan de jî wê cûr bi cûr wê cûreyên sawal û ajalan wê derkevina li holê. Hemû wê di nava wê xwezayê de wê weke rengekê jîyanê bin.

Pêvajoyên pêşketina jîyanê li herêmê, wê di vê çerçoveyê de wê, hema bêja wê bi awayekî pêşketî wê ji dema dawî a serdema mazin a qaşayê wê dest pê bike. Di vê çerçoveyê de wê rewşek wê ya teybet wê hebê. Dema ku mirov çav li rewşa peleolîtîka herêmê didin, em van rewşan bi awayekî vekirî dibînin. Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, bi demê re wê bi herîkînîn ardê û hwd de wê qûl û şikeftên xwezayî wê biafirin. Wê li wan, wê mirovê demê wê bicih bibin. Heta dema ku ew mana, dûkeşîyên li herêmên kurdistanê, wê pirranîya wan, ne bidestê mirovan wê hatibibina çêkirin. Pirranîya wan, wê bi herîkîn û xişiqîna ardê re wê biafirin. Ew jî wê, weke deverna ku wê, mirovê demê wê wan weke stergeh wê wan bikarbênê bê.

Di serdema mirovê şanîdarê de mirov wê dibînê ku wê rengekî jîyanê ê pêşketî wê hin bi hin wê pêşbikeve û wê derkeve li holê. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di çerçoveya jîyane wê de wê rengekî pêşketinê wê bide dîyarkirin. Di nava şert û mercên xwezayî ên jîyanî de wê mirov demê ku ew mirovê şanîdarê bê, homo sapîens bê, neandertal bê û ankû *homo heidelbergensis* bê, wê xwediyê rewşek jîyanî bin. Bi teybetî, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê heta dema destpêkê a serdema peleolîtîkê jî wê herêmên weke yên ewropa wê giştîya wan wê di bin çîyayên qaşayê de bin. Lê bi demê re wê bidest halîna xwe bikê. Bi wê re jî wê qadên jîyanê wê li herêmê wê vebin. Di serdema dawî a peleolîtîkê de wê bi gûharînên giring ên di birehê de re wê, zûdetîrîn wê halîn wê pêşbikeve. Ev rewş, wê bandûra wê li mesopotamîya bê(*). Di aslê xwe de destana tûfanê ku ew dihê hanîn li ser ziman û bi wê re bahse ´her der ku ew di bin avê de dimênin´ em, divê ku wê ji aliyekî ve van pêşveçûnên peleolîtîkî ên bi halîna kaş û çîyayên qaşayê re ku wê asta bilindbûna avê bi carekê wê bilind bê û wê gelek herêman wê di bin avê de wê bide hiştin, em divê ku wan rewşan di dema bibîrkirina *´destana tûfanê*(*)*´* de di bîra xwe wan bibîr bike.

Di destana tûfanê de wê, çendî ku wê weke vegotinekê jî bê, lê di aslê xwe de wê bi xosletên rengê vegotin û dîmenên ku ew di hundûrê vegotinên de dihên afirandin û hwd, wê têgîneka bi vê rengî wê di mejiyê mirov de wê bide çêkirin. Ev rewşa tûfanê, wê weke vegotineka ku wê ji demên pirr kevn wê were vegotin û heta ku ew dihê dema Nûh û ankû ew di wê demê de bi wê rengê û ankû bi cûreyna din pêşketîya, ew jî wê bi rengekî di vê çerçoveyê de wê mijara hizirkirinê bê.

Dibêt ku ew ji xosletên rengê hevgirtînîya weke bi mîneralên wê yên di nava ardê de re bê, wê axa herêmê wê di vê çerçoveyê de wê cûreyekî pirr cûda wê bi xwe re wê bide nîşandin. Wê bi demê re wê di rewşa rengê pêşketina jîyane herêmê de wê, ev rewş, wê bandûrîya wê zêde wê hebê. Axa ardê a herêmê jî ku ew ji aliyê hevgirtînîya sentezî a nava wê ya weke mineralên wê re ku ew were lêkolîn kirin, wê ji aliyekî jeolojîkî ve wê ew wê rewşa pêvajoyên peresendinê ên dirêj ên di xwe de wê bide dîyarkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa ardnîgarîya herêmê, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek teybet bê. Mirovê herêmê wê, di vê çerçoveyê de wê li ser wê rewşê re wê jîyane xwe wê bide pêşxistin.

**Ji rêza çîyayên Zagros û heta bigihijê berfiratê û çîyayê kurda li rojavayê kurdistanê** û hwd, wê di qadaka berfireh de wê, mirov wê derfeta jîyanê wê ji xwe re wê bibînê. Ji xwe, wê mirovê şanîdarê wê van herêman wê ji xwe re wê, weke herêmên ku ew li wan dijî wê werê hanîn li ser ziman. Ji demên navîn û dawî ên serdema qaşayê a mazin ve wê ev herêm, wê weke herêmên ku wê zûtirîn wê temenê jîyanê weke yê ku wê mirovê şanîdarê ku wê karibê di nava wê bijî wê biafirê û pêşbikeve. Her wusa, daristanên wê û hwd, di vê çerçoveyê de wê pirr zû wê biafirin. Bi wê rengê, wê cûreyên sawal û ajalan wê pirr zûtirîn wê xwe li herêmê wê bidina dîyarkirin. Mirovê şanîdarê û ankû weke ku ew tê herêmê homo sapîens, homo heidelbergensis û hwd jî wê li herêmê bi mirovê şanîdarê û dederîyehê**,** neandertal û hwd re wê bikeve nava hevdû de û wê bijî. Rewş û rengê jîyanê ê li herêmê ku wê pêşbikeve, wê ji mirovê demê re wê derfetek pirr zêde wê biafirênê. Her wusa, mirovê herêmê ku ev mirovê şanîdarê

-------------

(*)Li herêmên mesopotamiya ku wê çerçoveya wê kurdistana roja me bê wê zû demên peleolîtîkê dawî li wan were. Wê ev hem bi jiyane mirovê demê û hem jî bi jenolojikî wê bibê.

(*)Destana tufanê wê weke destanaka ku wê bahse rabûna tufanê li herêmê wê bikê bê.

bê û ankû neandertal û an jî ku ew homo sapîens û homo heidelbergensis jî bê, wê li herêmê wê zû adepte bike di nava rewşa xwezaye herêmê de. Ber ku wê rewşa xwezaye herêmê wê derfeta jîyanê wê zêdetirî wê bide mirov.

Piştî ku homo sapîens, homo heidelbergensis û hwd ew hatina herêmê, wê li herêmê wê komên xwe wê ava bikin. Ankû wê kolonîyên xwe wê ava bikin. Wê li herêmê wê bijîn. Rewşa hatina mirovê homo sapîens, homo heidelbergensis û hwd li herêmê, wê rastî dema dawî a serdema qaşayê a mazin wê werê. Piştî wê re wê, bi halîna qaşayê re wê hem gelek herêmên nû wê ji jîyanê re wê ve bin û hem jî wê gelek herêm wê di bin avê de wê bimênin. Bi teybetî wê, gelek herêmên keviyên afrîqa, wê di bin avê de wê bimênin. Dibêt ku ev jî wê bê sedemek giring ku ew zêdebûna avê wê bike ku mirovê homo sapîens, homo heidelbergensis û hwd ku ew werina herêmê. Bêgûman, em ku mijarê ji kîjan aliyê ve wê hildina li dest û wê bikin ku wê fahm bikin, em nikarin şert û mercên xwezayê ji berçav û ji temenê şîroveyê dûr li wê bihizirin. Şert û mercên hewayê û hin bi hin bi gûharînên di birehê de wê tirêjên rojê wê di çerçoveyeka ku wê weke ya heta roja me wê were wê, di wan de wê adilîn wê bibê. Şert û mercên hewayî wê, di vê çerçoveyê de wê li se rewşa jîyane mirovê demê jî wê bi bandûr bê. Herêmên ku ew zû ji bin qaşayê derketina û li wan daristan û hwd pirr gûrr pêşketina ên weke yên mesopotamîya, wê bi demê re wê xwediyê rewşek teybet bin.

Mirovê herêmê ku wê li herêmê bê ku em di bin navê homo sapîens de hemû rewşa mirovê hemdem weke homo heidelbergensis, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd jî wan werênina li ser ziman jî lê wê, li vir, wê di nava wan şert û mercên xwezayê de wê tiştekî din wê xwe bide dîyarkirin. Rewşa mirovê şanîdarê jî û ya mirovê dederîyehê jî wê, di vê çerçoveyê de wê di nava wê de wê were hildan li dest. Ew jî wê ew bê ku wê li herêmê wê temenekî xwezayî ê ekolojîkî wê pirr baş wê biafirê. Di vê çerçoveyê de wê mirovê ku ew dihê herêmê wê di nava wê jîyane xwezayî a weke daristanê û hwd de wê, çawa fêrî nêçîrê û cûreyên nêçîrê û hwd bê û wê bi wê re wê çawa karibê xwe ji xaterîyan biparêzê, wê zûtirin wê bi dîtin û jîyankirinê re wê fêr bibê. **Pêvajoyên jîyane mirovê şanîdarê** û ankû mirov dederîyehê, homo sapîens, homo heidelbergensis, neandertal û hwd, bi hemû cûreyên din ku wê xwe bigihênina li herêmê wê di van warên fêrbûn û pêşketinê de wê zûtirîn wê bi şert û mercên xwezayê re wê derfetekê wê bidina dîyarkirin. Di nava şert û mercên xwezaye herêmê a gûrr de wê, bi awayekî wê şert û merc wê zorê bidina mirovê demê ku ew li gorî şert û mercên demê xwe zû adepte bike û bijî. Di vê çerçoveyê de wê, bi demê re wê were dîtin ku wê mirovê demê wê di nêçîrkirinê û hwd de wê, zûtirin wê pêşbikeve. Weke ku mirov wê bi dema dawî a peleolîtîkê û her wusa dema mezolîtîkê û hwd re wê bibînê wê, ev şert û mercên xwezayê din ku wê temen û derfetek zêde a berhevkirinê jî wê bi temenî wê bide dîyarkirin. Bo ku berhevkirin bibê, temen û derfet pêwîst a. Ew jî wê di wê demê de wê hebê. Lê mirovê demê weke homo sapîens û ankû mirovê şanîdarê û hwd, wê hê neketibibina pêvajoya berhevkirinê de. Lê bi wê re jî wê, di nava şert û mercên xwezayê de wê rewş û derfetek ku em dikarin weke rewş û derfetek berhevkirî a bi xwezayî wê weke temenê jîyane mirovê demê wê di nava şert û mercên xwezaye demê de wê ji wî re wê biafirê. Ber ku wê rewşên daristanî wê pirr zû wê pêşbikevin, wê gelek cûreyên sawal û ajalan wê weke kerîyan wê di nava wê xwezayê de wê bijîn.Ev jî wê derfetek pirr mazin û hesan a nêçîrê wê ji mirovê demê ê mirovê şanîdarê, homo sapîens û hwd re wê biafirênê. Bi fahmkirina van rewş, şert û mercan re

mirov, dikarê di dewama mijarê de wê rewşa pêşketina amûran, bikarhanîna wan û hwd wan hilde li dest û fahm bike. Wê di vê çerçoveyê de wê wateya wê bi fahmkirina wê re wê zêdetir wê hebê.

Şert û mercên demê û bi teybetî ku ev dem dema dawî a peleolîtîkê bê, mirov dikarê wê weke demeka ku ew êdî ew pêşketîya wê werênê li ser ziman. Şert û mercên xwezayê û n zindîyan wê bi hevdû re wê di ahengekê de wê pêşbikevin. Ji xwe, ya ku ew dihê dîtin jî wê ew bê. Di vê çerçoveyê de wê, di vê dema navîn û ya dawî a peleolîtîkê de wê daristan wê biafirin. Wê kerîyên sawalan, ajalan û hwd wê biafirin. Wê bi wê re jî wê rewşa jîyane xwezayî wê biafirê.. Ji aliyê şînîyên ku ew şîndibin re wê rewşa ku wê derkeve li holê, wê bi ya pêşketina darîstan û kerîyên sawalan re wê wê di ahengekê de bê. Di vê çerçoveyê de wê bi hevdû re wê di ahengekê de wê, rewşên xwezayê wê bi hevdû re wê biafirin. Bireh, di vê demê de wê, rewşa ku wê, şert û mercên jîyane me ya dawî wê bi wê re wê were jîyîn, wê pêşbikeve. Her wusa, wê gûharînên  ku wê di qat û beşên birehê de wê bi hevdû re wê bibin, wê rewşek teybet wê bi xwe re wê biafirênê.

Em li vir, divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê rewşa zindîyan, wê di nava rewşa xwezayê de wê zêdetirî wê biafirê. Piştî serdema dawî a mazin a qaşayê û halîna wê û bi wê halînê re afirîna bahr û deryeyan û di dewame wê de pêşketina dûkelîyê bizêdeyî di nava ardê û birehê de wê, temenê afirîna gelek zindiyên din ên pirrşaneyî û yekşaneyî jî wê bi xwe re wê biafirênê.

Di nava vê rewşê de wê, di nava axa ardê de jî wê zindî wê derkevina li holê. Bi wê re wê, rewşek pirr cûda wê di serdema peleolîtîkê de wê derkeve li holê. Mirov dikarê serdema peleolîtîkê, di vê çerçoveyê de wê weke serdemek afrîner a bi şert û mercên xwe yên xwezayê re wê werênê li ser ziman. Wê pêvajoyên afirîna jîyanê, wê di vê serdema peleolîtîkê de wê di çerçoveyekê de wê pêşbikevin. Her wusa, wê weke ku wê çawa wê serdema mezolîtîk û neolîtîkê wê ji pêşveçûnên civakî û destpêka wê re wê xwediyê wateyekê bin, wê biheman rengî jî wê serdema peleolîtîkê wê ji rewşa jîyanê, afirîna wê ya li dunyê, bi awayekî pirralî pêşketina di wê de û her wusa bi hevdû re bidest jîyanekirina zindiya û xwezayê bi hevdû re bi awayekî ku ew ji hevdû bixwûn, wê di vê demê de wê temenê wê bi başî wê biafirin. Her wusa, wê çendî ku wê av li dunyê zêde bibê bi halîna kaş û çîyayên qaşayê re wê ev rewş wê bi rewşa jîyanê re wê biafirê. Her ku av zêde dibê, wê jîyan jî wê zêde bibê. Gotina ´av, jîyan a´ wê, di aslê xwe de wê hinekî jî wê vê rastiyê wê bi xwe re wê weke ku wê piştrast bike.

Mirovê demê, wê bi van pêşveçûnên demê û ankû wê di nava wan pêşketinên demê de wê çendî ku wê di nava xwezaye xwe de wê pêşbikeve, wê bi wê re wê beyenîbûnê wê bi xwe re wê bi pêşketina aqilê xwe re wê ji wê xwezayê bi dûrketina xwe re wê bijî. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê, dema ku wê xosletên mirovî wê bi mirovê demê ê weke homo sapîens, mirovê şanîdarê û ankû mirov dederîyehê, neandertal û hwd re wê pêşbikeve wê, mirovê demê wê bi van xosletên mirovî re wê di jîyanê de wê weke rewşeka bi xwe bixwe re wê bide jîyanê bike. Wê di nava wê xwezaya xwe de wê, bidest bikarhanîna dest û lingên xwe bike. Wê bibînê. Wê dengan bikê. Wê di nava şert û mercên xwezaye de wê, bidest nêçîrîyê bike. Temen û derfetê nêçîrê ji yê her demê wê di vê demê de wê zêdetir bibê. Wê di her qadê û deverê de wê kerîyên sawalan wê derkevina ber mirovê demê. Ew jî wê di nava wan de wê, hem xwe bike ku ew ji hêrîşan biparêzê û hem jî wê bike ku ew nêçîrê bike ku ew karibê xwe bijî û jîyane xwe bide domandin. Bo vê yekê, wê di vê demê de wê li hemberî sawalên mazin ku ew dehqat ji wî bi hêztir û maztir in, wê nikaribê xwe biparêzê. Lê wê bi bi du şêwayan wê karibê xwe biparêzê. Şêwayê pêşî wê bi komî nêçîrkirin bê. Şêwayê duyem jî wê bi kifşkirin û bikarhanîna amûran bê. Şiv, di dest de wê werina bikarhanîn. Rim, wê werina pêşxistin û serê wan were tûjkirin û ankû wê kevirekî tûj wê bi serê wê ve wê were girêdan û wê bi wê êdî wê nêçîrê bikin. Yan jî, weke ku em di demên navîn û ya dawîn a serdema peleolîtîkê de wê kifş dikin ku wê mirovê demê wê bivirkên piçûk ên dest wê çê bike û wê bi wan, wê herê nêçîrê li hemberî sawalên ku ew bi wan re rastarast dihê berhevdû. Kevirên ku ew bi tarîşên ji çerm ku ew bi hastûyan ve ew dihên girêdan, wê weke bivirkna û ankû mazrabna piçûk ên destî ên nêçîrê bin. Temenê kifşkirina bivir û ankû mazrabkên destî ên piçûk wê, piştî nêçîrkirin û xwarina sawalên mazin û hastûyên wan ên ling, dest û hwd ku wê ji aliyekî ve wê bê weke gilokekê û stûr û mazin bibê û ji aliyê din ve wê zirev bibê, wê ew temenê wê kifşkirinê û bikarhanîna wê bê.

Di vê çerçoveyê de wê ev bivirk û ankû mazrabk, wê di dest de wê êdî wê weke amûrna destî ên nêçîrê bin. Yan jî wê, weke van rewşên hastûyan, hin dar ku wê kokên wan stûr weke gilokên bin û ew zirev û bi hevdû re wê pirr zaxm bin, wê ew jî wê weke wê bên bikarhanîn. Rewşa kevirhastên kevîtûj ku ew dihên

bikarhanîn û ya kevirên hinekî ji navikê ve stûr û aliyek zirev û tûj û aliyê din stûr a, ku wê ew bi tarîşên ji çermê wê bi hastûyan weke dar ku ew werina bikarhanîn ve wê werina girêdan bo ku ew bikarbênin weke çekek destî, wê ew di pêvajoyên piştî van pêvajoyên ku wê hastûyên sawalan bêî van bi hev ve kirinan ku wê bên bikarhanîn wê hebê.

Bi wê re jî em divê ku vê yekê wê werênina li ser ziman ku wê ev rewş, wê li gorî dîtina xwe ya ji jîyanê wê werina pêşxistin. Her wusa, di pêvajoyên piştre de wê li ser van kifşên weke van re wê pêşxistin wê werina kirin. Em dikarin vê pêşxistinê wê destpêka pêşketina teknîka destê mirov jî wê werênina li ser ziman. Aqilê mirov ku ew pêşket û pê de wê, bi xwe re wê rewşên pêşketî ên nû wê li ser van rewşên ku me bahse wan kir re wê bide pêşxistin. Rwşên nû jî wê weke ji hastû, kevirêtûj û tarîşên ji çerm ku wê bi hevdû ve wê mazrabk û ankû bivirkên piçûk ên destî wê bo nêçîrê wê werina pêşixistin.Bi wê re jî wê rimên dest ku ew pêşî weke şiv in, wê piştre weke rim wê werina pêşxistin. Weke rim pêşxistina wan jî, bi qaşartina darek zirev û dirêj re ku wê kevirkna tûj û zirev ku wê bi tarîşên ji çerm ku wê li wê êdî wê werina girêdan û wê ji wê rimek ku ew dar a lê ku ew serê wê yê tûj ku ew ji hastûyekî pirr tûj û ankû ji kevirekî pirr tûj a, wê bê çêkirin bê.

Di nava şert û mercên xwezayê de wê mirovê demê wê, van rewşên weke amûrên destî wê hin bi hin wê wan zêde bike û wê rewşên nû wê li ser wan re wê pêşbixê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bêjê ku wê pêvajoyên peresendinê wê li ser van pêşketinên weke teknîkî ên destpêkê re jî wê bên derbaskirin heta ku ew yên baştir werina pêşxistin û ew baştirî werina bikarhanîn. Bo baş bikarhanînê jî wê pêvajoyna peresendinê wê li ser rewşa amûran û mejiyê mirov re wê di jîyanê de wê bên derbas kirin. Ev pêvajo, wê heta wê dema ku mirov amûrê destî ê weke çek ku ew bikardihênê û bi wê nêçîrê dike û xwe diparêzê ku ew baştir bikarbênê û ew bigihêjê têgîna wê, wê ew pêvajoya peresendinê wê hertimî wê li ser wê re wê bi mejiyê mirovê demê re wê xwe bide domandin.

Mirovê demê, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşeka bi pêşketina xwe re bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê bi aqilê xwe re wê bidest hîskirinê wê bike. Hîskirin, wê li ser pêvajoyên fêrbûnê ên weke alimînê re wê pêşbikeve.

Mirovê demê wê di vê çerçoveyê de wê pêşketina xwe wê bide dîyarkirin. Pêşketina mirovê demê, wê di nava wan şert û mercên xwezayî de wê li gorî wê ku ew çawa dikarê xwe bijî û jîyane xwe bide domandin û hwd, wê li ser wê re wê bi pêşketina wî re wê xwe bide dîyarkirin. Pêşketina mirovê demê, di vê çerçoveyê de wê, di dema ku ew dijî de wê pirr zêde û gelek cûreyên sawal û ajalên û hwd, ku ew afirîna wê hebin. Bi wê re jî wê kerîyên sawalan wê biafirin. Ji xwe serdema peleolîtîkê, mirov dikarê weke serdemek sawal û ajalan û kerîyên wan ku ew bêhad û hasab pêş dikevin û zêde dibin, mirov dikarê wê binavbike û wê werênê li ser ziman. Di nava wê jîyane bi pirrcûrezindiyî de wê, di rewşekê de wê yên bi hêz wê karibin wê bijîn. Yên bihêz, wê yên ji xwe kêmhêztir wê nêçîr bikin. Mirovê demê ew ji gelek sawal û ajalên demê kêmhêztira. Lê ew wan sawal û ajalan nêçîr dike. Ev jî wê, di çerçoveya pêşketina bihevrebûyîna komî û piştre ew aqilê ku wê bi wê mirovê demê ku wê amûrên destî wê weke çek wê ji xwe re wê pêşbixê û wê xwe bi wan biparêzê û wê nêçîrê wê bi wan bike bê. Ev serdema peleolîtîkê ku wê weke serdema pêşketina hebûna zindîyan bê, wê di vê çerçoveyê de wê di nava wê reşa pirrzindîyî de ku mirov wê karibê bijî, wê li ser wê re wê rewşa nêçîrê û xwe parastinê wê pêşbikeve.

Ev serdema peleolîtîkê û xosletên wê yên pirrzindîyî, pêşketina jîyane daristanan, jîyane mirovê şikeftê a demê û hwd, ev hemû wê weke rewşna ku em divê ku wan di vê çerçoveyê de bi pêşveçûnên demkî re wan hildina li dest bin.

Di aslê xwe de ku mirov rewşa jîyane sawal, ajalan û hwd wan bi kerîyên wan ên ku ew pêş dikevin re wan hilde li dest, wê çawa ku wê mirov demê weke homo sapîens û ankû mirovê şanîdarê ku ew di şikeftê de dijîn, wê bi heman rengî ew sawal û hwd jî wê di nava jîyane daristanî de wê biheman rengî wê bijîn. Her wusa wê rewşa sittarîya xwe wê pêşbixin. Wekî din jî di nava jîyane daristanê de wê ew sawal jî wê şênîyê ku ew bi wê diçêrin û dijîn, wê ew di nava wê de wê bijî. Ev şert û mercên xwezayî û hebûna zindiyî û hwd, wê bi hevdû re wê, di ahengekê de wê pêşbikeve.

Sawal, ku ew şênîyê ku ew bi wê neçêrê ku ew nebê, wê nikaribê bijî. Her wusa, wê sawal, wê pêşî, wê ji mirovê demê zûtir wê kifş bike ku wê kîjan şênî û ankû geya baş a û tê xwarin. Di aslê xwe de wê mirovê demê wê ew, di dema nêçîrkirinê de wê kifş bike ku wê ew sawale ku ew nêçîr dike ew ji çi şênîyê diçêrê. Bi wê re jî wê ew di mejiyê wî de wê bicih bibê.

Têkilîya mejiyê mirovê demê û şênîyan a bi hevdû re hevdûnasîn, wê hinekî jî wê di vê çerçoveyê de wê bibê. Ev jî wê, bi wê re wê bibê. Sawalên pazkovî, garanên ga, kerîyên xezal, mimbiz, xanzîr û ankû baraz, çêlek, hasp û hwd, wê bi gelek cûreyên din ên sawalan re wê hebin. Ev cûre û hemû cûreyên din wê werina nêçîrkirin. Lê bi demê re wê sînorê nêçîrkirinê wê were çêkirin. Kîjan sawal, baş a û mirov ji wê dikarê goştê baş bigirê, wê ew were kifşkirin. Mirov, wê li wê bihizirê. Bi wê re wê nêçîrkirina xwe bi sawalên ku ew nêçîr dike re wê bi sînor bike.

Di vê demê de wê pirsgirêka nêçîrê wê nebê. Ber ku wê, bi kerî û garanan re wê sawal wê hebin. Mirov, wê wan nêçîr bike. Wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Di nava wê jîyane xwezayê wanqas kerî û garanan de wê weke ku wê pirsgirêka berhevkirinê jî wê nebê. Ji xwe, wê, di vê demê de wê mirov wê berhevkirinê wê nekê. Wê tenê wê bi ya ku ew wê dixwê û hwd re wê nêçîra xwe bi sînor bike.

Di vê demê de mirov wê dibînê ku wê mirovê demê wê fêrî danîna xafkan bibê. Her wusa wê bi wê rengê wê sawala ku ew wê nêçîr bike, wê bi hesanî wê berê wê bide bixafka ku wî vedayî û wê ew wê nêçîr bike. Têgîna xafkê, wê di aslê xwe de wê nîşanaka xosletna cûda ên mirovî ên ku ew pêş dikevin bin. Xafk, wê bi wê re wê bi çerçoveyê de wê were hizirkirin. Her wusa wê bi komî wê çawa wê dora sawalekê wê dorpêç bikin û wê ew wê nêçîr bikin, wê jîyane komê û bi hevdû re tevgerîna bi komî wê mirov fêrî wê bikê.

Lê bi giranî, em divê ku vê yekê wê di serî de wê li vir wê werênina li ser ziman ku ew amûrên dest, ên weke şiv(*), rim(*), bivirkê destî(*), kavirê tûj ku ew weke kêrê dihê bikarhanîn û hwd, wê weke van wê gelek amûrên nêçîrê û hwd wê werina birrîn. Wê ev amûr, wê weke amûrna ku wê çawa wê mirovê demê ku wê ew bi wan nêçîrê bikê bê. Di dewama vê de em, vê jî wê werênina li ser ziman ku wê mirovê demê wê weke di rewşeka ku ew êdî ew bi xosletên mirovî re ew pêş dikeve bê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa wî û jîyane wî, wê xwe bide dîyarkirin. Rewşa pêşketina daristanan û kerî û garanên sawalan, mirovê demê û jîyane wî ya şikeftê, pêşketina bi hevdû re bûna komî û pêşveçûna wê ya di nava jîyane mirov û hwd de wê, weke aliyna ku mirov wan bi teybetî hilde li dest bê. Di nava jîyane komî de wê mirovê demê wê jîyane xwe wê ava bike. Ew bi komê re wê di çerçoveya jîyane xwe ya ku ew bi wê re bûhûrandîya, giranîya bixwûnê û her wusa bi berjewendîyên xwe yên jîyanî re ew di nav de dijî. Ew di nav de xwe xort hîs dike. Naxwezê ku ew vê ji dest berdê. Bi wê re jî ew bi hevdû re diçina nêçîrê û hertimî dest tişî û bi hevdû re divegerihina nava koma xwe. Bi wê re mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku mirov bi têna serê xwe ew diçê nêçîrê, dibê ku ew carna nevegerîya ba. Jîyane komê û rewşa wê ya bi hevdû re kirinê, wê ji gelek aliyan ve wê temenekî jîyanî wê bide danîn li pêşîya wan.

Mirovê demê ew hin bi hin mirov a. Li gorî jîyane xwe ya mirovî ew êdî ew xwe pêş dixê. Ew ji nava jîyane sawalan dûr dikevê. Bi vê rengê, wê rengekî din ê jîyanî ku ew jî di derbarê wê de di mejîyê xwe de ne xwediyê zanînê ya û ne zelal a, ew bi wê re pêş dikeve.

.

**Çêkirin û bikarhanîna amûran, pêşketina rewşa xwarinê û gûharînên ku wê di dewama wê de wê di laş û mejiyê mirov de wê bibin**

Mirovê demê dema ku mirov li rewşa wî ya jîyanê dinerê, wê her wusa wê ew pêşbikeve. Wê bi rewşa xwe ya mirovî re wê pêşbikeve. Rewşa mirovî, wê bi xoslet û rengên pêşketina wê ya di jîyanê de re wê pêşbikeve. Pêşketina xosletên mirovî, wê bi destpêka ku wê mirovê demê wê xwe ji rewşa jîyane xwezayê a zindîyan wê cûda bibînê re wê, pêşketina xwe wê bide domandin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê mirovê demê wê, xwe ji jîyane zindiyên din wê cuda bibînê. Ev cûdabûn, wê weke beyenîbûna pêşî a ku wê mirov ji nava xwezayê ku wê bi xwe re wê bijî bê.

Di rewşa pêşketina jîyane mirovê de wê, di vê çerçoveyê de wê pêvajoyên pêşketinê wê li dûv hevdû wê bibin. Wê mirovê demê wê pêşketina xwe wê di nava xwezayê de wê ew bi pêşxistina rewşên xwe re wê bide domandin. Mirovê

-----------

(*)Şiv wê kerîika piçûk a destî bê. Ya weke ji hastûyekê piçûk tê çêkirin û yan jî ji kevirekê zirev û dirêj tê çêkirin.

(*)Rim weke darê dirêj û ankû ´mizraq´ bê.

(*)Bivir weke çakuç lê serê tawandî û bi wê tawandinê weke çengelekê mazin ê destî ê xwe parastinê ya.

demê ew ketîya şikeftê. Wê kengî wê ji şikeftê wê derkeve? Kengî ku ew nêçîrê dike. Wê piştre, wê dîsa wê vegerihê li wê şikeftê. Ew wir, weke ku nas dike. Xwe li wir dibînê. Di vê çerçoveyê de wê ew

xwediyê rewşekê bê. Mirovê demê, di jîyane xwe ya şikeftê de wê, pêvajoyan li ser hevdû wê bide derbaskirin. Bi wê re wê gelek nifşên nû wê bi wê re wê li ser hevdû û di dewama hevdû de wê derbas bike.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku rewşa pêşketina jîyane şikeftê, wê bi nifşên nû re wê zêdetirî wê pêşbikeve. Mirovê ku ew di şikeftê de weke nifşên şikeftê ku ew dihên dunyê wê ew hêsta şikeftitîyê wê bi xwe re wê bijîn. Wê ew wir, weke ji xwe re wê mal bibînin. Wê dema ku ew ji her herina deverek din bi armanca nêçîrê û hwd, wê dîsa wê vegerihina li wir, her wusa wê bi wê re wê rewşek jîyanî wê bi xwe re wê bijî.

Di rewşa pêşketina nifşê mirovê şikeftê de wê, di vê çerçoveyê de wê ew nifşê mirovê şikeftê wê xwediyê w ahlbûna li şikeftê bê. Di vê çerçoveyê de wê ew bi wê re wê xwediyê rewşekê bê. Wê hertimî wê li pêşîya xwe jîyane şikeftê wê bibînê û li şûn xwe jî wê jîyane xwezayê a ku ew ji wê hatî wê bibînê. Wê bi herdûyan re jî wê bijî. Mirovê şikeftê, wê bi dema nifşên mirovê şikeftê re wê pêvajoyek nû a giring û dîrokî wê bijî. Di aslê xwe de wê bi rewşa nifşê mirovê şikeftê re wê mirovê demê, homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê, mirovê dederîyehê û hwd re wê derbasî pêvajoyek nû bibê di jîyane xwe de. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa jîyane mirovê demê wê bi bûhûrîna li rewşa nifşê mirovê şikeftê ê demê re wê weke derbasî pêvajoyek nû a pêşketî re. Xoslet û teybetîyên vê pêvajoyê wê ji her aliyê ve wê ji ya mirovê dema berî wê, wê cudatir bê.

Di serî de wê xosletên nifşê mirovê şikeftê, wê ew bin ku ew xwe aîdî şikeftê dibînê. Xwe di wir de weke di sittarê de dibînê. Wêderê ji xwe re weke deverek parastinê dibînê. Li vir, ew bi gelek mirovên weke xwe ku ew jî nifşên mirovê şikeftê na, wê bi wan re wê bijî. Wê bi wan re wê fêrî rewşa xwe ya nû bê. Pêşî wê rewşa xwe ya nû wê fêr bibê. Bi wê re wê, ew nifşê mirovê şikeftê, wê dema ku ew tê dunyayê wê di destê mirovê li hewirdora xwe de wê şiv, rim, bivirkên piçûk, hatûrên sertûj, hastûyên serkors(´serkors´ weke ku serê weke gilokekê gilover bê û ji deverên din ên hastûr stûrtir bê), kevirhast, kevirên kevîtûj(*) û hwd, wê hebin. Mirovê nifşê mirovê şikeftê, wê van rewşan wê di destpêkê de wê fêrî van bibê. Ew dema ku ew fêrî xwe parastin û nêçîrê dibê, wê ji vê rewşê têbigihê ku ew bêî wan amûran wê nikaribê xwe biparêzê û nêçîrê bike. Bi vê yekê ew wê li yên ji wê baştir wê bigerihê û ankû wê wan pêşbixê. Di vê çerçoveyê de wê nifşê mirovê şikeftê, wê teknîka xwe wê li gorî dema xwe wê

----------

(*)Hevirhast ûû kevirêdevîtûj wê ji hevdû cûda bin. Kevirhast wê weke kevirekê ku ew dem< ku ew li hevdû hat xistin ew çîroskên êgir derdixê û agir pêdixê bê. Kevirê devîtûj jî wê, ew rengê kevir ê ku ew dema ku hat birrîn ew keviya wê tûj dibê bê. Ev sêwayê kevir wê, weke şêwayekê kevir ê ku ew bvbib teybetî mirov dikarê bahse wê bikê bê. Li kurdistanê bi teybetî li ber herêmên firatê wê zêdetirî wê ew wê were dîtin.

pêşbikeve.Wê amûrên xwe wê li gorî demê wê pêşbixê.Wê wan amûrên xwe wê, wan pêşbixê. Wê fêrbûn û ezmûna bikarhanîna wan, wê bi xwe re wê derxê ast û pîvaneka din a hê bilindtir.

Em vê yekê jî wê bi wê re wê werênina li ser ziman ku mirov nifşê şikeftê ê demê, wê di vê dema xwe de wê hin bi hin wê li ser wê rewşa hatina dunyê a di şikeftê, bi xwe re weke xwe dîtina gelek nifşên mirovê şikeftê û hwd, wê rewşek hîskirinê wê bi nifşê mirovê şikeftê re wê pêşbikeve. Têgîna nifşê mirovê şikeftê, di aslê xwe de wê bi têgîna hîssî a şikeftê re wê ji rewşa xwe xwezayê, wê nêvî bi nêvî wê beyenîbûnê wê bi xwe re wê bijî.

Di rewşa nifşê mirovê şikeftê wê, nêvî bi nêvî wê rewşa mirovê hemdem û xosletên wî êdî wê bi wî re wê pêşbikeve. Ew jî wê bi wan xosletan ku ew çendî dijî, wê bi xwe re wê rewşa xwe derxê têgihiştinê. Di vê çerçoveyê de wê di rewşek komî û ankû ´kolonî´ de wê di vê çerçoveyê de wê pêşketina xwe wê bide nîşandin. Mirovê demê, wê di vê çerçoveyê de wê, di rewşek cûda wê bijî. Mirovê şikeftê, ew çendî ku bi xosletên xwe yên dema nifşê mirovê şikeftê re ew ji xwezaê hinekî dûrketîya û beyenî bûya jî lê wê, ew çavê wî li derve bê. Lê çendî ku wê çavê wî li derve jî bê, wê nikaribê ji wê rewş biqatihê. Wê bi girêdanekê wê li ser wê rewşa bûyîna nifşê mirovê şikeftê re wê bi wî re wê hebê.

Ji ber vê yekê jî wê nifşê mirovê şikeftê, wê di rewşa xwe de wê bikeve rewşeka weke ku ew bi zincîrê hatibê girêdan wê bijî. Wê nikaribê ew xwe ji wê rewşa şikeftê bikê. Wê dema ku ew derdiekve dervî wê, wê weke ku ew xwe rût û bitenê hîs bike bê. Wê weke wê hîs û hêsta ku ew ji komê dûr dikeve ku ew xwe bi tenê hîs dike bê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa mirovê demê ê şikeftê wê bijî.

Xosletên nifşê mirovê şikeftê ê demê wê di vê çerçoveyê de wê di aslê xwe de wê rewşek nêvî bi nêvî wê rewşek bûhûrîner jî bê. Wê rewşek bûhûrîner bê li rewşa jîyane bi tememî a şikeftê. Wê rewşek

bûhûrîner bê ku ew bi tememî wê bi rewşa şikeftê ve wê girêdayî bibê. Di vê çerçoveyê de wê ew wê êdî wê şikeftên baştir wê ji xwe re wê çê bikê. Wê şikeftên maztir û bi parastintir wê pêşbixê. Wê şikeftên zaxmtir wê pêşbixê. Nifşê mirovê şikeftê ê vê demê wê, ji aliyekî ve wê ji aliyê rewşeka xwe ya jîyanî û fîzyolojikî ve wê bi ber vê rewşa ve wê pêşketinê bi xwe re wê bide çêkirin. Gûharînên fîzyolojikî, wê di çerçoveya girêdanîya wî ya bi wê rewşa şikeftê ve bê. Wê di wê çerçoveyê de wê çawa wê bijî, wê çawa dabara xwe bike, wê çawa wê herê nêçîrê, wê çawa xwedîyê amûrên nêçîrê û parastinê û hwd bê, wê di van rewş û rewşên weke wan de wê pêşketinê wê bi xwe re wê di rewşa xwe de wê bide çêkirin. Her wusa, wê rewşa nifşê mirovê şikeftê wê di mejî, rewşa xwe ya jîyanî û ya fîzyolojikî ve wê li hevdû hoyandî bê. Wê ji hevdû cûda wê rewşa pêşketinê wê bi xwe re wê nejî. Wê mejiyê wî, wê di vê çerçoveyê de wê, di xwe de wê bi ponijê. Bi wê ponijbûnê re wê rewşek teybet a aqilî wê bi xwe re wê bide çêkirin û pêşxistin. Nifşê mirovê şikeftê, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek teybet bê.

Rewşa nifşê mirovê şikeftê, wê di vê çerçoveyê de wê di nava jîyane xwe de wê ji aliyekî ve jî wê bi amûrên nêçîrkirinê û yên parastinê ve wê were girêdan. Bi wê re jî wê, giringîyê wê bide wan.Wê hertimî wê wan bi xwe re wê pêşbixê. Hertimî wê başkirinê wê li ser amûrên xwe yên nêçîr û parastinê re wê çê bike. Ber ku wê jîyane wî, parastina wî û nêçîrkirina wî, wê bi wan ve girêdayî bê. Wê di vê çerçoveyê de wê ew jî wê bi demê re wê wan kifş bike. Bi wê re wê bi amûrên xwe re wê nêçîrên baştir wê bi demê re wê bike. Wê nêçîrên ku ew wan dike, wê wan werênê nava komê li şikeftê. Wê xosletek giring û sereka a nifşê mirovê şikeftê jî wê ev bê. Wê hertimî wê nêçîrên xwe wê werênê nava komê li şikeftê. Wê li wir wê bi hevdû re wê beş bikin. Rewşa hin bi hin bidest hanîna nêçîrên xwe li şikeftê wê rewşa berhevkirinê jî wê bi ber wê ve wê weke destpêkek bigavî bê. Wê di dem û pêvajoyên piştre de wê, berhevkirin wê bibê. Lê hê jî wê, ji wê dema berhevkirinê re wê dem wê hebê. Lê ev kirin, wê bi xosletî wê mejiyê mirov wê li wê bidina hûnandin. Pêşketina hîskirinê û hîskirina aîdîyetê, wê hinekî wê temenê wê rewşa berhevkirinê wê hin bi hin wê biafirênê. Têgîna berhevkirinê wê weke têgîneka ku wê bi demê re wê piştre wê bi hîsa aîdîyetê wê pêşbikeve. Piştî ku ew pêşket û pê de wê, hişkirinê wê bi xwe re wê bidest afiraninê wê bike. Di vê çerçoveyê de wê nifşê mirovê şikeftê, wê di dema xwe de wê bi van rewşên xwe re yên ku ew weke yên destpêkî ku ew dike re wê, temenê wê pêşaroja xwe wê biafirênê.

Xosletên nifşê mirovê şikeftê, wê serdema mirovê şanîdarê, mirovê dederîyehê, homo sapîens, neandertal û hwd ve wê bi gavên biêmin wê bi vê rengê bi ber pêvajoyên pêş ve wê herê. Di vê çerçoveyê de xosletên nifşê mirovê şikeftê, wê hê ji gelek aliyan ve wê pêşketinan wê bi xwe re wê bide destpêkirin. Minaq, rewşa xwarinê û bi demê re fêrbûna li ser êgir û ankû di nava êgir de çêkirina xwarinê bê. Ev jî wê, di çerçoveya têgîna xwarinê de wê gûharînên fîzyolojikî û jîyanî ên giring wê bi xwe re wê werênê. Em divê ku ji vê aliyê ve jî rewşa nifşê mirovê şikeftê wê hildina li dest.

Di dema nifşê mirovê şikeftê de wê rewşa xwarinê wê bi wê rewşa jîyane wî re wê di ahengekê de wê pêşbikeve. Rewşa xwarinê wê weke rewşeka xwezayî a her zindiyî bê. Her zindî wê li gorî rewş û dema xwe ya pêşketî wê rewşa xwe ya xwarinê wê pêşbixê. Bêgûman, em dema ku em dema di çerçoveya têgîna xwarinê de serdemên peresendinê wê hildina li dest, em dikarin heta destpêkê herin. Her zindî, heta ku ew dikarê xwarinê bixwê, wê ew karibê bijî û hebûna xwe wê bide domandin. Di vê çerçoveyê de wê rewşa xwarinê wê hebê.

Di dema nifşê mirovê şikeftê de wê rewşa xwarinê wê pêşketî bê. Wê her wusa, wê hin bi hin wê bidest bikarhanîna agir di rewşa xwarinê û pêşxstina wê de wê bikin. Di vê çerçoveyê de wê rewşa xwarinê wê bibê. Berî serdemên nifşê mirovê şikeftê, em heta ku em herina dema homo habilîs û berî wî jî wê, di vê çerçoveyê de wê rewşek wê were dîtin ku wê, rewşa xwarinê wê weke ku ew nêçîr dikin ku wê pêşbikeve bê. Lê ku em li wê dem homo habilîs û hinekî piştre dinerin, em dibînin ku wê cûreyên weke Homo floresiensis wê werin û derkevina li holê. Ev cûre jî wê di bikarhanîna êgir de wê pirr hosta bin. Di vê çerçoveyê de wê rengekî hêja ê pêşketinê wê bi xwe re wê bide nîşandin. Em li vir, divê ku wê jî bi wê re û ankû li ser vê rewşê re wê werênina li ser ziman ku mirovê weke homo habilîs ku ew di rewşa xwe de ´kêrhatî´ya û mirovên weke Homo floresiensis ku ew di rewşa xwe de ew biheman rengî kêrhatî na û agir jî baş bikardihênin, wê ew bi vê rewşa xwe re wê ew wê têgînê wê bidina me û bikina serê me de ku ew di rewşa xwe ya xwarinê de jî wê li gorî wê, wê ew wê pêşketî û di rewşek pêşketî de bin. Ku em hinekî b şûn ve herin û herina dema Australopithecus endocast´yan, ku wê bi lêkolînan ku ew dihê piştrastkirin, mirov wê dibînê ku wê aliyê mejiyê wan ê bi navê *Lunate* wê bi şûn ve wê pêşketî bê. Ev wê weke

rewşek pêşketî a di beşbûna mejî de jî wê bide hanîn li holê. Di vê çerçoveyê de wê beşên dîtin, bihîstin, bêhnkirin, têjgirtinê û hwd wê pêşbikevin. Pêşketina rewşa bêhngirtinê wê, weke rewşeka ku wê di çerçoveya beşa mejî û ya xwarinê de jî wê giring bê. Di vê çerçoveyê de wê ev rewş wê vê têgînê bi me re wê bide çêkirin ku ew di rewşa xwarina xwe de wê, li ser bêhnê re wê di pêvajoyek pêşketinî a bi peresendinî bin. Ev rewş, wê di pêvajoyên piştre ên pêşketina Australopithecus´yan de wê êdî wê pêşketina rasta mejî bi şûn ve wê pêşketina wê bide destpêkirin. Wê piştre wê di cûreyên weke homo habilîs û homo erectus de wê were dîtin ku wê bêşên zimanî û xwarinê ên weke bêhnkirinê wê weke beşên mejî ên bi navê ´broca´ û hwd wê pêşbikeve. Ev jî wê di rewşa wan de wê, weke rewşeka pêşketina wan, wê xwe bide dîyarkirin bê.

Di vê çerçoveyê de bi beşbûna mejî wê di aslê xwe de wê, rewşa girtina bi xêvî, têjgirtinê, dîtinê, weke zindî pêşketina ajoya xwe ya parastinê û hwd, wê ev beş hemû wê pêşbikevin. Hê di dema homo habilîs û homo erectus de wê, ev beş wê xwe bi pêşketina xwe re wê bidina dîyarkirin. Wê weke cûreyekî ku wê pêşketina rengên bi pêşketina homo habilîs û homo erectus ku wê di hebûn û pêşketina xwe de wê bide nîşandin Homo floresiensis, wê di pêşketina xwe de wê xwediyê astek li pêş bê. Weke ku mirov li ser rewşa pêşketina mejî û beşên wê yên weke *´broca´* de wê dibînin wê bi homo habilîs re wê zêde pêşketî bê. Lê piştî wê re wê di pêşketina homo erectus de wê ev beşa mejî wê zêdetir xwe bi awayekî dîyarker wê bide dîyarkirin. Ev jî wê, bide nîşandin ku wê di dewame hevdû de wê xwediyê xateke pêşketinê bin. Em ku vê yekê wê, dikin ku wê fahm dikin a bi mejiyê homo habilîs re wê ev rewş, wê pêşketî bin.Homo habilîs, wê di warê pêşketinên xwe yên mejî de wê,rewşek pêşketî wê bide nîşandin. Lê bi wê re mirov divê ku wê jî wê, werênê li ser ziman ku wê piştî wî re wê cûreyên hemînîdan ku ew tên, wê bi wan re wê pêşveçûn bi pêşketinî ên li ser wê re wê xwe bidina dîyarkirin.

Li vir, em dema ku pêşketina homînîdan û hwd, wan şîrove bikin, em divê ku wê werênina li ser ziman, em hem li ser xûy û tevgerên ku ew didina nîşandin û nîşanakên pêşveçûnên fîzyolojikî ên weke bîolojikî û genetikî û hwd wan li berçav bigirin û li ser van herdû aliyan re bimeşin û wê werina li ser ziman. Ev yek, wê weke aliyekî giring bê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê pêşketina homonîdan, wê bi demê re wê di vê çerçoveyê de wê xwe li ser van herdû aliyan re wê bide nîşandin. Di xatekê de weke ku mirov li ser beşên mejî ên weke *´broca´* û hwd re kifş dikin ku wê xateka pêşketinî a peresendinî wê ji homo habilîs û heta homo erectus wê hebê.

Di rewşa homo habilîs, homo erectus û homo floresiensis de jî wê, ev bi awayekî vekirî wê were dîtin ku ew di pêşketina xwe de wê ew xwedîyê pêşketineka li berçav ku ew dihê dîtin bê. Ji wê pêşketina wan, mirov dikarê wê jî bibêjê ku beşbûna di mejî de ew bûya. Beşên weke yên girtinê ên xêvê, ên weke yên *amîgdala*(*) ku ew serborîyan me ên hatina jînkirin û hwd di xwe de ew qayd dikin û hwd, wê bi îhtîmaleka mazin wê destpêka pêşketina wan bibê û pêşketibin bin. Wê ev jî wê bi xwe re wê rewşekê wê bide nîşandin ku wê beşên têjgirtinê, dîtinê, bihîstinê, deng derxistinê û hwd wê di pêvajoya xwe ya pêşketinê de bin.. Mirov di dewama wê de wê jî dikarê wê werênê li ser ziman ku wê ev beş, wê dema ku ew pêş dikevin, weke ku me li jor li ser têgîna genetikê re hanî li ser ziman ku wê her pêşketin wê ji asta ku ew heya wê xwe bide domandin ve wê, di vê çerçoveyê de wê di xate peresendina heyînî de wê, vê pêşketina bi demê re wê dem bi dem wê li ser wê asta wê re wê bide dîyarkirin. Em ku di hinek rewşna de bahse têgîna ´motasyonê(*)´ a li ser genan û hwd re bikin jî lê wê ev têgîn, wê di her rewşê de wê nikaribê rewş û têgîna peresendina bi demê re a bi jîyane zindîyî re wê baş werênê li ser ziman.

Di rewşa pêşveçûnên mejî de wê rewşa pêşektina homonîdan wê di vê çerçoveyê de wê weke ku em wê kifş dikin wê xwediyê rewşek teybet a bi pêşketina wan re bê. Di rewşa homonîdan de wê têgîna pêşketinê wê dualî wê were dîtin û şîrovekirin. Aliyê pêşî wê li ser xûy û tevger û kirinan re bê. Aliyê din jî wê li ser xate pêşketina bîolojikî, genetîkî û pêvajoyên wan ên pêşketinê re bin. Ev herdû alî jî wê bi hevdû re wê di ahengekê de wê xwediyê pêşketinê bin. Mejiyê homonîdan, ew dema ku ew birçî na, wê bi wan bide hîskirin ku ew birçî na. Wê demê wê ew jî wê li xwarinê wê bigerihin. Hêsta birçîbûnê, wê weke hêstek fêrker a di vê çerçoveyê de wê ku rewş, tevger û kirinên homonîdan jî wê bide dîyarkirin bê.Hêsta birçîbûnê wê temenekî wê yê bîolojikî wê hebê. Ev jî wê bi wê re wê xwe bide pêşxistin. Her wusa, hêsta bîrçîbûnê wê

-----------

(*)Amigdala beşa meji a ku mirov çi dijî ku ew di wê de bicih dibê. Wê ew çerçoveya kompleks û makanismayên parastinê wê li ser xwe re wê bide afirandin. Mirov wê, dema ku wê, tiştekî xirab bijî, meji wê qayd dikê. Piştre dûbare ku mirov rastî heman rewşê hat wê meji wê bibîrê bixê ku mirov xwe ji wê rewşa taluke dûrbigirê. Wê bi wê rengê wê, meji wê hewlbide ku me dubare jîyankirina wê rewşê xilasbikê bê.
(*)Motasjon wê gûharînên genetikî bê.

çendî ku wê ajoyî û zindîyî bê, wê bi heman rengî wê aliyekî wê yê di mejî de jî wê hebê. Di vê çerçoveyê de em dema ku wê aliyê wê jî wê li berçav digirin û wê dikin ku wê fahm bikin, her wusa wê bi wê re wê ya ku wê li berçavê me wê bide nîşandin wê rewş û pêvajoyek pêşketinê a bi jîyane zindîyî re bê. Birçîbûn, wê dem bi dem wê xwe dûbare bike. Her wusa, wê dem bi dem wê temenê hêrîşên li hevdû jî bê. Wê temenê xwarina hevdû jî jî bê. Di nava zindîyan de wê ev hebê. Lê ji kîjan pêvajoyê û pê de wê homonîd, wê hevdû nexwûn, wê ew hinekî ne zelal bê. Hêsta birçîbûnê, wê bi ajoyî wê rewşek teybet a giştî wê bi zindîtîya heyînî re wê bike dewrê de. Lê di rewşa weke ku mirov bi reşa homo habilîs, homo erectus û Homo floresiensis û hwd re di destpêkê de dibînê ku ew di şikeftê de dijîn, wê ev têgîn wê weke têgîneka ku em ji wê dikarin gav biavêjin û wê rewşa wan ya pêşketinê hinekî zêdetir û di astek pêşketî a bilind de ku em wê divê ku wê werênina li ser ziman bê. Hêsta bîrçîbûnê wê bi demê re wê temenê lêgerîna xwarinê bê. Lê bi wê re jî wê, bi demê re wê dema ku homonîdan têrxwar û têrbûn û pê de wê, bi demê re wê li ser wê rewşa têrxwarin û têrbûnê re wê di nava rewşa xwarinê de wê ji hevdû naqandinê wê bikê. Bi wê re jî wê, zindîyên ku ew berê mirina û ankû ji aliyê hiek ajal û ankû sawalên mazin ve ew hatina derbkirin û mirina wê xwarina di her rewşê de wê nebê. Wê di nava wê rewşê û rewşa nêçîrkrina ya nû de wê weke ku wê rewşa bijartinê wê hin bi hin wê pêşbikeve. Ev jî wê nîşanaka pêşveçûneka giring a bi mejî re bê ku wê xwe li ser tevger û kirin re jî wê bide nîşandin bê. Rewşa nêçîrkirina sawalan wê heta ku wê dem were dema mirovê şanîdarê, mirovê dederîyehê, neandertal û ankû weke giştîya wan ku em di bin wî û navê wî de dihênina li ser ziman homo sapîens û hwd, wê di astek pêşketî de wê pêşbikeve.

Rewşa morfolojîya xwarinê wê di rewşa laşê homonîdan û piştre heta dema mirovê homo sapîens, wê temenê gûharînên dîrokî ên fîzyolojîkî bê. Em tenê gotinekê ji dema homo sapîens û ankû mirovê şanîdarê wê werênina li ser ziman ku ew hin bi hin wê fêrî sorkirina goşt li ser êgir bibin bi rewşa bikarhanîna êgir re wê ev goşt û ankû xwarina ku ew li ser êgir pijîyayî, wê di rewşa laş de wê di hundûrê hinavên mirovê demê de wê gûharînan wê bi xwe re wê werênê. Di rewşa cûtinê, qûrpandinê, mihandinê, sarifandina(*) wê ya di zik û ankû ûr de wê hesantir bê. Ev jî wê di rewşa hildana mînarelan de wê gûharînan wê bide çêkirin. Wê laş wê bi demê re wê fêrî wê rewşê bê. Ev xûy û tevgerîyeka mirovî a giring a ku wê li ser rewşa xwarinê û ankû morfolojîya xwarinê re ku wê xwe bide nîşandin bê.

Di rewşa xate pêşketina fîzyolojîkî û bîolojikî de wê, rewşa morfolojiya xwarinê wê di xate peresendinê de wê xwediyê cihekî teybet bê. Gûharînên ku wê di rewşa xwarinê de wê bibin, wê di mejî de jî û wê di fîzyolojîya mirovê demê de wê gûharînan wê bi xwe re wê werênê li holê. Em vê yekê jî wê bi

-------

(*)Xwarina bijîyayî, û ankû xwarina li ser êgir çêbûyî wê baştir wê, qûrpandin, mihandin û serifandinê wê çênbikê. Piştî ku mirov wê kifşkir, wê cardin wê bixwazê ku ew wê dubare çêbikê.

awayekî vekirî kifş dikin ku wê ji dema homo habîlîs û heta homo erectus, wê kifş dikin ku wê di rewşa wan ya nêçîrê de wê pêşveçûnek wê hebê. Lê weke nifş û ankû cûreyekî wan ku ew di wê serdema wan de jîya ya wê Homo floresiensis, wê weke ku ew di nêçîrkirnê, bikarhanîna êgir û hwd de wê zêde pêşketî bê. Di vê rewşê de wê bi çerçoveyekê ku mirov wê dihilde li dest, mirov wê bi wê çerçoveyê re wê kifş dike ku wê di nêçîrkirin û bijartina nêçîran de wê pêşveçûn wê bibin. Wê ji ajalan zêdetir wê sawalan wê nêçîr bikin.

Beşên weke beşa bêhnkirin û tahmkirinê, wê pêşbikevin. Wê bi wê re wê di rewşa weke kifşkirna cûreyên hevdû ku ew wekehevdû na, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşeka pêşketina mejî jî wê bi xwe re wê bide nîşandin. Di rewşa kifşkirina cûreyên hevdû û hêrîşî hevdû nekirin, wê ev weke aliyekî din ê pêşketina mejî jî bê. Ev, wê temenê xate pêşketina têgîna kombûnê a piştre ku wê pêşbikeve û wê hin bi hin wê di wê de wê kûrbûn wê bibê bê.

Î ro, mirov hevdû dibînin û xwe weke hevdû dibînin. Weke hevdû bi dulingî, dudestî, duçavî û hwd wê bibînê. Di rabê ser lingan û dimeşê. Her wusa, wê dema ku mirov mirov û zindiyên ne mirov ji hevdû cuda bike, wê li ser van xosletan re wê wê ji hevdû cuda bike. Ev xoslet, wê weke xosletên ku mirov wan

bi mejî dibînê bê. Lê ji aliyekî din ê zindiyî ve jî wê, bi heyînî bê. Her zindî, wê demê wê di vê çerçoveyê de wê vê rewşê wê bi xwe re wê kifş bike. Homonîdan jî ev rewş bi xwe re weke ku wan ew hin bi hin kifşkirîya. Di vê çerçoveyê de wê bi demê re wê têgîna ku wê bi pêvajoya peresendinê re ku wê temenê rewş û têgîna kombûnê jî bê, wê ev bê.

Di rewşa weke di birengekî kifşkirina bitêgîna naskirinê a cûreyê xwe yê weke xwe de wê têgîna bîrçîbûnê, ji hevdû cûdakirina cûreyên nêçîrê ku wê ew nêçîr bike û hwd, wê rewşna teybet ên ku wê weke encam û nîşanaka pêşketinê jî bin. Em î ro vê yek di zanin ku wê bi cûreyên homonîdan ên weke homo habîlîs, homo erectus, homo floresiensis û hwd re wê, weke zindîyna ku ew di şikeftê de xwe disittirin û diparêzên. Di vê çerçoveyê de wê herî hindik, wê çend ji wan wê bi hevdû re wê bi komî wê di wan şikeftan de wê hebin û wê bi hevdû re wê bijîn. Rewşa komî wê weke rewşek zindîyî û ankû ku em dikarin wê di çerçoveya rewşa civaknasîya navxweyî a zindîyan de wê hildina li dest bê. Ev rewş û pêvajoyên ên bi hevdû re di şikeftê û hwd de ên jîyankirinê, wê di rewşa pêşketina mejî û beşbûna wê de wê jî wê pirr zêde wê weke temenekî ku wê pêşketinê bide çêkirin û domandin bê. Her wusa, rewşa beşbûna mejî ku wê beşên weke yên dîtinê, bihîstinê, tahmgirtinê, bêhnkirinê, parastinê û hwd wê pêşbixê, wê weke rewşek giring a bi mejîyê zindî re bê. Di beşbûna mejî de wê bi pêşketina van beşan re wê di mejî de wê rewşên hevdû bandûrkirinê wê bi demê re wê li ser wê beşbûnê re wê pêşbikeve. Rewşa *simetrîkî a mejî* ku ew pêşdikeve wê di vê çerçoveyê de wê rastîya pêvajoyên pêşketinê ên ku ew di nava hevdû de û bi awayekî pirr-dîmenî ku ew pêş dikevin jî wê bi xwe re wê bide dîyarkirin û wê bênê hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê û rewşê de wê mejî, ku ew beşên wê pêş dikevin, wê temenê têgîna morfolojîya xwarinê û hwd bê, wê cûreyên wê yên ku ew bi demê re wê pêşbikevin jî wê bi xwe re wê bide pêşxistin. Di vê beşê de em divê ku vê aliyê di çerçoveya rewşa pêşketina homonîdan de wê baş fahm bikin.

Rewşa têgîna morfolojîya xwarinê, dîtinê, bihîstinê, bi hevdû re têkilîdanînê û hwd, wê bi awayekî wê pêşbikeve. Em dema ku î ro em, bahse têkilîdanînê dikin, bi devkî gotinan ji hevdû re gotinê em fahm dikin. Wê her zindî wê xwediyê reng û awayê xwe yê têkilîdanînê ê bi hevdû re bê. Bi teybetî wê her cûreyên zindîyan, wê rengê rewşa wan ya têkilîdanînê a bi hevdû re wê hebê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê wê werênê li ser ziman, di serdemên homo habilîs, homo erectus, homo floresiensis û hwd jî wê di dema xwe de wê rengekî têkilîdanînê a ku ew di nava xwe de bikardihênin wê hebê. Em dikarin, vê rewşê li ser têgîna ziman û beşa wê ya mejî ku ew pêş dikeve re wê, werênina li ser ziman.

Bi heman rengî, rewşa têkilîdanînê, ku ew pêş dikeve, wê bi wê rengê wê jî wê rengê pêşketina morfolojîya xwarinê wê pêşbikeve. Wê çawa têkilîyê wê dênin, her wusa wê di vê çerçoveyê de wê rengên weke din jî wê di mejî de wê beşa xwe wê biafirênin. Li vir, têkiliya di nava peresendina di jîyanê de û ya bi mejî re wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê heyînekê bê. Wê rewşa têkilîyê wê xwe weke rewşek teybet wê bide nîşandin. Weke cûreyên hevdû, naskirina hevdû jî wê, di aslê xwe de wê weke rengekî pêşketinê ê giring ku mirov wê di vê çerçoveyê de wê hilde li dest bê. Li vir, wê her rewş, wê li ser rewşê fîzîkî re wê bimeşê. Rewşa fîzîkê, wê rengê aqilê wê jî bê.

Di rewşa pêvajoyên li ser mejî re wê ji dema homo habilîs, homo erectus, homo floresiensis û hwd, wê heta ku wê dem were dema homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd jî wê, di vê çerçoveyê de wê pêşveçûn, wê di xatekê de wê xwe bide domandin. Li vir, em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê di xatekî de wê li ser cûreyan re wê pêşveçûn wê bibê. Her dem, wê xwediyê reng û cûreyê xwe yê teybet bê.

Di rewşa fahmkirina têgîna pêşketina mejî de wê ku mirov di dewama pêşketina ya dema homo habilis, homo erectus, homo floresiensis û hwd de wê di hilde li dest, her wusa mirov di vê çerçoveyê de wê rengê pêşveçûna bi demê re wê heta ya dema homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê bi gûharînên di mejî de re wê hebûna xwe wê bide domandin. Gûharînên mejî, wê di jîyanê de wê di çerçoveya pêşketina wê de wê bi jîyane zindî re wê xwe bide nîşandin. Pêşveçûnên di jîyane zindî de wê ji aliyekî ve wê weke encamên wê pêşketina di mejî de bin. Her wusa di mejî de pêşketina beşên mejî û di wê çerçoveyê de ji hevdû beşbûna mejî, wê bi demê re wê li gorî pêşveçûna ku ew dibê bê. Wê têkiliya hundûr û derve û ankû bi gotineka din, têkiliya dunya derve û ya mejî, wê bi awayekî simetrîkî û ankû çaprazî wê li hevdû û ji hevdû, wê bibê. Her rewşên ku ew hatina jîyankirin bi zindî re wê pêşveçûnên mejî jî wê temenê wê biafirênin. Lê her pêşveçûnên mejî jî wê dema ku ew bûn,

wê di wê rengê jîyankirinê de wê gûharînê wê di rengê peresendinê û hwd de wê bide dîyarkirin û nîşandin. Dema ku wê, heta ku wê were serdema homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê astek pêşketinî wê xwe bide dîyarkirin. Her çend ku wê di vê xate pêşketinê re wê dem bi dem wê cûreyên nû wê derkevina dika dîrokê jî lê wê, ew cûre, wê ji aliyekî rakendî û hwd ve wê têkiliyeka wan bi cûreyên ku ew ji dîrokê çûna û ankû windabûna re wê hebê. Ya ku wê di aslê xwe de wê temenê domandina wê xate peresendinê a bi homonîdan re jî wê, ev bê.

Di rewşa homonîdan de wê, di vê çerçoveyê de wê bi demê re wê pêşveçûn wê gav bi gav wê bibin. Her asta pêşveçûnên ku ew dibin wê li ser rewşa bîolojikî û genetikî û hwd re wê ji ast û dema ku ew heya wê xwe bide domandin. Di vê çerçoveyê de wê pêvajoyên rabûna li ser du lingan û ankû pîyan ku wê li ser dema homo habilîs û hwd wê dest pêbike, wê di dema homo erectûs û Homo floresiensis û hwd de jî wê pêvajoyên pêşketin û pêşveçûnê wê li ser wê re wê rabin. Wê ew rewş, wê weke rewşek zindiyî wê xwe di rewşa laş û ankû fîzîkê de wê hilde ewlehîyê. Di mejî de jî wê ew rewş wê pêşbikeve. Wê di genan de wê qaydkirina wê bibê. Wê çerçoveya wê zindîyî wê biafirê. Di rewşa xwe de wê, mirovê demê wê di xate xwe ya pêşketinê de wê weke ku ew li ser xateya pêşketinê wê bi teybetî û bi serê xwe w hebê û wê hebûna xwe weke cûreyekî zindîyî wê bide domandin bê. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa wê ya ku mirov wê li wê dihizirê, vê hizrê bi mirov re ew dide çêkirin.

Lê li vir, em di dewama wê de jî wê hildina li dest ku wê, pêşveçûnên ku wê li ser rewşa homonîdan wê bibin, wê di çerçoveyek teybet a weke xwe de wê bibin. Cûreyên ku wê piştre wê pêşbikevin weke homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê, di astek pêşketî a demî de wê xwe bidina jîyankirin. Di vê çerçoveyê de ev cûreyên homonîdan, wê rewşê bi xwe re didina nîşandin ku ew dikarin di nava xwezaye xwe de ew bijîn bin. Wê di wê çerçoveyê de wê ew xwediyê rewşek teybet bin.

Bi demê re wê, ev bi awayekî vekirî wê were dîtin ku wê ji wê dema ku wê hin bi hin wê homonîd wê bidest rabûna li ser duling û ankû pîyan û pê de wê, xosletên mirovtiyê wê bi wê re wê di ahengekê de wê bidest pêşketina xwe ya bi wê re bikin.

Di vê çerçoveyê de wê dema ku em hewl didin ku vê xate pêşketinê bi pêvajoyên wê yên pêşketinê re wê fahm bikin, em ji aliyê jîyane di nava xwezayê û hebûna zindî a homonîd a giştî ve li ser kirin, tevger û xûyên wî re wî dihênina li ser ziman. Lê bi wê re jî wê ji aliyê duyem ve jî wê ji aliyê bîolojikî û genetîkî hwd ve bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wê wateyê bê. Di rewşa têgîna fahmkirina wê de mirov, wê jî bi wê re wê fahm bike ku wê, di xate pêşketina pêvajoyên wê de wê, ev herdû alî wê bi hevdû re wê di awayekî ku ew ji hevdû û pêşketina hevdû re dibina temen ve wê pêşbikevin.

Di rewşa pêşketina rewşa xwarinê, rewşa têkilîdanînê, rewşa bihîstina dengan, rewşa naskirina cûreyên xwe ku ew weke hevdû na ji nava zindiyên din ên di xwezayê de wê, ev rewşna ku wê bi demê re wê bi pêşveçûnên mejî re wê temenê wan hebê bê. Di rewşa têkilîdanînê, dîtinê û xwarinê û hwd wê, dema ku mirov em li ser homonîdan re wê dihziirin, em vê yekê dibînin ku wê hê di dema Australopithecus´yan de jî wê ew beşên mejiyên wan wê bi awayekî wê weke ku ew di pêş dikeve bê. Piştre jî wê, di dewama wê de wê bi cûreyên weke homo habilîs û hwd re wê pêşketina wê, zêdetir wê xwe bide nîşandin. Heta ku mirov dikarê vê jî bibêjê ku wê weke ku wê bi demê re wê bi lêkolînan re wê were dîtin ku wê beşên Australopithecus(*)´yan ku ew afirîna, wê hema bêja wê nêzî mirovê yên roja me ê hemdem bin. Ev jî wê hizrê û nîqaşê bi xwe re dihênê ku ew di dema xwe de wê, bi asta pêşketina xwe re ku ew wê di wê çerçoveya ku ew xûy, tevger û kirinîya wan bi rewşna mejiyê wan re pêşketîya, wê têgînekê wê bide mirov. Li gorî wê jî wê di pêvajoyên piştre de wê, asta pêşveçûnê wê li ser wê re wê xwe bide domandin.Li gorî vê jî wê mejiyê *Australopithecus*yan wê bi kok, destî û giştîya wê re wê ji yê meynunan pêşketîtir û rabûyîtir a. Di rewşek vertîkal de ya.

Bi demê re wê pêçenokên mejî, wê bi demê re wê zêdebûn wê di wan de wê çê bibê. Ev pêçanok, di aslê xwe de wê bi rewşa pêşketina beşên mejî ve girêdayî wê xwediyê wateyekê jî bin. Di vê çerçoveya fahmkirina wan pêçenokên mejî de wê, rewşa beşên mejî û têkiliya wan ya b hevdû re a simetrikî û her wusa bi demê re pêvajoyên pêşketinê ên ku mejî ew bûhûrandina, mirov bi wan re wê dikarê wê werênê li ser ziman. Mirov, nikarê vê rewşê tenê bi mazinbûna hacmê mejî ve girêdayî wê werênê li ser ziman. Ev rewş hemû wê bi hevdû ve girêdayî bin. Beşên mejî pêşketina wan, wê her wusa wê temenê ji hevdû cudakirin, têkilîdanîn, dîtin, bihîstin û hwd jî wê biafirênê. Di beşa anîya mirov a rastê de wê di hundûrê

wê de ku ew kevî wê, di her têkilîya zayendî de wê bandûrbûna li wê, wê bandûreka mazin wê li wê hebê. Ev kevîya mejî, wê deverên ku wê li wê, wê di heman demê de wê bi mirovê hemdem re wê cihê ku wê êşên weke yên ´mîgrenê´ û hwd jî ku wê derkevina li holê bin. Di her rewşa zordayînê de wê, ew êş, wê xwe bidê dîyarkirin. Homonîd, wê di nava wan de jî wê têkiliyên zayendî wê hebin. Her wusa, rewşa li berçav a Australopithecus´yan, wê di vê rewşê de wê, bi mejiyê wî re wê têgînên pêşketî wê bide me.Piştre jî wê di dewama wê de wê, rewşa ku wê were dîtin ku wê bi cûreyên weke homo habilîs, homo erectus, Homo floresiensis û

----------

(*)Ausralopithecus wê, cûreyê piştî yê afrikanus bê. Wê di nava wan de wê pêvajoyek derbasbûyî wê hebê. Her çendî ku wê herdû jî wê tam meymsî jî bin lê wê, ew jî wê, bi xwe re wê pêvajoyê wê derbas bikin. Wê gûharînên ku wê bibin wê di warê laşî de wê bibê. Minaq wê destên australipitcus wê ji yê afrikanus wê kintirbin. Wê gowdeya wî hin bi hin wê bi ber mazintirbûnê ve wê herê.

hwd de wê bi awayekî pêşketî wê pêşketina wan, wê di dewama ya Australopithecus´yan û hwd de wê xwe bide dîyarkirin. Bi awayekî mihtemelî, mirov dikarê vê jî bibêjê ku wê weke homo habilîs, homo erectus, Homo floresiensis û hwd, wê mejiyê Australopithecus´yan jî wê di wê de wê temenê derxistina dengna bi ermanca têkilîyê ku wê di nava wan de wê were danîn hebê. Nîşanakên ku ew ji **Australopithecus´yan** hena, vê yekê didina nîşandin ku ew bi wan re heya.Piştre jî wê ev rewş, wê pêşbikevê. Wê qalîteya wê zêdetir bibê bi pêşveçûnên di mejî de ku ew dibin re.

Di rewşa fahmkirina rewşa Australopithecus´yan de wê, rewşa fahmkirina wan, wê bi awayekî wê têgînê di mejiyê mirov de wê, bide çêkirin ku ew jî wê weke homo habilîs, homo erectus, Homo floresiensis û hwd, wê di mejîyê wan de wê beşên deng derxistinê wê hebin. Her wusa bi wê re mirov dikarê di dewama wê de wê werênê li wer ziman ku wê dengna jî wê karibin bi armanca têkilîdanîna bihevdû re ew derxin. Her wusa, ew deng, wê di nava wan de wê, weke dengên têkilîyê bin. Em ku wê serdema homo habilîs, homo erectus û Homo floresiensis ku em li wan dinerin, em bi wan re wê dibînin ku ew dengna ku ew bi wê têkilîyê didênin û hevdû dipejirênin wê derxistin. Di vê çerçoveyê de wê cûreyê wan ê têkiliyê wê wan re wê hebê. Ev rewş, wê piştre wê, bi pêşketinên li ser mejî re ku me hinekî li jor bahse wan kir re wê, hebûna xwe wê bi pêvajoyên pêşketinê re wê bide domandin. Di serdemên piştî homo habilîs, homo erectus, homo floresiensis û hwd de wê, heta ku wê dem wê were serdema homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd, wê ev pêşketin û pêvajoyên wê, di awayekî pirr zêde pêşketî û bi astek bilind wê xwe bidina dîyarkirin û derxistin li holê. Her wusa, rewşa têkilîya mirovê homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê, mirov wê dibînê û kifş dike ku ew bi wan re pirr zêde pêşketîya. Heta ku di mejî de ketina pêvajoya girtinê de jî wê hin bi hin wê bibê.

Rewşa jîyane komî ku ew pêş dikeve û mirovê demê ê homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê ku ew wê dijîn, wê bi wê re wê ya ku wê were dîtin wê ew bê ku ew pêşketina wan ya bi mejî re wê, pirr zêde wê li pêş bê. Wê di mejiyê xwe de wê karibin, wê rewşan bi mêylî wan bidina nîşandin. Mêyl û ankû mêl, çendî ku ew aliyekî wê yê bi aqilî wê hebê jî lê wê, bi zêdeyî di çerçoveya hebûna zindîyî de wê, temenekî wê yê ajoyî ê hebûnîya zindîyî jî wê hebê. Minaq, naqandina ku wê kîjan sawalê nêçîr bike û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê rastîyê bi xwe re wê piştrast bike û wê werênê li ser ziman. Mirovê demê ê weke homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê, wê di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rewşek giring a ku mirov wê hilde li dest bê. Her wusa di vê çerçoveyê de em î ro, ku em bahse pêşketina homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê dikin, em bi wê re bahse asteka pêşketinê dikin. Di mejîyê wan de wê, beşbûna di mejî de wê pêşketî bê. Wê têkilîya di nava beşên mejî de wê bi rastûçap wê pirr zêde û bi awayekî pirr alî wê pêşbikeve. Li gorî pêşveçûnên bi pêşketinê re wê ew pirralîbûna di pêşketinê de wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku pêşketinên di jîyanê de wê, her yekê di mejiyê mirovê demê ê homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê û hwd de wê, pirr zêde wê bandûra wan hebê. Pêşketinên jîyanî û ên mejîyî wê bi hevdû re wê di ahengekê de wê bibin û wê pêşbikevin. Mejî, wê dema ku wê mirovê demê homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê û hwd, ew tiştekî dijî, wê mejiyê wî, di wî de w hîskirinekê wê bi wê re wê bijî. Mejî, dema ku ew van pêşketinan bi xwe re ew dijî, wê bi wê re jî wê ji aliyê fîzîkî û fîzyolojikî ve wê pêşveçûnên bingihînî wê di laşê mirov de wê bide çêkirin. Serdema mirovê homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê û hwd, wê serdemek bûhurîner jî bê. Di vê çerçoveyê de jî mirov dikarê wê hilde li dest û wê fahm bike.

Di vê serdemê de wê beşên mejî ê mirovê demê homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê û hwd, wê di rewşa dîtin, girtin, bêhnkirin, tahm û ankû têjkirin, bihîstin û hwd de wê pêşketî bê. Bêhkirin, wê aliyekî wê giringî ê ku ew mirov dide girêdan wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê mirovê demê wê di vê demê de wê li ser bêhnê re jî wê bidest pêşketina xwe wê bike.

Di rewşa morfolojîya xwarinê de wê mirovê demê homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê û hwd, wê bi xwe re wê pêşketinên bingihînî wê bidina çêkirin. Her wusa rewşa xwarinê, wê di wê de pêşketin û pêşveçûnên ku wê bi xwe re wê bide çêkirin wê, mirovê demê wê ji aliyê fîzîkî û fîzyolojîkî ve jî wê di laşê wî de wê gûharînan wê çê bike. Hin bi hin wê mirovê demê homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê û hwd, ew çendî ku ew bi jîyane xwe re ew dijîn û pêde diçin, wê rewşa rengê xwarinkirinê weke ya sawal û jîndîyên di nava xwezayê de ku ew hena, wê ji wan dûrbikeve. Bi kifşkirina qalandin û pijendina goşt, minaq li ser êgir, wê weke şoreşekê bê. Mirovê demê, wê li ser van pêşketinan re ku ew di jîyane xwe de dikê re wê, gûharînên ku ew bijî, wê weke gûharînên dawî ên ku wê wî ji jîyane xwezayê a sawalgerîyê wê dûrbike û derxê bê.

Bi wê re jî wê, di rewşa çêkirina xwarinê li ser êgir de wê, dema ku mirovê demê ew goşt û hwd dixwar, wê di laşê wî de wî ew jî wê gûharînê bide çêkirin. Xwarina goştê ne qalandî û pijendî, wê di mihandin û serifandina wê de wê, zik û laş di rewş, qaym û qaysekê de bê. Lê piştî ku ew rewşa li ser êgir qalandin pijandina goştê nêçîra xwe ya ku mirovê demê ew kirîya ku ew çêkir û bidest xwarina wê kir û pê de wê, rewş, qaym û qaysa laş jî wê bigûharê li gorî wê rewşa goştê qalandî û pijendî li ser êgir. Goştê sawalan ê qaland û pijendî ê li ser êgir, wê zûtirîn wê were mihandin û serifandin di zik de. Di rewşa çûtinê û hwd de jî wê, bi rewşa qirikê û hwd re wê gûharînan wê bi xwe re wê werênê. Piştî ku mirovê demê wê fêrî van rewşan wê bibê jî wê, weke ku wê bikeve rê û rewşek bêveger de. Wê êdî wê hin bi hin wê tenê karibê goştê qalandî û pijendî li ser êgir wê bixwê.

Mirovê demê, di vê çerçoveyê de wê di rewşa xwe ya xwarinê de jî wê pêşveçûnên giring wê bi xwe re wê bijî. Ev rewş, wê gûharînên mazin wê di mejî de wê bi xwe re wê werênin.

Di mejî de wê rewşa nû, wê xwe li gorî wê biafirênê. Ev jî wê, bi wê re wê mirov, wê hin bi hin wê bi wî re temenê çêkerîyekê bê. Minaq, li ser êgir, çêkirina goşt, wê di aslê xwe de wê, di vê çerçoveyê de wê rewşeka ku wê, mirov bi mirovtiya wî re wê biafirênê bê. Mirovê demê, wê van rewşan wê bi xwe re wê pirr zêde wê êdî wê bijî. Ev rewş, wê ji aliyekî din ve jî wê di rewşa zelalkirina rewşan di mejî de û ji hevdû vaqatandina rewşan di mejî de jî wê, temenê rewşeka bi pêşketina mirovê demê re bê. Her wusa, ew rewşên weke di nêçîrkirinê de ew bikarhanîna amûran, goştê nêçîra xwe ya ku wî kirî li ser êgir sorkirin, di komê de ew xwe weke endamakî komê, dîtin û bi wê rengê tevgerîn û hwd, wê xosletna teybet ên mirovî bin. Ev xoslet, wê destpêka wan hebê. Piştre jî wê, di dewama wan de wê pêşxistin û li wan zêdekirina xosletan û hwd re wê pêşketina wan wê bê dayîn domandin.

Mirovê demê homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê û hwd, wê di van waran de wê di rewşek teybet de wê bijîn. Xate peresendinê a mirovî ku ew heta wê demê ew hatîya, wê di vê demê de wê pêvajoyna giring wê bi avêtina gavên mazin re wê bide jîyankirin. Têkilîya nava nêçîrkirin û xwarinê de wê, di navbera wan de wê têgîna li ser êgir sorkirina wê, wê êdî wê were bicihkirin. Wê ji wir û pê de wê, nêçîrkirin, li ser êgir sorkirin û piştre xwarin wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê di rêzekê de wê gavavêtin wê hebê. Di rewşa xwarinê de wê, pêşketinên bi rewşa xwarinê re wê di laş û fîzîka mirovê demê de wê jî ya mirov dizanê wê zêdetir jî wê pêşketin wê xwe bi fîzyolojîkî wê bide çêkirin. Her wusa, ji dev, ziman, dinan, hinavên hundûr weke mahdê, zik û ankû ûr, rovîyên hinavên mirov ên xwarin û avêtina derve û hwd, wê di wan de wê pêşketin û gûharînên mazin wê xwe bidina dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê, pêvajoyek ku ew kin lê ku wê di wê de wê pirr zêde wê gûharînên mazin û mejûyî wê bibin wê bi vê rengê wê pêvajoya pêşketina xwarinê wê hebê. Wê di pêvajoya dest bi xwarina germ a weke goştê li ser agir sorkirî kirin, wê rewşa fîzyolojikî a mirovê roja me, hema bêja wê bi xwe re wê derxê li holê. Bi wê re jî wê di mejî de beşên têjgirtin û ankû tahmkirinê, bêhnkirinê, xwestinê, dîtinê, bihîstinê, naskirinê û hwd de wê pêşveçûn wê bibin. Wê têkiliya van beşan wê a bi hevdû re wê zêdetirî wê bibê. Em li vir, vê yekê jî wê di dewama wê de wê bibêjin ku wê çendî ku wê di dema mirovê demên bûhûrî ên weke Australopithecus´yan, piştre homo habilîs, homo ergasterîn, homo erectus, homo floresiensis û hwd de wê ew beşên mejî û beşbûna mejî wê, bi wan re bi pêşketina wan re wê hebê jî lê wê rewşên weke simetrîkî a bi têkilîya mejîyî a bi hevdû re wê pêşneketî bê. Di serdemên piştre heta ku wê dem wê were mirovê

demê ê weke homo sapîens, neandeertal, mirovê şanîdarê û hwd jî wê, ev rewşên mejîyî wê hin bi hin wê pêşbikevin bin.

D nava rewşa jîyane mirovê demê ê weke homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd de wê, ev rewşên bi pêşketina mejîyê wan re ku wê pêşbikeve wê, temenê pêşketina wan ya demkî a bi wan re wê biafirênê. Ew wê, li ser wê re wê pêşketina xwe wê bijîn. Mirovê demê, wê weke mirovê ew hin bi hin bi xosletên xwe pêş dikeve bê.

Li vir, weke ku me hinekî li jor jî hanî li ser ziman wê jîyane komî wê pêşketî bê. Têgîna komîtîyê, wê aliyekî wê yê bi pêşketina mejî re jî wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê ew alimîna mejî û hwd, wê mejî wan di xwe de bi pêşketina xwe re wê bijî. Her wusa, wê weke ku me, dîsa hinekî li jor hanî li ser ziman nifşê mirovê demê ê şikeftê ku ew di nava jîyane komê de hatîya dunyê û fêrî jîyane komê bûya wê, ew di vê çerçoveyê de wê xwediyê wê rengê pêşketinê bê. Pêşvçûna ku wê di mejiyê mirovê nifşê mirovê şikeftê de ku ew dibê, ku mirov karîba ku mirov wê di cihê wê de wê bidîta û lêkolîn bikira û fahm bikira, mirov wê ew asta pêşketinê a bi wê re ku ew afirîya mirov wê ew jî bi rewşa wê ya fîzyolojîkî re wê biheta dîtin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê rastîya wê biheta dîtin ku mejiyê mirovê demê ê şikeftê di rewşek çawa de ew pêşketîya. Yan jî ew, dema ku ew ji komê dûr dikeve çi ji mejiyê wî tê, wê ew jî wê bi wê re wê biheta dîtin.

Gûharînên mejî, wê weke gûharînên bingehînî bin. Mejî wê wan di xwe de wê pirr baş wê bijî. Di vê çerçoveyê de wê rewşa mejiyê mirovê dihizirê homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê rewşa wê ya simetrîkî wê pêşbikeve. Wê têkiliya li ser beşan û bandûrbûna wan a ji pirr alîyan ve wê zêdetirî wê xwe bide dîyarkirin.

Li vir, divê ku mirov li rewşa fîzîkî ya bi pêşketina jîyanê a ku ew pêş dikeve û mirovê demê wê bi xûy, tevger û kirinan re wê dide nîşandin, em divê ku wê bi rewşa pêşveçûnên mejîyî ê mirovê demê re wê hildina li dest. Ev wê bi hevdû re wê di ahengekê de wê bibê. Têkiliya di mejî de a di nava beşan û her wusa rewşa bandûrîya wan a li ser hevdû, wê di rewşek pirr alî de wê di mejî de wê xwediyê rengekî pêşketinê bê. Giringîya herî mazin a bi pêşketina mirovê demê re ku wê pêşbikeve û mejî wê bidest girtinê di xwe de bike wê, bi rewşa têkiliya simetrîkî a hundûrê mejî re bê.

Di rewşa pêşketina mirovê hemdem ê dihizirê homo sapîens, neandetal û mirovê şanîdarê de wê, rewşa hebûna jîyane di şikeftê de û her wusa rewşa bûhûrîna jîyane nifşên wê di nava jîyane komê de re wê, rengê pêşketina wî ya demê wê bi xwe re wê bide nîşandin. Şert û mercên xwezayê ê demê wê di wan de wê gûharînên mazin wê bibin. Piştî dawî lê hatina dema dawî a mazin ya qaşayê, wê bi wê re wê rewşek pêşketinê a nû wê derkeve li holê. Wê di birehê de wê gûharînên mazin wê bibin. Her wusa parzînîna ku ew wê di birehê de wê bi tirêjên rojê ên ku ew dihêna li dunyê re ku wê bibê, wê ew jî wê rewşa jîyane roja me wê biafirênê. Stûrbûna hastûyên mirovê berê ên weke homo habilîs, homo erectus û hwd, wê rewşek bi vê rewşa hewayê a demê ve girêdayî bê. Ji dema homo erectus û homo floresiensis û hwd ve wê hin bi hin wê ew stûrbûn wê bi ber tenikbûnê ve wê herê. Piştre jî ji xwe wê, bi demê re wê ew gûharîn, wê zêdetir bibê. Piştre jî ew şînahîyên roja me ku ew dibin, wê temenê bûyîna wan wê biafirê. Rewşa hewayê, wê di vê çerçoveyê de wê di rewşa wê de wê bandûra wê zêde wê hebê. Li vir, em di dewama wê de wê jî wê bibêjin ku wê bi rewşa hewayê û ya hebûna zindîyan û gûharînên di wan de ku ew dibin, wê bi hevdû re wê di ahengekê de wê bibê.

Di rewşa mirovê demê ê weke homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd de wê rewşa xwezayê wê pirr zêde wê xwediyê rewşek giring bê. Di dema wan de wê, serdema qaşayê dawî lê hatibê. Wê herêmên ku ew di bin qaşayê de na, ew jî wê qaşaya wan bihalihê û wê li wan temenê şînbûna jîyanê wê pêşbikeve. Wê bi wê demê re wê herêmên ku wê qaşa li wan bihalihê, wê daristan û hwd wê bi awayekî gûrr wê pêşbikevin. Zêdebûna halîna qaşayê wê, bandûra wê ya li birehê wê, li ser dûkelîya ku ew tîrêjên rojê didina avê û ew pêşdikeve re wê bibê. Ev jî wê rewşa jîyanê, pêşketina zindîyan, şînîyan û zindîyên yekşaneyî û zindîyên pirrşaneyî û hwd wê bide pêşxistin. Di nava axa li ardê de wê zindî wê biafirin. Ev jî wê rewşeka ku wê weke encama wê rewşê bê.

Di vê çerçoveyê de wê çendî dema qaşayê wê dawî li wê were, wê di vê çerçoveyê de wê temenê pêşketinê wê bibê. Mirovê demê homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê û hwd, wê di nava rewşek bi vî rengî de wê di nava van şert ûmercên hewayî û jîyanî de wê pêşketina xwe wê bijîn. Jîyane wan ya bi xwezayê re wê pirr cûdabê. Her wusa, wê di nava daristanan de bê. Wê ji herêmên qaşayê zêdetirî wê

herêmên daristanî, ardî û hwd wê bibînin û wê li wan bijîn. Li deverên ku ew dijîn, wê li wê ew wê bikin ku jîyane xwe ew hilbijêrên. Piştî ku herêmên qaşayê halîyan û herêmên ji jîyanê re vebûn, wê mirovê demê ê weke homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd, wê bikin ku ew li wan vebin. Ew herina wan deveran. Lê ev wê hinekî zor bê. Ber ku wê gelek herêm, wê di bin tirêjên rojê de wê weke ku ew zûwa bin. Mirovê demê wê aqil nekê ku ew wê avê ji kûderê wê bibînê. Bo vê yekê, wê gelek rêwîtîyên wan wê nîvcû û ankû nîvrê wê bimênin. Ber vê yekê, wê bi demê re wê ev yek were dîtin ku ew li devera ku wê av li wê hebê û ankû di herikê weke herêmên ber çemê firatê ku ew di wê demê de wê weke deryayekê gûrr û bilind wê biharikê wê jîyane xwe wê di şikeftan de wê bijîn. Li van herêman, ku wê li aliyekî wan av û aliyekî wan daristan bin ku ew herin û di wan de nêçîrê bikin û hwd bê.

Di rewşa jîyane demê de wê, gelek jîyanek bi cihêrengî wê pêşbikeve. Wê rewşek, pirr zêde mazin wê pêşbikeve. Wê gelek cûreyên sawalan wê biafirin. Wê xwe bidina dîyarkirin. Cûreyên sawalan ku ew bikerîyî dijîn di nava wê jîyane daristanî de wê, mirovê demê wê bi nêçîrkirina ji wan kerîyan, wê jîyane xwe wê karibê bide domandin. Di vê çerçoveyê de wê çawa ku wê di nava xwezayê de wê kerîyên sawalan û garanên sawalên mazin ên weke ga û hwd, wê hebê, wê mirov jî wê bi komî, di şêwayekî ne dûrî wê de wê bijî. Lê farqe mirovê demê wê bi pêşketina wî ya bi mejiyê wî re bê. Ew wê, bi aqilê xwe re wê, pêşbikeve. Wê di jîyane xwe de wê, weke zindiyekî ku ew nêçîrê dike. Di nêçîrê de ew amûrên nêçîrkirinê bikardihênê. Xwarinê hin bi hin fêrî wê dibê ku ew wê li ser êgir çê bike û hwd. Ev rewş, wê wî ji nava wê jîyanê dûr bike. Wê weke zindiyekî ku ew di wê xwezayê de ew bûya bê. Mirov, wê weke ku ew xwe dibînê wê xwe tefkîr bike.

Mirovê demê wê bi jîyane xwe ya şikeftê re nifşên ku wî bi komî li ser wê re bûhûrandina, wê wî bike rewşek pirr zêde pêşketî de. Her wusa, jîyane wî, di çerçoveyek komî de wê zêdetirî bigihênê tevger, kirin, xoslet û xûyan.Di vê çerçoveyê de wê rewşa komî, wê çendî ku wê bi wan re wê di vê çerçoveyê de wê ji aliyê derve wê bi xûy, kirin, tevger û xosletên wan ên ku pêş dikevin re wê pêşbikeve, wê biheman rengî wê di mejî de jî wê ji aliyê fîzyolojikî ve wê pêşveçûnên wê yên giring ên ku mirov wan li ser fîzyolojîya mirovê demê re wê fahm bike wê, pêşbikevin. Di rewşa jîyane mirovê demê a komî de wê di vê çerçoveyê de wê rewşa pêşveçûnên bi jîyane komî, xosletên weke nêçîrê, bikarhanîna agir bo xwe germkirinê û piştre li ser wê agirê bidest çêkirin(pijandin)a goşt û hwd, wê, bi wê re wê pêşbikeve. Mirovê demê, wê van aliyan, wê bi xwe re wê zêdetirî pêşbikeve. Mejiyê mirovê demê wê di xwe de wê bi awayekî simetrîkî wê bikeve têkilîyê li ser beşên wê yên ku ew pêşketina re. Di aslê xwe de ya ku wê, herî zêde wê weke pêşketina wî ya dîrokî bê, wê ev rewş bê. Ev jî wê weke aliyna ku mirov bi teybetî wê hilde li dest bê. Weke ku wê çawa ku mirov, wê di jîyanê de wê fêrî têkilîyê di nava xoslet û kirin, tevger û xûyan de wê dênê bê, wê bi heman rengî ew rengê têkilîdanînê wê di mejî de jî wê di nava beşên mejî û hwd de wê hebê û wê bibê. Minaq, çêkirina bivirkekî bi destî, di çêkirina wî bivirkî de destî û kevirê weke bivirk ku ew dihê bikarhanîn, hatina cem hevdû bi hev ve kirina wan, wê hem ji aliyê mejî ve wê weke rewşek xosletî û têkilîdanê bê û hem jî wê di jîyane wî de wê weke rewşek teknîkî a bi aqil ku ew hatî pşxistin a ser rewşa bihevvekirinê re bê. Jîyan û pêşveçûnên wê û pêşketinên di mejî de wê bi hevdû re wê di ahengekê de bin.

Di rewşa vebûna mirovê demê li qadên ku qaşaya wan halîya ya û nevegerîna wan, piştre jî ew fêrbûna wan ya li deverên ku wê li wan av û temenê nêçîrkirin û hwd ku ew karibê bi wan xwe û jîyane xwe bide domandin wê hebê ku ew xwe li wan digirê, wê rengê pêşveçûnên demî bin. Çûyina li rêwîtîya li wan qadên nû ên ku qaşaya wan halîya ya û ew arda wê zûwa û hişka, wê piştre wê mirovê demê wê li wan wê jîyane xwe wê pêşbixê. Di aslê xwe de ew ku ew bixwezê ew vegerihê jî wê nikaribê ew vegerihê. Ber ku ew wê bi ser rêya xwe ya vegerînê ve wê nebê. Gelek qûtbûnên ji komê û ankû ji deverên ku ew komên wan li wan dijî û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê pêşbikevin. Bi demê re wê, têgîna nasîn û bi servebûyîna li cihê ku ew li wê dijî wê pêşbikeve. Mejî, bi rewşa wê ya ku ew têkiliya nava wan beşên wê de xortbûya, wê temenê wê, li ser wê têkiliyê re wê zûtirîn wê pêşbixê. Rewşa zû pêşketina mirovê demê wê hinekî jî wê bi van rewşên têkiliyî ê mejî ve wê girêdayî bê. Weke zindîyan, wê di roja me de jî wê gelek zindî û ankû sawal wê hebin ku ew mejîyê wan ew beşbûn di nava wê de bûya. Lê ew rewşa têkilîyî a simetrîkî ber ku ew pêşneketîya ew ji wê rewşê nikaribin bi pêşketina mejiyê xwe re derbasî pêvajoyna din ê pêşketî weke hizirkirinê û hwd, ew bibê.

Di rewşa fahmkirina rewşa têkilîyên mejîyî ên bi hevdû re wê di vê çerçoveyê de wê pêşveçûnên di mejî de wê bi pêşketina xwe re wê rewşek pirr zêde wê bidina dîyarkirin. Mirovê demê wê, di vê demê de wê di çerçoveya wan têkilîyên mejiyî wê di rewşên xwe yên dervî mejiyî de jî wê rewşên bi hevvekirinê wê pêşbixê. Weke bivirk û pêvekirina destikê wê, rim û bi rêve girdana kevirk û ankû hastûkên tûjik û hwd. Ev rewşa bi hevvekirinê wê weke rewşek teybet a bi aqil re jî bê.

Mirovê demê wê di vê çerçoveyê de wê van rewşan wê bi xwe re wê pêşbixê. Lê serdema wî ya ku ew di wê de dijî dema dawî a serdema peleolîtîkê de wê rewşa hewayê a ku ew afirîya bi gûharînên bi birehê re wê, ji aliyekî ve wê temenê wan pêşveçûnan wê biafirênê. Di rewşa pêşketin û parzînîna tîrêjên rojê di dema bûhûrîna di birehê de wê, di vê çerçoveyê de wê rewşek jîyanbar ku ew temenê jîyanê di afirênê wê pêşbikeve. Bi wê re wê rewşa şînîyan weke geya û hwd jî wê pêşbikeve. Wê daristan, wê pêşbikevin. Li gorî rewşa hewayê û gûharînên di birehê de wê rewşa jîyane li dunyê û her wusa ya şînbûnê weke şînîyan û hwd jî wê di wê de w gûharîn wê bibê. Di vê çerçoveyê zindiyên ku ew wan şînîyan dixwûn, wê bi wê re wê pêşbikevin. Di vê demê de wê zindîyên ku ew tenê bi şînîyan mazin dibin û ne zindiyên goştxwarin, wê zêde pêşkevin. Wê di hijmara wan de wê zêdebûn wê bibê. Wê bi awayekî din jî wê di cûreyê wan de wê gûharîn bibin. Di nava şînî û zindîyên goştxwar û yên goştnexwar de wê, bi awayekî vekirî wê xatek wê, di vê demê de wê pêşbikeve. Ev serdema dawî a peleolîtîkê, di vê çerçoveyê de wê weke demek giring bê.

Pêşveçûnên ku wê di rewşa dema dawî a serdema peleolîtîkê de wê bin, wê rewşa zindîyan a bi xwezayê re ku wê, piştre wê heta roja me jî wê bê jîyîn, wê pêşbikeve. Mirovê demê ê weke homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd, ew jî wê bi pêvajoyên ku wan di şikeftê û hwd de wan li ser xwe re bi nifşî derbaskirina, wê wan jî di pêvajoyek pêşketin û pêşveçûnê de wê bide derbaskirin. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê, di wan pêvajoyên di dema dawî a serdema peleloîtîkê de ku ew dijî, wê mirovê demê wê, di rewşa wî ya jîyanê de wê bigihênê astek û pîvanekê. Wê di nêçîrên wî de wê, wî zêdetir zîrek û zanetir bike. Lê di vê dema dawî a serdema peleolîtîkê de wê, hin bi hin wê tiştna din jî wê weke tevger, kirin û xûyan wê bi wî re wê pêşbikeve. Ew jî wê ew bin ku wê li şûna hertimî bi nêçîrkirinê jîyankirinê wê li sawalên li dora xwe binerê ku ew çi cûre şînîyê wê diçêrin û wê dixwûn, wê ew jî w bale mirovê demê bikişênê. Bi teybet jî, jina mirovê demê wê di vê rewşê de wê pêşbikeve. Ew, wê dema ku ew dibînê ku ew sawal wan şînîyan dixwûn û ew bi wê têr dibin û xort dibin, ew jî wê bidest tahmkirina wan bikê. Destpêka ahlkirina şînîyan jî wê di vê çerçoveyê de wê di jîyane mirovê de wê, li ser rewşa morfolojîya xwarina wî re wê xwe bide dîyarkirin û pêşxistin.

Bi demê re wê li dora şikeftên ku ew kom di wê de dijîn de wê, sawalên weke sa, dêlegûr û hwd, wê rûbidin. Mirovê demê ew dema ku wan sawalan nêçîr dikê û goştê wan dixwê û hastûyên wan bidest avêtinê dike, wê ew hastû, wê li dora komê wê temenê civîna van cûreyên sawalan jî wê hin bi hin wê biafirênê. Sawalên ku ew zêde fêrî komê dibin, ewên ku ew bizêdeyî hertimî li şûna xwarina komê, wê werin û wê bixwûn û wê vê rewşê wê bi xwe re wê bidomênin bin. Temenê ahlbûna sawalan li dora wê jîyane komî jî destpêka wê, di vê çerçoveyê de wê bêavêtin û wê pêşbikeve.

Di nava rewşa jîyane komê de wê rewşa jîyane mirovê demê, hin bi hin wê pêşdetir wê herê. Wê xosletên komî û girêdanîya bi komî, wê zêdetirî wê pêşbikeve û wê derkeve li pêş. Girêdanî, wê di temenê wê de wê tûxmîtî, xizmtî û girêdanîya bixwûnî wê hebê. Ev temen, wê piştre wê hin bi hin wê pêşbikevin. Bi demê re wê kom, wê pirr mazin bibin. Di nava komê de wê bi rewşa zêdebûna mirovan bi hatina wan ya li dunyê re wê bibê. Rewşa komê, çendî ku wê mazintir wê bibê, wê bi wê re wê di aslê xwe de wê rewşên nû wê di nava jîyane komê de wê hin bi hin wê rûbidin.

Rewşên ku wê nû xwe dinava jîyane komê de wê bidina dîyarkirin, wê di çerçoveya jîyane komê de bê. Di nava komê de wê, têgîna mêtiyê û ya nêrtiyê wê bi dîtînî wê were li pêş wê were dîtin. Her wusa, di nava komê de wê, ev rewş, wê zêdetirî wê pêşbikevin. Mêr di nava komê de wê weke aliyê nêr, wê zêde barrî bê. Ew barrîbûna wî, hertimî bi çûyîna wî ya nêçîrê û bi wê re li derve mayîna wî û hwd re wê xwe bide nîşandin. Aliyê ku wê weke aliyê komî ku ew zêde nebarrî ya, wê alîyê mê û ankû aliyê jin bê. Ew jî, wê ji ber rewşa xwe ya hanîna zarokê li dunyê, nexweşîyên ji ber wê ew dijî û hwd re wê, derfeta zêde gavavêtinê wê zêde nemênê. Weke ku mirov bi xosletên nifşê mirovê şikeftê ê komê re dibînê wê ew li dora wê dayika xwe wê hem ber têkiliyên zayendî û hem jî wê ber rewşên din ên komî û hwd, wê ew zêdetirî wê were girêdan.

Di rewşa jîyane komê de wê pêşveçûnên ku wê di dema dawî a serdema peleolîtikê de dibin, wê li ser rewşa komê, zêdebûna bi komê û hwd re wê temenê girsebûnê wê bide pêşxistin ku ev wê temenê afirandina xosletên civaktiyê û pêşxistina wê bê. Pêşveçûnên ku wê li ser rewşa jîyane komî û zêdebûna wê re ku wê bibin, wê di vê çerçoveyê de wê pêşveçûnên giring bin. Mirovê demê wê, di vê demê de wê bidest nasîna xwezayê bike. Wê bidest nasîna cûreyên şînahîyê xwezayî bike. Em li vir, vê yekê jî di dewama wê de wê werênina li ser ziman ku wê rewşa ahlkirina şînîyan bi nasîn wan re wê heta destpêka dema navîn a peleolîtîkî û dema dawî a peleolîtîkê wê herê.

Di rewşa têgîna nasînê de wê, her wusa wê bi dîtina bi çavî û pêşketina wê, wê zêdetirî wê pêşbikeve û wê derkeve li pêş. Di nava wê xwezaya ku ew mirovê demê di nava wê de dijî de wê gelek sawal wê hebin ku ew pêş dikevin. Wê kerîyên sawalan û garanên ga û hwd wê hebin. Sawalên mazin û piçûk, wê pirr zêde wê zêde pêşbikevin. Ji xwe, têgîna pêşketina rewşên darîştanî û hwd, wê di aslê xwe de wê di serî de wê ji aliyê jîyanî ê bi vî rengî ve wê temen û rengekî jîyanî wê bi xwe re wê bide pêşxistin. Rewşa daristanan û bûyîna kerî û garanên sawalan, wê weke rewşek teybet a ku mirov wê bi teybetî wê hilde li dest bê. Di rewşa giringîya wê de mirov, dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa di rewşa jîyanî de wê temenekî mazin wê biafirênê, hin bi hin wê li wê zêdebûn bibê bi pêşketina mirov a di jîyane de re. Çendî ku wê tirêjên rojê wê di dema ku ew di birehê re derbas dikin ku ew tên parzinandin wê di wan de wê bibê, wê bi wê re wê rewşa zindiyan de jî wê bi pêşketina mirovan re wê encamên xwe wê bide nîşandin. Bi teybetî jî wê ji vê dema pêşketin û pêşveçûnê û pê de wê, li ser rewşa komê, jîyane mirov weke endamê komê, têkiliya mirov a bi zayendî a bi hevdû re û hwd re wê pêşveçûn û pêşketin wê bibin. Di rewşa vê pêvajoya pêşketinê de wê, mirov wê bi mejiyê xwe re wê bikeve pêvajoyeka wê êdî wê hertimî wê di xwe de w kifşkirinê wê bikê bê.

Di rewşa kifşkirinên di xwe de jî wê mirovê demê wê bi xwezaye xwe re wê pêşî wê hevnasînê bike. Hevnasîna di nava xwezayê de wê mirovê demê wê bigihênê astek bilind. Nasîna xwezayê, cûreyên sawalan, şênîyan ku pêş dikeve û hwd, wê weke aliyna giring bin ku mirov wan di vê demê de wê hilde li dest bê. Ji dema navîn û a dawî ya serdema peleolîtîkê ve wê mirovê demê wê di aqilê xwe de wê pêşveçûnên dîrokî wê bi jîyane komî re wê bijî. Wê xweza jî wê bi demê re wê gûharînên mazin wê derbas bike.

Bi teybetî, em dema ku bahse vebûna qadn jîyanê zêde bikin, em divê ku wê serdema peleolîtîkê bigiştîya wê re wê hildina li dest. Di vê çerçoveyê de wê hin bi hin wê kaş û çîyayên qaşayê wê bihalihin. Wê bi wê re wê qadên jîyanê ên berfireh wê vebin. Bi wê re jî wê rewşa pêşketina çem û herîkîna wan, wê zêde derkeve li pêş. Weke ku em li dora çemê firatê bi kifşkirina nîşanakên wê re wê kifş dikin, wê di demên pirr zû de wê temenê jîyanê wê li wê pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de jî wê mirov wê xwe li wê bigirin.

Di nava jîyane komê de wê, nirxbûn wê pêşbikeve. Wê rêgezên jîyanî ku wê hin bi hin wê mirovê demê wê li gorî wan bijî wê temenê wan bidest afirîna xwe bike. Li ser wê re wê rewşa jîyanê wê bi pêşveçûnên nû ên ku wê weke li ser aqil re bin, wê xwe bide domandin. Di rewşên nêçîrê, bikarhanîna agir û hwd de wê, zêdetirî wê bikarhanîn wê bibê.

Rewşa jîyanê komî a ku ew pêşbikeve, wê hin bi hin wê rewşên nû wê bi nifşên nû re wê xwe bide nîşandin. Wê pêşveçûnên nû wê bibin. Rewşên wê weke rewşên jîyane komî ku wê weke rewşên ku ew nebin wê nebê, wê pêşbikevin. Di vê çerçoveyê de wê rewşên jîyane komî wê pêşbikeve. Mirovê demê wê bidest bikarhanîna hîs, hêst û aqilê xwe bikê. Bi demê re wê ev pêşbikevin. Wê mirovê demê wê di van demên dawî ên serdema peleolîtîkê de wê bidest çêkirina xwarinê li ser êgir weke pijandin û ankû sorkirna goşt û hwd, wê bike. Ev jî wê, gûharînên bingihînî wê di hebûna mirovê demê de wê bi xwe re wê werênê. Li gorî wê jî wê, mirov wê pêşveçûnan bi pêvajoyên wê re wê di jîyane xwe de wê bijî. Ev jî wê weke rewşna teybet ên ku mirov divê ku wê hilde li dest bê.

Pêşveçûnên fîzyolojikî ên ku wê piştî rewşa pêşketina bi rewşên xwarinê re ku wê bibê re wê, bi xwe re wê rewş, şert û mercna nû wê bide hanîn derxistin li holê. Her wusa, mirov, wê fêrî wê bê ku xwarin kelendî û ankû li ser êgir sorkirî ku ew çawa di dev de zû ji hevdû belav dibê û ankû di zikê mirov de wê zûtirîn wê were mihandin û hwd, wê bi wê re wê gûharînan wê bijî. Di rewşên weke dev, lêv, dinanan, ziman û hwd de wê gûharînan wê bi xwe re wê werênê. Rewşa xwarina çêkirî wê di muskulatûrên qirikê

de jî wê hinek bandûrê wê hebin ku wê ziman zûtirîn herê û were. Ev jî wê, di rewşa derxistina dengan û hin bi hin ku wê bi wê temenê axiftinê wê bi wî re wê çê bike, wê bi xwe re wê werênê.

Pêşî, wê deng wø werina derxistin li ser rewşan re. Wê dema ku ji rewşek agir û hwd ku deverek mirovekî şawitî wê deng derxê. Dengê wê rewşê çawa ya, wê ji aliyê yên li dorê û wî bixwe ve jî wê were qaydkirin. Bi vî rengî wê dengên ku wê werina derxistin wê hin bi hin wê zêde bibin. Bi demê re têkilîya wan deng û wan rewşên ku ew li ser wan re ew hatina derxistin û hwd, wê bibina temenê salixkirina wan dengan. Wê piştre wê, dema ku ew rewşên agir hatina dîtin, wê ew deng wê werê derxistin. Mejiyê mirovê demê wê, di vê çerçoveyê de wê, dema ku ew bidest têkilîya nava rewş û dengan de ku wê danî, wê bidest salixkirina wan dengan bike. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa salixkirina dengan wê temenê wê biafirê. Têkilîya di nava rewşan de ku ew dihê danîn, wê temenê pêşketina biaqilî bê. Minaq, dema ku mirovê demê ew diçê nêçîrê, ew wê tefkîr bike ku ew bi rim û ankû bicivirkê xwe de wê, nêçîrê bike. Dema ku wî nêçîrkir, wê tefkîr bike ku ew wê nêçîra xwe werênê şikeftê û bi yên li şikeftê weke jin û zaroyan re parve bike. Di vê çerçoveyê û rengê de wê, rewşên ku ew têkilîya wan bi hevdû re ew hatîya danîn wê hin bi hin wê zêde bibin. Mejiyê mirov, dema ku wê têkilîyê didênê, wê hingî bidest pêşketina xwe ya bi xwe re wê bike.

Di rewşa pêşketina têkilîyan a li ser rewşan a bi hevdû re de wê, di vê çerçoveyê de wê hin bi hin wê rewşên nû wê pêşbikevin. Mirovê demê, wê di vê çerçoveyê de wê, bi aqilê xwe re wê hin bi hin wê bidest jîyankirinê bike. Bi wê re jî di dewama wê de em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman, wê hin bi hin wê xwe bi rewşa xwe ya heyî re wê bibînê. Wê ew rewşa wî ya ku ew hin bi hin wê bi xwe re wê kifş dike, wê temenê wê jî bike ku ew xwe ji dunya sawalan û zindîyên cûda bike jî bê. Bi kifşkirina xwe re wê beyenîbûna wî ya ji rewşa xwezayê û nava sawalên din wê pêş bikeve bi wî re. Bi wê re jî wê li ser aqilê xwe re wê, pêşketina xwe bide domandin. Di vê çerçoveyê de wê dema ku ew dikeve rewşek û rêyek bi vî rengî de wê, di dewama wê de wê çendî ku wê biaqilê xwe pêş dikeve wê, pêşketinê bi xwe re wê di jîyane xwe de wê bide çêkirin.

Ji vê pêvajoyê û pê de wê, her pêşveçûn wê li ser aqil re wê zêdetirî wê xwe bide nîşandin. Aqilê mirov, wê bi demê re wê pêşketina xwe wê zêdetirî wê bide dîyarkirin. Rewşa gûharînên ku wê bi fîzyolojîkî û mejîyî wê bi mirov re wê çê bibin, wê mirov bi rewşa wî ya nû ve wê li pêşketîna wî, wê bide honandin. Çareya jîyan û domandina hebûna xwe, wê bi pêşketina xwe re bê. Hin bi hin wê, ev jî wê, bi xwe re û wê bi jîyane xwe re wê bide domandin.

Pêşketina mirovê demê bi vê rengê re wê, di aslê xwe de wê hin bi hin wê temenê destpêka demek nû jî bê. Rewşa ku wê weke rewşa dawîya serdema peleolîtîkê jî wê mirov, karibê wê vê rewşê jî wê bi pêşketina wê re wê werênê li ser ziman. Serdema peleolîtîkê wê ji aliyê pêşveçûnên dawî ên di birehê de û bi halîna çîyayên qaşayê ên dawî û bi wê re wê bi afirîna daristan û pirr cûreyên zindîyan di nava wê de wê, weke destpêka demek nû bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê di dema dawî a serdema peleolîtîkê, bi serdema mezolîtîkê re di heman reng û rewşê de wê hilde li dest. Di vê çerçoveyê de wê, ev dema dawî a serdema peleolîtîkê û dema mezolîtîkê û hwd, wê weke demekê wê xwediyê wateyekê jî bin. Di vê demê de wê êdî wê mirovê dihizirê wê derkeve li pêş.

Serdema mezolîtîkê, wê weke serdemeka ku wê di wê de wê ji dema komîtîya dema mirovê peleolîtîkê bûhûrîna li dema komîtîya ku wê êdî wê bi rengê civakî wê bidest pêşketina xwe wê pêşbikeve bê. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê serdema mezolîtîkê wê weke serdemeka ku wê di wê de wê, ahlkirin û kedîkirina sawalan, bikarhanîna agir di rewşa çêkirina xwegermkirinê û rewşa çêkirina xwarinê û hwd re wê, di vê demê de wê pêşbikeve. Rewşa weke ya ahlkirina şînîyan û ji wan sûdgirtinê û hwd ku ew di dema navîn û ya dawî a serdeme peleolîtîkê de wê destpê bike, wê di vê dema mezolîtîkê de wê bi rengekî zêdetir wê pêşbikeve. Serdema mezolîtîkê, wê weke serdemeka ku wê piştî dawî lê hatina serdema peleolîtîkê re ku wê pêşveçûnên ku ew di wê de bûna, wê di vê demê de wê li ser wan re wê pêşketin di jîyane mirov û xwezayê de wê bibin.

Her wusa rewşa mezolîtîkê ku mirov wê bi rastîya wê re wê fahm bike, wê weke rewşek teybet bê. Her wusa, wê serdema mezolîtîkê, wê weke serdemeka destpêkî a navber bê. Wê di wê de wê, di rewşên weke rewşên kifşkirina xwezayê û ji wê sûdgirtinê wê pêşbikevin. Di aslê xwe de wê gelek destpêkên bi rengê pêşketina civakî wê di vê demê de wê bibin. Her wusa wê di rewşa dema mezolîtîkê de wê rengekî civakî ê pirr seretayî wê pêşveçûna wê, wê di vê demê de wê hebê. Pişte jî heta ku wê dem wê were dema

neolîtîkê û pê de wê, ev pêşveçûnên dema mezolîtîkê û hwd, wê di wê de wê di astek bilind de wê pêşbikevin. Di rengê pêşketina rengê jîyane komî a mezolîtîkê de wê şêwayekî wê pêşveçûnên demkî wê li ser aqil re wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, wê temen û têgînên bi hişmendî wê, di vê demê de wê binûqûtin li mejî û destpêka wan bibê. Yanî wê di mejî de wê pêşbikevin. Di aslê xwe de wê destpêka têgînên weke anamismê û totemîsmê ku em dikarin ji demên neolîtîkê wan bidest destpêkirin, wê destpêkek wan wê di vê demê de wê bibê. Yanî, wê serdema anamismê û totemîsmê a seretayî wê di dema mezolîtîkê de wê bijî. Di dema mezolîtîkê de wê serdema anamismê û totemîsmê a seretayî, wê bên jînkirin. Di vê çerçoveyê de wê, were dîtin ku wê di aslê xwe de wê rengekî têgînî ku ew di wê demê de ew pêşketîya wê hebê. Pêvajoyên dema mezolîtîkê ku wê li ser wan re dem û pêvajo bi nifşên mirov re wê derbas bibin, wê rengekî pêşketînî ya anamîsm û totemîsmê a dema neolîtîkê jî wê, temenê wê bi xwe re wê biafirênin. Dema anamismê û totemîsmê a seretayî, wê bi bûhûrandina pêvajoyan li ser jîyane mirov û nifşên mirov re wê, nêvî bi nêvî wê seretayîtîya xwe wê li şûn xwe bihêlin, heta ku wê dem were dema neolîtîkê.

Serûwana jîyane mirov ku wê ji serdemên berî peleolîtîkê û heta serdema peleolîtîkê wê bibê, wê di vê dema peleolîtîkê de wê, bi pêşketina mirovî a dîrokî re wê xwe bide domandin. Di aslê xwe de wê, weke demek kifşkar wê serdema peleolîtîkê wê di jîyane mirov û ya xwezayê de wê xwediyê wateyekê bê. Piştre jî wê, li ser re wê piştî ku wê mirovtî bi xosletên xwe re wê di demên dawî ên serdema peleolîtîkê û hwd re wê pêşbikevin, wê pêvajoyên piştre ên weke yên dema mezolîtîkê û hwd, wê heta serdema neolîtîkê û piştre jî wê li se wan pêşveçûnên demkî ên berî wê re wê bibê. Ji vê demê û pê de ku wê dema mezolîtîkê û dema neolîtîkê wê di dewama hevdû de wê bi pêşketina mirovî û rewşa civakî û hwd re wê pêşbikeve wê dîrokê li ser wan pêşveçûnên bi xosletên mirov re wê bide nivîsandin. Fahmkirina wan demên mezolîtîk û neolîtîkê, wê bi wê re wê fahmkirina di dewama wê de wê, bi çerçoveyek pêşketînî a jîyanî, xwezayî û hwd de wê xwediyê wateyê bê. Emê ku demên mezolîtîk û neolîtîkê wan lêkolîn bikin û fahm bikin, emê baştirin fahm bikin ku wê çawa wê mirovtî bi rewşa xwe ya komî, civakî û hwd re wê pêşbikeve, emê wê di wê dewama van pêşveçûnên bi pêşketina xate mirovtiyê de wê bibaşî fahm bikin.

,

**Beş du:**

**Li herêmên kurdistanê pêvajoyên pêşketin û pêşveçûna serdema civake neolîtîkê**

Ku mirov, serdemên berî dîroka dema şariştanîyê wan dikê ku wan fahm bike, wê pêşî wê serdema neolîtîkê wê pêşî wê weke serdemekê wê xwe bide dîyarkirin. Serdema neolîtîkê, weke serdemek civakî a ku ew di çerçoveya pêşketina destpêkê de ew dihê hildan li dest a. Ev serdem, weke serdemeka ku mirov, wê di çerçoveya pêşketina têgîna civakî a dervî demên şariştanîyê de ku wê hilde li dest a. Serdemên neolîtîkê, wê weke serdemna ku wê di çerçoveya pêşveçûnên civakî ên destpêkê de wê hilde li dest bê. Dema ku mirov wê demê dihilde li dest, mirov bi wê re wê jî dibînê ku wê ev serdem, wê weke serdemeka ku wê di wê de wê di çerçoveya têgîna ´destpêkîya´ civakî de wê xwe xwediyê mejûyeka ku wê gelek rewşên bi destpêkî ên di çerçoveya jîyane civakî de wê, bi xwe re wê bide hanîn li ser ziman.

Destpêkên weke destpêkên civakî ên çandinîyê, şivaniyê û hwd, wê di vê demê de wê pêşbikeve. Di vê demê de wê, mirov, wê serdemna pirr demdirêj ên bi pêşketina xwezayê re wê li şûn xwe wê bihêlê. Herî zêde wê serdema giring ku wê weke serdemeka bûhûrîner a li xosletên mirovtîya roja me bê, wê serdema peleolîtîkê bê. gelek pêvajoyên ku wê di vê serdema neolîtîkê de wê pêşbikevin, bêgûman ku miirov van serdemên peleolîtîkî û piştre ên mezolîtîkî wan fahm dike, wê baştirîn wê werina fahmkirin.

Serdemên berî serdema neolîtîkê, wê weke serdemna ku wê weke serdemên weke serdemên bi pêşketina mirov re ku wê di xate pêvajoyên peresendina xwe de ku wê, heta vê demê wê were, wê pêşketineka pirr zêde demdirêj wê di xwe de wê bibê. Serdemên peleolîtîkê, wê weke serdemên pêvajoyên afirînê ên ji aliyê xwezayê û mirovbûnê ve ku wê bibin bê. Li herêmên kurdistanê ên weke qaxizmanê û gûndên, entebê, cizîra bota û dora wê, şirnax, erxanî, mimbic, afrîn, marê û hwd, wê gelek nîşanakên wê hebin. Di şikeftên li gûndên li dora qaxizmnê de wê, li hêtên wan, wê wêne û ankû sûretên sawalan ku ew li hêtan hatina xîzkirin wê bi sedan wê werina dîtin. Di vê çerçoveyê de wê piştre wê heta ku wê dem were dema navber a mezolîtîkê, wê ev pêvajo, wê di çerçoveya hebûna xwe de wê, têrîtîyekê wê bi xwe re wê bidina çêkirin. Ji xwe, wê li ser wê têrîtîyê re wê ew derbasbûna li wê demê wê bibê.

Pêvajoyên mirovbûnê ku mirov wan bike ku wan werênê li ser ziman, wê di serî de wê serdema homo habilîs ku wê weke serdemeka ku wê destpêkî bê. Çendî ku wê hinekî mejiyê wî ji yê mirovê roja me wê piçûktir jî bê wê ew wê karibê rabê serpîyan, xwe li ser pîyan bigirê û destê xwe bikarbênê. Homo habilîs, wê weke *mirovê kêrhatî* jî wê were hanîn li ser ziman. Pêvajoyên peresendinê ên ji Australopithecus´yan û heta homo habilîs û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê weke pêvajoyek peresendinê wê ku wê gelek xosletên mirovbûnê, wê hema bêja wê bide pêşxistin bê. Homo habilîs, wê weke mirovê ku ew di dewama wê de wê pirr baş û xweşik bi kêrhatîya xwe re wê dijî bê. Homo habilîs, wê di serdema cemedê a **Pleistosen**´ê de wê bijî. Ber vê yekê, wê ew di nava wan şert û mercên xwe yên demî de wê bi wê re wê bijî. Piştî homo habilîs re wê homo ergasterîn wê were. Ew jî wê, di dewama wî de wê were. Di nava homo habilîs û homo Ergasterîn de wê pêvajoyna çawa ên peresendinê wê ji wan bi ber hevdû ve wê bên jîyîn, wê temenê pêşxistina xosletên nû bê. W ji dema homo habilîs û heta homo Ergasterîn wê gelek cûreyên wan wê derkevina li holê û wê bijîn. Lê wê di dawîya dema homo Ergasterîn de ku wê, hin bi hin homo Erectus wê derkeve li holê, wê ev cûre hemû jî wê bi wî re wê bina yek. Homo Erectus, wê bi bîolojikî wê zû û zêde wê pêşkeve. Wê zû zêde bibê. Wê serdema homo erectus, wê weke serdemek ku wê serdema qaşayê a mazin ku ew hema bêja ew ber bi dawîyê ve tê. Wê gelek herêm wê ji jîyanê re wê vebin. Wê di wê demê wê bi rewşa hebûna kaş û çîyayên qaşayê re wê gihiştina ji parzemînan li parzemînan, wê zûtir û hesantir bê.

Ji herêmên Asya dûr û nêzî, û heta ku digihijê ber rojhilate roja me û ji wê jî bi ber rojhilatê afrîqa ve wê zêdebûna homo Erectus a mazin û giştî wê hebê. Di nava cûreyên xwe yên demê û her wusa ên berî xwe de wê homo erectus, wê cûreyê yekane bê ku ew wusa zêde di dema xwe de wê zêde bibê û wê li qadaka berfireh wê belav bibê. Di roja me de wê li gelek deveran wê hastûyên îskeletê homo erectus wê li wan wê were dîtin. Ev jî nîşanaka wê ya ku ew li gelek deveran ew belavbûya. Homo habilîs, wê di dema wî de wê hê dinanên wî, wê mazin bin. Lê yên homo erectus, wê zêdetirî, wê ji yê wî piçûktir û hûriktir bin. Î ro, dema ku ew xate peresendinê a ji homo habilîs û heta homo erectus ku ew dihê li wê nerîn, wê ya ku wê were dîtin wê ew bê ku wê di çerçoveya rewşên kêrhatînîyê û pêşveçûnên fîzyolojikî ve wê gûharînan wê bi xwe re wê bide nîşandin. Rewşa homo habilîs, weke rewşek pêşketîya. Pêvajoyên peresendinê ên berî homo habilîs û heta ku wê werina dema homo habilîs, wê ji gelek aliyên ku wê bişibihina hevdû ve wê ji Australopithecus africanus wê bê dayîn destpêkirin. Lê Australopithecus africanus jî wê, tenê cûreyek ji homonîdên dema xwe bê. Di vê çerçoveyê de wê ew di nava rewşa peresendina dema xwe de wê, tenê wê weke cûreyekî bê. Pêvajoyên ji homo habilîs û piştre ku wê heta homo erectus û piştre wê heta ku wê werina homo sapîens û neandertal û hwd, wê weke pêvajoyên xwe gihandina xosletên mirovbûnê bin. Piştî serdema homo erectus wê, serdema qaşayê a mazin wê ber bi dawîyê ve wê herê. Li şûna wê, wê ard, zevî, daristan, çem û hwd wê biafirin. Di vê çerçoveyê de wê pêvajoyek gûharînî a bi ardnîgarîyî jî wê xwe bide domandin.

Heta ku wê dem wê were serdem homo sapîens, wê pêvajoyên pirr zêde dirêj ên peresendinê wê bên derbaskirin. Wê xate peresendina zindîyan, wê gelek deman wê rastî pêvajoyên tûnebûnê wê were. Di pêvajoyên **mezozoyîk û şenozoyîkê** de wê rewşa dunyayê û her wusa gelek cûreyên zindiyan wê bêhasab wê biafirê. Lê li gorî lêkolînên jeolojîkî ku mirov fahm dike, wê gelek pêvajoyên feleketan wê di van deman wê were derbaskir**in**. Di dema mezozoyîkê de wê hin bi hin wê ajalên bi mazmazk(*´mammalian´*) wê derkevina li holê û wê zêde bibin. Heta ku dem tê serdema şenozoyîkê, wê ajal û sawalên ku ew gelek ji wan perîsîn(peresendin)a li roja me, weke hasp, xezal, mar û hwd bi gelek sawal û ajalên din ên avî û neavî wê derkevin li holê û wê xweza jî bi wan re di ahengekê de wê biafirê. Bi wê re jî wê hinek

zindiyên ku em di derbarê wan de ne xwediyê agahiyê na wê hebin. Wê di vê demê de wê jîyane bejehî wê pêşbikeve. Di serdema mezozoyîkê de ew tûfan û felaketa ku ew bûn, wê di wê de sawal û ajalên weke dînazoran û hwd wê tûne bibin. Wê li şûna wan, wê zindiyê bêmazmazk wê ji nû ve wê pêşbikevin û wê şûna wan dagirin. Di serdema **şenozoyîkê** de wê dunya, ew rewş û rengê roja me ku wê pêşbikeve li wê, wê pêşketina wê bibê. Ji hevdû cûdabûn û dûrketina parzemînên, pêşketina bahr û deryayan, çem, gol, girav û kûrehîyên ku wê reng bidina ardnîgarîyê, wê biafirin. Li gorî herêman û bi bandûra radîoaktivê gûharînên genetikî û hwd, wê weke bi rengê ´motasyonê´ û hwd wê zêdetir wê temenê wan biafirê û pêşbikevin.

Pêvajoyên piştre ên afirîna zindîyan, rewşa hewa û birehê û hwd, ku wê ji nû ve wê di wê de bibê, wê weke pêvajoyna nû bin. Ev pêvajoyên piştre wê teybetîya wan a jeolojîkî wê ew bê ku wê gûharînên di birehê û hwd de ku ew bûna, wê derfeta hatina tîrêjên rojê zêdetirî li dûnyayê wê biafirênin. Bi wê re wê, zûdetirîn wê kaş û çîyayên qaşayê n mazin wê bidest halîna wan bibê û wê li şûna wan, wê gol, çem û û piştre bahr û piştî bahran re wê derya wê biafirin. Di vê çerçoveyê de wê rewşna nû ên dûnyayî wê biafirin. Ev rewşên nû, wê rewşa temenê jîyane zindiyên piştre wê biafirênê. Piştre wê cûreyên weke Australopithecus´yan wê pêşbikevin û wê zêde bibin. Piştre jî wê bi peresendina li ser wan re wê hin bi hin wê cûreyên din ku em î ro di derbarê wan de em ne xwediyê ti zanînan in wê pêşbikevin û wê di jîyanê de wê di demên xwe de wê cihê xwe bigirin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê rewşek wê biafirê. Piştre jî wê pêvajoya Australopithecus´yan û heta ku wê were dema homonîdên weke homo habilîs, homo Ergasterîn û homo erectus û hwd wê bidemê.

Pêvajoyên piştre wê heta serdema peleolîtîkê û dema homo sapîens wê werin. Homo sapîens, weke *´mirovê dihizirê´* jî ku ew dihê hanîn li ser ziman, wê di dema xwe de wê bi pêvajoyên ku ew derbas dikê re wê, di aslê xwe de wê destpêka serdema mirovê hemdem ê roja me wê bi xwe re wê bide destpêkirin û wê bênê heta roja me. Di serdema homo sapîens de wê pêvajoyên ku wê bi jîyane xwezayê re wê werina derbaskirin, wê rewşek xwezayî a pêşketî wê derxê li holê. Di dema homo sapîens de wê gelek daristan, gol, çem, bahr, hinek piştre peşketina deryayan û hwd, wê gelek herêmên ku ew li wan dijî li parzemîna afrîqa û hwd, wê gelek herêmên ku ew di wê de ew li wan dijî wê di bin avê de wê bide hiştin. Piştre jî wê ji herêmên ku ew hê hinek ji wan bin avê ve nemana ên weke ji aliyê rojhilatê afrîqa û hwd ve wê bi ber cezayîr, lîbya û piştre herêmên din ên asya û mesopotamya û hwd wê were. Ev hatina homo sapîens li herêman, wê weke hatina bi dagirkirinî jî wê ji aliyê gelek antropologan ve w werê şîrovekirin. Pêvajoyên dema jîyane homo sapîens ên demên peleolîtîkê wê weke demna ku wê ku wê di wan de wê pêşveçûnên xwezayî, jîyanî û li gorî jîyane mirovê ku ew dihizirê wê pêşbikevin bin.

Pêvajoyên homo sapîens, wê weke pêvajoyên ku ew bi jîyane komî dijî bê. Wê kombûn, wê bi wî re wê pêşbikeve. Wê di çerçoveya komê de wê jîyane wî pêşbikeve. Wê xosletan û xûyan bi xwe re wê pêşbixê. Mirovê demê homo sapîens, wê bi demê re wê bidest bikarhanîna amûrên weke mazrabk, bivirk, rim, şiv, kevirên tûj, kevirhast û hwd wê bikarbênê. Amûrên bi vî rengî ên ku ew ji dema wî mana, di derbarê rengê jîyane û nêçîrkirina wî de jî wê têgînekê wê bidina me. Her wusa rewşa jîyane mirovê demê homo sapîens a komê wê bi dem re wê bi vê rengê wê pêşbikeve. Pêşketina wî û jîyane wî, wê bi demê re wê rewşa jîyane komî wê ji wî re wê weke rewşek ku ew nikaribê dervî wê bijî bê. Wê bixwezê ku ew hertimî di nava wê de bijî.

Mirovê dihizirê homo sapîens, wê pêvajoyên jîyane wê bi nifşî wê li ser jîyane xwe ya komî re wê derbas bike. Ev jî wê di nava rewşa rewşa jîyane wî ya komî de wê, bandûra wê pirr zêde wê li ser wê hebê. Wê bi demê re wê bê weke mirovê komê. Bi demê re wê, li ser jîyane wî ya komî re wê nifşên mirovê komê homo sapîens wê derkeve li holê. Di nava komê de wê çi xûy, xoslet, teybetmendî û hwd wê hebin, wê di xwe de wê bicih û wê bi wan re wê bidest jîyane bike. Wê nifşê mirovê demê wê, amûrên parastin û nêçîrê û hwd jî wê wan di nava xwe de wê zêdetirî wê pêşbixê û wê li ser wan re wê hostetîyekê wê bi xwe re wê bide nîşandin.

Rewşa jîyane mirovê demê, wê di vê çerçoveyê de wê pêşikeve. Bi demê re wê, ya ku wê bi jîyane homo sapîens û cûreyên din ên weke mirovê şanîdarê, neandertal û hwd re wê were dîtin, wê ew bê ku wê, jîyaneka giştî wê li şikeftê wê were pêşxistin. Di aslê xwe de wê ew weke *´mirovên şikeftê´* jî wê werina bi navkirin.

Jîyane şikeftê wê weke rewşek jîyanî a bi sittar bê. Wê di vê çerçoveyê de wê ji rewşên weke baranê, sermayê, hêrîşên ajal û sawalên parastinê, wê bo wan jî wê giring bê. Di vê çerçoveyê de wê şikeftên ku ew dihên kirin weke cihên jîyanê, wê nêzî deverên avî weke çeman û hwd bin. Minaq, herêmên weke yên şanîdarê, afrînê û hwd, li kurdistanê ku ew nêzî herêmên avî na, wê li wan bicihbûn bibê.

Xwezaye herêmê bi teybetî em divê ku vê yekê jî li ser wê bibêjin ku wê hê di serdema qaşayê a mazin a **Pleistosen**´ê de wê li herêmê halîna qaşayê wê bibê û wê herêm ji jîyanê re wê vebê. Wê li w hê di van deman de wê dariştan û şînahî wê pêşbikeve. Wê ji wan deman û heta roja me wê pêvajoyên peresendinê wê li ser şînahîyên ku ew dibin re wê bên derbaskirin. Ev jî wê, di rewşa şînahî û pêşketina wan de wê, rewşek teybet a pêşketî wê derxê li holê. Ber vê yekê ya ku wê li herêmê wê zûtirin wê jîyan wê pêşbikeve. Wê temenê jîyane zindîyan wê li wê biafirê. Heta ku wê dem were û bigihijê serdema peleolîtîkê, wê were dîtin ku wê li herêm, gol, çem, dariştan, garan û kerîyên sawalan û cûreyên wan wê bi zêdebûna wan re wê li herêmê wê pêşbikevin. Ev rewş, wê di dema mirovê demê ê dihizirê homo sapîens de wê temen û derfeta nêçîrê wê pirr zêde biike û wê hesan bikê.

Di serdema peleolîtîkê de wê di nava wê de wê, li ser vê rewşê de wê temenê jîyanekê wê were afirandin. Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku ev rewş, wê temenê jîyane komî a di cih de jî wê, pêşbixê. Yanî, wê komên homo sapîens, mirovê şanîdar, neandertal û hwd, bêî ku ew herina herêmna din, wê li herêmê wê li ser vê rewşê re wê karibin jîyane xwe bidina domandin. Jîyane bi komî, wê di vê çerçoveyê de wê temenê wê, wê hebê. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê mirovê demê homo sapîens, wê di vê çerçoveyê de wê bi hemû cûreyên weke wî ên di demê de ku ew dijîn re wê, jîyane xwe wê pêşbixin. Jîyane bikomî wê temenê wê di vê çerçoveyê de wê li ser derfetên ku wê jîyane xwezayê wê bide wan wê li ser wê re wê bê pêşxistin û afirandin. Her wusa divê ku em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê rewşa jîyane mirovê demê, bi jîyane wî ya komî re wê di vê çerçoveyê de wê pêşbikeve. Wê di vê çerçoveyê de wê heta ku ew bixwezin wê, zindiyên ku ew dikarin wan nêçîr bikin wê bibiin. Cûreyên sawalan, weke meh, pazkovî, ga, çêlek, hasp, baraz û ankû xanzîr, mambiz, xezal û hwd, wê weke van wê bi dehan sawal û kerîyên wan wê hebin û wê mirov jî wê wan nêçîr bike û wê bi wê re wê dabara xwe bike.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa jîyane bikomî wê di vê çerçoveyê de wê zêdetirî wê pêşbikeve. Bi demê re wê xosletên mirovî wê pêşbikevin. Wê rewşên weke bikarhanîna amûran wê di demên serdema peleolîtîkê ên navîn û dawî de wê zêdetirî wê pêşbikevê. Wê li ser wê re jî wê pêvajo û nifşên ku wê bi jîyane komî re wê werina derbaskirin wê hebin.

Di nava rewşa jîyane komê de bikarhanîna amûran, wê rewşek teybet a jîyane mirov bê. Di aslê xwe de wê, bikarhanîna amûran re wê mirovê demê wê hin bi hin wê ji jîyane zindîyan û xwezaye wan wê dûrkeve. Wê bigihijê xwezaye xwe ya mirovî. Ev jî wê bi wî re wê bi demê re wê bi xoslet, teybetî û xûyên wê re wê pêşbikeve. Mirovê demê vê yekê wê, bi xwe re wê hin bi hin wê zêdetîrî wê pêşbixin.

Di çerçoveya jîyane komî a li şikeftê de wê xoslet û xûyên mirovî wê hin bi hin wê xwe bidina dîyarkirin. Wê di rewşa têkilîya nava komê de wê rewşên nû wê biafirin. Ev jî wê bi demê re wê bi bûhûrandina nifşan re wê heta ku wê karibin, fêrî wê bibin. Di rewşa fêrbûnê de wê mirovê demê, wê bi rewşa bikarhanîna amûran re wê hin bi hin wê rewşa xwe wê pêşbixê. Bi demê re rwşên weke bikarhanîna amûrên parastin û nêçîrê bidestî, biikarhanîna agir bo xwegermkirin û sorkirina goşt û hwd li ser wê, wê rewşna nû bin. Em li vir vê yekê jî wê, werênina li ser ziman, fêrbûna van amûran û bikarhanîna wan û li gorî wan avakirina jîyanek komî, wê tenê weke fêrbûnekê wê li holê wê nemênê. Ji wê zêdetirî wê weke rewşek ku wê gûharînên mazin di jîyanê de wê hem bi xûy û xosletan û hem jî wê bi fîzyolojîkî wê li ser rewşa fîzîka mirovê demê re ku wê bi xwe re wê werênê bê.

Minaq, rewşa hin bi hin xwarina goştê li ser êgir pijandî, wê di rewşa laşê mirovê demê de wê gûharînên mazin wê bi xwe re wê werênê. Wê di laşê wî de wê, gûharînên ku wê bibin wê hem di hundûr de bin û hem jî wê di derveyîya wî de bin. Di hundûrû de wê di hinavên wî de wê gûharîn wê bi wî re wê bibin. Wê di rovî, dil, kezeb, mahdê û hwd de wê gûharîn wê bibin. Li derve jî wê, di rewşa dîtina mirov de wê gûharînan wê bi xwe re wê werênê. Dev, lêv, dinan, bi rewşên cûtinê re zenî û argûşk wê gûharîn wê di wan de wê bibin.

Bi wê re jî wê xwarina ku ew dihê sorkirin li ser êgir wê, di mihandin û serifandina wê de wê zûtirîn wê bibê. Ev jî wê rewşên nû wê bi xwe re wê werênê. Mejî, wê van rewşan wê di xwe de wê qayd bike û

wê hin bi hin wê fêrî wan bibê. Bi wê re jî wê di rewşa wê rengê xwarinê de wê mirov, wê hertimî wê li ser wê alimîn û fêrbûna xwe re wê, bixwezê ku ew bi wê rengê wê bixwê. Ev jî wê, rewşek nû bê. Wê ev rewş, wê di xoslet, teybet û xûyan de jî wê gûharînan wê bi xwe re wê werênê. Di vê çerçoveyê de wê bi demê re wê rengekî mirov wê derkeve li holê. Wê mirovekî ku ew êdî wê bi vî rengî wê xwarina xwe bixwê û wê di vê çerçoveyê de wê jîyane xwe biadilênê wê derkeve li pêş.

Xosletên vê dema jîyane mirovê demê wê di vê çerçoveyê de wê bi kifşkirina rewşên pêşî re wê derbas bibê. Di aslê xwe de mirov divê ku van rewşan, weke rewşek şoreşî a jîyane mirovê demê a di dema peleolîtîkê de wê werênê li ser ziman. Piştî wê re jî wê di serdemên mezolîtîkê de wê ya ku wê were û bibê jî wê, ew bê ku wê li ser wan pêveçûnan re wê hem fêrbûn û alimandin wê pêşbikeve û hem jî wê li wan zêdekirin bi kifşkirinên nû re wê bibê. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê dema mezolîtîkê, wê weke demeka ku wê di wê de wê hin bi hin wê xoslet û xûyên ku wê mirov wê hin bi hin wê bi mejiyê xwe re wê li wan wê bihizirê û wê wan bike, wê pêşbixê. Di vê çerçoveyê de wê biplan tevgerîn, wê di vê çerçoveyê de wê pêşbikeve. Minaq, di nêçîran de bikomî çûyîna nêçîran, wê rewşek ji wan rewşên bi plan ku ew dihê kirin bê. Wê di dema dawî a serdema peleolîtîkê de jî wê bi komî wê çûyîna nêçîrê wê bibê. Lê xosletê çûyîna nêçîrê bi komî a vê demê wê hinekî cûda bê. Ew jî wê di vê çerçoveyê de wê ji ya wan demên berê wê pêşketîtir bê. Di vê demê de wê zêdetirî wê ji dîtinên di mejî de ku ew bûna wê ji wan jî wê sûd wê were girtin.

Em dikarin î ro, vê yekê bibêjin ku wê di serdema peleolîtîkê de wê, mirovê demê wê karibê hin bi hin ew aqilê xwe bikarbênê.Di vê çerçoveyê de wê pêşbikeve.Di nêçîrê, çêkirina xwarinê, bi hevdû re di nava jîyanek komî de jîyankirin û derbaskirina demê û hwd, wê rewşna ku mirov di vê çerçoveyê de wê werênê li ser ziman bê. Di dema çûyîna nêçîrê de wê mirov wê, amûran di nêçîrkirinê de wê, bikarbênê. Wê planan çê bikê. Nêçîra ku wî kir, wê werênê nava komê. Ev xosletêna mirovê jî na. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê vê jî bibêjê ku wê di dema dawî a serdema peleolîtîkê de wê mirov, wê bidest pêşketina xoslet û xûyên mirovê hemdem bi wî re wê bibin.

Mirovê demê wê di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rewşek pêşketinî a teybet bê. Wê di nava jîyane ku ew dijî de wê, hin bi hin wê bi aqilê xwe wê serdest bibê. Wê di şikeftan de wê bi komî wê çaw bijîn û wê çawa baştir, ewlatir û her wusa mayindatir di wê de bijîn wê, li ser wê re wê bihizirin. Hîskirina li hevdû pêşketîya. Hin bi hin rewşên weke rewşên têkilîdanînê ku em dikarin di çerçoveya pêşketina ziman de wan, hildina li dest wê pêşbikevin. Mirov dema peleolîtîkê, her çendî ku ew hê jîyane bixwezayê a di şikeftê de dijî jî mirov, lê em nikarin wî weke ku ew ne xwediyê zimanekî û şêwayekî zimanî(*) ê têkilîdanînê ya wî newênina li ser ziman. Vajî wê, divê ku mirov wî weke mirovekî ku ew xwediyê zimanekî têkilîdanînê ê pêşketî jî wê, werênê li ser ziman. Di nava komê û jîyane komê de wê, gelek xûy, tevger û kirinên hevbeş wê bi nêzîkatîyî ku ew dihên kirin û dayîn nîşandin wê bibin. Weke fêrbûneka pitikekê ku ew hê nûka ji dayika xwe re bûya, wê mirov bidest nerîna li dunyê bike û wê fêrî dunyê bibê. Di nava komê de jî wê, bi heman rengî wê fêrî kirinên hevbeş bibê. Li ser van kirinên ku ew dikê re wê, pêşî wê weke *zimanê nîşanakan*(*) wê bikarbênê. Di çerçoveya zimanê nîşanakan de wê pêşî fêrî di çerçoveya wî zimanê nîşanakan de ku wê, çawa laş xwe bikarbênê, wê fêrî wan bibê. Dema ku ew hêrs bû, wê xwediyê rêdeneka çawa bê û ankû ji aliyê yekî bi hêrs ve wê rastî rûdênek çawa a bi hêrsî wê were, wê bi demê re wê fêrî wê bibê. Wê tevger û xûyan ku ew li hevdû dihûnê, wê fêrî wan bibê. Li hevdû

-------------

(*)Di wê demê de wê şêwayekê zimanî ê weke bi deng derxistinê û li ser bertekan re ku wê helwest wê bê dayîn nîşandin wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa wê, dengên ku di wan de cûreyên deng hena wê biafirin. JI qirikê ve wê mirov wê, bidest adilandina xwe ya li gorî axiftinê a mirovê hemdem wê di wê demê de wê bikê. Pêvajoyên ku derbaskirina wê di wê demê de wê, di asta dawî de wê, encamên xwe de wê bidin. Ev wê, weke aliyekê pirr giring ê mirovê wê demê bê, Têkiliya çav, ziman û meji wê li ser rewşan re wê hin bi hin wê bi temenê xêvê re wê bê danîn. Ev jî wê, hin bi hin wê di temenê hizirkirinê de bê.

(*)Ji aliyekê din ve jî wê, di wê demê de wê, şêwayekê zimanî ê weke zimanê nîşanakan wê xwe bide nîşandin wê ew weke ku wê pêşkeve. Wê piştre wê, hin bi hin wê li wan nîşanakan wê, deng were lê zêdekirin û wê, nerîn lê were baxşkirin. Wê bi wê re wê rûdên wê gûharînan wê weke qirikê wê bi xwe re wê bide çêkirin.

hûnandina tevger, kirin û xûyan wê, di aslê xwe de wê nîşanaka hebûna pêşketina aqil jî bê. Di çerçoveya wate dayinekê de wê, ew bibê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa watedayînê ku wê di wê rengê de wê rewşekê bi xwe re wê bide dîyarkirin a mirovê demê, wê li ser rewş, tevger û xûyan re wê, kirinên xwe bide nîşandin. Wê nêzîkatîyên xwe pêşbixê. Di dema ku wan nêçîrek kir, wê ew nêçîr, wê dema ku wan

ew hanî şikeft li nava komê, wê demê divê ku ew herkesek ji wê bixwê. Li ser beşên wê nêçîrê ku ew dixwezin bixwûn, wê helwesta xwe bidina nîşandin. Helwest, bi zindiyan re wê weke rewşek giring bê. Wê pêşî, wê di temenê wê de wê, di rewşên weha de wê hinekî ajo û piştre jî wê hinekî hîskirin jî wê hebê. Piştre wê li ser wan hîskirinan re wê, aqil bi helwestan re wê, pêşbikeve. Di nava komê de wê, li ser xwestina danîna têkiliyên zayendî ên bi jinekê re wê, di vê çerçoveyê de bibê. Heta ku dibê ku jin, wê têkiliyê nexwezê, lê ew ber ku wê dixwezê, wê bixwezê ku ew bi zorê jî wê têkiliyê bike. Li vir, wê ajo, wê serdest bê. Mirov, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek teybet a bi xwe re bê. Di rewşa danîna têkiliyên zayendî de wê, di nava komê de wê sînor nebê. Her wusa, li vir, weke ku mirov wê fahm dike, wê pêşî jina ku ew têkilîya zayendî bi wê re ew dihê danîn wê ew herêbike têkilîdanînê û ankû herênekê, wê têkilîdanînê. (*) Li ser wê re wê, hatina berhevdû a mirovê ku ew dixwezê ku ew têkiliyê dênê û yê ku ew nexwezê têkiliyê bi wê re dênê û hwd, wê werina berhevdû. Di vê çerçoveyê de wê rewşa wan wê, xwe bide dîyarkirin. Dem bi dem wê rewşên weke yên ku weke jin û mêr ku ew têkiliyê bi hevdû re didênin û yekî din tê û dikeve navê de û dixwezê têkiliyê dênê wê, di nava wan de jî wê, hingî wê rewşek weke ya hatina berhevdû wê biafirênê. Ev rewş, wê weke rewşna teybetî ên komî bin. Bi demê re wê rewşên komî ên bi vî rengî wê bibin û wê zêde bibin. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têgîna ´xwedîbûnê´ wê weke têgîneka ku em nikarin bêî rewşa têgîna ajoyê wê werênina li ser ziman bê. Di rewşa kifşkirina rewşa xwedîbûnê de wê ajo, wê xwe bide dîyarkirin. Wê hin bi hin ev pêşkeve. Di rewşa komê de wê ev rewş, wê hertimî wê hebin û wê zêde jî wê xwe bidina dîyarkirin. Heta ku mirov dikarê vê yekê bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê, bi demê re wê temenê gelek pirsgirêkên ku wê di nava komê de wê bibin, wê di vê çerçoveyê de wê, xwe bidina dîyarkirin. Di nava jîyane komê de wê, di vê çerçoveyê de wê hin bi hin wê rewşek li ser

---------

(*)Ji aliyê rewşa têkiliyên zayendî ve wê, di wê demê de wê, pirrjinîtî û pirrmêrîtî wê hebê. Jinek wê bi pirr mêran re wê bibê. Heman rengê wê bo mêr jî wê wusa bê. Lê ajo wê, zêdetirî wê, hêsta xwe gihandina li jinê û bi wê re bûyinê wê pêşbixê. Ev jî wê, weke rewşeka ku wê, bale mirov wê zêdetirî wê bikişênê li ser jinê. Jin wê, zaroyan wê bênê dunyê û wê, ew zêde nikaribê weke mêr bi tevger bê. Wê, hin bi hin wê, ew têkiliya girêdana bi zaroyan û têkiliyên zayendî wê bi hevdû re wê biafirê. Wê, hin bi hin wê, di wê rengê de wê, rewşek weke ya mêr wê herê nêçîrê û jin li malê û ankû li şikeftê bi zaroyan re ya û li wan dinerê wê, pêşbixê. Bi demê re wê, ev rewş wê bê temenê weke aliyekê ku wê gotina wê derkeve li pêş wê jinê serdest bikê. Wê wê hem li ser zaroyan re û hem jî wê li ser mêr re wê pêşbixê. Lê di wê demê de ew hêsta xwedîbûnê hê ew ne wusa zêde xort a ku ew mêr jinê weke ya xwe bibînê û ankû ew xwe bi zaroyan ve girêdayî bibînê. Lê ew hin bi hin pêşdikeve.

rewşên têkilî, nêzîkatî û hwd re wê tevlîhev wê bi demê re wê derkeve li holê. Minaq, rewşa têkilîyan, wê rewşek ji wan rewşan a giring û dîrokî bê. Wê di nava komê de wê, hertimî wê temenê pirsgirêkên komî jî bê. Di nava jîyane komê de wê, ji vê demê û pê de wê bi jîyane komê re wê li ser rewşên têkilîdanînê, parvekirina nêçîrên ku ew hatina kirin û hwd re wê pirsgirêkên nava mirovan ên komî wê rûbidin.

Mirov, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek teybet bê. Rewşa têkiliyan û pirsgirêkên ku wê li ser wan re wê xwe bidina dîyarkirin, di aslê xwe de mirov, dikarê wan bi teybetî wan hilde li dest. Ev rewş, wê di rewşa koman de wê, çendî ku wê weke rewşna pirsgirêkî wê xwe bidina dîyarkirin jî lê wê, bi xwe re wê rewşna din jî wê bidina dîyarkirin. Minaq, weke bi pêşketina mejî, pêşketina hêsta xwedîbûnê û hwd re ku wê bibê.Pêşketina hêsta bûna xwedîyê beşa mazin a ji nêçîrê û hwd jî, wê di vê çerçoveyê de wê pêşbikeve.

Li vir, wê bi vir ve girêdayî wê hinek rewşên din jî wê xwe bidina dîyarkirin. Mirovê ku ew di nava komê de ew di nêçîrkirinên xwe de ew bihêz û xorta, ew dema ku ew dihê nava komê jî wê ew wê bixwezê ku ew wê hêzbûna xwe bide nîşandin. Minaq, ew dema ku wî xwest ku ew bi jinekê re têkiliyê dênê, wê bixwezê ku ew newê redkirin. Wê bixwezê ku ew weke ku ew çawa ku wî nêçîra xwe bidestxistîya bi nêçîrkirinê re wê, bixwezê ku ew têkilî jî bi wê rengê ew wê bidest bixê. Bi vê rengê û mantiqê, wê nêzîk bibê. Di nava komê de wê, ne tenê di ast, pîvan û temenekî de wê mirov hebin. Wê mirovên zaro, ciwan, balix, pîr û kal jî wê hebin. Di vê çerçoveyê de wê di nava vê rewşê de wê, mirovê herî xort û bihêz bê, wê mirovê balix bê. Ew, wê di vê çerçoveyê de wê bi hêza xwe wê bixwezê ku ew xwe bide herêkirin.

Li vir, têkiliyên nava komê, wê têkiliyên li ser xwûnê re bin. Wê di vê çerçoveyê de wê ew wê hevdû wê hîs bikin.Ber vê yekê, wê rewşek wan ya têkiliyî a teybet a bi hevdû re wê hebê. Di dema ku ew nêçîrekê dike û ew dihênê nava komê re wê li ser vê rengê têkiliyê re wê di nava komê de wê, ew nêçîr wê were parvekirin. Wê ew li dijî wê dernekeve. Lê wê herkesek wê ji xwe re wê bixwezê. Di vê

çerçoveyê de wê, serbestîyek bêsînor wê hebê. Li ser wê serbestîyê re wê, kî çi xwest, wê di wê çerçoveyê de wê nêz bibê.

Di nava komê de wê, rewşên wê bi demê re wê di vê çerçoveyê de wê zêde bibin. Nifşên nû ku ew wê di nava wê rewşa têkiliyê de wê werina li dunyê, wê ew wê rewşa têkiliyê, wê bi awayekî xwezayî wê bijîn. Wê piştî ku ew mazinbûn û pê de wê, li gorî rewşa xwe wê rewşên nû wê tevlî wê bikin. Wê bi wê re wê rewşên nû wê biafirênin. Lê li vir, wê dema ku ew rewşên nû diafirênin, wê li tiştekî pirr bixwezayî wê heyîderbin. Ew jî wê ew bê ku ew dernekevina dervî komê. Wê di nava sînorê komê de wê ew wan kirinan bikin. Di mejiyê wan de wê, ti sînorên rewîstî û ankû aqilî ên weke sînor nebin. Wê sînorê ku ew hebin, wê sînorê weke bi hebûna komê re bê. Kom, çendî ku wê mirov, weke ku me hinekî li jor jî hanî li ser ziman ku wê di nava wê de wê pirsgirêkan û hwd jî wê bijî jî lê wê, ew wê hebûna komê wê ji wî re wê, weke rewşek teybet a malbatî bê. Wê kom, wê di şêwayekî de wê weke *malbatek mazin* wê di nava xwe de wê bijî.Ew malbata mazin, wê di nava wê de wê hertişt wê bibê. Wê nava sînorê wê de wê hertişt wê bibê. Wê di nava rewşa wî ya jîyanî de wê ew hertiştê wê bibê. Rewşa jîyanê komê têkiliyên nava komê, têkiliyên zayendî û hwd, wê di nava komê de wê ji xwe re wê bi serbestî wê bibin. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa jîyane komê wê xwediyê rewşek pêşketî a di vê çerçoveyê de bê. Lê bi wê re jî wê rewşa jîyane komê wê bi demê re wê bi nifşên nû ên ku ew di vê çerçoveyê de ku ew jîyane komê dijîn, wê bi hebûna xwe re wê pêşveçûnên nû wê tevlî jîyane komê bikin. Ji aliyê fîzyolojikî, genetîkî û hwd ve jî wê, pêşveçûnên ku ew dibin, wê di vê çerçoveyê de wê li ser pêşveçûnên nifşên nû û bûyîna wan re wê di dewamîya jîyane wan de wê bibê.

Jîyane komê, wê weke aliyekî giring ê jîyane mirovê demê bê. Wê di nava komê de wê xwe bibînê. Dema ku ew di nava komê de ew dibê, wê bi awayekî wê rewşa hebûna komê wê ji xwe re wê weke rewşek temen a ku ew di nav bûya wê bibînê. Bo vê yekê jî wê rewşa komê, wê bo wî, wê weke rewşek teybetî bê. Derneketina dervî wê jî wê, di vê çerçoveyê de bê.

Rewşa komê, mirov nikarê tenê weke rewşek komî bi tenê wê werênê li ser ziman. Rewşên ku ew di jîyanê de din weke rewşa komê, rewşên pêşketîna xûyan û hwd, wê aliyekî wan ê bi pêşveçûna mejiyê mrov ve girêdayî wê hebê. Wê her demê wê di wê çerçoveya wan de wê ew hebê. Pêşveçûnên ku mirov wan di fîzyolojiya xwe de wan dijî, wê ew weke pêşveçûnna ku wê di mejî de wê pêşî wê xwediyê rewşekê bin. Di nava pêşveçûnên di mejî û yên di jîyanê de weke ku wê di nava komê wê bi xûyan û hwd wê bibin, wê têkilîyek temenî û ankû hîmî wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, ew rewşa ahenga pêşketina bi mejî û ya bi jîyanê, komê û xûyan re wê bi hevdû re wê bimeşîn. Têkilîya di nava komê de jî wê ew wusa bê.

Me hinekî li jor jî hanî li ser ziman ku wê rewşa komê wê heta demên navîn û dawîn ên serdema peleolîtîkê wê herê. Dibê ku ew rewşa komî hinekî din jî kevntir herê. Lê bi teybetî ya van rewşa van herdû deman, wê bi teybetî û xosletî wê ew bê ku ew di wan de wê mirovê demê wê bi aqilê xwe re wê hin bi hin wê pêşbikeve bê. Wê rewşan, li ser aqilê xwe re jî wê wan bijî. Dema ku ew çû deverekê û li wir rastî hêrîşa sawaleka weke ku ew şêrek bê, hirçek bê û ankû sawalan din a bi vî rengî bê, wê demê wê ew ji wir bazbide û dûrbikeve. Lê piştre ku ew, deme ku ew têveçû û ew cardin hat wê deverê, wê demê wê di mejîyê wî de wê ew rewşa rastî hêrîşê hatî wê bibîr bike. Ev rewş, wê di cih de wê ku ew bitirsihê û heyîderbê. Yan jî, di heman rengî ku ew hat heman deverê û li wir rastî heman sawalê hat, wê di mejiyê wî de wê di cih de wê ew rewşa berê wê biveje.

Ev rewş, wê ji gelek aliyên din ve jî wê xwe bide dîyarkirin. Minaq, ku ew ne li wê deverê û ankû mekanê jî bê û ku ew li deverek din jî rastî sawalek weke wê ya ku ew rastî wê hêrîşa wê hatî ku ew wê bibînê, wê di mejiyê wî de wê di cih de wê ew rewşên berê wê di mejî de wê bi vejê. Wê di cih de wê mejî wê bibîr bike. Rewşên ku wê dema ku ew mirovê demê ku ew di wan de rastî hêrîşê hatî ku ew li hemberî hêrîşan sekinî û serket, wê ev rewş, wê bi wî re wî wêrebûnekê wê bide çêkirin. Di vê çerçoveyê de wê ev hîs, di dema duyemin a rastî heman sawalê hatina de jî wê, di mejiyê wî de wê biafirê ku ewê karibê li hemberî wê serkeve. Lê dema ku ew derbeyek hişk a bieş ji wê bixwê, wê hingî ew ji wir wê bike ku ew xwe xilas bike. Di vê çerçoveyê de wê ev rewş, di rewşa mejî û fîzyolojiya mirovê demê de wê pêşbikevin. Li vir, ew xate ku wê di mejiyî de wê di nava mejî de wê pêşbikeve û wê li aliyekî wê, êş û derbxwarin û serneketin wê hebê û li aliyê din ku wê serkevtin, derblêdan û xwe baş hîskirin wê hebê.

Di vê çerçoveyê de wê ev rewş, wê weke rewşna ku mirov wan dikarê, bi rewşa jîyane mirovê demê re wê bi teybetî wê hilde li dest bê.

Mirovê demê wê di vê çerçoveyê de wê di nava rewşa xwe ya komî de wê di wê rewş de wê ku ew xwediyê rewşe serkevtî û ankû ne serkevtî ya. Li vir, sînor hêzbûna xwe wê fêrbibê. Dema ku ew hîs bi wî re çêbû ku ew li ber wê sawalê serkevtîya û ankû serneketîya û derba xwarîya wê, hingê ew wê wê sînorê bi xwe re bibêhişî wê di xwe de wê kifş bike. Rewşa bibêhişî di xwe de kifşkirin, wê weke rewşna mejîyî ku ew di xwe de wan dijî bê. Di vê çerçoveyê de her tiştê di mejî de wê, du û ankû sê pêvajoyên wê yên derxistina têgihiştinê wê hebin. Pêvajoya pêşî wê bi mejî re bê. Pêvajoya duyem wê, bi derxistina têgîhiştinê re bê. Pêvajoya sêyem jî wê, bihişkirina wê hişê re bê. Di rewşa duyem de wê, ya ku ew dihê derxistin li hişê, wê ew ya ku mejî ew di xwe de girtîya bê. Di mejî de ew hebûna ku ew heyî, wê weke rewşek bibêhişî wê hebê bê. Di vê çerçoveyê de wê ew rewşa bibêhişîya wê a bi mirov re jî wê, weke rewşeka ku ew di mejî de ew hatîya dîtina, cihbûya û heya ya. Lê ew ne hatîya derxistin li hiş. Dema ku mirov ew derxst li hiş, wê hingî ew weke rewşek bizanînî wê bi mirov re wê ew hebê. W hingî ew weke rewşek têgînî wê hebê. Kengî mirovê demê bidest derxistina li hişkir, kengî ku wî, bidest xîzkirina li hêtên şikeftê kir bi sûretên sawalên ku wî nêçîrkirina na. Li vir, li ser rewşa sûretên sawalên ku ew li hêtên şikeştê ku wê hin bi hin wê werina çêkirin jî mirov dikarê tiştekî bi teybet wê bibêjê. Mirovê demê wê dema ku wî sawalek nêçîrkir, wê ew sawale ku wî nêçîrkirî wê ew sawal wê, wêne û ankû sûretê wê, wê li hêt wê were xîzkirin. Di rewşa xîzkirina wêne û ankû sûretan de wê, nîşanaka ew wêneyên bibêhiş ku ew di mejî de ew berê hatina girtin û hena, wê weke derxistina wan ya li têgihiştinê jî bê. Ew wêne û ankû sûret, wê nîşanaka pêşketina destpêka hiş jî bin.

Em li vir, vê yekê wê werênê li ser ziman ku ew wêna, wê bi demê re wê, weke rewşna xîzkirî wê weyn û roleka ajoyî di mejiyê mirovê re wê bileyizê ku mejiyê wî, di xwe de bidest girtinê û hwd bikê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa xîzkirinan, wê nîşanaka pêvajoyek giring bê. Em di di dema dawî a serdema peleolîtîkê de rastî wan xîzkirinan tên. Ev jî wê, ji aliyekî ve wê were wê wateyê ku wê hê di wê demê de wê mejiyê mirov di xwe de wê bidest bihişkirina rewşên ku ew di xwe de digirê wê bike bê. Mejî, rewşa wê ya wê ya girtinê, em nikarin bi destpêka bihişkirina mejî re wê bidina destpêkirin. Em divê ku wê, hinekî din ji wê kevntir bibin. Heta ku em dikarin vê jî wê, li ser wê re wê bibêjin ku wê bi demê re wê hinek pêvajo jî wê li ser rewşa girtina mejî re wê derbas bibin, heta ku wê ew wan girtinên xwe wê derxê li hiş. Di vê çerçoveyê de wê, rewşek teybet wê di nava mejî û girtinê de wê hebê.

Girtina mejî û rewşa mejî, wê têkiliyeka wê ya pêşî a dervî hiş wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê ew têkilîya dervî hiş, wê ew di çerçoveya hebûna mirovî a zindîyî de wê de wê hebê. Bi demê re wê ev rewş, wê di mejî de wê pêvajoyên peresendinê wê di hundûrê mejî de wê bide derbaskirin. Mejî, wê van rewşan wê di xwe de wê bêî ku ew wan derxê li hiş wê di xwe de wê bike temenê hinek pêşveçûnên giring ên fîzyolojikî de. Ew pêvajoyên fîzyolojikî ku ew pêşketin û her wusa ew rewşa wan bi pêşketina di mejîde re ku wê xwe da li der, wê hingî wê piştî wê re wê li ser wê pêvajoya wê ya di mejiyî de a weke ku ew temembûyî re wê pêvajoyek nû a din a duyemin weke di ast û dîmenekî duyem de ku wê bê dayîn destpêkirin, wê pêvajoya bihişkirinê wê xwe bide çêkirin. Temenê pêvajoyên pêşketina bihişkirin, wê di wan pêvajoyên pêşî ên berê de wê bi fîzyolojikî, bîolojikî û her wusa genetîkî wê biafirê. Li ser wê re wê di çerçoveya têgîna nifşên duyem de wê di mejî de wê pêvajoya hiş, wê li ser wê rewşê re wê di mejî de wê xwe bide dîyarkirin û destpêkirin.

Mirov, ku van pêvajoyên di mejî de ên li ser zindîyî re bi fîzyolojîkî, bîolojikî û genetîkî ku ew pêş dikevin, piştre ku wê li ser wan re wê kodkirinên di mejî de wê pêşbikevin ku em wan baş fahm nekin, wê xate peresendinê a pêşketina mirovê demê jî wê bi awayekî baş wê newê fahmkirin. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di rewşa aqilê mirov de wê, hertimî wê di vê çerçoveyê de wê ahengîya bi hevdûyî re wê ew were dîtin. Di rewşa mejîyê mirov de wê ev rewş, wê weke rewşek teybet a mejiyî bê. Di rewşa pêşketina jîyane komî de jî wê, rewş û pêvajoyna fîzyolojikî, bîolojikî û genetîkî û hwd wê hebin ku em divê ku wan li berçav bigirin di fahmkirina xwe ya rewşa jîyane komê de. Rewşa jîyane komê, di vê çerçoveyê de mirov, wê dema ku wê dike ku wê fahm bike, di vê çerçoveyê de wê, ya ku wê di serî de wê were dîtin wê ew bê ku wê jîyane komê, wê di nava xwe de wê gelek rewşan wê bijî. Rewşa komê, wê bi hebûna xwe re wê weke rewşek xêvî jî bê di rewşa pêşketina

mirovê demê de. Em dema ku wê rewşa pêşketina jîyane komî wê dikin ku wê fahm bikin, li vir, di serî de em vê yekê dibînin ku wê di nava jîyane komê de wê, bi pêşketinên weke xûyan re wê, rewşa komê, li ser rewşa mirovên wê re wê, bi awayekî li hevdû hoyandî wê pêşbikeve. Ew rewşa li hevdû hoyandî jî wê, weke rewşeka ku em wê nikarin dervî rewşa fîzyolojîkî, bîolojikî û genetîkî û hwd wê hildina li dest bê. Rewşa hoyandina li hevdû, wê di rewş û nêzîkatîya alimîn û fêrbûna li hevdû de wê bibê. Bi wê re wê di rewşekê de wê xwedîyê rewşekê bê. Mirovê demê wê, van rewşan wê bi xwe re wê di rewşek jîyanî de wê ew wê bijî. Rewşa komê, wê ew fêrbûnên ku ew wê bi wê re wê bijî li ser rewşên weke alimînê re wê, pêşî wê ew mirovê komê wê di nava rewşa xwe ya komî de wê kedî û ahl bibê. Piştre jî wê li ser wê re wê bidest alimîn û fêrbûna xwe bike. Wê bi wê re wê êdî wê pêvajoyên xwe yên pêşketinê wê di jîyane xwe de wê bi xwe re wê bijî.

Rewşa jîyane komê, ku mirov wê dike ku wê fahm bike, mirov heta demên serdema peleolîtîkê diçê. Her wusa, di çerçoveya jîyane komî de mirov dikarê serdemên peleolîtîkê, di wê de wan, destpêkên bi jîyane komî re wan bide destpêkirin. Bi wê re jî mirov, êdî wê, bi wê re pêde herê. Di rewşa serdema peleolîtîkê de wê, dema ku mirov di xiyale xwe de zore didiyê de mirov, digihijê têgîneka berfireh. Her wusa, serdema peleolîtîkê jî wê weke serdemek pirr berfirah.Di pêvajoya homo sapîens a dawî ku ew, weke pêvajoya ´homo sapîens sapîens´ dihê hanîn li ser ziman jî wê di wê de wê, ev rewşên komî wê pêşketî bin. Di rewşa jîyane komê de wê, dema dawî a serdema peleolîtîkê, wê weke serdemek ku wê di wê de wê gelek destpê wê werin û bibin bin.

Em dema ku vê demê li wê dihizirin, her wusa, wê di dewame wê de piştre hatina dema mezolîtîkê, wê weke demeka ku wê hin bi hin wê bi rewşa şert û mercên xwezayê re wê hin bi hin rewşên komî, nîv bi nîv ên malbatî û hwd wê pêşbikevin bin. Her wusa, wê di cihê weke şikeftan ku wê mirovê demê wê di wan de wê bijî, wê di wan de wê rewşên xwwe yên jîyanî wê zêdetirî wê bide nîşandin. Di vê demê de wê, were dîtin ku wê, di çerçoveyeka jîyane komî de wê, hin bi hin wê rewşa komkirinê û ankû berhevkirinê jî wê pêşbikeve. Lê di dema mezolîtîkê de wê zêdetirî wê mirovê demê, ku ew heta wê demê wê bi goştxwarîya xwe wê bijî, wê di vê demê de wê hin bi hin wê rewşên xwarinê ên weke negoştî jî wê, werina kifşkirin. Minaq, rewşên weke kifşkirin û xwarina cûreyên hinek şînahîyan. Serdema mezolîtîkê, wê serdemek pêşketî bê(*). Wê di wê de wê, hin bi hin wê li gorî jîyane komî ku wê çawa wê were jîyankirin, ew dihê dîtin û pêşxistin. Bi wê re jî wê, girêdanîya bi hevdû re wê pêşbikeve. Di vê demê de wê, gelek cûreyên din ên nêçîrkirinê wê werina pêşxistin. Minaq, wê weke cûreyên ku wê, weke ku wê ji gol, çem û keviyên bahran wê girtina

----------

(*)Ji rengên pêşketinên wê, mirov fahm dikê ku wê dema mezolitîkê wê, zêdetirî wê bi aliyê dema neolîtîkê ve wê, xwediyê rengekê pêşketinê bê. Ji wê aliyekê ve wê, mirov dikarê weke dema wê ya destpêkê jî wê mirov dikarê wê, werênê li ser ziman. Wê rengê jîyane komî a civakî a dema neolîtîkê wê di wê demê de wê zêdetirî wê pêşkeve. Wê kom wê hin bi hin wê, ji rewşên weke girêdanên xwûnê wê hin bi hin wê derbasî astek bilindtir weke ya di rengên çandî û hwd de jî. Ev jî wê, dide nîşandin ku wê, şêwayekê civakî ê seretayêî wê xwe biwê re wê bide dîyarkirin. Di wê demê de wê ji aliyekê din ve jî wê cûreyên nêçîrkirinê wê zêdetir wê bibin û wê pêşkevin. Rewşên weke masîgirtinê jî wê, pêşlkevin. Çêkirina xafkan wê pêşkeve. ..

masîyan û hwd, wê were girtin re wê were pêşxistin. Hin bi hin wê bi demê re wê cûreyên şînahîyan ku wê çawa wê bi avdan û çandiniyê wê ji wan zêdetir wê bidest bixin, wê werina pêşxistin. Kifşkirina çandiniyê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê, were dîtin. Herêmên ber diclê û firatê, wê di vê çerçoveyê de wê herêmna pirr zêde bi bereket bin. Piştî dawîlêhatina dema dawî a qaşayê, wê gûharînên mazin wê di birehê de wê bibin. Her wusa, wê di rewşa şînahîyan de jî wê gûharîn wê bibin. Piştre wê, bi hewkirinê re wê, hinek rewşên şînahîyê ku ew bi avdanê wê werina ji wan sûdgirtin ku wê werina pêşxistin wê bên pêşxistin. Ev jî wê, di serdemên weke yên mezolîtîkê de wê, pêşbikeve. Di nîşanakên ku ji şikefta şanîdarê dihên derxistin de wê, bi îsleketê mirovê şanîdarê re wê were dîtin ku wê mirovek ku ew li dora 45 salan dijî, wê di nava komê de wê were lê nerîn û meyîzendin. Di vê dema mezolîtîkê de wê weke ku wê di nava civake şanîdarê û ya natûfîya de wê were dîtin ku wê, ji didanê fîlan wê di nêçîrkirinên xwe de wê bikarbênin. Her wusa, bi wê re jî wê ev jî wê were dîtin ku wê, di vê serdemê de wê, çanda çandiniyê wê hin bi hin wê were kifşkirin. Dîsa em bi gelek minaqan weke ku mirov ji nava civakên seretayî kifş dike, wê hin bi hin wê bi awayekî ne zêde jî bê, wê di vê dema mezolîtîkê de wê hebûna komên civakî ên şivan wê xwe bidina pêşxistin. Lêê em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, di serdemên mezolîtîkê de wê deverên weke deverên şanîdarê wê bi berdewamî wê weke deverna ku wê li wan bicihbûn bûbê û

di wan de wê jîyankirin wê hebê bê. Di vê çerçoveyê de wê di rewşekê de wê xwe bide nîşandin. Rewşa jîyane mirovê demê wê, di dema mezolîtîkê de wê, bi xwe re wê gûharînên nû wê bijî. Bi dawîlêhatina serdema dawî a qaşayê re wê demek nû wê destpê bike. Wê di rewşa jîyane komî de wê, gûharînên mazin wê xwe bidina destpêkirin Di rewşa jîyane komî de wê di vê demê de wê hin bi hin wê komên civakên şivan, wê derkevina li pêş. Komên civakên şivan, wê weke komna ku wê ew wê kedîkirin û ahlkirinê wê pêşbixin bin. Ev jî wê weke destpêke pêvajoyek nû bê. Wê di nava jîyanê de wê, bi kedîkirina sawalan, wê ji nêçîrkirina wan zêdetirî û cûdatirî wê rewşekê wê bide derxistin li holê. Her wusa, di vê çerçoveyê de em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê şivanî wê bi kedîkirin û ahlkirinê re wê rewşên nû ên cûda wê pêşbixê. Di vê demê de wê hin bi hin wê di çerçoveyek jîyane komî de wê, mêr di nêçîrkirinê de wê derkeve li pêş. Jin jî wê, di nava wê rewşa xwezayê de wê weke zindîyeka ku ew berhev dike wê derkeve li pêş û wê weyna xwe ya di jîyanê de wê bileyizê.

Rewşa jîyane komî, wê di vê çerçoveyê de wê hin bi hin wê pêvajoyên nû wê bi xwe re wê bijî. Wê rewşên nû wê bi xwe re wê pêşbixê. Wê di herêmên ku ew têkiliyên wan weke ku ew ji herêmên din qût in, wê komên civakî wê li ser temenê xwe wê pêşbikevin. Minaq, li herêmên parzemîna emerîka, komên weke li perûyê, meksîka û hwd wê wusa bê. Ev rewş, wê li herêmên din jî wê wusa bê. Di vê çerçoveyê de wê ev kom, wê gelek nifşan wê li ser hevdû di rewşa jîyane xwe de wê derbas bikin. Wê pêşveçûnên xwemalî wê di nava xwe de wê bijîn. Herêmên weke kurdistanê û hwd, wê weke herêmna vekirî bin. Wê hertimî wê temenê hatina komên nû li herêmê wê hebê. Û hatin bibê jî.

Li herêmên kurdistanê, hebûna çemên diclê û firatê, wê hertimî wê weke teybetîya wê ya sereka a kifşkir bê. Wê rewşa avdanê, nêçîrkirinê û hwd wê, zêdetir bike. Her wusa wê hewirdora wê ya ku wê ya ku ew tişî daristan in, wê bi kerîyan wê cûreyên sawalên din wê bijîn. Ev jî wê weke aliyekî din ê ku mirov divê ku wê, mirov li ser wê bisekinê bê.

Di parzemîna Asya de wê, piştî dema dawî a qaşayê û dawî lê hatina wê, wê pêvajoyek nû wê li wê, destpê bike. Wê gelek komên ku wê li wê dijîn, wê bibin. Wê bi wê re wê derfetên jîyanê wê zêdetirî wê li wê hebê. Her wusa, di çerçoveyeka şopandina li peynêçîran de wê mirovên nêçîrvan wê heta ber diclê û firatê wê werin. Her wusa wê di vê demê demê wê rewşek teybet wê hebê.

Di serdemên piştre ên şariştanî de wê, deverên ku wê wê gund û bajarên sûmerîyan wê li kurdistanê li ber çemên diclê û firatê wê ava bibin, ev dever hemû jî wê, mejûyeka wan ya bi jîyanî ku wê heta serdemên mezolîtîkê û berî wê ya peleolîtîkê wê, hebê. Di vê çerçoveyê de wê ev rewş, wê weke rewşek teybet bê. Pêvajoyên pêvajoyên ku wê ji dema jîyane neolîtîkê a civakê a bi ber ya şariştanîyê de wê pêvajoyên weke yên ***hassûna***, *samarra, tel-helef, abeyd, uruk, cemdet nasr û hwd* ku wê li dûv hevdû wê bên şopandin û wê pêşbikevin jî wê di vê çerçoveyê de wê têgîneka ku ew bi xate pêşketina jîyane civakî a ji serdemên civakî ên neolîtîkê û heta ya serdemên jîyane civakî ên demên şariştanîyê û hwd wê bidina nîşandin bin. Di vê çerçoveyê de ew, pêvajoyên jîyane civakî ku wê ji hewkirinê, berhevkirinê û bi ber rewşa çandiniyê de wê pêşbikevê, wê ev herêmên ber diclê û firatê ên kurdistanê bin. Herêmên kurdistanê, ên weke li herêma botanê weke cizira bota, herêmên amedê, erxanî, herêmên rehayê û heta ku wê herê herêmên rojavayê kurdistanê wê, di vê çerçoveyê de wê di derbarê çanda çandiniyê, berhevkirinê û hewkirinê de wê nîşanakên ji demên berê wê di xwe de wê bihawênin. Bi wê re jî ji herêmên ber zagrosan û bi ber herêmên din ên başûrê kurdistanê ve wê, ev rewş bi heman rengê wê were dîtin. Minaq, herêmên weke Zaxoya roja me ku wê di serdemên sûmer-gûtîyan de wê weke ´kumma´ jî wê werê bi navkirin, wê ev herêm, wê herêmek avî bê. Wê bi bilindahîya çemê diclê û xabûrê re wê ev herêm di rewşek cûda de bê. Hin bi hin wê li van herêman wê çanda çandiniyê wê pêşbikeve.

Di rewşa demên mezolîtîkê de wê, ev dem û çanda wan wê, bi vê rengê wê di pêvajoyek xwe ya pêşketinê de bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê ev herêm, wê bi xwe re wê, weke herêmên ku wê di serdema mezolîtîkê de wê, pêşveçûnên giring ên civakî ku wê li wan bibin bin. Çanda neolîtîkê, wê weke çandeka pêşketî wê li van herêman wê hebê. Dema ku çanda neolîtîkê a li kurdistanê ew dihê şîrovekirin, hertimî wê bi nerîn, têgîn û çavdêrîyeka pêşketî wê ew hanîna li ser ziman ji ya li herêmên din, wê hinekî jî wê, sedema wê, di çerçoveya wê ya rewşa wê ya ardnîgarîya wê û pêvajoyên yên pêşketin ve de bê. Çanda neolîtîkê a kurdistanê(*), wê di xatekê de wê xwe bide dîyarkirin. Di aslê xwe de mirov, dema ku wê çanda neolîtîkê li kurdistanê wê bike ku wê fahm bike, ji rewşa civake kurdistanê a kurd ku ew heta roja me, tevî hemû astengî û hêrîşan bi xwe re dijî wê,

di wê de wê gelek nîşanakên ji van deman ku wê xwe di hemû şert û mercan de wê bidina domandin wê hebê di wê de. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa hebûna civake kurdistanî a kurd, wê bi jîyane wê re wê xwediyê rewşek jîyanî a neolîtîkî a di berdewamîya jîyane xwe de bê.

Di rewşa pêvajoyên jîyane berîdîrokê a li herêmê de wê, rewşên ku wê werina dîtin li herêmê wê ew bê ku wê, li herêmê, wê piştre jî wê di pêvajoyên jîyane şariştanî de wê, ev çanda wê ya civakî a berî jîyane dema şariştanî wê di nava xwe de wê were parastin. Heta roja me jî wê di nava kurdan de wê, xosletên jîyane dema neolîtîkê û civaketîya wê, wê di nava civake kurd de wê, xwe bide parastin. Di vê çerçoveyê de wê, ne tenê hebûna herêmên kurdistanê wê weke herêmna ku wê li wan serdemên neolîtîkê wê li wan wê zûtirîn wê bibê. Her wusa, civakên weke civakê kurd ku wan, karîya xwe hebûna xwe heta roja me werênin, wê di vê çerçoveyê de wê wateyeka wê hebê. Kêm civakan ji wan demên kevn ên berîdemên şariştanîyê karîna hebûna xwe bidina domandin. Civake kurd, wê civakên ku wê karîya hebûna xwe bide domandin a îstîsna bê.

Pêvajoyên jîyane civakê, wê her wusa wê xwe wê di çerçoveyê de wê bidina dîyarkirin. Xosletên jîyane civakî wê ji wê demê û heta roja me, wê bi civakê re wê hebûna xwe wê karibin bidina jîyankirin. Civake kurd, ku ew heta roja me, weke civakek ´çîyayî´ ku ew dihê pênasekirin û hanîn li ser ziman, wê bi wan xosletên wê yên civakî ên kevn re bê.

Li vir, em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê pêvajoyên serdemên civaketîya serdema neolîtîkê, wê bi xosletên xwe re wê, di vê çerçoveyê de wê heta roja me, bi hebûna civake kurd re wê bide domandin. Di vê çerçoveyê de rengê pêşketina wê ya jîyanî û ankû rengê jîyane wê ya ku ew bi civakî dijî, ku mirov li wan dinerê û wê dike ku wê fahm bike, her wusa di vê çerçoveyê de mirov, bi van xosletên wê re wê kifş dike. Rewşa jîyane civakî a herêmê, wê

-----------

(*)Ji pêvajoyên çanda neolîtîkê a li kurdistanê mirov wê fahmdikê ku wê, jîyanek çandî wê hin bi hin wê pêşkeve. Wê derketina li ser giradana bixwûnê a bi hevdû re. Wê aliyekê çandî ku mirov wê bi girêdana xwûnê a bi hevdû ve girêdayî re wê dikarê wê, kifşbikê û wê werênê li ser ziman. Li pirraniya deverên ku wê li wan nîşanakên ji dema neolîtîkê hena wê li wan wê, nîşanaka kedikirina sawalên weke sa û hwd wê, were dîtin. Di dewama wê de wê, werê dîtin û kifşkirin ku wê, sawalên weke ku ew bi garani û ankû keri digerihin wê ew bi wê rengê wê werina girtin û ahlkirin. Wê ji wan wê şir û tiştên wusa wê bê girtin. Li herêmên bakûrê kurdistanê ên weke qaxizmanê û hwd wê, di şikeftekê de wêneyên xizkirî ku ew hatina dîtkin wê di wan de wê were dîtin ku mirov wê, bi sawalan re wê biçêrê. Mirov wê, dibînê ku wê, di vê demê de wê, pêvajoyek bûhûrîner a gûtbûna ji wê rengê jîyanî wê bijî. Di dewama wê de wê, bikomî wê demên dirêj wê li deverekê wê bijîn. Di wê çerçoveyê de hemû deverên ku em weke deverên gûndîtî ku wê li wan di demên neolîtîkê de wê li wan wê were jîyankirin ku em li wan dinerin em, dibînin ku wê, nîşanaka pêvajoyên dirêj ên bi hevdû re li wê jîyankkirinê wê bibê.

hertimî, wê ji aliyekî ve xwe wê weke ku wê li ser rengên jîyane civake koçerîyê û hwd, wê di pêvajoyên jîyane şariştanîyê de wê hertimî wê bike ku ew li berxwe bide û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê, wateyek wê hebê.

Pêvajoyên serdema civake neolîtîk, li herêmê bi hebûna jîyane civakî re wê bi xwe re wê piştî demên mezolîtîkî ên destpêkê re wê li herêmê wê pêşbikevin. Di serdemên neolîtîkê re wê çandinî û şîvanî û hwd wê bi jîyane xwezayê re wê zêdetirî wê derkeve li pêş. Bi wê re jî wê naskirna cûreyên şînîyan û ji wan sûdgirtin weke di çêkirijna xwarinê û hwd de wê, aliyekî din ê vê jîyane civakî bê. Jîyane civakî a destpêkê, wê ji xosletên xwe jîyane komî a demên peleolîtîkê ku ew wê hertimî hebûna xwe li ser nêçîrkirin û goştxwarîya xwe re wê bide domandin, wê, di demên civaketîya neolîtîkê de wê, xosletên xwe têrkirina bi şînahîyan jî wê tevlî wê bike. Her wusa, kerîyên sawalan ên ku ew bûna û ew ji şînîyan di çêrên, ku ew ji aliyê mirovan dihên dîtin, wê pêşî, wê weke rêyeka xwe gihandina wan şînahîyên ku ew sawal dixwûn, wê weke wan wê bikin ew jî bi sawalan re biçêrin. Di nava xîzkirinên wêneyî ên li hêtên şikeftên kurdistanê de ku ew dihê dîtin ew a ku wê çendî ku wê gelek sawalên ku ew hatina nêçîrkirin wê wrina xîzkirin, wê bi heman rengê wê wêneyên kku ew hatina xîzkirin û di wan de mirov di nava sawalan de diçêrê wê were dîtin. Minaq, di şikeftên ku ew malên jîyane civake dema neolîtîkê bûn li dora qaxizmanê na, wê di wan de wê wêneyên bi vê rengê wê werina dîtin.

Bi wê re jî mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê serdema civake neolîtîkê de wê ew wêneyên ku ew hatina xîzkirin, wê ew weke wêneyna ku wê, ew wê weke hin bi hin wê li wan alaqa û bawerî wê pêşbikeve.Pêşî wê alaqa wê pêşbikeve.Piştre jî wê bawerî wê hin bi hin wê pêşbikeve. Alaqa, wê di temenê wê de wê têgîna fahmkirinê û ankû armanca fahmkirinê wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, ew jî wê hebê. Lê wê di vê demê de wê were dîtin ku wê rengê bawerîya demê wê li ser têgînên afsûnî re wê pêşbikeve. Herwusa, bawerîya ku wê, *ew tişt wê tiştekî ji min bike* û hwd, wê weke têgîneka ku wê di

vê çerçoveyê de wê bi temenî pêşbikeve bê. Yekî ku ew destê xwe li mirov nexê û bawer bike ku wê tiştekî karibî li mirov bike, wê di vê çerçoveyê de wê were hizirkirin. Lê li vir, di aslê xwe de em divê ku bandûra wê têgîna gotinê ku ew hê nûka dihê derxistin li têgihiştinê, em li ser wê divê ku em xabatekê bikin di çerçoveya fahmkirina vê rewşê de. Ber ku wê di vê çerçoveyê de wê ev rewş, wê nîşanaka pêşketina têgînên hevbeş jî bê. Hizirkirina, bi rengê ku yek bi gotina ku ew ji devê xwe derxê û wê karibê wê, weke têgîneka ku wê di mejiyê herdû aliyên ku ew bi wê dihê hizirkirin re ew dihê fahmkirin ku ew wateya wê gotinê çî ya. Yanî bi gotineka din, dihê hizirkirin ku ew dema ku gotineka nebaş bibêjê, wê tiştekî nebaş wê were serê wî.

Têgîna afsûnê, wê di temenê wê de wê ji aliyekî ve wê aqilê têgîna ´başîyê´ û yê ´nebaşîyê´ wê hebê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî wê werênê li ser ziman ku wê ew weke aliyekî giring wê hebê bê. Di vê rewşê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têgîna afsûnê, di vê çerçoveyê de wê weke têgîneka ku ew di çerçoveya fahmkirina van herdû aliyan de bê. Bi wê re jî wê, ew were hizirkirin ku ew wê çawa bê. Tiştek ne zindî ku ew dema ku mirov dihizirê, wê weke ku ew zindiya, wê demê ew dikarê tiştekî xirab werênê serê mirov jî. Di vê çerçoveyê de hizirkirina li tiştan, weke zindî û ankû tişten ne zindî ku ew dikarin xirabîyê werênina serê mirov, wê di vê çerçoveyê de wê weke têgînekê wê pêşbikeve. Bawerîya li wê, wê weke rengê fahmkirina di wê çerçoveyê de bê. Minaq, di nava xwezayê de wê gelek cûreyên şînahîyê û ankû geya wê hebin. Dema ku mirov wan tahm dike, hinek ji wan şêrîn, hinek miz, hinek tirş, hinek zimanê mirov di şawitênin, hinek ku mirov wan diavêjê devê xwe mirov diêşihê û hwd, wê bi vê rengê wê gelek ji wan rewşan wê hebin. Mirov jî ew, dema ku van şînahîyan tahm dike û ev rewş dihêna serê wî, wê weke rewşna ku wê bi vê rengê wan bijî bê. Di vê çerçoveyê de wê her rewşa ku ew jîyankir, wê di vê demê û pê de wê, di mejî de wê cih bigirê. Têgîna tahl, şêrîn, miz, tirş, şor, û hwd ku mirov wan kifş dike, wê ew di mejî de wê kifş bibin. Miirov wê bi demê re jî wê bikeve hişê wan de. Di vê çerçoveyê de wê ev rewş wê bi demê re wê pirr zêde wê pêşbikevin.

Rewşa têgîna bawerîyê a dema neolîtîkê de wê di vê çerçoveyê de wê li ser kifşkirina têgînên bi vî rengî ên fîzyolojikî re wê pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de wê, her tişta ku ew bêî ku mirov destlêda û ankû ew gihişt fîzîka mirov û bandûra wê li mirov bû û pê de wê, di vê çerçoveyê de wê rengê têgîna afsûnî a bawerîya demê wê bi xwe re wê bide dîyarkirin.Li vir, divê ku em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê têgîna bawerîyê, wê di vê çerçoveyê de wê weke têgîneka ku wê dema ku mirov kifş dike ku mirov nexweş ketîya ji tiştekî, ketîya bin bandûra tiştekî û hwd de bê. Rewşên weke wêneyên xîzkirinê ên di hêtên şikeftan de ku ew hatina kirin, ew di destpêkê de wê ne bi armanca bawerîyek bi vî rengî bin. Ew di destpêkê de wê bi armanca bawerîyeka bi xwe bawerbûnê wê werina çêkirin bin. Minaq, mirovekî ku wî nêçîrek kir û ew nêçîr ku ew pirr zêde mazin bê, wê wêneyê wê xîz bike ku ew ji aliyekî wî ve hatîya xîzkirin. Her çendî ku wê tenê ew sawal û hwd wê were xîzkirinê jî di wê wênekirinê de wê, bi wê re wê di dema ku wê mirovê komê ku ew li wê wêneyê xîzkirî dinerê, wê ji wê xîzkirinê zêdetirî tiştan ew dibînê û ankû di mejiyê xwe de ew dizanê. Di mejî de wê, ew wêne, wê çerçoveyek têgînî wê bi xwe re wê bihawênin. Di aslê xwe de ew wênekirin, wê nîşanaka wê jî bê ku ew ya hatî hizirkirin weke ku ew razber a ku ew bi şenberî li ser minaqekê re ew were hanîn li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de ew rewş, wateyek din jî bi xwe re wê bi vê rengê wê bide nîşandin. Di rewşa gihiştina wê têgînê de wê, jîyankirin wê kifşkar bin. Bi wê re jî wê, rewşên jîyanî wê di vê rewşê de wê xwediyê rewşek kifşkirinî bin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê di vê çerçoveyê de wê têgîneka bawerîyê wê bi demê re wê were pêşxistin. Mejî, wê di xwe de wê bi xêvkirinê re wê pêşî bidest nivîsandinê wê bike. Piştre jî wê bi demê re wê bi gotinî ev were kirin. Bi gotinî her salixkirin û ji berkirina wê û bûyîna malê gelek mirovan bi hevbeşîbûna wê re wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wateyekê jî bê. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê di vê çerçoveyê de wê têgîna aqilkirinê wê pêşbikeve. Xêv û gotinkirin, wê di vê rewşê de wê weke rewşna giring ên ku mirov wan di vê çerçoveyê de li ser têgînîya aqilî re ku wê fahm bike bê.

Minaq, têgîna bawerîyê a demê, weke mijareka ku em çendî ku wê dikin ku wê fahm bikin, wê bi xiyalkirina me re wê ew me di nava xwe de kûrtirkirîn wê bibê bê. Di vê çerçoveyê de wê, weke rewşeka ku emê hê jî li ser wê bisekin bin.

Di rewşa têgîna xiyalê de wê, di dema neolîtîkê de wê, weke ku em wê dibînin wê hin bi hin wê pêşbikeve. Pêşî, wê her tişt wê bi mejî û bihiş wê were dîtin. Bihiş bidest dîtinê kirin, wê weke ku mirov

xewnekê bibînê bê. Çendî ku mirov şîyar bê û ankû razahî bê, wê ev rewş wê wusa bê. Mirov, wê di vê demê de wê, di vê çerçoveyê de wê têgînên bawerîyê wê li ser rewşên ku ew dijî re wê bijî. Lê ev rewşa fahmkirina bawerîyê û pêşketina wê, wê me ji du aliyan ve wê bike ku em kûr bibin û di wê de pêde herin. Aliyê pêşî wê li ser aqil û pêşketina wê ya bi hiş re bê. Aliyê din ê duyem jî wê li ser rewşa malbatîtîyê re bê. Em li vir, dema ku vê rewşê hildina li dest, wê di serî de wê rewşa malbatîtîyê wê xwe weke têgînekê wê bide dîyarkirin.Her çendî ku weke ku du mijarên ku ew hinekî weke ku ew hinekî ji hevdû dûr in jî lê wê, dema ku mirov li wan dihizirê, mirov wê dibînê ku wê ji hevdû ve wê di çerçoveya têgînîya wan de wê bi hevdû ve wê girêdayî bin. Di aslê we de wê, têgîna bawerîyê ku ew pêş dikeve, wê bi serê xwe wê weke nîşanaka pêşketina ya malbatîtîyê di dema neolîtîkê û hwd de bê. Di dema mezolîtîkê de wê, zêdeyî ev rewşên malbatî, wê di çerçoveyek komî a ku ew hinekî bi têgînî bûya re wê bimeşê. Lê wê di dema neolîtîkê de wê ev rewş wê bi awayekî têgîna malbatîtîyê bide nîşandin. Ya ku wê dawîyê li serdema mezolîtîkê bênê û wê dema neolîtkê wê bi xwe re wê bide destpêkirin jî wê ev bê. Di dema neolîtîkê de wê têgîna malbatîtîyê, bawerîyê û her wusa ya hiş wê bi hevdû re wê di ahengekê de wê pêşbikevin. Di vê çerçoveyê de wê, rengê malbatîtîya dema neolîtîkê ew lêkolînkirin û fahmkirina wê, wê di aslê xwe de wê, di vê çerçoveyê de wê gelek rewşên giring jî wê bi xwe re wê bide hanîn li ser ziman. Di rewşa têgîna malbatî a dema neolîtîkê de wê, di vê çerçoveyê de mirov, ku wê dinerê, wê ew were li berçav ku ewê ew nêvî bi nêvî malbatîtîkî û nêvî bi nêvî wê di çerçoveya jîyan komî bê. Wê di vê çerçoveyê de wê di rewşa fahmkirina têgîna malbatê a wê demê de wê were dîtin ku wê têgîna komîtîyê û ya malbatê ku ew di zikhevdû re çûyîna û bûhûrîna û di hevdû de ew hevdû dijîn wê di rewşekê de wê rewşa wê, wê were dîtin li berçav. Em dema ku vê rewşa dîtina malbatî a demê wê dikin ku wê fahm bikin, her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê di rewşek malbatî ku wê bi ben û girêdanîyên bîolojikî û hwd ve wê li ser rewşa dayikê û ankû dê re wê bi hevdû ve wê girêdanîya bi xwûnê û ankû xizmî wê hebê. Wê di vê çerçoveyê de wê ew rewşa malbatîtîyê wê hebê. Her çendî ku wê, hê rewşên kifşkar ên weke rewîstê ku ew rengê têkilîyan didina dîyarkirin ew hê pêşketî na û ne kifşkar in di rewşa têkilîyan de û pêşîya serbestîya xwe jixwerebûyîna nagirin jî lê wê, di vê rewşê de wê, di serdema neolîtîkê de wê derî li wan pêşveçûnan jî wê hin bi hin wê vebê. (*) Ji xwe, em li vir, gotinekê bo dema li pêş bibêjin wê, piştre ku wê ev pêşveçûyînên li ser rewîstê re ku wê ew wê bibin, wê ew di çerçoveyê de wê reng û şamale rengê pêşketina têgîna şariştanîyê wê hin bi hin wê bi xwe re wê bide dîyarkirin. Ev jî wê, nêvî bi nêvî wê weke dawîlêhatina dema neolîtîkê û rengê pêşketina wê ya civakî jî bê.Dema neolîtîkê, wê ev rewşa wê ya malbatî, wê di nava komê de wê hin bi hin rengê pêşketina jîyane komê jî wê bi xwe re wê bide dîyarkirin. Wê kom, wê bi wê re wê nikaribê zêde ew di rewşa xwe de ew pêşve herê. Li ser rewşa malbatîtîyê re wê rengê komî û jîyane komî ku wê pêşve herê, wê weke rengekî wê li ser rengên têgînên aqil û hişmendîyê re bê. ev jî wê, bi demê re wê nîşanaka rengên pêşketinên nû bê. Di nava komê de wê rewşa têkiliyên xizmî wê di rewşa pêşketina têgîna malbatî de wê rewşek kifşkar wê bistênê. Lê bi wê re wê kom, bixwe jî wê weke rewşek malbatî a giştî wê xwediyê wateyekê bê. Kom û endamên wê, weke endamna ku ew bi girêdana xwûnê ku ew bi hevdû ve girêdayî bin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse wê bike. Di rewşa fahmkirina wê de wê, ev rewş, wê weke aliyekî giring ê wê, wê xwe bi demê re wê bide dîyarkirin. Rewşa têgîna komê, wê di vê çerçoveyê de wê, xwe bide pêşxistin. Lê wê rengê têgîna civakî ku ew jî wê li ser pêşveçûnên aqilî re wê xwe bide dîyarkirin, wê ew hebê. Di nava komê de wê, bi demê re wê ew rewşa baviksalaliyê û dayiksaleliyê a ji piçûkatiyê û heta ber mazinbûnê ve wê pêşbikeve. Bi demê re wê, dema ku

-----------

(*)Pêşveçûnên herî zêde giring ên vê demê ên di meji de ku wê bibin bin. Wê mirov wê, mejiye wî bidest girtinê wê bikê. Lê ew wê ne di farqê de ya. Minaq wê, xewnekê wê bibînê û piştî ku ew rabû ji xewê wê, wê rewşa xewnê wê nebînê di rewşa jîyane xwe de. Wê ev rewş wê, ji wî re wê, weke rewşên bi sahw bin. Wê ji wan wê bitirsihê. Wê dengên ku wî girtina wê, di mejiyê xwe de wê wan dengbikê. Wê ew bi wan re wê weke ku ew jinûve wê rewşê dijî wê, li dora xwe binerê û wê bikeve rewşekê de. Wê baran barê lê ew wê fahmnekê ku ew ber çi bûya. Lê wê bi jîyankirina wan rewşan re wê fêrî wan bibê.

Di rewşa jîyane xwe de wê, demek dirêj wê pirsgirêka adaptasyonê wê li ser rewşên mejiyê xwe û jîyane xwe re wê bi hevdû re wê bijî. Wê çawa wê têkiliya wan wê bi hevdû re wê dênê wê, nizanibê. Ji xwe wê dema ku ew care pêşî fêrî wan bû wê, ew bê destpêka pêşxistina toteman a bi wî û jîyane wî re. Wê hin bi hin jî wê, pêvajo wê bi ber wan ve wê herê. Di wê rengê û awayê de wê, pêvajoyeka ku ew di wê de dijî wê, bijî. Her çendî ku em i ro dibîjin ku aqil piştî ku wê pêşkeve wê, mirov bi wê serdestî li jîyanê bê jî lê wê rewşek vajî wê, di destpêka wê pêvajoyê de wê, mirov re wê biafirê. Wê rewşên ku ew diafirin wê, mirov wê weke dilgirtinê wan rewşên mejiyê xwe û bandûra wan a li jîyane xwe bê.

Fahmnekirina bi aqil û rewşên ku ew mejiyê wî digirê wê, rewşek pirr bi xolubatî û bandûrker wê di jîyane mirov de wê biafirênê. Wê di destpêkê de wê, ew aliyê din ê di mejiyê xwe de ku ew bi xewnê dibînê û ankû di meji de weke bidest xiyalkirinê dikê û dibînê wê, weke aliyekê

din ê jîyanê ku mirov wê dikarê di wê de bijî wê tefkir bikê. Wê piştre wê, bi heman rengê wê ew wê wan bi hişbikê. Hınek qabristanên ji wê demê ku mana wê di wan de wê, gelek tiştên ku wê weke ku mirovek herê bi rêwîtîyekê bi xwe re bibê ku wê di wê de wê bicih bikin wê di wê de wê werina dîtin. Wê dema kiu ew mir wê, were hizirkirin ku ewê herê wê aliyê din ê ku ew dibînê di serê xwe de. Ev rewş wê di dewama hevdû de wê werin û pêşkevin.

wê dê û bavê pîr ku ew mazin bûna û ku ew mirin, wê ew rewşek mayînda wê di mejiyê zarokan de wê bihêlin. Wê zarokên wan ên piştî wan re wê wan ji bîr nekin. Wê ew hertimî wê bikin wan di mejiyê xwe de wê zindî bihêlin. Ji xwe, ew bixwezin jî û nexwezin jî ew zindî mayîna di mejî de wê bi hişmendî wê êdî wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, ev rewş, wê piştre wê, li deverên ku wê wan binax bikin, wê tiştan weke yên wan ku ew didina wan wê dênin. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê, ev tevger û xûyên ku wê ji mirov re wê weke ku wê acêb werin, wê bi demê re wê temenê têgîna boraqdayînê û ankû korbandayînê wê pêşbixê.

Bav û ankû dayika mazin ku ew mir, wê ew wê piştre jî wê mirov, weke ku ew razahî bê û xewnê bibînê wê ew di mejîyê wî de wê ew bivejin. Wê weke ku ew bi wan biaxifê, wê dem bi dem wê ew karibê gotinan jî ew werênê li ser ziman. Di aslê xwe de wê ev rewş, wê ji aliyekî ve wê weke aliyekî giring ê ku mirov dikarê wê weke temenekî pêşketina têgîna bawerîyê jî wê werênê li ser ziman. Têgîna gîyanîtîyê, ew hê mirov di wê demê de ne dihişê wê de ya. Lê di rewşek weke bi vê rengê ku ew weke ku ew xewn dike wê(dê) û ankû wî(bav) bibîr dike, wê di vê rewşê de wê, temenê wê pêşketina rewşek bi vî rengî jî bê. Wê ji rewşek bi vî rengî re wê bê minaqek û ankû rewşek fîzîkî a bi aqil jî û ankû di mejî de ku ew dihizirê û ankû bihizirkirinê ew pêşxistîya bê. Lê dîsa wê çavkanîya wê têgînê jî wê ew mirovê ku ew jin bê weke dayik û ankû mêr bê weke bav ku ew jîyane û ew di jîyane mirovan şahîdî ji jîyane wan re kirîya bê.

Di vê çerçoveyê de wê rewşa dê û bav a jîyankirina wan a di nava komê de wê, di vê çerçoveyê de wê hebê. Bandûra wan, heta ku ew pîr dibin, wê di nava komê de wê pirr zêde wê bibê û wê derkevina li pêş. Di vê çerçoveyê de wê dema ku ew mirin, wê êdî wê ew piştre jî wê bi qadrekî wê werina bîrhanîn. Wê ew werina jîyankirin. Wê li ser wan re wê têgîna bi mezelkirinê wê were pêşxistin. Yanî bi gotineka din wê mirî, ku ew werina defnkirin. Ev jî wê bi demê re wê di vê demê wê pêşbikeve. Hê di dema mezolîtîkê de mirov, rastî rewşên weke defnkirina di mezelê de mirov wê kifş dike. Di dema neolîtîkê de wê ev rewş wê pêşketîtir wê pêşbikeve. Wê di astek zêde pêşketîtir de wê were dîtin.

Rewşa malbatîtîyê, wê di pêvajoya wê pêşî a di dema mezolîtîkê û piştre di dem neolîtîkê de jî wê di nava rewşa jîyane komî de wê meygirtina xwe wê bigirê. Wê di wê çerçoveyê de wê hin bi hin wê li ser rewşa çêbûna zarokan a ji dê re wê pêşbikeve. Wê di aslê xwe de wê li dora dê wê rewşa malbatîtîyê wê pêşbikeve. Mêr, di vê demê de wê weke yekî barrî ya. Hertimî li derve ya û nêçîrê dike. Lê jin ew hertimî ew li mal a. Ew di nava komê de ya. Ew  li dora wê, zarok mazin dibin. Zarok, di pêvajoyên xwe yên mazinbûnê de wê, ew bi wê re wê mazin bibin. Ev jî wê, ya giring ku wê di mejiyê wan de wê bicih bike jî wê dayika wan bê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa wan ya dayikî wê di çerçoveya wan ya malî û ankû malbatî de wê ew li pêş bê. Di vê çerçoveyê de em, divê ku vê yekê jî em wê werênina li ser ziman ku wê, ev rewşa jîyane komê a li dora dayikê wê hin bi hin wê rewşa têgîna malbatîtîyê jî wê xort bike. Dayik, wê di rewşa jîyane xwe ya komî û malbatî de wê, di rewşek berhevkirinê de wê, xwediyê rewşek jîyanî bê. Mêr, wê di rewşek derve ku ew nêçîrê dike de bê. Di vê çerçoveyê de wê ya ku ew hat destê dayikê wê, ew di nava zaroyên xwe û yên li dorê ên pîr û kal de wê parve bike. Di vê çerçoveyê de wê rewşek meyizendinê a di nava jîyane komê de wê ev pêşbikeve. Ev rewş, wê bi demê re wê zêdetirî wê pêşbikeve. Her wusa, di dema neolîtîkê de wê, rewşa kedîkirina kerîyên sawalan wê bibê. Sedemek wê jî wê, rewşa şîrdayîna wan sawalan bê. Sawalên ku ew dikarin şîr bidin, wê ew sawal bi teybetî wê werina kedîkirin weke kerîyan. Wê mirovê komê, wê ji wan kerîyên sawalan, wê fêrî hildana şîrê wan sawalan bibê ku ew bi wan bijî. Ev jî wê, rewşeka teybet wê bi demê re wê pêşbikeve bê. Rewşa xwe gihandina kerîyên sawalan, wê di vê çerçoveyê de wê rewşa malbatîtîyê di çerçoveya dabara wê de wê xort bikê û wê rewşa têgîna xwedîbûnê wê di çerçoveya wê têgîna kerîyên sawalan de wê pêşbikeve. Ev rewşa kerîyên sawalan û xwedîkirina wan, li malê û ankû li deverek li nêzî malê, wê weke rewşek teybet bê. Em divê ku wê, hinekî jî wê hildina li dest bi rewşa jîyane malbatîtîyê û xwe dabarakirina wê re.

Tabî rewşa malbatê, wê dema ku wê bicihbûn bibê û pê de wê di nava rewşa komê de wê pêşbikeve. Di rewşa demên peleolîtîkê û nava komîtîya wê de wê rewşa malbatî ji demên dawî ên serdema peleolîtîkê û pê de wê, pêşbikeve. Demên ku wê di çerçoveya komîtîyê de wê pêşve herin, wê demna pirr zêde

dirêjbin. Wê kom, wê weke malbatek mazin bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê, ji dema peleolîtîkê bûhûrîna li dema mezolîtîkê de wê, ev rewşên weke rewşn malbatî ku wê li dora jinûmêrekê wê pêşbikeve di nava komê de wê hin bi hin wê temenê wê were avêtin. Lê di dema neolîtîkê de wê ew hin bi hin wê pêşbikeve. Lê çend ku wê di dema neolîtîkê de wê, ev pêşbikeve jî lê wê, ev zêde dernekeve li pêş. Wê ya ku wê ew derkeve li pêş wê, rewşa komê a giştî bê. Her mirov wê endamê wê bê. Wê her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê kom, wê weke malbatek mazin bê. Di dema peleolîtîkê û hinekî di ya mezolîtîkê de wê di şikeftê de wê di nava hevdû de wê jîyankirin wê bê kirin. Lê di dema neolîtîkê de wê, hin bi hin ev rewş wê bigûharê. Dema ku em bahse pêşketina malbatê bikin wê, her wusa, wê di çerçoveya malbatîtîyê de wê pêşketina malê jî wê, wê bi wê re wê xwe bide dîyarkirin. Malbat wê bê xwedîyê malê. Di wê malê de wê dê hebê. Bav hebê. Keçzaro û kûrzaro wê hebin. Piştre jî wê ew pîr û kal bibin wê newîyên wan wê çêbibin. Ev rewş jî wê, di dema rewşa jîyane neolîtîkê de wê rewşa malbatîtîyê wê bide pêşxistin. Bi wê re jî wê bi rewşa malbatîtîyê re wê, rewşa pêşketina gûndan wê pêşbikeve. Di aslê xwe de wê, pêşketina rewşa malbatê û ya gûndîtîyê wê bi hevdû re wê di ahengek de bê. Wê rewşên komî wê wergerina li aşîr û ankû ´klan´ên mazin. Ev jî wê, weke malbatên mazin bin. Wê, dema ku em bahse gûndekî dema neolîtîkê ku ew hin bi hin pêş dikeve dikin, wê ev rewş wê bi awayekî vekirî wê xwe bide dîyarkirin.Malbat û gûnd, wê di vê çerçoveyê de wê pêşbikeve. Komên mazin ku ew berê di şikeftê de dijîn, wê hin bi hin wê ji şikeftan wê derkevin. Wê ji xwe re wê malan ava bikin. **Li bakûrê kurdistanê, weke ku mirov li herêmên Rehayê dibînin, li herêmên Erxanî, Erzûrûm, dîyarê xezale li gundê şabanê ê karsê, li qaxizmanê şikefta boraqan, li hin herêmên rojavayê kurdistanê dibînê, wê dema ku wê di encama baran barînê de ku wê ard biherikê,wê deverên weke ku em î ro li van herêmên kurdistanê weke ´malên farîşteyan´ bi nav dikin, wê bi xwezayî wê derkevina li holê. Ev jî wê, wê werina kifşkirin. Ev dever, wê deverna ku wê di wan de wê mirov, wê piştre wê bijîn. Wê rewşa jîyanê wê, di vê çerçoveyê de wê, bi rengekî din wê ji rengê jîyane şikeftan cûdatir wê pêşbikeve.** Ev rewş, wê weke rewşeka ku wê ji destpêka ku wê mirov, wê ji şikeftê wê derkeve bê. Ev deverên ku weke *´malên farîşteyan´* û ankû *´dûkeşîyên farîşteyan´* ên li kurdistanê ku em bahse wan dikin, wê di aslê xwe de wê afirîna wan di nava xwezayê de wê heta demên dawî ên serdema peleolîtîkê wê herin. Ev dever, wê deverna wusa baş û îdeal bin ji jîyankirinê re ku mirov weke bi malî wan bikarbênê. Di vê rewşê de wê, rewşa malbatî wê pêşbikeve. Di demên dawî ên peleolîtîkê û dem mezolîtîkê de wê mirov, wê hin bi hin wê bidest kifşkirina van deveran bike. Lê wê bi awayekî jidil û baş wê di dema neolîtîkê de wê bidest jîyankirina di wan de wê bike. Di vê çerçoveyê de deverên weke ***´nawala çolê´*** û hwd, wê deverna ku wê li wan jîyane gûndîtîyê a neolîtîkê wê pirr zû wê li wan destpê bike û pêşbikeve bê. Herêmên ku weke *´herêmên heyva bi bereket´*( û ankû ´hîlala bi bereket´) ew ku dihên bi navkirin, bi teybetî ji rojavayê kurdistanê û bi ber bakûrê kurdistanê li herêmên weke amed û Rehayê ve wê, ev herêm, wê weke herêmna ku wê pêşî wê li wan bicihbûn bûbê bê. Bi wê re jî wê li van herêman wê jîyane bicihbûyî a piştre a şariştanîyê jî wê li van herêman, wê zûtirîn wê pêşbikeve. Lê ev herêm, weke herêmna li ber çemên diclê û firatê na, wê temenê jîyanê jî wê li wan wê, zêdetirî wê li wan pêşkeve. Di lêkolînên li herêma farqînê di *şikefta hassûna*(*) de ku ew hatina kirin de wê, were dîtin û kifşkirin ku wê li vê herêmê wê çandinîya weke genim û hwd, wê li dora 9 û 8 hezar salan wê pêşbikeve. Ev herêm, wê di vê çerçoveyê de wê weke herêmek ku wê di vê çerçoveyê de wê di wan demên destpêkê de wê weke herêmek ku wê li wê bicihbûn bibê bê. Li vir, ez divê ku vê yekê jî werênima ser ziman ku herêmên li dora amedê ên weke ´erxanî´ û farqînê jî, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman. Î ro, li van herdû herêmên wê, bineterên ku di ancama

-----------

(*)Wê weke dever û şikefteka ku wê nîşanaka zû pêşxistina çandiniyê wê di wê de wê were dîtin bê. Wê, were bi dîrokkirin ku wê çandinî wê li vê deverê li dora 9 û ankû 8 hezar salan berî zayina îsa wê bibê. Ev jî wê, demên neolîtîkê ku ew bi dîrokî li dora 10 hezar salan ku ew dihê hasibandin wê karibê bi awayekê mihtemel kevntir bi xwe re bibê. Kifşkirinên li şikefta hasûna û gûnde xirabreşkê wê karibin bibina temel ku ew dîrokê hê kevntir bibin. Wekî din gelek herêmên din ên weke wan kevin li başûrê kurdistanê ên weke herêma ´kûnarê´ ku ew dikevina kuntara rêza-çîyayên zagrosan de wê hebin.

lêkolînên kolanê de derketina li holê di ***´şikefta hîlêrê´* a li erxanî û li *´şikefteya hasûnî´* a ku li farqîn**ê ya, di wan de lêkolînên ku hatina kirin, daya nîşandin ku jîyana bicihbûyî û her wusa, karê çandîniyê, cotkariyê û her wusa xwedîkirina sawalgeriyê li van herêman pirr zêde zû pêşketîya. Nîşanakên ku derdiketina li holê ji van herdû şikefteyan, dana nîşandin ku jîyanê bicihbûyî li van

herêmên pirr zêde zû pêşketîya. Jîyane bicihbûyî ya bi vî rengî ku çandînîyê û cotkariyê dike û sawalan xwedî dike, temenê wê heta dema nêzî 10 hezar salan diçêt. Herêmên ku weke nêzîkî ber çemê diclê ên weke Erxanî û farqînê, weke herêmna ku li wan temenê jîyanê û pêşketina wê zûtir pêşketîya ya.

Em î ro dizanîn ku herêmên weke Heskîfê, herêmna ku li wan pirr zû jîyane şariştanî pêşketîya. Ev herêm, weke herêmek li ber çem û avê, wê temenê jîyanê xwe li wê biafirêne.

Weke ku çawa li ber diclê li sûrê pêşxist, her wusa, bi heman rengî li cizira bota jî li ber çemê diclê ku wêli Cizira bota, bi awayekî navendî jîyane şariştanî pirr zû temenê wê pêş bikeve. Em divê ku werênina ser ziman ku temenê jîyane bicihbûyî û ankû ya şariştanî li Cizira bota, ne bin 10 hezar salî re ya. Ku ne ser re bê, wê ne bin re bê. Ev rewş, wê bo sûrê jî wusa bê. Sûr, weke herêmek navend a. Her çar deriyên wê( *´derîyê hûrî´, ´derîyê xarpûtê´, ´derîyê çîyê*(*)´´û hwd bin.) yên ku ji wê divebin, di aslê xwe de di vê çerçoveyê de mirov dikarê weke dager(´sembol´)a wê navendîtîya wê jî, werêne ser ziman. Hûrîyan, Sûr, weke navendek giring pêşxistin. Hêtên wê yên ku bajêr dorpêç dikirin weke kirmanekê, di dema wan de çêkirina wan hatîya kirin.

Ev herêmên kurdistanê ku wê weke herêmna ku wê li wan wê rewşa jîyane bicihbûyî wê li wan wê zêdetirî wê pêşbikeve bê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê di dema neolîtîkê de wê, ev rewş, wê wê zêdetirî wê pêşbikeve. Dem neolîtîkê wê li kurdistanê, wê hema bêja pirranîya herêmên wê, wê derfetê ji jîyanê û bicihbûn û dabarakirina wê re wê biafirênin. Ji ber çemên diclê û firatê û heta ku digihişt ber çîyayên zagrosan û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê ev herêm, wê herêmên ku wê li dora wan, mirov bi komî wê bicih bibin. Herêmên li dora çîyayên zagrosan, wê gelek deverên wê, wê weke herêmên niştecîhî ên dema jîyane neolîtîkê bin. Ev rewş wê, li dora herêmên botanê jî wê hebê. Î ro jî ku mirov bi lêkolînî li van herêman dinerê û wan dike ku fahm bike, wê di serî de wê ev herêm wê weke herêmna ku wê gelek nîşanak ji wan demên berê ku wê li wan hebin bin. Di vê çerçoveyê de wê rewşa jîyane neolîtîkê a civakî wê li herêmê wê pêşbikeve.

Di rewşa jîyane komî a demê wê rewşek teybet wê hebê. Wê hin bi hin wê di nava rewşa jîyane komê de wê rewşn weke malbatî, ên ku em dikarin weke

-------------

(*) Ev her çar derî ku wê her yekê li aliyekê keleh û ankû kirmana sûrê vsdibin bin. Ev herêm bi serê xwe wê, weke herêmeka ku wê di demên pêşî ên şariştaniyê û heta ku wê di dema neolîtîkê ên zû de wê li wê jîyan bi komî û civatî wê hebê bê. Hertimî ev herêm bûya weke herêma ku li wê jîyan hebûya. Wê di herdemê de wê li wê temenê jîyanê wê bi demên şariştanî re wê were pêşxistin û bi sazûmantirkirin.

malbate piçûk û tang wê werênina li ser ziman, wê pêşbikeve. Di vê demê de wê hêst wê pêşikevin. Hêst, wê bidest kifşkirin û dîyarkirina tevgeran wê bikin. Ev jî wê, bi rewşa jinê ku ew dibê dayikê re wê zêdetirî wê xwe bidina dîyarkirin. Hikmê jîyane komî wê di dema pêşketina malbate piçûk de jî wê xwe bi serwerî wê bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê rewşa wê biteybetî wê werênê li ser ziman. Her wusa rewşa rewşa malbatê, wê di vê demê de wê, pêşbikeve. Di vê demê de wê rewşa komî a dema peleolîtîkê û ya dema mezolîtîkê jî wê, hin bi hin wê ji holê rabibê. Wê rengê komî ê ku wê cihê wê bigirê jî wê, li ser tûxmîtîyê û ankû girêdana bi benên xwûnê re bê wê, rewşa aşîrî û ankû klanî bê. Pêşketina vê rewşa aşîrî û ankû klanîyê, wê bi pêşketina jîyane gûndîtîyê re wê di ahengekê de bê. Wê bi hevdû re wê di ahengekê de wê pêşbikevin. Di vê çerçoveyê de em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, di rewşa gûndîtîyê de wê hemû malên ku wê werina çêkirin û wê mirov wê bikevinê de wê, ew bi hevdû ve girêdayî bin. Wê di vê çerçoveyê de wê teybetîya rengê pêşketina jîyane neolîtîkê, wê di vê çerçoveyê de wê bi şêwayekî ku ew wê di zikhevdû de wê pêşbikeve wê, reng û reşa weke bi aşîrîyê û ankû klanîyê re wê şêwayê malbate mazin bê. Bi wê re jî ku wê di zik wê de wê pêşbikeve wê rewşa malbate piçûk a tang dendikî(*) bê. Malbate dendikî, wê ji dê, bav û zarokan wê pêk werê. Ev malbat jî wê weke malbate ku wê, piştre wê li dora wê, wê pêşveçûn wê bibê. Di dema neolîtîkê de wê ev rengê malbatê wê, piştre wê bi pêşxistina rewşên xwe yên jîyanî ên bo dabarakirinê re wê, rewşa xwe di dîrokê de wê bide rûnandin û domandin.

Rewşa kedîkirina kerîyên sawalan bo hilandina şîrê wan, wê di çerçoveya vê rewşa malbate dendikî de wê, zêdetirî wê pêşbikeve. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê rewşa malbate dendikî, wê pêşbikeve. Wê li vir, wê bi pêşketina malbate dendikî re wê, rewşa têgîna aîdîyetê û ankû yewêtîya komîtîyê jî wê were bi sînorkirin. Wê li şûna wê, têgîna aîdîtîyeta malbate dendikî wê pêşbikeve. Wê bi wê ew wê ew xwe bi awayekî serdestî wê bide

----------

(*)Malbatên dendikî wê pêşketina wan wê rastî wê dema pêşketina gunditiyê wê werê. Di wê demê de wê, kom wê di nava xwe de wê reng û awayên têkiliyên xwe wê bigûharênê. Wê rewşa jin û mêr bi zaroyên wê re wê, zêdetirî wê derkeve li pêş. Wê ew wê girêdanekê wê bi hevdû re wê, bidina çêkirin. Bi wê re jî wê, temenê pirrjiniti û pirrmêrîtî jî wê hin bi hin wê ji holê rabê û wê li şûna wê bend û girêdana mahrê wê pêûşlkeve. Ev jî wê taqabûlî demên ku wê rêgezên rewîstî ên demên şariştaniyê ên destpêkê ku ew pêşdikevin wê were.
Di dewama wê de wê, sazûmanaka civakî a malbatî wê hin bi hin wê di wê çerçoveyê de wê, pêşkeve. Di nava jîyane komê de wê, rengên weke kesên dapîr û ankû bapîr ku ew li pêş weke kesna kifşkar in wê, cihê xwe biparêzên. Lê wê di şêwa û rengê wê de wê gûharin wê bibê. Wê biaqil wê, ew gûharîn wê bibê. Wê, serborîya mirovî wê, hin bi hin biaqilê mirov re wê mirov derxê li pêş. Mirov wê dibînê û wê kifşdikê. Wê di dewama wê de wê ew rengekê hîyararşîkî wê di nava têkiliyan de wê xwe biawayekê wê hin bi hin wê bide dîyarkirin. Hîyararşîya têkiliyan wê, bi wê re wê, kesê li ser û yên li bin wê bidina afirandin.
Malbat wê, di nava wê de wê, çendî ku wê weke dendikî wê pêşkeve jî wê tabîî wê hiyararşîyê wê xwe bide dîyarkirin û pêşxistin. Wê têgînên weke yên aidityetê wê pêşkevin li cihê ku mirov li wê dijî. Wê rêgezên jîyanî wê bijîn. Wê, jinek û mêrek wê bi hevdû re wê bibin Ev wê, weke rêgezekê wê bê kifşkirin. Di pêvajoyên piştre ên şariştaniyê de wê weke ku mirov wê kifşbikê wê li pêşîya danîna têkiliya pirralî wê bendên weke yên cezakirinê û hwd wê werina danîn.

dîyarkirin. Tişt, mal û semyanê ku ew wê ji xwe re wê pêşbixê, wê ew xwediyê wê bê. Wê ew malbat, wê ji xwe re weke cihê ku ew di wê de dijî wê ´malê´ wê çê bike. Wê piştre wê, ji xwe re wê weke mal û ankû semyanê ku ew bi wê bijî û malbatîtîya xwe bide domandin, wê kerîyên sawalan wê bigirê û wê kedî bike. Wê ji wan sûdbigirê. Wê fêrî hildana ji wan şîr bibê. Wê fêrî hildana ji wan hîrîya wan bibê û ji wê ku ew karibê ji xwe re tiştên hundûrê malê çê bike. Wê bi wê re wê fêrî çêkirina tiştan bibê. Ev rewşa fêrbûna çêkirina tiştan, wê bi şêwayekê wê rengê aqilê afrîner ê têknîkî ê dema neolîtîkê jî wê bi xwe re wê bide nîşandin. Çêkirina tiştan û ankû pêşketina mejiyê çêkirina tiştan wê, di vê çerçoveyê de wê weke aliyekî giring bê. Wê têgîna plangerîyê bixwe jî mirov dikarê wê di vê çerçoveyê de wê werênê li ser ziman. Her wusa, rewşa pêşxistina çandiniyê wê di çerçoveyek plangerî de wê, pêşbikeve. Ji rewşa çandiniyê û heta rewşa berhevkirinê û ankû palayîkirina wê, wê ev hemû di çerçoveyekê de wê hem hevdû temem bikin û hem jî wê bi awayekî plangerî wê werina pêşxistin bin.

Di rewşa jîyane malbatî û ya komî de wê, di vê demê de wê ya ku wê werê dîtin ku wê hin bi hin wê, rewşa jîyane malbatîtîya dendikî wê pêşbikeve. Bi wê re jî wê rewşa komê, wê weke rewşek giştî wê xwe bide dîyarkirin. Hin bi hin, piştî salixbûna rewş malbatê di nava jîyane komê de wê, li vir, li ser wê têgîna xwedîbûnê û ankû xwedî derketinê jî wê pêşbikeve û wê derkeve li pêş. Di rewşa têgîna xwedîbûnê û ankû xwedî derketinê de wê malbat, wê xwediyê têgîneka aîdîyetî bê. Wê li ser wê re wê ew were kirin. Bi wê re jî wê malbat, wê xwediyê cihê ku ew li wê dijî bê. Wê ev pêşbikeve. Bi wê re jî wê, di çerçoveya wê têgîna malbatî de wê afirandin bibê. Her tişta ku ew hat afirandin jî wê weke ya malbatê bê. Ev jî wê, rewşeka ku wê malbat, wê bi wê, wê bibê rewşeka ku wê di wê de wê berhevkirin wê pêşbikeve bê. Malbat, wê ji aliyekî ve wê temenê berhevkirinê jî.

Rewşa komên ku ew di wê de dijîn, wê di vê demê de wê bi komî wê gelek kom wê bi pênaberî wê di nava gerînê de bin. Dever û cihên xweş û avî û ankû ber çem û golan, wê li wan dever û cihan wê bicih bibin. Pênaberîya koman ji herêman li herêman, wê di temenê wê de wê li cihê xwest ên ku ew li wan derfetên jîyanê hena wê hebê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Di rewşa dema jîyane neolîtîkê de wê, komên ku ew bicihbûna û êdî ew ne weke komna pênaber in, dema ku wê komên pênaber wê werina herêmên wan, wê rastî bertekan wê werin. Yan jî wê, komên ku wan di nava jîyane xwe de berhevkirin daye çêkirin wê, ew rewşa wan ya heyî, wê bê armanca hêrîşan. Di vê çerçoveyê de wê, hêrîşên li malbatan, ji koman li koman û hwd, wê hin bi hin wê pêşbikevin.

Di van deman de wê têgîna ´parastinê´ em dibînin ku wê zêdetirî wê derkeve li pêş. Yên ku weke afsûnkarin û ankû ew weke xwedîyê hêzêk mazin dihên hasibandin, wê boraqan û ankû korbanan wê ji wan re wê bidin bo ku ew werina parastin. Di vê çerçoveyê de wê têgîna parastinê wê, bi demê re wê derkeve li pêş. Parastin, xwe xwedîkirin û domandin û hwd, wê weke rewşna ku wê mirov li wan bihizirin bin. Di vê çerçoveyê de em dibînin ku wê, di rewşên weke yên bawerîyê ên van demên civake neolîtîkê de wê, rewşên ku wê werina dîtin, wê li ser esasê parastinê wê, zêdetirî wê derkevina li pêş. Di rewşa têgînên demê ên weke totemîsmê û anamismê de wê ev rewş wê hebin. Rewşên parastinî wê, weke rewşna ku wê di vê çerçoveyê de wê, mirovê demê wê li ser wê, pirr zêde wê bihizirê û wê di çerçoveya pêşxistina parastinê û hwd de wê, li rê û rêbazan wê bigerihê. Wê bixwezê ku ew were parastin ji tiştên ku ew dikarin zirerê bidina wî û jîyane wî.

Di rewşa têgînên weke têgînên bawerîkî ku ew pêş dikevin de mirov, vê yekê jî wê kifş dike û dibînê ku wê rewşên ku wê mirov, ew derdikevina li pêşîyê û nikarê wan fahm bike, wê bibin. Minaq, weke barîna baranê, berfîna berfê, rewşa mirina mirovan û hwd, wê weke pirsna ku wê hin bi hin wê di serê mirov de

wê bina weke rewşna pirsî. Mirovê ku ew mir, wê pênaberî kûdeverê bikê? Ew wê di serê mirov de bê. Di rewşa mirinê de mirov, wê di bînê ku wê di hinek mezelên ji dema neolîtîkê de wê, dema ku mirî mir wê tişt û mişt wê bên danîn li rex di hundûrê mezelê de.

Li vir mirov, dikarê du rewşan di çerçoveya vê rewşê de wê werênê li ser ziman. Rewşa pêşî ya mirovî mirî ku ew pêşî jîyan bûya ya. Mirovên ku ew bi wî re jîyanbûna, wê di mejiyê wan de wê ew rewşa jîyanî a bi wî mirovî re wê hebê. Piştî ku ew mir jî wê dem bi dem wê di mejîyê wî de wê were berbîra wî. Heta ku wê di demên razanê de bê û ankû di nava rojê bixwe de bê, ew mirov, weke ku ew razahayî bê ku ew weke xewnekê ew wî mirovî li berçavê xwe bibînê bê. Ev rewş, wê hebûna mirov de wê cih bigirê. Rewşa din a duyem jî wê di çerçoveya wê bîrkirinê de ku ew weke ku ew dijî wê li ser xewnkirinên di dema razanê û di dema ne razanedinê ku ew dibînê de bê. Di vê çerçoveyê de wê, ev rewş, wê weke rewşna ku wê hişê mirov ê ku ew pêş dikeve ku ew weke ku ew bi mirov bileyizê wê di rewşekê de wê xwe bide dîyarkirin.

Di rewşa jîyane komî de wê ev rewş, wê weke rewşekê wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, mirovê dema neolîtîkê, wê di vê çerçoveyê de wê di rewşekê de wê di mejiyê xwe de wê bijî. Wê, di vê demê de wê bi dîtina di mejiyê xwe de wê weke ku ew xewnê dibînê wê lê werê. Her wusa wê dîtina mejiyê xwe de a bi hişî ku ew pêş dikeve, wê ew wê fahm nekê. Wê ev rewş, wê weke rewşeka ku ew dervî wî dibê wê, şîrove bike û wê li wê binerê. Her wusa rewşa bidest dîtina xewnê kirinê de jî wê, rewş ev bê. Di dîtina xewnê de wê, rewşa ku wê mirov, pirr zêde wê ew wê bijî û wê nikaribê wê fahm bike bê. Di vê çerçoveyê de wê di rewşekê de wê bijî.

Her wusa rewşa dîtina xewnê û ankû weke dîtina bi hiş a di nava rojê de wê, weke rewşek teybet a ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman bê. Her wusa di vê çerçoveyê de wê rewşa dîtina xewnê û ya bihişkirinê û hwd, wê du rewşên ku ew nikaribê ji hevdû vaqatênê. Wê, di heman nefahmkirinê de wê weke hevdû wê wan hilde li dest. Yanî wê di heman fahmkirinê de wê wan, wê weke hevdû wê hilde li dest. Di rewşê mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku rewşa dîtina xewnê û rewşa bihiş bidest dîtinê kirinê wê weke du rewşên ku wê karibin mirovê demê bidina tirsandin jî bin. Her wusa, ev çi na û çawa pêşketina, wê nikaribê wan fahm bike. Di dîtina xewnekê de wê heman tiştî wê bijî. Di rewşa jîyane xwe ya asayî de wê, ew wê bihişkirinê wê bikê. Ev rewşên bihişkirinê wê weke rewşna ku wê mirov bitirsênin bin. Mirov, di vê çerçoveyê de wê weke yekî roja me ê din û ankû aqilê xwe windakirî û hwd wê lê werê. Di vê çerçoveyê û rewşê de wê lê werê.

Mirovê demê, wê di vê çerçoveyê de wê di rewşa aqilê xwe de wê, di rewşek teybet de bê. Her wusa mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê di rewşa xwe de wê xwediyê rewşna ku ew wan fahm nekê bê. Pêvajoyên totemîsmê û anamîsmê û hwd, wê hinekî jî wê li ser van rewşên ku ew dibin û nayêna fahmkirin ji aliyê mirovê demê ve jî wê bibin. Ew tiştên ku wî di hiş de dîtin û ankû di xewnê de dîtin, ew kî na û çi na û li kûderê na? Wê ev jî wê mirov wê weke pirsan wê li xwe bike bin. Ev pirs, wê weke pirsna ku wê di mejiyê mirov de bin. Wê bi hîskirinê re wê hebin. Tiştekî ku wî carekê di mejîyê xwe de wî dîtî, ew dema ku ew di jîyane xwe de li wê digerihê û wê nabînê, wê hingî wê ew weke rewşek acêb wê li wî were. Tişta ku wî di xewna xwe de dît, wê di jîyane xwe de jî wê li wê bigerihê. Wê di mejiyê xwe de wê bikeve lêgerîneka li wê de. Her wusa wê bixwezê ku ew wê bibînê. Hinek zindîyên ku ew li dora wî hena ku ew wan dibînê, wê weke ku ew di legerîna xwe de gihiştibê armancê. Lê hinek jî wê ew wan nebînê. Di vê çerçoveyê de wê ew tiştên weke xewnê ku wî dîtina, wê fahm nekê ku ew rewşna ku mejiyî wî wan afirandina.

.

**Li herêmên kurdistanê hebûna pêşveçûnên demên neolîtîkê**

Ji kîjan aliyê ve ku mirov dinerê, mirov vê yekê dibînê ku wê herêmên kurdistanê bi giştîya wan re wê weke herêmna ku wê serdema neolîtîkê li wan bijî. Me dema ku bidest nivîsandina vê beşa pirtûkê kir, me xwest ku em fahm bikin ku wê kîjan herêm, wê weke herêmên neolîtîkî wê werina bi navkirin. Lê li vir, ya ku me dît, wê hemû herêmên wê, di vê çerçoveyê de wê weke herêmên neolîtîkê û jîyane wê bin. Di dema neolîtîkê de wê li wan jîyane wê pêşbikeve. Herêmên weke ***´girê hacîyan´*** hwd, wê ten weke herêmna ku wê ew herêm, demna zêde berfireh jîyankiribin bin. Lê wekî din jî mirov, dema ku lêkolîn dikê, her wusa mirov wê kifş dike w, ev herêm hemû, wê weke herêmna giring ên ku wê civake neolîtîkî li wê bijîn bin. Di vê çerçoveyê de mirov hebûna kurdistanê ku weke welatê civake neolîtîkê wê bi nav

bike, wê rast û di cih de bê. Li herêmên ber diclê û firatê, wê bi teybetî ku em ji aliyê jeolojîkî ve li wan dinerin, ya ku em dibînin ku wê di demên berî dîrokê de jî wê ev herêm, wê li wan jîyane zûtirîn wê pêşbikeve bê. Wê li wan wê jîyane komî wê pêşbikeve. Hê ji serdemên destpêkê a qaşayê a bi navê serdema **Pleistosen**´ê ku wê kaş û çîyayên qaşayê wê bidest halîna wan dibê de wê, ev herêm, derfetên jîyanê wê li wan hebin. Herêmên ji kurdistanê û ankû mesopotamîya û heta ku wê bigihijê herêmên din ên afrîqa û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê pêşbikeve. Piştre heta ku wê dem were serdema peleolîtîkê û hwd, wê di wê de wê êdî wê temenê jîyanê bi rewşên weke çem, gol, dariştanên gûrr ku ew şîbûna û hwd re wê pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa jîyane wê li herêmê wê pêşbikeve. Ew herêmên ku î ro weke *´çolên komê´* dihên dîtin ew jî wê, weke herêmna bi daristan û pirr zêde wê pêşketî bin. Heta serdemên neolîtîkê jî wê ew rewşa wan herêman wê hebê û wê bidomê.

Li herêmên kurdistanê, ji aliyê jeolojîkî ve wê ev herêm, wê pêşveçûnên ku wê li wan bibin, wê di vê çerçoveyê de wê zêdetirî ji aliyê pêşketina van derfetên jîyanî ve wê xwediyê pêşketinê bin. Di demên ku wê hê kaş û çîyayên qaşayê wê ne halîyabin, wê zêde sînorekî mazin jî wê weke sînorê parzemînan mazin wê nebê. Di vê çerçoveyê de wê, bi halîna kaş û çîyayên qaşayê re wê hem ew sînor wê biafirê û hem jî wê gelek herêmên mirovê demê ê jîyane wî ê homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd wê di bin avê de wê bimênin.

Herêmên ber diclê û firatê, teybetîya wan ew a ku wê hê ji serdemên serdema cemedê a **Pleistosen**´ê wê kaş û çîyayên qaşaya wan wê bihalihê. Ev jî wê, were wê wateyê ku wê hê zûtirin wê temen û derfetê jîyanê wê li wir wê biafirê. Piştre jî wê weke herêmên avî, wê cih bi cih wê komên homo sapîens, neandertal û mirovê şanîdarê wê li wan pêşbikeve. Ev rewş, wê heta serdema mezolîtîkê û neolîtîkê wê hebûna xwe bi awayekî ku ew gav bi gav bi ber jîyanîyê ve pêş dikeve, wê ew pêşve herê. Herêmên jîyanê wê di vê çerçoveyê de wê biafirin. Daristanên wê ku ew afirîna, wê gûrr pirr zêde dîrêj bin. Wê qadên pirr zêde berfireh wê bixamilênin. Di nava wan daristanan de jî wê kerîyên sawalan ajalên mazin kom bi kom wê bijîn. Ev rewş jî wê derfetên nêçîrê wê li herêmê wê pirr zêde wê bide çêkirin û afirandin.

Herêmên ber diclê û firatê, wê di vê çerçoveyê de wê hê di serdema peleolîtîkê de wê weke demên civake neolîtîkî wê bidest pêşketina xwe bikin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku rewşên jîyanî ên ku ew li herêm pêşketina wê zêdetirî, wê derfetên jîyanê bidina dîyarkirin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê rewşek mazin a jîyanî wê bi xwe re wê biafirênê. Heta ku wê dem were demên dawî ên peleolîtîkê û mezolîtîkê, mirov dibînê ku wê, berava şikeftê, girikê haçîyan, giryan û ankû girkê hemo, girê osê, girê hevşerîk, girê gûzirê, girê çemê halan, simakî, xarîf, kîkan, kotekan, girê kortik, newala danîk, girêhami û hwd, wê li wan jîyane neolîtîkê wê pêşbikeve. Ev herêm û dever, wê tenê hinek ji wan deverên ku wê li wan jîyane neolîtîkê wê pêşbikeve ên li herêma botanê a roja me bin. Herêmên botanê, wê di vê warê de wê, bi di lêkolîneka bi hesanî de wê, bi sadan deverên ku ew weke deverên ku ew li wan jîyane civakî a dema neolîtîkê pêşketîya wê werina kifşkirin.

Herêmên neolîtîkê ên li herêma botanê, wê bi teybetî, ji ber diclê û heta bi ber firatê wê xatekê bi xwe re wê bidina xizandin. Herî zêde ev herêm, wê weke herêmna ku wê, li wan derfetê jîyanê wê li wan pêşbikeve bê. Heta ku mirov wê jî wê dikarê wê werênê li ser ziman ku wê hinek nişanekên wê hebin ku wê ji herêmên weke musil(nînova)a roja me ku wê li wê deverê jîyane neolîtîkê wê di demên wê de wê pêşbikeve, ew jî wê piştre wê, bo ku ew pêdîvîyên xwe yên jîyanî bênin li cih wê bi herikina bi ber sêrt, xîzan, silopî, şirnaxê, bedlîs, barwarê û hwd, wê werina van herêman, ev herêm û herêmên li dora wan, wê pêşketî bin. BI teybetî herêmên li dora silopîya ên weke girikê bedro, nerwan, takyan, amarsawa, hazayî, girikê kûsê, girê tahalî û besorîn, girê bimrinê, serçemê û girê metrokê, mizgefta nû, baswan û hwd jî wê çend ji wan herêmên ku wê malvanîyê ji dema jîyane neolîtîkê re wê hê pirr zû wê bikin bin. Li van herêman wê pirr zû, wê jîyane neolîtîkê wê pêşbikeve. Demên mezolîtîkê, wê di van herêman de wê, weke serdemên neolîtîkê, wê bi awayekî pêşketî wê di rewşa xwe de wê werina jîyankirin. Ji van herêman bigra û heta ku wê bigihijê navende cizira bota û herêmên wê yên weke nerdîs, kidişû, kasrik, rawînê, sûsê, hendek, hecî siltan, zoran, girikê silo û hwd, wê hin ji wan deverên vê herêma kurdistanê ên ku ew li wan jîyane neolîtîkî wê bi awayekî pêşketî wê hebê. Heta ku em dikarin vê gotinê jî wê bi hesanî wê bibêjin ku wê li van herêman, wê rewşa jîyane neolîtîkî wê, destpêka wê herê berîya dema mezolîtîkê li demên dawî ên serdema peleolîtîkê bixwe jî. Serdemên peleolîtîkê, wê li vê herêmê wê weke serdemna neolîtîkî wê bi awayekî pêşketî wê werina jîyankirin. Sedema wê jî wê, ew rewş û derfetên jîyanê ên li wê

ku ew hebin bin. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê ev herêm, wê di vê çerçoveyê de wê weke sedemna pêşketî bin.

Herêmên li dora diclê ên botanê wê, dema ku ew lêkolînna kûr li wan werina kirin, wê werina dîtin ku wê li wan derfetê jîyanê wê zêdetirî wê li wan pêşketî wê hebê. Her wusa, ev herêm, weke herêmna ku mirov wan bi teybetî dikarê wan hilde li dest. Di zane min de mirov, heta ku rewşa jîyane neolîtîkî a li herêma botanê wê baş fahm nekê, mirov wê bi awayekî baş wê pêşveçûnên dema neolîtîkê wan jî baş fahm nekê. Ber ku pêşveçûnên vê herêmê wê di berdewama rojavayê kurdstanê de wê, weke pêşveçûnna navendî bin li herêmê. Li aliyekî wê, wê bi ber zagrosan ve wê, herêm bi herikê. Herêmên başûrê kurdistane roja me, wê bikeve rex wê û wê di keviya wê pêşveçûna wê de bê. Her wusa, bi heman rewşê wê rojavayê kurdistanê û di dewama wê de wê, herêmên anatolîa jî wê bi heman rengî wê bi sayaserê wê, ew wê pêşketinekê wê bi xwe re wê bijîn û ankû wê bidina jîyankirin. Herêma botanê, di vê çerçoveyê de ku ew navenda wê ber diclê cizira bota û dora wê, wê di vê çerçoveyê de wê ji van aliyan ve wê weke hermek giring û navendî wê xwediyê rewşekê bê. Minaq, herêmên ku wê weke nisêbînê wê bi dora xwe û gelek deverên wê yên weke berçemê re wê xwediyê rewşek bi vî rengî a jîyanî a dema neolîtîkê bê. Li dora nisêbînê û heta ku wê bigihijê hezexê mirov wê gelek deverên bi vî rengî ên giring wê karibê, wan werênê li ser ziman. Ji nisêbînê û heta ku digihijê cizira bota, herêmên weke serêkahnîyê, girêmîra, girêbîya ku wê xirabêsosina û xirabê darik wê bikeve li rex, aysere û gelek herêmên din ên li dora wê, li wan rewşên jîyane dema neolîtîkê ku ew pêşketî na, hena. Li dora hezexê herêmên weke xirabêşêref, filê, zergûz, girê hanika, tirerasê û hwd, wê tenê çend ji wan herêmên ku ew heta roja me jî mirov dikarê bermehîyên ji dema neolîtîkî li wan bibînê bin. Ev herêm, bi vê rengê wê weke herêmna ku ku wê giring bin. Ev herêm û heta ku wê bigihijê herêmên rojavayê kurdistanê ên weke qamişlo, Afrînê, ber çîyayê kurda, amûdê, rimêlan û hwd, wê wan rewşa jîyane neolîtîkî wê pêşketî bê. di vê çerçoveyê de wê dema ku mirov lêkolînan li ser herêmê bi awayekî cidî bike, bêgûman mirov wê gelek herêmên din jî wê kifş bike. Di vê çerçoveyê de wê were dîtin ku ev herêm, wê hê di serdemên destpêkê de wê, jîyane civakî wê li wan, wê weke herêmên pêşî bin ku wê li wan pêşbikeve bê. Bi wê re mirov, dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku ev herêm, wê di vê çerçoveyê de wê, nîşanakn ji wan deman ku wê li wan hebin. Me li jor, tenê çend ji wan herêmên ku ew hê nîşanakên ji dema neolîtîkê ku ew li wan hena, em navê wan hanî li ser ziman. Lê em dikarin vê yekê jî wê, bibêjin ku mirov li herêmê lêkolîneka giştî bike, wê gelek herêmên din ên giring wê di vê çerçoveyê de wê kifş bike ku ew jî wê, bi heman rengî wê li wan rewşa jîyanî a dema neolîtîkê wê li wan pêşketî bê.

Herêmên bakûrê kurdistanê ên ber diclê wê, weke herêmna ku wê li wan rewşek jîyanî a neolîtîkî wê li wan pêşketî wê hebê. Rewşa nîşanakên ji dema neolîtîkê li herêmên êlihê ên weke sason, beşîrî, raman, sûmakî û hwd, wê bidina nîşandin ku ev herêm wê di dewama herêmên botanê de wê, heta ku wê bigihijê herêmên heskîfê, wê li wan wê rewşek jîyane neolîtîkî a pêşketî wê li wan hebê bê.

Herêmên kurdistanê ên din jî em rastî nîşanakên dema neolîtîkê li wan tên minaq, herêmên weke sêrtê li bothanê, ayngermê, li herêmên weke çolemergê li dora çîyayê tanin, li çêlê navenda wê û hwd, mirov dikarê wan werênê li ser ziman. Ev herêm wê weke herêmna ku wê jîyane dema neolîtîkê ku wê li wan bi komî wê pêşbikeve bê. Her wusa wê li wan jî wê di vê çerçoveyê de wê rewşa jîyane dema neolîtîkê wê xwe bide dîyarkirin.

Em dema ku nîşanakên ji dema neolîtîkê wan fahm dikin, bi wê re em wê jî fahm dikin ku wa ew rewşa ardnîgarî û rewşa wê ya şînahîyê û hwd jî wê gûharîn wê di wê de wê bibê. Di wan deman de wê gelek herêmên kurdistanê, wê weke herêmên daristan û hwd bê. Di vê çerçoveyê de wê rewşek jîyanî wê bi xwezaye wê re wê hebê. Li herêmên botanê, wê di vê çerçoveyê de wê herêmên ku em li wan dinerê, weke herêmên ber çîyayê sipî û heta ku wê bigihijê ber çîyayê gabarê û ji wir jî heta ber çîyayê cûdî, wê weke xateka ku wê bi jîyane xwezayî re wê hatibê afirandin bê. Di vê çerçoveyê de mirov vê yekê jî wê dibînê ku ev herêm, wê weke herêmna ku wê temenê jîyane neolîtîkê wê li wan, pirr zêde zû wê were û pêşbikeve bê.

Em vê yekê jî wê di dewama wê de wê werênina li ser ziman ku em vê yekê jî wê dibînin û kifş dikin ku rewşa jîyane neolîtîkê a li herêmê, mirov wê yekê jî bi wê re wê kifş dike ku wê ji ya ku em dizanin wê kevntir wê herê. Nîşanakên ku wê yên ku ew didina nîşandin, wê di wê çerçoveyê de bin ku mirov wê rewşên jîyane neolîtîkê a li herêma botanê wê şîrove dike, li ser nîşanekên wê yên ji wê dema wê re wê,

bi wê re wê were dîtin ku ew kevntir wê herê. Serdemên mezolîtîkê, wê di vê çerçoveyê de wê di rengekî pêşketîna jîyane neolîtîkê de wê bidina dîyarkirin. Her wusa, demên dawî ên serdema peleolîtîkê, wê di vê çerçoveyê de ku em wan li ser têgînên jeolojîkî re wan dikin ku fahm bikin û ku em wan fahm dikin, em dibînin ku wê hê di wan deman de wê derfetên rengê jîyane neolîtîkî wê li ser jîyane komî a li herêmê re wê pêşketî wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, çendî ku ew nîşanakên wê yên di derbarê jîyane neolîtîkê a li herêma botanê ku ew werina dîtin û kifşkirin jî wê, bi wê re wê werina dîtin û kifşkirin ku wê, rewşa jîyane neolîtîkê û temenê wê, wê li herêmê wê kevntir wê herê.

Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa jîyane neolîtîkê, wê di vê çerçoveyê de wê di rewşek pêşketî wê de wê xwe bide dîyarkirin. Herêmên weke **Rehayê û nawala çolê, girê hacîyan, xirabreşkê**(*) **û hwd**, wê di vê warê de wê weke herêmna ku wê karibin, di warê kevnçûyîna rengê pêşketina jîyane neolîtîkê de ew hinek têgînna bidina me. Ev herêm û hinek herêmên din ên weke ên li bakûrê kurdistanê, di van waran de wê têgînekê wê bi me re bidina çêkirin. Rewşa jîyane li van herêman, wê hem kevnherê û hem jî wê piştre wê karibê xwe bide domandin bê.Yanî, di pêvajoyên şariştanîyê de jî wê,li wan wê hinek rewşên jîyanî wê di dewama wê jîyane li wan herêman de wê xwe bide domandin, wê hebê. Di rewşa fahmkirina

----------

(*)Ev hersê herêm wê weke herêmna ku wê di derbarê nîşanakên jîyane dema neolîtîkê de wê gelek nîşanak û birhanan wê karibin bidina me bin. Wê li wan wê hêkelên piçûk ên jinekê, tiştên ku ew hatina çêkirin bi destî û hwd wê, li wir wê werina dîtin. Ew jî wê, bidina nîşandin ku wê li van herêman wê, di demên neolîtîkê de wê, mirov wê di derbarê çêkirina karên destî de wê, hin bi hin wê pêşkeve û derkeve li pêş. Di wê warê de wê, ev wê, di warê civake dema neolîtîkê de wê, wusa bê. Li xirabreşkê bawergeha ku ew hat dîtin li dora 12 hezar salan hat bi dîrokkirin. Ev jî wê, dide nîşandin ku wê dîrokkirina dema neolîtîkê ew bi xwe re kevntir dibê. Bawergeh wê, weke saziyeka dema şariştaniyê bê. Ku ew di wê demê de ew pêşketibê bê wê demê mirov dikarê wê bêjê ku wê, pêvajoyên demên jîyane neolîtîk û hwd ên berî wê, ew wê, kevntir wê herin. Di wê varê de ev kifşkirinên li vê deverê, bi wê rengê ew hinekî bi dîrokkrinê bi xwe re kevntir dibin. Her wusa weke van herêman herêmên ´balqîê ku ew di bin avê de hatina hiştin jî wê li wan deveran wê cihên ku em bi wlê rengê wan dikarin werênina li ser ziman ên k uew xwediyê nîşanaka jîyane kevn li wê hebin wê bibê. Bêî ku ew nîşanak werina derxistin li holê û ew herêm ji kolanên erkologijikî re were vekirin hat di bin avê de hiştin. Lê li wir jî wê, weke xirabreşkê wê bawergeh û ankû bajarekê kevn wê hebê ku ew di bin avê de hat hiştin bêî ku ew were derxistin li ser rûyê rojê

demên neolîtîkê ên li herêma botanê de jî mirov digihijê heman qinyatê. Herêmên botanê, wê di vê çerçoveyê de wê, herêmna ku wê li wan wê nîşanakên ji dema neolîtîkê wê hem di rewşa jîyane civakê û bi xûyên mirovên herêmê ên ku ew bi wan dijîn re wê hebê û hem jî wê di rewşa weke bermehîyan de wê, ev rewş wê xwe bide nîşandin û dîyarkirin. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa jîyane herêmê, wê di vê çerçoveyê de wê giring bê ku mirov çavekî li wê bixê. Wê fahmkirina di rewşa jîyane xalkê herêmê de wê, biqasî wan bermehîyan wê giring bin û heta ku wê wê ji wê giringtir jî bê di gelek warên weke fahmkirina xûyên jîyane civake a berî jîyane şariştanîyê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê herêma botanê, weke navendek giring û dîrokî a dema jîyane neolîtîkê wê werênê li ser ziman.

Herêma botanê, wê ji gelek aliyan ve wê giring bê ku mirov wê hilde li dest. Lê bi teybetî jî ji aliyê têgîna jîyane civakî a ji demên neolîtîkê ve wê herêm, wê weke herêmeka bijarta bê. Di vê çerçoveyê de wê, herêm, wê herêmên li dora xwe wê bi pêşketinên wan re wê bide li hevdû. Her wusa herêmên başûrê kurdistanê jî wê ji herêmên weke Xazo û heta ku wê bigihijê ber rêza çîyayên zagosan, wê gelek dever, wê di vê çerçoveyê de wê weke herêmên ku wê li wan jîyane civakî a dema neolîtîkê ku wê were pêşxistin bê. Li herêmên weke kirman, haslê, Fûqanîya, hassûna û hwd, wê bi gelek deverên din re wê weke herêmên ku wê di wan deman weke cihwar ku ew hatina avakirin bin.

Di rewşa jîyane herêmê a neolîtîkî de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê herêmên weke ber çemê xabûrê ku wê di wan deman de wê pirr zêde wê bilindba, wê li dor û kevîyên wê, bi cih bûn wê bibê. Em dema ûrûkê de wê di destana gilgamêş de dibînin ku wê gilgamêş wê li ser şaqek çemê xabûrê ku ew di rijihê li diclê re wê bi kiştê wê rêwîtîyê wê bike. Di vê çerçoveyê de wê ew jî wê di wê rêwîtîya xwe de wê, heta botanê û ankû cizira bota a roja me, wê were.

Ji van rewşên vegotinî mirov wê jî fahm dike ku ev herêm, wê di wê demê wê weke herêmna ku wê bi bajarvanî bûn. Ev herêm, wê weke herêmeka ku ew kok û jeolojîya wê were lêkolînkirin, wê were dîtin ku wê li ser axa wê, wê gelek pêvajoyên demên peleolîtîkê, mezolîtîkê û piştre ên neolîtîkî bi kokî û dirêj jînbûna. Di vê çerçoveyê de navenda Cizîra bota bixwe jî wê di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rewşekê bê. Her wusa navend silopîya, Hezexê, nisêbînê û hwd jî wê bi heman rengî wê xwediyê rewşekê bin. Ev

herêm, wê bi demê re wê bi wê li wan zêdebûna mirovan re wê gûharîn wê di wan de wê bi destê mirovan wê werina çêkirin. ***Çemê nisêbînê***(*)**,** di aslê xwe de wê, di dema

------------

(*)Li dora çemê nisêbînê û heta ber çîyayê sipiî wê di wê navberê de wê, nîşanakên ji dema neolîtîkê û heta dema peleolîtîkê wê pirr zêde wê hebin. Gundên neolîtîkî wê hinek ji wan wê pêşî li wir wê werina vakirin. Minaq gûndên weke ´xirabê şêref˝ mirov dikarê di wê çerçoveyê de bibîrbikê. Ev tenê deverek ku ew zû hat kifşkirin bê ji wê herêmê.

neolîtîkê de wê ne kêmî yê xabûrê wê xwediyê rewş û giringîyekê bê. Pirranîya ku wan gûndên herêmê ên nisêbînê ku wê bikevina tahma wê de wê, di dema neolîtîkê de wê weke deverna beravî ên ku wê komên civakî ên dema neolîtîkê ku wê li wan deveran bicih bibin bin. Her wusa, di vê çerçoveyê de em dikarin vê jî bibêjin ku gundikên nisêbînê ên weke girêmîra, kelehêbûnûsra, serêkahnîyê, qasir belek, erebenê, xirabê mişka û hwd, bi gelek gûndên wê yên din ên nisêbînê re û bi dora wan re were lêkolînkirin, wê di van waran de wê li wan wê rastî bermehîyên civakî ên dema neolîtîkê û her wusa ên şariştanî ku ew aîdî pêvajoyên şariştanîyê na wê werina kifşkirin û dîtin.

Li dora hezexê jî wê, mirov rastî gelek gûndên neolîtîkî ên weke *xirabêşêref* wê were. Di herêmê de wê, weke vê gûndê ku wê di demên neolîtkê de jî wê li wan herêmên wan wê cihên jîyane komên civakên neolîtîkî wê bijîyan, wê li herêmê wê gelek deverên din jî wê hebin. Her wusa, mirov dema ku wê, rêwîtîyekê li herêmê dike, mirov bi awayekî vekirî, wê rewş dibînê ku wê gelek bermehî wê werina dîtin. Gûndên weke xirabêşêref ku ew dikevina nêzî çîyayê sipî de wê, li herêmê wê di vê de wê, di wê çerçoveyê de wê hebin. Hewirdora çîyayê sipî, wê demekê, wê weke çîyayê cûdî û ankû zagrosan, wê di van deman de wê, deverna ku wê mirovan wê xwe li wan girtiban. Ew şikeftên wê yên ku ew pirr zêde berfireh û î ro, ew di bin axê de mana, wê li wan wê jîyane komên dema neolîtîkê wê li wan hebê. Piştre jî wê, dema ku wê pêvajoyên şariştanîyê wê pêşbikevin, wê hinek ji wan herêman, wê li rex wan wê niştecihên weke gûndên neolîtîkî wê werina avakirin. Hinek herêm jî wê ew devera ku ew berê cihên komên civakên neolîtîkî bûya wê ew weke gûnd wê werin û pêşbikevin. Di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bin. Lê li vir, di dewama wê de em vê yekê jî wê werênê li ser ziman, em dema ku wê rêwîtîyê li herêmên botanê dikin, em rastî pirr zê de bermehîyên ji dema civake neolîtîk û piştre pêvajoyên şariştanîyê dihên.Pêvajoyên şariştanîyê ku wan destpêkir û pê de wê, herêm wê bi awayekî wê li ser gûndîtîyê re wê pêşbikevin. Li herêmê têgîna gûndîtîyê, weke têgîneka neolîtîkî wê di dema pêvajoyên şariştanîyê de jî wê ew bîjî û wê hebûna xwe wê bide domandin. Her wusa ew rewşa gûndîtîya herêmê, wê weke rewşek gûndîtîya dema neolîtîkê bê. Di vê çerçoveyê de rewşa gûndîtîyên herêmê di cihê xwe de lêkolînkirina wan, wê di serî de wê vê rewşê bi awayekî vekirî wê piştrast bike û wê bide dîyarkirin. Mirov, dema ku li herêmê digerihê û bi nerîneka ne zêde dirêj re jî mirov wê rewşa wê di cih de wê kifş dike.Ber vê yekê, rewşa gûndên wê, her wusa weke rewşek teybet di aslê xwe de mirov divê ku wê hilde li dest. Rewşa gûndên wê, wê weke rewşek teybet bê. Li gûndên wê, dema ku mirov li wan dinerê bi nerînek lêkolînî, wê ew bi wê re wê, ew wê were dîtin ku ew ew dever, wê weke deverna ku ew li wan jîyan bi hezaran salan hena. Lê hertimî wê wê di nava wan pêvajoyên bi hezaran salan de wê, weke gûnd wê weke xwe bimênin ku ew heta ku ew werina roja me. Ji rewşa xwe ya gûndîtîyê xirabûn nejîna.

Di vê çerçoveyê de rewşa gûndîtîya herêmê, di aslê xwe de wê bi serê xwe wê weke rewşeka ku mirov wê dikarê wê di vê çerçoveyê de wê weke têgînekê wê hilde li dest bê. Rewşa gûndên herêmê, di serî de mirov dema ku wan dinerê û mirov rastî wan bermehîyên ji demên civake neolîtîkê û piştre ji pêvajoyên şariştanîyê li wan tê, mirov wê pirsê ji xwe dike ku ew gûnd, çawa bi hezaran salan weke xwe weke gûnd di cihê xwe de mana. Ev rewşeka ku wê, bi xwe re wê, ji gelek aliyan ve wê, weke rewşeka ku mirov wê bi lêkolînî li wê binerê û wê di çerçoveya jîyane demên bûhûrî ên civakî de wê hilde li dest û wê fahm bike bê.

Li vir, em divê ku vê yekê jî wê di dewama wê de wê werênina li ser ziman ku wê, gûndîtî, wê weke rewşek jîyanî wê xwe bidepêşxistin. Wê piştre jî wê, ev rewşên gûndîtîyê, wê di çerçoveyê de wê, di çerçoveya têgîna xizmtiyê de wê ew werina parastin. Di vê çerçoveyê de wê sazûmanaka parastina wan, wê were pêşxistin. Zêde tevlîbûn, bo vê yekê wê destûr newê dayîn ku ew li wê bibê. Her wusa, wê gund bi gûnd, wê aîdî kîjan malbata ku ew mazinbûya weke aşîrekê û ankû klanekê bê, wê ew di wê çerçoveyê de wê ew were naskirin. Di vê çerçoveyê de têgîna gûndîtîyê de wê têgîneka gûndînasîtîyê wê pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de wê li ser wê têgîna gûndînasîtîyê re wê ew rewşa wê ya jîyanî wê di çerçoveya wê jîyane malbatî û hwd de wê, ew wê were parastin.

Di rewşa jîyane malbatî de mirov, dema ku wê rewşa wê dihilde li dest wê, di serî de wê bi wê re wê rewşa jîyane gûndîtîyê wê xwe bi wê re wê bide dîyarkirin. Du tişt wê bi têgînî wê temenê wê pêşketina gûndîtîyê bin. Aliyê pêşî wê, wê nifşên ku ew li ser hevdû di wê de jîyane xwe derbas dikin bin. Aliyê din jî wê, her wusa, wê bi wê re demên bûhûrandinê re girêdane ku ew li wê deverê ew çê dibê bê. Di vê çerçoveyê de wê, ev bibê. Li herêmên kurdistanê, wê rewşek malbatên pênaber ên navxweyî wê zêde nebê. Yên ku ew hena jî wê di rewşek jîyane şivaniyê de wê weke ku em heta roja me wê, bi jîyane koçerîyê re wê kifş dikin re wê ew hebê. Jîyane koçerîyê jî wê, di çerçoveya wê jîyane gûndîtîyê û rewşa şivanîya wê ya bi malbatî re ew, weke mijareka bi serê xwe mirov dikarê wê hilde li dest. Ev jî wê, di derbarê rengê jîyane demên civakî ên demên neolîtîkê û piştre ku wê di pêvajoyên jîyane civakê de wê çawa wê xwe bide domandin, wê têgînna wê bide me. Ber ku ev jîyane koçerîyê, wê weke rengekî jîyanî ku ew di dema jîyane şariştanîyê de jî ew dijî wê, ew wê rengê jîyane bi dema şariştanîyê a bi xwe re wê bi gotina ´jîyane deştê´ re wê werênê li ser ziman. Lê wekî din jî wê lingê xwe yê duyem ê jîyane xwe ya ya gundîtîyê jî wê bi gotina *´jîyane zozana´* re wê werênê li ser ziman.Ji xwe,jîyane koçerîyê(*),wê bi gotina *´zozana´,´çûyîna zozana*(*)*´, ´jîyane*

-----------

(*) Jîyane koçeriyê wê şêwayekê jîuyane xweza ku wê di nava rengê jîyane wê de wê mirov rastî nîşanakên jîyane demên berî yên şariştaniyê jî werê bê. Hê jî ew li vê herêmê dijî. Çendî ku ew bi tememî hatibê ji deformekirin û ji gelek aliyan ve tûnekirin jî lê wê, hê karibê dîmenekê vekirî dênê li berçav.

*zozana*(*)´ û hwd re wê were naskirin. Ev gotin, wê bixwe re wê tiştekî wê bidina dîyarkirin. Ew jî wê wê ew bê ku wê, jîyane civakê wê ji van aliyan ve wê were dîtin. Minaq, jîyane gûndîtîyê, wê temenê wê yê destpêkê wê li ser rewşa xwedîkirina kerîyên sawalan bê. Ev jî wê, taqabûlî rewşa jîyane civakî a gûndîtîyê a dema neolîtîkê a li herêmê a şivaniyê wê bike. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê vê yekê jî wê bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê di rewşa wê de wê ev rewşa wê, wê weke rewşek jîyanî a ku wê xwe bide domandin bê. Rewşa jîyane şivaniyê, wê di vê çerçoveyê de wê bi demê re wê li ser esasê xwedîkirina kerîyên sawalan, garanên ga û çêlekan û hwd re wê, xwe bide domandin. Bi teybetî jî ev sawalên ku ew weke kerîyan wê werina xwedîkirin ji aliyê malbatan ve wê, weke rengna kerîyên sawalan ên ku ew şîr didin bin. Bi teybetî jî wê, ev sawal wê werina naqandin û wê werina kedîkirin. Di vê çerçoveyê de wê ew weke rewşek jîyanî a ku ew bi wê re ew dabara xwe ya malbatî bikin bê.

Jîyane gûndîtîyê, wê weke aliyekî giring ê jîyane civakî a destpêkê a li herêmê bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Di nava gûndan bixwe de jî wê, rengekî jîyanî ê weke bi komelî wê hebê. Wê çandinîyên xwe weke ku ew di dema palayîyê de ku ew alikariyê didina hevdû û bi hevdû re dest didina hevdû û zadê xwe yê li ardê berhev dikin, wê di rewşek bi wê de wê bijîn. Di nava gûndîtîyê de wê weke hevdû bijîn. Ku yek ji wan mihtacê tiştekî û ankû rewşa wî nebaş bê, wê alikariyê bidina hevdû. Wê rewşa wî wê, weke ya mirovên din ên li gûnd wê baş bikin.

Jîyane gûndîtîyê, wê dema ku mirov, li ser xosletên wê yên ku ew bi wê dijî ku mirov li wê dihizirê mirov, wê bi wê re wê gelek xosletên dema neolîtîkê wê kifş bike. Di aslê xwe de gûndên herêmê wê bi rengê jîyane xwe re wê weke gûndna neolîtîkî bin. Di vê çerçoveyê de fahmkirina wê rengê jîyan wan, wê biqasî wan rewşên erkolojikî ên ku ew li herêmê bo fahmkirina wê rengê jîyane demên bûhûrî ku ew li ser wan bermehîyan dihê kirin wê giring bê û heta ku wê ji hinek aliyan ve wê ji wê giringtir jî bê.

Jîyane gûndîtîyê, wê di vê çerçoveyê de wê giring bê ku mirov wê fahm bikê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku serdema neolîtîkê, wê gûndikên wê, wê weke gûndikna ku wê, di wê demê de wê hê nûka wê bûhûrîna li rewşa avakirina malan û hwd bê. Malan, wê ji axê çê bikin. Em dibînin ku wê li herêmê, di destpêka demên neolîtîkê û piştre wê di demên şariştanîyê de jî wê ew were dîtin li herêmê ku wê malên wan ên ku ew ava dikin wê ji axê û keviran bin. Di vê çerçoveyê de wê bi axê sayandina wan keviran wê bikin. Wê bi axê sayandina hûndûrê malê û dervî wê, wê bikin. Di vê çerçoveyê de wê, weke devereka ku ew di wê de karibin bijîn bê. Ev rewş,

-------------

(*)Çûyina zozana dema ku wê koçer ji deştê herina zozana bê. Gotina zozana di dema gûtîyan de jî dihê dîtin.

(*)Jîyane deştê, wê weke jîyane li deverên şariştanî ku ew hebê bê. Wê dema ku wê koçer vegerihina li malên xwe wê ew wê bênê ser ziman.

wê hin bi hin wê nîşnaka du tiştan bê. Yek, ji şikeftê derketina derve bê. Ya din jî wê, çawa hêtên wê yên hundûr wê çê bikin, wê li gorî wê bijîn. Em li rewşên malên destpêkê dinerin, em wê reş dibînin ku wê hinek ji wan, wê weke ku ew rewşa şikeftên berê ku mirovan di wan de jîyankirina wê weke model wê

esas bigirin û wê malên xwe wê çê bikin. Di gelek deverên herêmên de malên ku ew hatina çêkirin, wê bi awayekî wê bi qawartina hundûrê kevir re wê malên xwe çê bikin. Bi qawartina hûndûrê kevir re wê ew mal wê werina çêkirin. Rengê şikeftên ku ew di wê de dijîn jî wê ji mirovan re wê bi wê rengê wê werê. Di vê çerçoveyê de ew di şêwayekî de wê qawartina kevir û ankû latên mazin bikin û wê di hundûrê wan de wê malan çê bikin. Şêwayekî din jî ê destpêkê ê çêkirina malan ku ew jî li herêmê di destpêkê de wê werina çêkirin wê mal serdorên wê bi ardê ve weke hema bêja wê yek bê. Wê bi kolandina ardê re wê, ew mal çê bikiran. Wê dema ku wan ew ser wê kola, wê piştre wê wê ser wê devera ku wan kolaya wê bigirtan. Wê bi wê re wê biketan hundûr de. Bi vê rengê jî wê, ew malên weke ku bi kolana ardê û ankû bi ardê re yek, wê ew piştre wê bi kolandinê wê kûr û dûr wê di wan de wê bi ardê ve biçûyan. Di vê çerçoveyê de wê di rewşekê de ba. Rewşa axa herêmê jî ew bû ku ew deverên ku ew hatina kolandin ku ew hundûr ve ew dihatina sayandin bi hariyê, wê weke kevir wê ew harî hişk bûba. Di vê çerçoveyê de wê ew bûba. Şêwayekê sêyem ê weke malên ku ew di wê de dijîn ên weke ku ew li herêmên kurdistanê ên weke Reha, erxanê, Erzinganê, Erzûrûmê û hwd hena, ên weke *´dûkeşîyên ferîştayan´* bin. Ev bi tememî wê weke bangorekî bilind bûba. Ji kevir bin û ji axê bin. Ew jî wê, ne zêde mazin ban. Wê mirovan ew ji xwe re wê çêkiriban û wê di wan de wê bijîyan. Her wusa, li herêmên weke botanê, Cizîrabota, heskîfê, elezîzê, meletî, semsûrê û hwd jî wê, malên ku ew di latan de bi qawartina wan ew hatina çêkirin wê hebin. Di vê çerçoveyê de wê ew bibin. Di gelek deveran de mirov rastî hinek rengên malan tê ku ew aliyekî wê binlat a. Lê her sê aliyên wê yên din jî ew bi destê mirovan ew hatina girtin bin. Lê bin lat jî ew di awayekî ku ew di hundûrê lat ve diçê hatîna qawartin bê. Di vê çerçoveyê de ew hatina girtin. Di aslê xwe de ev rewş, wê rewşek jîyanî a demê a giring ku ew pêşdikeve wê bi xwe re wê bide dîyarkirin. Li herêmê, wê bi demê re wê malên ji axê wê pêşbikevin. Wê pirranîya malan wê, di vê çerçoveyê de wê, wrina çêkirin. Malên ji axê, wê em zivistana germban û hem jî wê di havînan de wê hînikban. Di vê rengê de wê xwediyê rewşna demsalî ên baş ban.

Li herêmê, wê rewşa havînan wê bi demê re wê pirr zêde bi germ bibê. Ya zivistanan wê vajî wê, wê pirr zêde wê bi cemed bê. Wê di vê çerçoveyê de wê bi pêşketina rewşên demsalîyê re wê mirov jî wê jîyane xwe wê li gorî wan biadilênin. Wê bi wê re wê di rewşekê de wê bijîn. Di rewşa jîyane mirov de wê, di vê çerçoveyê de wê, ew wê were jîyankirin.

Di rewşa jîyane gûndîtîyê de wê, bi vê rengê wê bi çêkirina malan re wê rewşa gûndîtîyê wê pêşbikeve. Mirovên ku ew di gûnd de dijîn, wê ew jî wê hema bêja hemû jî wê ahl û xizmên hevdû bin. Wê di ast û rewşa gûnd de wê weme malbatek mazin bin. Di vê çerçoveyê de wê bi giştîya gûnd re wê xwediyê rewşek gûndîtîyê bin. Lê di hundûrê wê de wê de jî wê rewşên weke yên weke malbatî û hwd jî wê pêşbikevin. Ew jî wê, di vê çerçoveyê de wê bibê.

Di rewşa gûndên neolîtîkê de wê dû rewş wê bi teybetî wê xwe bidina dîyarkirin. Yek, weke ku em kifş dikin, wê nêzî deverên avî û cihên ku ew dikarin herin û li wan nêçîrê bikin bin. Di vê çerçoveyê de vê, xwediyê rewşekê bin. Lê bi demê re wê, reşa nêçîrîyê wê di wê de wê pirr zêde wê gûharîn wê di wê de wê bibin. Wê piştî pêşketina rewş kedîkirina sawalan bi kerîyan wê êd wê, mirov wê ji wan sawalan wê sûdbigirê. Wê fêrî hildana şîrê wan û ji wan xwe dabarakirinê bê. Bi wê re jî wê, bi demê re wê di çêkirina xwarinên xwe de wê ne tenê goştê nêçîrên ku ew dikin wê, weke xwarina wan bê. Wê her wusa wê bi demê re wê fêrî xwarina şînahîyan jî wê bibin. Di vê çerçoveyê de wê, dema ku mirov dibînê ku ew sawal diçêrê û wî geyayê dixwê û ew bi wê namirê, ew jî wê bidest xwarina w geyayê weke şînahîyê bike weke w sawalê. Di vê çerçoveyê de wê rewşek nû wê di rewşa morfolojiya xwarina mirovê dema neolîtîkê de wê, xwe bi demê re wê bide dîyarkirin.

Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman, ku wê bi demê re wê fêrî çandinîyê wê bibê. Wê zadên xwe wê biçênin. Di vê çerçoveyê de wê, hinek malên demê û ankû weke gûndên neolîtîkê, wê di wê rewşê de bê ku wê aliyekî wan weke pişta wan ku ew xwe dide çîya û ankû daristanê bê. Lê her sê aliyên wan ên din jî wê vekirî bin. Wê di wê qada vekirî de wê êdî wê bi demê re wê ew wê çandinîya xwe wê bikin.

Bi demê re wê ev rewş wê pêşbikeve. Wê bi demê re wê, mirov wê nêçîrkirinê wê kêm bike. Wê zêde jîyane xwe bi nêçîrîyê ve wê girênedê. Wê rewşa jîyane şivaniyê jî wê rewşa nêçîrkirinê wê bide kêmkirin. Her wusa wê rewşa çandiniyê û hwd jî wê, rewşa nêçîrkirinê û girêdanîya bi wê ve wê kêm bikê. Jîyane şivaniyê a dema neolîtîkê ku em bahse wê dikin, wê di cih de di mejiyê de wê, rewş û rengê

jîyane koçerîyê a li kurdistanê ku ew xwe bi hezaran salan dide jîyankirin wê werêne berbîra me. Jîyane koçerîyê wê, di vê çerçoveyê de wê weke rewşek giring a ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman bê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku wê yekê jî wê werênê li ser ziman, wê malbatên koçer, wê di derbarê sawalan û naskirna şînahîyên xwezayê de wê bi demê re wê weke malbatna hosta bin. Wê zanebûna wan ya xwezayê wê pirr zêde wê pêşbikeve. Di aslê xwe de wê, zanebûna xwezayê wê, di demên neolîtîkê de wê di nava van malbatan de wê xwe bide pêşxstin. Ev malbat, wê weke malbatna ku wê xwediyê zanebûna xwezayê wê pêşbikevin bin. Di vê çerçoveyê de wê, di rewşekê de wê xwediyê rewşekê bin. Bi demê re wê mirov, wê gelek şînahîyan wê kifş bike û wê wan biçênê. Di nava xwezayê de wê gelek şînahîyên ku ew ew dikarê wan bixwê û bi wan dabara xwe wê pêşbixê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku wê jî wê werênê li ser ziman ku wê kifşkirina şînahîyan, wê rengekî nû ê di jîyane mirov de bê. Wê rengê xwarina mirov a demê jî wê, cûr bi cûr bikê. Rewşa xwarinê û ankû morfolojiya xwarinê wê bi demê re wê bi kifşkirinên di xwezayê de re wê bi wê re wê gûharîn û pêşveçûn wê bibin. Wê bi wê re wê, xwarinên weke bi tevlîhevkirinê ku ew dihên çêkirin wê, mirov wê fêrî wan bibê. Di aslê xwe de wê bi tevlîhevkirinan çêkirina xwarinê, wê nîşanaka tiştekî din jî bê. Ew jî ew a ku wê, têjgirtin û tahmgirtina ji xwarinê a mirov wê pêşbikeve bê. Mirov, wê di vê çerçoveyê de wê, bi demê re ku ew çendî ku ew şînahîyan wan nas dikê, wê bi wan re wê bike ku ew xwe bigihênê têj û tahmên ji hev cûda. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî wê werênê li ser ziman ku wê pêşketina têjgirtin û ankû tahmgirtinê, wê weke rewşek nû a di jîyane mirov de bê. Têjgirtin û ankû tahmgirtin wê, bi têgînî wê, di vê çerçoveyê de wê di jîyane mirov de wê xwediyê pêşketinekê jî bin. Bêhnkirin û ji wê bêhnê sûdgirtin wê, pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de wê bi demê re wê ev pêşbikevin.

Di rewşa fahmkirina gûndên neolîtîkê ên li herêmê de ku mirov dihizirê, mirov wê dibînê ku wê heta roja me jî wê di nava gûndên herêmê ên kurdistanîyan de wê ew xosletên wê, wê xwe bidina jîyankirin. Rewşa jîyane wan ya bixwezayê re wê, di vê çerçoveyê de wê pêşbikeve. Di nava rewşa xwe de wê, bi awayekî ji rewşên pêşveçûnên şariştanîyê dûr, wê di nava xwe de wê bi awayekî xwe bi xwe re wê bijîn. Wê pêşveçûnê di jîyane xwe de wê çêbikin. Wê her demî wê zanîna xwe ya xwezayê wê zêdebikin. Wê bi wê re wê temenê ji xwezayê sûdgirtinê wê hertimî wê bi xwe re wê zêdetir wê bikin.

Mijara sûdgirtina ji xwezayê wê, weke mijareka ku mirov dikarê wê di çerçoveyê de wê ji gelek aliyan ve wê hilde li dest bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, jîyane mirov wê di nava xwezayê de wê bijî. Fêrbûn û alimînên bi jîyane xwezayê re wê, di vê çerçoveyê de xwediyê giringîyeka bi jîyane me û pêşketina wê re bin. Mirov, weke zindiyekî ji nava xwezayê wê, hertimî wê ji xwezayê wê sûdbigirê. Wê tiştên ku ew bi wan dabara xwe dike wê ji xwezayê wê hilde. Wê her tiştê ku ew di jîyane mirov de ew pêş dikeve jî wê, ji wê xwezayê bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê xwezayê weke aliyekî giring ê bingihîn ê xwezaye xwe wê hilde li dest.

Mirovê demê, wê di destpêka jîyane xwe de wê, jîyane wî, wê girêdayî nêçîrê bê. Heta serdemên peleolîtîkê jî wê ev rewş wê wusa bê. Lê ji dema dawî a serdema peleolîtîkê û dema mezolîtîkê û hwd ve wê, heta ku wê dem were dema neolîtîkê wê di wê de wê gûharîn wê bibin. Mirov, wan kifşkirin ku ew di jîyane xwe de dikê, wê ew wê her yekê wê temenê gûharînan bê. Her wusa, wê di vê demê de wê mirov wê di rewşa xwe de wê, wê kifşkirinên weke çêkirina xwarinê li ser êgir û xwarina wê xwarina çêkirî û hwd, wê di rewşa jîyane mirov û her wusa fîzyolojiya mirov de wê gûharîna wê bi xwe re wê werênê. Minaq, wê di reşa hemû hinavê mirov de wê, li gorî wê rewşa xwarina kelendî û qalandi wê rewş wê biafirê. Wê li gorî wê, rewşên nû wê, biafirin. Li gorî wê, wê di fîzyolojîya mirov de wê gûharîn di laşê mirov de wê bibin. Mirov wê di vê çerçoveyê de wê kifşkirinan wê bi xwe re wê bide çêkirin. Rewşa çêkirina xwarinê wê, ji gelek aliyan ve wê temenê beyenîbûneka mirov a ji nava zindiyên din ên xwezayê bê. Wê di dewama wê de wê jî wê, temenê rewşna ku ew di rewşa xwe de weke rewşên ahlbûnê a di nava jîyane komê û ankû civaketîyê de wê bi xwe re wê werênê li holê. Ev rewşên jîyanî wê, rewşna nû bin. Her wusa, wê mirov wê li gorî wan, wê hertimî wê pêwîstî wê bi wan bibînê ku ew pêşxistinê bi xwe re û di jîyane xwe de ew bide çêkirin. Di vê çerçoveyê de wê, bike jî. Wê di rewşa çêkirina xwarinê de wê, pêşveçûnan wê di xwe de wê çêbike. Wê xwarina ku ew li ser êgir çêdike wê bikeve jîyane mirovê demê de. Wê bi wê re wê di jîyane mirovê de wê, ev rewş, hin bi hin jî wê cihê xwe bigirin. Di rewşên çêkirina xwarinê de wê, herî zêde wê jin wê derkeve li pêş. Jin, wê hertimê wê di nava xwezayê de wê di dema neolîtîkê de wê di rewşek berhevkkirinê û afirandinê de bê. Mêr, wê li derve wê di rewşên nêçîrê û hwd

de bê. Mêr, wê zêde barrî bê. Lê ew barrîbûna wî, zêde ji ser wî neçûya. Lê hin bi hin wê, ev barrîbûna(*) wî wê ji ser wî herê. Wê ew were girêdan. Di rewşa pêşketina malbatîtîyê de wê ev rewş wê pêşbikeve. Wê rewşa malbatê wê, weke jin û mêrek wê temenê wê biafirênê. Di nava hemû zindiyên xwezayê de wê, weke ku em di kurdî de wê dihênina li ser ziman wê yek ´mê´ û ya din ´nêr´ wê ´cohtek´ wê hebê. Cohtek, ji yek ´mê´ û ´yek ´nêr´ pêktê. Wê di vê çerçoveyê de wê ev hebê. Her wusa, di rewşa mêşên hingiv de wê ´mêşahingiv a banû´ wê hebê û wê ew weke ya herî zêde wê kifşkar bê. Di vê çerçoveyê de wê, rewşek weke wê, wê di nava malbatê de wê li ser zayîn û walidandinên wê re wê derkeve li holê. Wê ew di nava rewşa jîyanê de wê, weke ya kifşkar wê derkeve li holê. Di gelek nivîsên di vê warê de ku ew di wan de dihê gotin ku ´mêr, ber ku ew zaxma û ew di nêçîrê dike û ew her nêçîrê weke xwarina malê dihênê malê, ew yê kifşkar a´ wê, weke teorîyeka ku em nikaribin li vir wê, bi tememî piştrast bikin bê. Çendî ku rewşek weke ya zêde çûyîna nêçîrê a mêr hebê jî lê wê mêr, wê bi van rewşan re wê nikaribê ew xwe serdest bike di demên neolîtîkê de. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê di dema neolîtîkê de wê ya ku wê li pêş û kifşkar, weke mêşahingiv a banû wê jin bê. Ew jî wê kifşkar bê.

Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê jin wê, di rewşa jîyane bicihbûyî de wê, ew di dû rewşan de wê pirr zêde wê derkeve li pêş. Di rewşa berhevkirinê û her wusa rewşa hewkirinê de wê bizêdeyî wê derkeve li pêş. Di vê çerçoveyê de wê rewşa jinê wê bi rewşa wê ya afirandinê re wê li pêş bê. Wê jin, wê bi zêdeyî wê li dora xwe wê bijî. Yanî wê, dema ku ew li wê bicihbûya weke bi malbatî wê li wir wê bike ku ew wê

--------

(*)Berrîbûn yanî hê kedî nebûyî, Ankû hê ahl nebûyî

jînkirinê wê bike. Di vê çerçoveyê de wê, pêşî ew wê bibînê ku wa sawal ji kîjan geyayê dixwûn. Wê ew şînahîyên ku wan sawalan xwarin wê ew jî wan kifş bikê. Di vê çerçoveyê de wê, heta ku wê demekê wê ew weke wana sawalan wê ew di nava wan sawalan de wê biçêrê. Piştre jî wê ew şînahî, wê bi têj û tahma wan re wê di mejiyê wê de wê bicibûn. Ev rewş, wê bi teybetî wê di dema dawî a serdema peleolîtîkê w bibê û wê di dema mezolîtîkê de wê hin bi hin wê, li wan şînahîyan û têj û tahma wan wê serwaxt bibê.

Hewkirina şînahîyan, wê bi rengê kirina nava hevdû û ji wan derxistina têj û tahmên nû bê. Minaq, dema kelendina şînahîyan di nava hevdû de di nava avê de wê, ew tevlîhevdû bibin. Wê têja wan tevlî hevdû bibê. Şînahîyên ku ew wê werina kifşkirin û wê piştre wê, weke *´şînahîyên xwarinê´* wê pêşbikevin wê, bi demê re wê weke şînahîyna ku wê di sofreya mirov de wê cihê giring wê bigirin bin. Di aslê xwe de mirov, çawa ku weke ku bi hostatîya mirov a di nêçîrê de wan rewşan dihênê li ser ziman, mirov divê ku wê jî bi heman rengî wê werênê li ser ziman. Pêvajoyên fêrbûna nasîna şînahîyan, wê temenê ji wan sûdgirtina wan jî wê bi xwe re wê pêşbixê. Di vê çerçoveyê de wê, ev jî wê weke pêvajoyeka giring a ku wê di nava jîyane mirov de wê pêşbikeve bê. Bi teybetî jî mirov di jîyane xwe de ew piştî ku ew bicihbû û pê de wê, di rewşa jîyane xwe ya di cih de wê, çawa karibê baştirin dabara xwe bike, wê li rê û rewşên wê bigerihê. Rewşa kifşkirina şînahîyan û bikarhanîna wan jî wê, di vê çerçoveyê de bê. Bi teybetî, wê aliyekî serdema neolîtîkê wê ew bê ku wê, di rewşa naskirina şînahîyan de wê, pêşveçûna ku ew dihê çêkirin bê. Bi wê re jî wê, temenê çandiniyê wê were çêkirin. Her wusa wê bi demê re wê ji wî tişta minaq weke genim ku ew dihê çandin wê gelek tişt wê weke hewkirin.

Piştre jî wê bi demê re wê li wan tiştên ku ew dihêna çandin wê li wan zêdebûn bê kirin. Wê gelek tiştên ku ew dihêna çandin wê bibin. Minaq, wê mirovê wê pêşî wan tiştê ku ew diçênê, wan di nava xwezayê de wê kifş bikê û wê bigihijê têja û tahma wan. Piştre jî wê, dema ku ew hişk bûn û bizrikê wan çêbûn û ketina ardê û şînbûn jî wê, mirov ew wê êdî wê ew wê kifş bike. Wê bibînê. Di vê çerçoveyê de wê dema ku ew rewş bi rewşa demsalan re ew şînbûn bû, wê ew hizirna wê di mejiyê mirov de wê bide şînkirin. Di vê çerçoveyê de wê mirov, wê hin bi hin wê bigihijê hizra çandiniyê. Her wusa, wê piştî ku ew gihişt wê hizra çandinîyê, wê bi demê re wê di wê rewşê de wê bizane bibê û wê li wê rewşên nû wê zêdebike.Wê pêşveçûnan wê, di wê rewşê de wê bijî. Pêvajoyên rewşa çandinîyê wê li dûv hevdû wê xwediyê rewşna ku wê li hevdû gav bi gav wê werina zêdekirin û bi wê re wê çêkirina pêşxistinê bê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa çandiniyê wê weke rewşeka ku wê ew wê girêdayî aqilê mirov û pêşketina wê jî bê.

Rewşa çandiniyê, wê di vê çerçoveyê de wê mirov wê bihizirkirinê re wê ew wê kifş bike. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku wê têkiliya çandiniyê û pêşketina wê ya gav bi gav wê, bi rewşa pêşveçûnên bi aqil re wê dênê. Di vê çerçoveyê de wê, ew rewşa çandiniyê wê weke rewşek teybet a jîyane mirov a bicihbûyî bê. Jîyane mirov a bicihbûyî, wê di vê çerçoveyê de wê temenê wê biafirênê. Mirov, li devera ku ew li wê bicihbûya, wê ji wê rewşa avê û axê ku ew dema ku ew digihijê hevdû û wê ji wê têkilîya wan bi hevdû re wê çawa wê şînahî wê bibê, wê bi kifşkirina wê re wê rewşa çandiniyê wê pêşbixê. Di aslê xwe de wê rewşa çandiniyê wê nîşanaka wê bê ku wê bi aqilê mirov re wê pêşketinek mazin wê hebê bê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Rewşa çandiniyê wê weke rewşeka ku wê mirov, wê di çerçoveya wê de wê, rewşa têkilîya avê û axê a bi hevdû re jî wê kifş bike. Her wusa ew têkilîya wan ku ew bi hevdû re çê dibê, wê çawa wê encamekê wê derxê li holê, wê ew jî wê were dîtin û wê were kifşkirin. Di vê çerçoveyê de mirov, li herêmên kurdistanê, rastî rewşên mazin ên çandiniyê tê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê jî, wê di dewama mijarê de wê hilde li dest û wê fahm bike.

Li herêmên kurdistanê wê derfetên çandiniyê wê, pirr zêde wê bibê. Wê rewşa çandiniyê wê zêde pêşbikeve. Rewşa çandiniyê ku ew bi rewşa çandiyê a li kurdistanê re ew dihê hanîn li ser ziman, wê bi gotina ´çare ewil ku wê li vê herêmê çandinî wê pêşbikeve´ re wê werê hanîn li ser ziman. Bi gotineka din wê, bê gotin ku wê pêşî li vê herêmê wê çandinî wê pêşbikeve. Çandinî wê weke rewşeka ku wê piştî pêşketina jîyane bicihbûnê re wê xwe bide dîyarkirin. Wê pşbikeve. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa çandiyê a li kurdistanê wê, weke rewşek xwedî mejû a pirr kevn bê. Di serdemên neolîtîkê ên pêşî de wê, rewşên weke yên çandiniyê wê werina kifşkirin. Di xwezaye kurdistanê de wê ev rewş jî wê werina dîtin, minaq wê li gelek herêman ku ew ji xwe re şînbûna wê gelek şînahî wê dever bi dever wê bi komî wê bên dîtin. Mirov jî wê wan bibînin. Piştre jî wê wan kifş bikin ku ew dikarin wan bixwûn. Ev jî wê, mirovan fêr bike lêgerîna wan komên şînahîyê de. Lê piştre wê, mirov wê, çendî ku ew wê ji wan komikên şînahîyê ku ew wê sûdbigirê jî wê, piştre ew ji mirov re wê, têr newê. Ber vê yekê wê mirov, wê li wê rewşa wê di her demsalê de ku wê li heman deverê wê heman şînahî wê bibê, wê li wê bihizirin. Ev jî wê, di mejiyê wan de wê, li ser rewşa şînahîyan re wê têgînekê wê bide çêkirin. Mirov wê, di vê çerçoveyê de wê rewşa çandiniyê wê, li ser wê bihizirê ku ew dikarê bike. Lê wê pêşî wê bibînê ku ew şînahî ku ew hişkbû wê ji wê hinek bizrik wê çêbibê û wê ew bizrik wê bikeve ardê û wê piştre wê ew bizrik wê şîn bibê. Mirov wê, vê rewşa bûyîna bizrikên şînahîyan piştî ku ew dema zûwabûna wan hat û pê de wê, bihizirê ku ew bizrik li kûderê bikeve ardê wê şîn bibê. Piştî ku mirov kifş dike ku ew bizrik ket ardê û şînbû û pê de wê, êdî ew wê bizrikê wê karibê li deverên din jî wê bi xwe re bidestî bibê û li wan biçênê. Dema ku ew kir û encama wê baş dît, wê piştre wê ev ji aliyê gelek mirovan ve wê were kirin. Her wusa wê li deverên nêzî ku ew dijîn, wê wan rewşan wê hin bi hin wê pêşbixin. Di vê çerçoveyê de wê şînahîyên xwezayî ku ew wan kifş dike ku ew baş in ji wî re ku ew wan bixwê, wê wan kifş bike û wê bi vê rengê wê bizrikê wan ê ku ew derket li holê wê, ew wê bizrikê wê bibê devereka ku ew dixwezê û wê li wir biraşênê li ardê ku ew şîn were. Aqilê şînkirinê wê bi vê rengê wê xwe bide dîyarkirin û pêşxistin.

Aqilê şînkirinê wê, temenê wê ji dîtinên ji xwezayê bê. Mirov, wê pêşî bibînê ku ew çawa şîndibê. Di nava xwezayê de wê pirranîya şînahîyan wê ku ew demsala wan hat wê şîn bibin. Piştre ku ew demsale wan bûhûrt wê, ew jî wê winda bibin. Ev rewş, dema ku mirov di nava xwezayê de dijî wê, ew wê bi awayekî vekirî wê bibînê. Ji xwe piştî ku mirov ket pêvajoya bicihbûnê de wê, vê yekê zêdetirî wê di cihê xwe de wê karibê bişopênê. Di vê çerçoveyê de wê ev rewş, wê piştre wê di jîyane mirov de wê bi rewşa kifşkirina xwezayê re wê xwe bidina dîyarkirin. Mirov wê, vê yekê jî di xwe de wê bijî. Mirovê demê, wê di vê çerçoveyê de deverên ku ew li wan bicihbûya weke şikeftan, wê, li deverên weke ku ew nêzî avê na û li pişt wan û ankû nêzî wan daristan û ankû deverên bi pirr şînahî wê hebin. Di vê çerçoveyê de wê mirov, wê bi rewşa jîyane xwe re wê, wê dewrûdayîmîya di xwezayê de ku ew dibê, wê di serî de wê, rewşên wê yên ku ew weke ku ew xwe dûbare dikin bi şînbûnê re wê kifş bike. Ev jî wê, bi rewşa xwe re wê di mejîyê mirovê demê de wê, cih bigirin. Herêmên ku wê di dema neolîtîkê de wê li kurdistanê wê weke deverên ku wê li wan bicihbûn wê bibê û wê mirov jîyane xwe pêşbixê, wê weke deverna ku wê li beravê bin. Minaq, tenê ev herêmên ku wê li herêma botanê(*) wê weke herêmna navend in ên ku wê li wan wê jîyane komî wê pêşbikeve ên weke berava şikeftê, girikê haçîyan, giryan û ankû girkê hemo, girê osê, girê hevşerîk, girê gûzirê, girê çemê halan, simakî, xarîf, kîkan, kotekan, girê kortik, newala danîk,

girîhamî û hwd, wê çend ji wan deverên li kurdistanê ên ku ew navê wan bi navê cihên jîyane neolîtîkî re ku ew derketibin bin. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê ji bilî van deveran gelek deverên din wê hebin. Li dora herêmên nisêbînê, Hezexê, silopî, şirnax û hwd, wê gelek deverên ku wê weke deverên niştecihîya dema neolîtîkê bin wê hebin.

Herêmên li herêmê ku mirov wan lê dikolê, di vê çerçoveyê de mirov bi wan re wê kifş bike. Herêmên ku ew di dema neolîtîkê de wê ji jîyane demê de wê derfetek mazin wê çêbikin, ew wê, piştre wê di pêvajoyên şariştanîyê de jî wê hebûna xwe wê bidina domandin. Minaq, navend û herêmên kurdistanê ên weke Reha, şîrnax, nisêbîn, silopî, hezex, Cizîra bota û navendên wan wê, weke gelek deverên din ên kurdistanê wê li wan jîyan wê hebûna xwe wê bidomênê. Li vir, minaq, navend navenda hezexê û gûndên li dora wê ên weke xirabêşêref û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê deverna wusa bin. Li gelek deverên din jî mirov rastî rewşên bi vî rengî tê li herêmên kurdistanê. Herêmên kurdistanê, wê di vê

--------

(*)Herêmên bakûrê kurdistanê ên ku li wan jîyane neolîtîkê zû pêşketîya

çerçoveyê de wê, di derbarê pêvajoyên pêşveçûnên jîyane dema neolîtîkê de wê têgîneka berfireh û giştî wê karibin bidina me. Ji pêvajoya destpêkê a zû a dema neolîtîkê û heta yên wê yên dawî, mirov wê wê kifş dike ku wê di vê çerçoveyê de wê di xatekê de wê pêşveçûn wê xwe bidina dîyarkirin. Pêşveçûnên ku ew dibin jî wê, di wê çerçoveyê de bin ku wê mirov wê hin bi hin wê di jîyane xwe de wê bikeve pêvajoyek afirandinê. Her wusa rewşa çandiniyê mirov dikarê wê di vê çerçoveyê de wê werênê li ser ziman.

Di rewşa pêşveçûnên çandiniyê de wê, bi wê re wê di ahengekê de wê mirov wê bi aqilê xwe re wê, di ahengekê de wê pêşbikeve. Her wusa, wê bi wê re wê di xwe de wê hin bi hin wê bidest hanîna li ser ziman bike. Wê xîzkirinan wê bike. Wê nîşanakan wê pêşbixê. Ev nîşanak wê nîşanakên têkilîdanînê bin. Nîşanak, wê weke zimanê wan yê pêşî ê hemdem bê. Di vê çerçoveyê de wê li ser rewşan re wê bi zimanê nîşanakan û dewlemendkirina di wê de a bi tevgeran re wê rewşa zimanê nîşanakan wê bê pêşxistin. Lê piştre jî wê, hin bi hin wê deng li wan rewşên tevgerî wê werina zêdekirin. Pêşxistina dengan wê weke pêşketinaka giring û dîrokî bê. Di vê çerçoveyê de mirov vê yekê weke ku mirov li ser zimanê kurdî re wê kifş dike wê pêşî bi dengên weke dengên gotinan ku ew bi tîpekê, dutîpan û ankû zêdetir ku ew dihêna ser ziman, wê pêşbixiştin. Zimanê kurdî, wê ji ber vê yekê bê û mejûya xwe kevn bê ku mirov wê dikarê her rewşên tîpî ên hanîna li cem hevdû mirov dikarê wateyekê bidiyê û ankû kirdeyeka wê ji wê derxê û wê fahm bike bê. Zimanên ku ew pêş dikevin, minaq, weke di kurdî de dengê bi tîpa´ a´ re wê weke dengekî ku ew dikarê wateye´herêkirin´, ´pejirendin´, ´bi derxistina dengê wê re bêjê ´herê´ û hwd, weke van ku mirov dikarê gelek wateyên din bidiyê de bê. Weke vê, mirov dikarê gelek rewşên din jî li ser dengên tîpî û dutîpî û hinekî din zêdetir jî wan werênê li ser ziman. Ber ku ew pirr zêde pêşketî di zimên de hena. Di vê çerçoveyê de wê ev rewş wê bi hevdû re wê di ahengekê de wê pêşbikevin bin.

Di rewşa fahmkirina rewşa dengderxistinê de wê mirov, wê pêşî wê wan dengan nas bike. Wê li ser rewşên ku wî ew bi wan derxistîya re wê nas bike. Ev naskirin wê, weke hişekî wê bi mirov re wê pêşbikeve. Piştre jî wê ew pêşbikeve. Mirov, wê di wê de wê pêşbikeve. Ev pêşketin wê di mejiyê mirov de wê, bi kifşkirinên nû ên mazin re wê hebûna xwe wê bide domandin. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa vê pêşketina weke li ser aqil û pêşketina wê re wê, piştre heta pêvajoyên şariştanîyê wê heta kifşkirina nivîsandinê û hwd jî wê herê.

Di vê çerçoveyê de wê di aslê xwe de wê, weke ku mirov ji nîşanakên ji dema neolîtikê ên li herêmên kurdistanê ku ew hena mirov ji wan fahm dike ku wê temenê kifşkirina bi xîzkirinan û hwd, wê koka wê heta demên zû û dereng ên neolîtîkê jî wê herê. Di demên neolîtîkê de wê, her wusa wê ew sûret û ankû wêneyên sawalan û ankû weke ku mirov sawalan xîz dike ku ew li hêtên şikeftan ew hatina xîzkirin, wê di vê çerçoveyê de wê weke rengekê pêşî ê li ser wêneyan re wê, ê nivîsandinê û hwd bê. Ev xîzkirin, wê piştre wê bi wateyekê wê werina dîtin û wê werina hanîn li ser ziman. Di rewşa fahmkirina wan xêzkirinên ji wan deman û hwd de wê, ev rewş wê bi awayekî vekirî wê xwe bide dîyarkirin. Di dema neolîtîkê a dawî de wê, gelek hêkelên jinan ku ew hatina çêkirin wê werina dîtin. Ev hêkel wê, weke hêkelna ku wê di derbarê jîyane demê de jî wê hin bi hin wê têgînekê wê bidina me. Ew hêkel wê weke hêkelna jinên ku ew di nava jîyanê de ew pirr zde kifşkar û xwedî rewşên kifşkar bûn. Bi gotineka din, ew wê weke ya jinên dayik ku ew weke xwedewend jî ku ew dihên hanîn li ser ziman. Ev rewş jî wê weke

rewşeka ku mirov wê bi teybetî divê ku wê hilde li dest bê. Ber ku ev rewş wê çawa wê piştre wê bi çandeka xwedewend wê pêşbixê û wê were, bi xwe re wê bide dîyarkirin. Di nava kurdan de wê çanda weke çanda *´kevneşopîya hemewîyê*(*)´ ku ew heta roja me dijî û ku wê jin di wê de wê weke *nirxek pîroz* wê di her demê de wê were hildan li dest, wê ev kevneşopî, wê dîroka wê di çerçoveya hebûna civake kurd û pêşketina wê de wê heta van demên neolîtîkê wê herê. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku wê di dewama wê de wê fahm bike û wê jî wê werênê li ser ziman.

Dema ku mirov, serdema neolîtîkê û pêşveçûnên wê bike ku wan hilde li dest û wan werênê li ser ziman, bêgûman mirov bi teybetî li herêmên kurdistanê, mirov divê ku rewşa pêşveçûnên jîyanî ên ku ew heta roja me bi jîyane civake re wan weke xoslet û xûyan xwe dana domandin jî wê, werênina li ser ziman. Di rewşa têgîna xwedewendîya dema neolîtîkê û her wusa rewşa kevneşopîya hemeweîyê a civake kurd, divê ku mirov di vê çerçoveyê de têkilîyeka wan bi hevdû re dênê. Di aslê xwe de wê, çanda xwedewendî a jinê, wê çawa wê piştre wê di nava çanda civakî de wê xwe di pêvajoyên şariştanîyê de wê bide domandin, mirov dikarê ji destpêkê pêvajoyên şariştanîyê û bi ber roja me ve pêvajoyên pêşketina xate êzdayîyê wan dikarê hilde li dest. Her wusa, wê de wê çawa ew weke rewşekê wê were dîtin, wê ev di vê rewşê de wê hebê. Ev rewş, di aslê xwe de wê şîroveyek giştî û berfireh wê ji me bixwezê. Em dema ku rewşa jîyane civakî a li kurdistanê wê dihildina li dest em, wê jî dibînin ku wê weke nirxên pîroz, nirxên ku ew di nava wê de ew, derketina li pêş, wê di vê warê de wê têgînekê wê bidina me. Em vê jî divê ku wê, li vir wê fahm bikin.

Her wusa, çanda kevneşopîya civake kurd a weke bi kevneşopîyên hemewîyê re dihê hanîn li ser ziman, wê ev çand wê weke çandaka ku wê bi giştîya xwe re wê jinê weke nirxek pîroz wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê ev çand, wê her demê wê xwe di nava çanda civakî a herêmê a kurdistanî de jî wê

------------

(*)Kevneşopîya hemawiyê wê, weke kevneşopîyek kurdistanî ku wê heta roja me wê di nava civake kurd de wê xwe bide jîyankirin û domandin bê. Wê weke kevneşopîya pîroz a jinê wê were binavkirin. Li gorî wê kevneşopîye ku du mirov û ankû aşîr ku ew werina berhevdû ku ew pevbiçin û ku jinek herê li nava wan bisekinê û tulbende serê xwe biavêjê li nava wan wê, ew alî mecburun ku ew rêzê ji wê re bigrin û dawî li pevçûna xwe bi hevdû re bênin. Ku newênin wê weke bêhurmetiyek civakî ku wê ti cari nikaribê wê mazur wre dîtin bê.

xwe bicih bikê û wê bide domandin. Ev kevneşopî wê di roja me de wê, bi renge ku wê jinek kurd ku ew dema ku du mirov bê û ankû du aşîr bin ku ew hatina berhevdû ku ew bi hevdû re levbikin û pevçûnê bikin ku ew di nava wan de bisekinê û hemeweîya xwe ya li serê xwe di nava wan de biavêjê ardê, wê ew wê ji wan re wê weke pîrozîyekê bê û ew êdî wê nikaribin wê pevçûna ku wan dixwest ku ew bi hevdû re bikin wê, nekin. Wê di cih de wê aşîtîyê wê di nava xwe de wê çê bikin. Lê ku aliyek û yan jî herdû alî, piştî ku hemewîya jinê di nava wan de hatibê avêtin li ardê û ew dîsa xwe li hevdû bi halifênin û bixwezin ku ew bi hevdû re pevçûnê bikin wê, hingî ew ji wan re ji aliyê civakî ve wê weke bêrûmetîyekê wê were hasibandin. Wê ji hebûna civakê û ankû koma civakê re jî wê weke bêhûrmetîyekê wê were dîtin û şîrove kirin.

Wê hertimî wê gotina dawî wê jinê wê bigota. Di vê çerçoveyê de ev çanda xwedewendî a civake kurd wê, di nava civake kurd de wê, weke çandaka ku wê bi hezaran salan ku wê heta roja me wê, bijî bê. Wê were jîyankirin. Ev çand, wê hertimî di nava civake de wê, temenê aramiyekê jî bê. Ber vê yekê ya ku wê weke dagerek aşîtîya navxweyî a civakî wê jina kurd wê, di her demê de wê were dîtin. Ev *kevneşopîya hemewîyê* ku kurd wê, weke *´kevneşopîya rûmetê´* jî wê bi nav dikin, dîroka wê, wê heta van serdemên destpêkê ên civakî wê herê. Em dema ku hebûna pêvajoyên civakî ên li herêmê di xate wê ya wê ya bi dîrokê re ku ew heta roja me pêş dikeve ku em wê li berçav digirin û wê heta roja me, wê dikin ku wê werênina li ser ziman, wê her wusa wê bi wê re wê ev jî wê bi wê re wê werê dîtin. Di pêvajoyên şariştanîyê ên piştre jî de wê ev çanda xwedewendî a jinê a civakî ku ew wê di serdemên civakî ên berî şariştanîyê de wê serdest bê, wê di pêvajoyên şariştanîyê de wê tekoşîna hebûna xwe û domandina xwe wê bide. Tekoşînên weke tekoşîneka lipît îştar, eşnûna, lêllît û hwd ku em ji mîtolojîya sûmerîyan û hwd, wê dixwênin, wê hinekî jî wê rastîyeka wan ya di vê çerçoveyê de wê wateyek wê hebê. Lê em li vir, vê yekê bi wê re wê divê ku wê werênina li ser ziman ku wê, ev çand wê weke çandaka ku wê di temenê pêşketina jîyane civakî ên destpêkê de jî bê. Her wusa wê ev çand, wê di pêvajoyên civakî ên destpêkê de wê bi têgîna toteman û anamîsmê û hwd re wê wateyekê wê bileyizê. Hinekî jî wê di van deman wê rewş, wê li ser rewşa hişkirina bi têgînîyê re wê bidest meşînê wê bike.

Di nava jîyane demê de wê, têgînên afsûnî ku ew derdikevina li pêş de wê, her wusa wê bi wê re wê, dema ku mirov li çareyan di jîyane xwe de li wan digerihê wê, bi wê re wê serî li yên ku ew dikarin gotinên weke rê nîşan ku ew ji wan bikin wê bixin. Di serdemên civake neolîtîkê de jî wê, were kifşkirin û dîtin ku wê jin wê, wê di van rewşan de wê li pêş bin. Jin, wê weke zindîyeka ku ew hîs û hêsta wê pêşketî wê li pêşbê bê. Ber vê yekê wê ew bixwe jî wê, di vê çerçoveyê de wê karibê bawerîyê bi wan hîs û hêsên xwe werênê û bênê li ser ziman. Wê di nava jîyane komî a dema mezolîtîkê de jî û wê di nava jîyane komî a ku ew bi pêşveçûnên li gorî jîyane civakî ew xwe pêşdixê de jî wê, di vê çerçoveyê de wê were dîtin ku wê jin wê li pêş bê. Di aslê xwe de wê, weke ku em ji hemû nîşanakên civakî ên ku ew ji demên neolîtîkê û heta roja me ku ew li kurdistanê pêşketina û berî wê jî fahm dikin wê, jin wê bi rewşa xwe re wê derkeve li pêş. Bi teybetî wê wê di nava jîyae komî a ku ew bicihbûya de wê ew bi awayekî vekirî wê derkeve li pêş. Jin, wê di rewşa berhevkirinê, beşkirinê û hwd de wê, di nava jîyane komê de wê derkeve li pêş. Çendî ku wê mêr, bi nêçîrkirinê û hwd, wê bikê ku ew dabara xwe û komê bidina kirin jî lê wê, jin wê di nava jîyanê de wê aliyên din ên weke bi şînahîyan û weke xwarinê xwarina wan jî wê, kifş bike. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, di nava jîyane komê a bicihbûyî de wê rewşên nû ên jîyanî wê derkevina li pêş. Di demên navîn û dawî ên neolîtîkê de wê, bi teybetî wê bi awayekî zêde wê girtina masîyan wê derkeve li pêş. Her wusa, wê masî jî wê weke rengekî xwe jîyankirinê ên komên ku ew dijîn jî bê. Wê di vê çerçoveyê de wê rewşa masîgirtinê wê di demên navîn û dawî ên neolîtîkê de wê, biqasî demên navîn û dawîn ên peleolîtîkê ku wê çawa wê nêçîrvanî wê pêşbikeve û wê di çerçoveya pêşketina hinek xûyên mirovî de wê mirov wê wê pêşbixê, wê rewşa masîgirtinê a van deman jî wê di rengekî ku wê bişibihê wê de wê pêşbikeve bê.

Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê rewşa masîgirtinê wê di nava jîyane komî de wê zêdetirî wê derkevina li pêş. Di hinek wênekirinên ku ew di mezelên li rojhilatê kurdistanê û hinek deverên din ên weke herêma botanê de ku ew hatina dîtin, rewşên weke li ser pêşmalka ku mirov bi pêşîya xwe ve dikê û ankû li ser hêtan xîz dike û an jî kû wê li ser tiştna din wê sûret û ankû wêneyê masî wê xîz bikin, wê werina dîtin û kifşkirin. Ev rewş jî wê, weke rewşeka ku wê nîşanaka wê bê ku wê, li rex şîvaniyê, nêçîrvaniyê û her wusa di demên neolîtîkê de weke ku mirov kifş dike wê, li rex cotyarîyê û çandiniyê û hwd, wê masîgirtinî û ankû masîvanîtî wê derkeve li pêş.

Di rewşa masîyan de wê, were dîtin ku wê gelek tefsîr wê werina dîtin. Bi teybetî, wê li ser rewşa zindiyên ku ew di nava avê de dijîn, wê di nava kurdan de wê heta roja me, wê ew têgîn wê hebê ku wê, çendî ku wê di pêvajoyên piştre ên şariştanîyê de wê hemû zindiyan wê nexwûn jî wê, masîyan wê weke zindiyên avî wê hertimî wê xwarina baş wê bibînin. Wê di rewşa mîtolojîya dema sûmerîyan de jî wê li ser masîyan wê gelek tefsîr wê hebin. Her wusa wê gelek tefsîrên yazdanî ku ew dihên pêşxistin wê laşê wan wê weke yên masîyan û serî wê weke yê mirovan wê werina pêşxistin. Di mîtolojiya hûrî û mîtannîyan de ku kûmarbî zindiyekî weke ´hadamû(*)´ ew diafirênê û hwd, wê ev rewş wê di vê çerçoveyê de wê, ev weke rewşeka ku wê ji van rewşan wê sûdbigirê bê. Di gelek mîtolojîyên li ber diclê û firatê de wê, rewşa masî wê were tefsîrkirin û

-----------

(*)Hadamû wê weke aferendiyekê ku wê ji aliyê yazdan komerbi ve wê were xûliqandin û wê ew li jîyanê bijî bê. Teybetmendiya wê aferendiyê wê ew bê ku ew zindî ji afirê hatibê afirandin di mitolojiya kurdan a dema hûrî û mîtannîyan de.

pêşxistin. Di vê çerçoveyê de wê, weke zindiyekê wê ew jî wê were hanîn li ser ziman. Di vê demê de mirov, wê dibînê û kifş dike ku wê zindiyên xwezayê wê ew wê werina kifşkirin û wê wêneyên wan wê werina çêkirin, ku ew li hêtên şikeftan bin û ankû li ser tişt û deverna din bê. Bi teybetî di nava jîyane bicihbûyî de wê, ev rewş wê hin bi hin wê zêde bibin. Mirov wê, di van rewşan de wê pêşketinên mazin wê bide çêkirin. Ji xwe ev xîzkirinên weke bi wêneyî bê û hwd, wê piştre wê temenê pêşketin û kifşkirina nivîsê hwd bê. Rengê nivîsên destpêkê bi wêneyên şeklî ên zindîyan weke çûk û zindiyên din bin û hwd, wê hinekî jî ev wê ji vê yekê bê.

Ev pêvajoyên rengê pêşketinî ên di jîyanê de mirov divê ku wan baş fahm bike. Ew jî wê, di temenê pêşveçûnên ku wê bi demê re wê bibin de bê. Xîzkirinên di demên neolîtîkê de wê, di vê çerçoveyê de wê temenê şîroveyên demên pêvajoyên şariştanî jî wê bi xwe re wê biafirênin. Bi wê re jî wê, rengekê ku wê çawa wê bi wê pêşketin wê were çêkirin wê were kifşkirin û bihişkirin.

Di aslê xwe de mirov, dikarê xîzkirinên li hêtên şikeftan ên li dema neolîtîkê wan, weke destpêka pêşketina hişkirina mirov jî wê hilde li dest. Beşên mejî dixabitin. Lê hê ne di wê rewşê de na ku ew têkiliyek smetrîkî bi hevdû re dênin. Di roja me de em, kifş dikin ku wê aliyê mejî ê çapê wê aliyê laş ê rastê û tevgerên wê çêbike, kifşbike û sehêt(kontrol) bike. Aliyê rastê ê mejî jî wê, bi aliyê çapê ê laş ve alaqadar bibê û wê sehêtê di wê de çê bike. Her wusa di vê çerçoveyê ev rewşa mejîyî bixwe jî wê rewşa têkiliya mejî û laş wê, di vê çerçoveyê de wê têgînekê wê bide me.

Di rewşa mejî de wê gelek beşên wê, wê biafirin. Wê beşên naskirinê wê biafirin. Wê her tişta ku ew hat tahmkirin, wê têja wê êdî wê were girtin di mejî de. Bi vê yekê re wê beşa mejî a bêhnkirinê û têjkirinê wê pêşbikeve. Ji aliyê din ve jî wê beşên din ên weke yên dîtinê bihîstinê û hwd wê pêşbikevin. Beşên mejî wê, rewşa wan ya pêşketinê wê li ser rewşên jîyankirinê re bê. Di vê dema neolîtîkê ku em, hinekî bi şûn ve herin, dema dawî a serdema peleolîtîkê û dem mezolîtîkê jî mirov, wê bi wê re wê, di vê çerçoveyê vê pêvajoya mirovî a pêşketinê wê bi wê re wê werênê li ser ziman. Mirov, wê di van pêvajoyan de wê çawa wê pêşbikeve, wê ew wê hin bi hin bi jîyankirinê re wê pêşbixê.

Di rewşên weke rewşa pêşketina aqil de wê, di vê çerçoveyê de wê, bi pêşketina mejî re wê di ahengekê de bê. Her wusa, wê minaq, wê rewşên weke têjgirtinê û hwd wê bi têgînî wê hin bi hin wê pêşbikevin. Di vê demê de mirov, wê xwediyê xwestekek pirr zêde serdest û serbest bê ku ew bi wê re dijî bê. Bi wê re jî wê xwediyê ajoyeka ku ew wê dide dîyarkirin bê. Her wusa di vê çerçoveyê de wê, ev jî wê were dîtin ku wê, bi demê re wê aqil wê pêşbikeve. Li vir, em divê ku wê têkiliya aqil û dunya derve û mejî baş bi hevdû re wan fahm bikin. Biqasî ku giringa ku mirov wan yek bi yek fahmbike, bi heman rengî, mirov divê ku wan bi têkiliyên wan ên bi hevdû re jî wan fahm bike. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê fahm bike, wê di serdema peleolîtîkê de weke ku mirov wê kifş dike, wê beşên mejî wê pêşbikevin. Heta ku wê girtina di wan de jî wê, hin bi hin wê pêşbikeve. Lê ew têkilîya beşên mejî ên bi hevdû re wê zêde nebê. Ev jî wê, bi demê re wê bi rewşa genetîkî û hoyandina wê re wê, bi pêşveçûna têkiliyên mejîyî û hwd re wê temenê wê biafirê. Peresendina genetîkî wê, di vê demê de wê temenê gelek pêşveçûnên giring ên demkî bê.

Têkilîya mejî û dûnya derve wê, bi demê re wê pêşbikeve. Her wusa mirov wê bidest dîtina bihiş bike. Dîtina bihiş wê, dema ku ew pêş dikeve û pê de wê, bi demê re wê di mejî de wê pêşveçûnên giring ên dîrokî wê bibînin. Her pêşketin wê di mejî de wê rewşa xwe bide xêvkirin. Minaq, piştî ku mirov, bidest xwarina kelendî û ankû qalandî a li ser êgir kir û pê de wê, di mejîyê mirov de wê ev rewş jî wê cih bigirin. Mirov, wê fahm bike ku ew rewş çina û çawa na. Darêjka van rewşan wê di mejiyê mirov de wê, temenê pêşveçûn û pêşketina rewşên din jî ku wê, di mejî de wê bibin bin. Her dîtin, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Lê li vir, mejî, piştî ku ew bidest pêşketina xwe ya demkî a bi vî rengî giring dike û pê de wê mejî, wê êdî wê pêşketina xwe ya demkî wê li gorî wê bijî. Pêşketina mejî, wê, di vê çerçoveyê de wê giring bê. Wê mejî, wê têkiliyên wê yên bi laş re jî wê, hin bi hin wê mirov wê di xwe de wê kifşkirina wê bi wê re jî wê bikê. Minaq, dema ku ew destê xwe dihênê wê di mejî de wê ew hîs û ankû dîtin wê bi wî re wê li ser wê re wê pêşbikeve. Mirov wê, di vê çeçroveyê de wê bi demê re wê bidest danîna têkilîyê di nava kirin û mejî de wê bike bê. Têkilîya di nava mejî û kirinê de wê, weke têkilîyeka jîyanî a ku ew pêş dikeve bê.

Mirovê dema neolîtîkê wê di vê çerçoveyê de wê, ji gelek aliyan ve wê mejîyê wî, wê pêşketî bê. Wê ev rewşên ku wê di demên peleolîtîkê û dema mezolîtîkê de di pêşketinê de na, wê di vê demê de wê pêşketî bin. Wê di vê demê de wê di aslê xwe de wê mejî wê, weke ku wê şoreşekê di van waran de wê, di xwe de wê bike. Wê di rewşên girtin, dîtin û danîna têkilîyê di nava rewşan de wê, heman rewşê de wê mejî, di vê rewşê de wê xwediyê rewşek teybet bê.

Mejiyê mirovê demê ê dema neolîtîkê, wê êdî wê, di xwe de wê, hîs bike ku ew tiştek di wê de heya. Minaq, wê weke hişkirinan, ku ew bi wê re di nava ronhniya rojê de weke xewnê bibînê wê lê were bê. Di dema razandinê de wê xewnê, wê bibînê. Weke van rewşan û hwd, wê êdî wê bikevina jîyane mirovê demê de. Ev jî wê bi xwe re wê nîşanaka tiştekî prr giring bin. Ew jî wê ew bê ku wê nîşanaka wê bin ku di mejî de girtin û ankû xêvkirin pêşketîya. An jî xêvkirin, pêşdikevê. Di wê rewşa pêşketina xwe de wê mejî wê, di vê pêvajoyê de wê, di rewşek teybet de bê. Di aslê xwe de mirov dikarê gelek encaman ji vê rewşê derxê. Minaq, mirov dikarê encama weke ku mejiyê mirov, wê bi dîtina xewnan û hişkirinên weke

xewnan û hwd re wê, weke ku ew bikeve pêvajoyek afirandinê a di xwe de jî. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê yekê wê werênê li ser ziman.

Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê mejî wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek pêşketî a di xwe de bê. Mejî, wê di vê rewşê de wê pirr zêde wê di rewşek pêşketî a di jîyanê de bê. Di jîyanê de wê, ji vê demê pê de wê, mejî wê weyna xwe wê bileyizê. Ji vê demê û pê de wê, pêşketin wê li ser kirin, tevger û xûyên mirovî re wê bimeşê bê. Di vê çerçoveyê de wê mirov, wê kifşkirinên xwe re wê, di vê çerçoveyê de wê, bike. Mejiyê mirov wê, di vê çerçoveyê de wê, rewşa ku ew gihiştîyê de wê, bi wê re wê derkkirna dîtinê, di mejî de xêvkirinê û hwd re wê xwediyê rewşeka ku wê êdî wê temenê wê pêşveçûna bi mirovî wê biafirênê, wê bi xwe re wê pêşbixê bê.

Mirov di vê çerçoveyê de vê yekê jî wê divê ku wê werênê li ser ziman ku wê mejî û jîyan wê, li ser pêşketin û pêşveçûnên jîyanî re wê, têkiliyê wê bi hevdû re wê dênê. Mejiyê mirov ê ku ew di xwe de bi danîna têkiliyê a dinava beşan de wê, pêşbikeve û wê bidest hişkirinê wê bike wê, di jîyanê de wê di nava rewşan de wê di destpêkê de wê nikaribê wê têkiliyê wê dênê. Ber ku ew hê bêzan a. Yanî nezan a. Hê di derbarê wê rewşa ku ew di wê de dijî û hwd de ew, nezan a. Di vê çerçoveyê de wê bi demê re wê li ser aqil û pêşketina aqil re wê bidest hin bi hin danîna têkiliyê bike bê. Danîna wê têkiliya bihiş a li derve, wê weke pêvajoyek piçûk weke pro-tîp a weke ya wê pêvajoya pêşî a di hundûrê mejî de ku mejî wê, hê di têkiliyên nava beşên xwe de wê zayif û lawaz bêbê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werên li ser ziman ku wê rewşa mirov, wê weke zindiyekî wê, her timî wê di nava rewşek pêşketinê a bi xwe re de bê. Pêşveçûna fîzyolojikî, bîolojikî û genetîkî û hwd ku ew dibin, wê di vê çerçoveyê de wê xwe bi rengekî û awayekî wê bidina dîyarkirin. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşek xêvî wê dîtinên derve ku ew di mejî de ew bicih dibin, wê mejî wê di destpêkê de wê tenê wê bi girtina wan re wê, wê xwediyê rewşê bê. Lê bi demê re wê li ser wan re wê beşên hişkirinê ên xêvê û mejî û hwd wê pêşbikevin. Ev jî wê, bi xwe re wê, rewşna teybet wê li ser wan girtinên me re wê biafirênê Di pêvajoyên destpêkê de wê, dema ku mirov, rewşan dibînê û di mejî de dibê û nikaribê têkiliyekê di nava wan de wê denê wê, hingî wê li aliyê têkiliyê wê bidest hizirkirinê wê bike. Minaq, dema ku baran barî, wê hewl bide ku ew baran çi ya û ber çi dibarê. Wê li wê bihizirê. Baran, ew ava ku ew di barê ew ji kûve tê û barê? Wê li ser wê bihizirê. Her wusa, wê kî wê biafirênê. Di vê çerçoveyê de wê rewşên serbixwe ku ew bêtêkilîyna wê biafirin di mejî de. Di mejî de jî wê bi demê re wê piştre wê bidest danîna têkiliyên wan bike. Wê di wan de wê têkiliyê wê dênê. Bi wê re jî wê li ser wê rewşê re wê bidest pêşketina xwe bike. Aqilmendîya ku wê di demên neolîtîkê de wê were danîn li holê wê, ew bê ku ew hin bi hin bi aqil re ew têkiliya di nava rewşan de ku ew were danîn bê. Rewşa têkiliyên mejîyî ên rewşan, wê weke rewşek teybet bê. Mirov dikarê wê weke rewşek teybet wê hilde li dest. Her wusa, têgîna afsûnê û totem û anamîsmê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê pêşbikeve. Wê di rengê hizirkirina wê de wê sînor nebê. Wê mantiq û ankû vaca wê, wê di wê reng û awayê de bê ku wê, her tişt di aqil de w bêî rewşa kişînaardê û rewşên weke wê, xwediyê rengekî pêşketinê bê. Li gorî xosletan hizirkirin wê pêşbikeve. Minaq, mirovek ku ew nikarê weke tayrekî biafirê, mirov wê bidest hizirkirina li wî bike ku ew weke tayrekî bihizirê. Mirovekî bi per û ankû bask wê çawa bê, wê ew were hizirkirin. Di vê çerçoveyê de wê, rengê hizirkirinên demê wê weke rengna hizirkirinî ên hewgirtinî û ankû sentezî ên bi aqil û hwd bin.

Rengê hizirkirina mirovê demê wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Her wusa divê ku mirov, vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê li hewirdora xwe bihizirê. Wê rengê hizirkirina mirovê demê ê dema neolîtîkê wê biafirê. Di rewşa rengê hizirkirin mirovê demê de jî wê, ew hebê ku ew li gorî wan rewşên ku ew pêşdixê di jîyane xwe de wê rewşa xwe pêşbixê. Wê bi wê re wê di rewşa xwe de wê ew wê li ser rewşên ku ew dijî re wê rengekî jîyanî wê bi xwe re wê pêşbixê Di aslê xwe de wê, nêvî bi nêvî mirovê demê wê, xwediyê rewşek ku ew êdî wê karibê bihizirê bê. Her wusa têgînên weke yên toteman ku ew wê werina dîtin û pêşxistin wê, wan wê weke rewşek hizirkirina wî bin. Bi teybetî di dema dereng a dema neolîtîkê de wê, hin bi hin wê pêjnên nû wê derkevina li holê. Her wusa, di dema dereng a neolîtîkê de wê li herêmê wê mirovê demê wê bidest afirandinê bikê. Dema zû a neolîtîkê li kurdistanê wê li gorî ku em wê î ro kifş dikin wê li dora yanzdeh û deh hezar salan bê. Dibê ku ew bi kifşkirinên nû re ew kevntir jî ew herê û ankû werê birin. Dema dereng û ankû weke dema dawî a dema serdema neolîtîkê wê, li herêmên kurdistanê wê li dora neh û heşt hezar salan bê. Nîşanakên ku ew weke ji **şikefta hassûna**

û ya hêlêrê derdikevin li herêmên farqîn û erxanî wê, wê bide nîşandin ku wê li dora van deman wê demên çandiniyê, cotyarîyê û hwd wê li herêmê wê pêşbikevin. Ji nîşanakên ku ew dihên dîtin wê, di vê çerçoveyê de wê encamekê wê bidina nîşandin.

Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa dema dereng û ankû dema dawî a serdema neolîtîkê wê, wê di wê de wê şivanî wê pêşbikeve. Wê şivanî û jîyane şivaniyê wê bi pêşveçûnên malbatî re wê, di ahengekê de wê di vê demê de wê pêşbikevin. Têgîna malbatî a li dora dê û bav ku ew pêş dikeve wê, di vê çerçoveyê de wê ew xwe bide pêşxistin. Mirovê demê wê, di vê çerçoveyê de wê, hin bi hin wê li ser rewşên bi vê rengê re wê, xwe bide dîyarkirin. Di rewşên bi vê rengê de wê, ev wê, weke rewşna ku mirov dikarê wan werênê li ser ziman bê. Malbatî ku ew pêş dikevin, wê weke *malbatên şivan* wê xwe bidina dîyarkirin û wê pêşbikevin. Ankû em dikarin vê weke *´malbatên cotkar´* jî wê werênê li ser ziman. ***Malbatên cotkar***(*)**,** wê di vê demê de wê di çerçoveya kedîkirin û ankû ahlkirina kerîyên de wê derkevina li holê. Di vê demê de wê mirov, wê li ser kedîkirina kerîyên sawalên ku ew dikarê ji wan sûdbigirê re wê jîyane xwe wê avabike. Jîyane cotkarîyê a malbatî wê, di vê dema dereng a neolîtîkê de wê xwe bide dîyarkirin. Malbatên cotkar ku ew diafirin wê, ew wê ji xwe re wê qadên jîyanê wê biafirênin. Wê qadên malbatên cotkar ku ew diafirin wê, li dora wê qada jîyane wan, wê bi demê re wê pêşveçûnên nû wê biafirin. Minaq wê, li ser rewşa sûdgirtina ji wan sawalên ku ew hatina kedîkirin wê, pêşveçûnên li ser sûdgirtina ji wan sawalên kedî ên weke *´sawalên malê´* re wê bibê. Bi demê re wê, weke ku mirov ji pêvajoyên neolîtîkê ên li kurdistanê fahm dike wê, meyendina şîr weke mast, qatandina şîr weke ´fir´, kirina şîr weke panîr û hwd wê pêşbikevê. Di vê çerçoveyê de wê, ji sawalan wê sûdgirtin wê hin bi hin wê pêşbikeve. Bi gelek cûreyan wê sûdgirtina ji sawalan wê pêşbixê. Minaq wê, li ser wê jî wê, ji sawalên weke meh û bizinan girtina hîrîya wan û ji wê hêrîyê çêkirina cilûberg, tiştên ku wê di malên de wê li xwe bikin, li ser rûnihin û hwd wê çê bikin. Di vê çerçoveyê de di rewşa dîroka civake kurd a kevn de wê, ev jî wê were dîtin ku wê çawa wê ji wê hîrîya sawalan wê sûd wê were girtin. Minaq, wê hîrîyê wê weke ta wê li hevdû bibadin. Bo badanê jî wê ´teşî´ wê were kifşkirin. Di vê çerçoveyê de wê teşî, wê weke amûrekî badanê ê di destê jinên kurd de ku wê dîroka wê heta pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê û berê wê heta demên neolîtîkê jî wê herê bê.

Em vê yekê, bi awayekî vekirî wê kifş dikin ku wê li ser van rewşên pêşketinê ên weke çandiniyê, cotkarîyê û ankû jîyane cotkariyê wê di nava jîyane malbatî de wê xateka pêşketinê wê bi wan re wê hebê. Her pêşketinek ji van pêşketinan wê bi xwe re wê xateka wê ya pêşketinê ku wê, bi demê re wê ew pêşbikeve û wê bi demê re wê pêşveçûnên nû wê bi demê re wê li wê were zêdekirin û hwd wê, hebê. Li dora jîyane cotkariyê wê, weke çawa ku wê ji sawalên malê ên ku ew hatina kedîkirin wê sûd were girtin wê, di vê çerçoveyê de wê li ser hîrî û şîrê w sawalê re wê ew were pêşxistin wê dem bi dem wê ew were dîtin. Bi demê re wê çandinî ku ew pêşket, wê li dora xate pêşketina çandiniyê jî wê pêşveçûnn nû ên cûr bi cûr wê hebin û wê bibin. Minaq, wê li dora tişta ku ew hat çandin ku ew genim bê, wê bi rengê hewkirinê û hwd re wê, tiştên weke savar, danûk û hwd wê werina pêşxistin. Wê çawa encamên ji şîrê sawêl û genimê ku ew diçênin wê bigihênina li hevdû di rewşên weke çêkirina xwarinê û hwd de wê, di nava kurdan de weke ku em dibînin wê weke xwarinna wan yên civakî ên bi hezaran salan bin ên weke ´meyîr´, xwarina ´danûkê´ û hwd, wê were pêşxistin. Di vê çerçoveyê de wê, ev rewş, wê nîşanaka wê jî bin

----------

(*)Malbatên cotkar wê malbatên ku ew bi kedikirinê re êdî xwedî keriyên sawalan bin. Wê di cihê xwe de wê bijîn. Wê bi demê re wê çandiniyê jî wê pêşbixin Bo ku ew li devera ku ew li wê bicihbûna ku ew karibin li wir jîyane xwe bidina domandin û karibin bijîn.

ku wê çawa wê têjên nû ankû tahmên nû wê pêşbixin. Çandinî, wê bi xwe re wê pêvajoyek nû a afirandinê wê werênê li holê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê mirov, wê fêrî çandina qadan û li wan tiştan wê bibê. Bi demê re wê, gelek cûreyên tiştan ku wê werina çandin û wê werina pêşxistin. Ev pêvajoya çandinîyê wê, bi vê rengê wê, heta ku wê were dema nêzî dema destpêka pêvajoyên şariştanîyê wê, ew pêvajo wê bi awayekî pirr zêde û baş wê were dîtin û pêşxistin. Li kurdistanê wê, mirov wê kifş dike ku wê di dema dereng û ankû dema dawî a serdema neolîtîkê de wê, ji axa sor a herêmê wê, hin bi hin wê hêkel û zerik, sewîlkên avê û hwd wê werina çêkirin. Di dema dereng a serdema neolîtîkê de wê, ew axa ku ew tişt bi vê rengê ji wan dihên çêkirin wê, ji axa ku ew tişt dihên kirin wê, ew tiştên ji

axê(harîya wê) ku ew hatina çêkirin wê, ew werina qamirandin li ser êgir jî. Hêkelên ku ew hatina çêkirin ew hatina qamirandin. Minaq sewîlkên ku ew hatina çêkirin wê li ser êgir wê werina qamirandin. Di lêkolînên li deverên ku ew li wan jîyane neolîtîkê li wan pêşketîya de wê, gelek hêkel û tiştên din ku ew ji axê hatina çêkirin wê werina dîtin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de ew tiştên ku ew hatina dîtin ku mirov li wan dinerê, wê ew weke tiştna weke ´bi seremîkî(*)´ ku ew hatina çêkirin bin. Ev pêvajoyên çêkirina tiştan ji axê wê li herêmê wê di demên navên û dawîn ên serdema neolîtîkê de wê li kurdistanê wê xwe dina dîyarkirin. Yanî wê, çêkirina wan wê di van deman de wê xwe bide nîşand**in**. Di vê pêvajoya jîyanî de wê, bi teybetî çêkirina tiştan weke sewîlk, hêkelan û hwd, wê rastî dema neolîtîkê a dawî ku wê li herêmên kurdistanê wê, taqabûlî demên li dora neh û heşt hezar salan wê bike. Dibê ku ev dîrok li gorî xosletên jîyane herêmê bi kifşkirinên ku ew werina kirin re mirov, wê kevntir jî wê karibê bibê. Cotkarî, çandinî û çêkirina tişta bi destî û hwd wê, bi vê rengê wê di vê çerçoveyê de wê weke sê reng û pêvajoyên jîyane civakî ên ku wê di zikhevdû de wê pêşbikevin û wê bi hevdû re wê, di ahengekê de wê di çerçoveya pêşketina jîyane civakê de wê pêşbikevin bin. Rewşa jîyane herêmê û pêşketinên wê yên dema neolîtîkî wê karibin, pirr kevntir wê herin. Ji ya ku em dizanin wê kevntir wê karibê wê herê. Li herêmê wê, şert û mercên wê yên jîyanî wê, di vê çerçoveyê de wê, di çerçoveya bi xosletên jîyane civakî re de wê, kevntir wê herê. Li herêmê, em dibînin û wê hin bi hin bi rewşên jîyanî ên civakî û xosletên wê yên ku ew civake kurd û hwd ew bi wê dijîn re mirov, wê kifş dike ku wê kevntir wê herê. Di serdemên peleolîtîkê de wê, rengekê pêşketina jîyane komî wê ji ya ku em tefkîr dikin wê, pêşketîtir wê hebê û wê pêşbikeve bê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de mirov, wê jî wê kifş dike ku wê, bi demê re wê, ev rewş wê, weke rewşna nû ên ku wê were dîtin û pêşketî bê. Afirandina bi destî wê, di vê demê de jî wê weke çêkirina bivirkên piçûk, mazrabkên destî, kêrên ji hastûyan ên tûj

----------

(*)Sseremik wê weke sênik û kevçiyên ku ew ji axê hatina çêkirin jî bê. Wê weke wan wê gelek tişt wê bidestî wê li gorî pêdîvîyên xwe ku ew êdî biaqil kifş dikin û dikarin çêbikin wê çêbikin.

û hwd, wê werina pêşxistin. Bi wê re jî wê ji kevir jî wê, ew wê weke kêran û hwd, wê werina pêşxistin û bikarhanîn.Ev rewş hemû wê, heta ku wê ew werina dema neolîtîkê a destpêkê wê, di wê de wê bi çerçoveyek pêşketî re wê xwe di nava jîyanê de wê bide nîşandin. Mirovê demê wê, xosletên xwe yên afirandinê ên kêrhatî wê pêşbixê. Wê di demên neolîtîkên de wê, bi pêşketina jîyane cotkariyê, çandiniyê û hwd re wê ev pêvajo wê, xwe bi awayekî vekirî wê di rengekî pêşketî ê di jîyane mirov de wê bidina nîşandin.

Çandinî, wê bi demê re wê wê pêşbikeve. Çandinî wê, di rewşa çandiniyê de wê, di reng û rewşek hewkirinê û hwd de jî wê, pêşbikeve. Her wusa mirov dikarê wê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê çandinî wê bi xwe re wê, bi xwe re wê gelek tiştan wê werênê. Her wusa minaq wê ev rewş hemû wê, li dora malbatên cotkar wê werina pêşxistin. Malbatên cotkar wê, weke rewşek teybet bê. Bi teybetî di pêvajoyên şariştanîyê û ankû di destpêka pêvajoyên şariştanîyê de em li kurdistanê wê jî kifş dikin ku wê, malbatên cotkar wê, li dora wan, wê ev rewş wê pêşkevin. Em li vir, divê ku vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku wê li kurdistanê wê, demên şariştanîyê, wê bi dewlemendkirina rewşên weke rewşên çandiniyê ku ew hatina pêşxistin bin.

Di vê çerçoveyê de em dikarin li vir, balê bikişênina li ser rewşa gûndkên neolîtîkî. Her wusa wê li herêmê wê, ev pirr zêde wê pêşbikevin. **Gûndên neolîtîkî,** wê weke gûndikna ku wê li beravê û ankû li deverên avî wê pêşbikevin bin. Herêmên li dora wê, wê weke herêmên daristan, beyere û avî bin. Herêmên daristan wê biçandiniyê bin. Herêmên beyer jî wê, weke herêmên ku ew ji axê û rût bin. Ev herêmên ku em weke herêmên beyera wan bi nav dikin wê, herêmên ku wê derfetên çandiniyê ku wê li wan hebê.

Herêmên avî jî wê, weke herêmên ku ew herêmên ku ew karin ji wan avbikin bê. Avkirina herêman wê, di dema çandiniyê de wê pêşbikeve. Çanda çandiniyê wê di vê çerçoveyê de wê di aslê xwe de wê çandaka ku wê di nava xwe de wê pêvajoyna bi hezaran salan wê di nava xwe de wê, bihawênê. Her wusa, wê rewşa çandiniyê wê, bi ser xwe re wê gelek têgihiştinên ji xwezayê wê di nava xwe de wê pêşbixê. Ji rewşa kifşkirina zad û ankû şînîyên ku ew dihên çandin û heta genim û hwd. Wê ardê ku ew dihê çandin, wê ew were kifşkirin. Wê rewşa berhevkirina zadê ku ew hatî çandin wê were kifşkirin. Wê ew zadê ku ew hat berhevkirin wê ew çawa wê were bikarhanîn û wê were parastin û hwd, wê ew jî wê

werina pêşxistin. Di vê çerçoveyê de em, weke ku em li kurdistanê di nava civake kurd de ku ew ji hê ji demên neolîtîkê ve maya kûwarên ku ew genim, ce, nîsk, nahk û hwd, her tiştê weke wan ku ew dihê çandin û berhevkirin ku ew dihê xistina li wan de wê, wê ji axê û ankû harîya sor wê werina çêkirin Kûwar, §wê weke cihna hînik bin. Wê zadê ku ew hat xistin hûndûrê wê de wê nehêlê ku ew hînbibê û ankû kivnikî bibê.Hînbûna zad, wê zad wê xirabike. Wê xirabûnê wê di zad de wê, çê bike. Di vê çerçoveyê de wê dema ku ew zad berhev dikin û ew zad di dest de ew digihijê hevdû û ew zad di dest de ew zêde dibê û hwd, wê êdî wê ew di wan kûwaran de wê were bicihkirin bo parastinê. Cihên parastina zad, wê hê di vê demê de wê werina çêkirin. Di vê çerçoveyê de em dibînin ku ew genimê ku ew hat kelendin di nava avê de wê, êdî wê were asteka ku mirov karibê wê bixwe bê. Bi wê re jî wê dema ku ew nermbû wê, hingî wê mast tevlî bikin û ankû wê mast berdina li ser ku ew wan bi hevdû re wê dixwûn. Di vê çerçoveyê de wê xwarinên nû wê ji xwe re wê ji wê rewşê wê derxin li holê. Li kurdistanê wê di pêvajoyên destpêka şariştanîyê û ankû em dikarin di pêvajoya dawî a neolîtîkê de jî wê, werênina li ser ziman wê, weke ku em di destê jinên kurd de wê kifş dikin wê ´destar(*)´ wê werina çêkirin ji heviran. Wê cêrnê kûtanê wê, ji kevir wê werina çêkirin. Wê mêkûtên kûtanê wê werina çêkirin. Ev rewşna ku wê bi rewşa çandinîyê û berhevkirina wê û bi wê re hewkirina zad re wê werina pêşxistin bin. Ev pêvajo wê, bidina nîşandin ku wê, bi demê re wê bi hewkirinê re wê rewşek pêşxistinê wê werina pêşxistin. Ev rewşên ku em di nava civake kurd de wan kifş dikin ên weke teşî, destar, tanûr(*), cêrn(*), mêkût(*), cêrê avê, sevîl û hwd,wê weke rewşna teknîkî û teknolojikî a wan serdemên kevn bê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê weke rewşekê wê xwe bide dîyarkirin. Di rewşa afirandina tiştan de wê li herêmê wê bi demê re wê ev rewş wê werina pêşxistin. Pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê wê hebûna wê bi pêşketina wê re wê, li ser van pêşveçûnên demî ên ku wê werina pêşxistin re wê xwe bide pêşxistin. Li herêmê ev rewşên weke ku ew bi tiştî hatina pêşxistin wê piştre wê werina bipêşxistin û domandin. Wê ji gelek aliyan ve wê werina pêşxistin. Wê tiştên nû wê li wan wê werina zêdekirin.

Di rewşa pêşxistina tiştên çandiniyê de wê, ev rewş wê weke rewşna ku mirov dikarê wan bi teybetî wan hilde li dest bê. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê li herêmê wê, bi pêşketina li herêmê re wê xwediyê rewşek dîyarker a li berçavê bê. Li herêmê wê, bi teybetî li herêmên ku ew di dema neolîtîkê de jî wê li herêmê wê weke deverên ku wê mirov li wan bijîn de wê, ew dever wê weke deverna ku wê li wan wê piştre wê bi gûndî wê pêşketin bibê bê. ***Gûndên neolîtîkî*** wê, wê weke deverna ku wê, xwediyê rewşna ku wê, pêşketî bin. Li wan derfetê jîyanê, pirr zêde baş wê werina pêşxistin bê. Wê di nava jîyane bicihbûyî a gûndên neolîtîkê de wê, bi demê re wê beşên din ên komî ên weke jinê û hwd jî wê, tevlî berhevkirinê di jîyanê de bibin. Aliyekî giring ê bicihbûna jîyane komî jî wê xwe bi vê rewşê re wê bide dîyarkirin.Jîyane gûndikên neolîtîkê wê, di nava jîyane xwezayê de wê temenê

------------

(*)Destar wê du kevirên gilover ku wê werina çêkirin û wê bi wan wê weke aş ku wê genim hûrbikê wê ji aliyê jinên kurd ve wê were çêkirin bê. Wê bi wê danokên weke yên savarê, nîskê û hwd wê bikarbênin.

(*)Tanûr, ji hariyê tê çêkirin û di wê de nan tê pijtin û çêkirin. Ev wê weke amûreka destê jinên kurd bê.

(*)Cêrn wê weke seremika avê bê. Wê di wê de wê av bo cemidinê wê were çêkirin. Cêrnên şûn jî hena ew jî ji wan re dayikên kurd dibêjin ´dene´ ankû ´kedûn´.

(*)Mêkût wê, ew wê weke mazdarekê mazin ku ew ji darê tê çêkirin bê. Wê kevirek wê di wê de wê bêqaeartin û wê, danok wê were xistin li wê û wê bi mêkût wê were kûtandin bo hêrtinê. Ji wî kevirê mêkûtê jî dayikên kurd dibêjin ´cêrnik.´

hewkirinê wê bi xwe re wê pêşbix. Wê rewşa komî a girseyî wê bi demê re wê pêşkeve. Wê zanebûn wê di nava wê de û di derbarê wê de wê pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de wê mirov, heta wê demê ku wî çi tevger kirina wê, wan di mejiyê xwe de wê bizanebûn bike. Alimîn û fêrbûna rewşan wê bi xwe re wê bi demê re wê hiş jî wê bênê. Di vê çerçoveyê de wê, pêvajoyek wê, were jîyankirin li herêmê. Pêvajoyên alimênê ên di nava jîyane komî de wê li herêmê wê bi demê re wê, pêşveçûn wê di wê de wê bibê. Wê pêşketinên ku ew di nava jîyane komî de wê bibin û wê bi demê re wê li ser wan re wê, zanebûn wê pêşbikeve, wê her wusa wê bi demê re wê, pêşketinên xûyên civatî jî bê. Xûyên civatî wê weke xûyna ku wê, wê mirov wê bi awayekî ku ew bi wan re wê dijî û ew di wê çerçoveyê de wê, bi wan re wê xwe bide dîyarkirin bê. Bi demê re wê, mirov, wê di çerçoveya jîyane komî de wê, bi alimîn û fêrbûnê re wê ezmûnên mazin wê bidest bixin. Her wusa mirov, dikarê wê jî di vê çerçoveyê de wê werênê li ser ziman ku wê, her alimîn û fêrbûn wê bi demê re wê temenê pêşketinna giring ên ku mirov wan dikarê wan hilde

li dest bê. Wê di çerçoveya jîyane komî de wê, ew alimîn û fêrbûn wê weke ezmûnna wê bi demê re wê bina temenê pêşketina hiş û piştre jî ya zanînê.

Ezmûnên jîyane komî wê bi demê re wê di pêvajoyên dema neolîtîkê de wê, bi derûnîyekê wê di civak û keseyetîyê de wê bina temenê pêşketinê. Wê mirov, wê bi demê re wê li ser wan re wê bizane bibê. Wê li ser encama wê, kirin û tevgerên ku ew bûyîna re wê, fêrbûnê wê di xwe de wê pêşbixê. Di dema neolîtîkê de wê hin bi hin wê mirov wê derkevina li pêş. Minaq, jin wê derkevin li pêş. Mêr wê derkevina li pêş. Lê ev derketina li wan ya li pêş ya yek bi yek û ankû bi girseyî wê di nava hevdû de wê bibê. Di aslê xwe de wê di vê demê de wê hin bi hin ew, derketina mirov ku ew jin bê û ankû mêr bê li pêş wê, weke rewşeka ku mirov dikarê wê bi keseyetîyê re jî wê şîrove bike û wê werênê li ser ziman. Mirov, wê bi kirinên xwe re wê xwe bide dîyarkirin. Wê derkeve li pêş. Ev derketina li pêş a mirov, wê bi demê re wê, xwe di rewşeka li ser zanînê re jî wê bi şêwayên weke bi afsûnê û hwd re wê bide dîyarkirin. Her wusa wê, keseyetîyên pêşî ku ew pêşdikevin û dikevina farqe xwe de wê, li ser wan têgînên weke toteman û rewşên afsûnî û hwd re bê. Di rewşa pêşketina têgînên afsûnî de wê, her wusa wê bi demê re wê mirovên ku ew wan dikin ew wan werênina li ser ziman wê bibin. Ev jî wê, weke ku em heta roja me, di nava civake kurd de wê kifş dikin wê, mirovên pîr û kal ên weke jin(dapîr) û mêr(bapîr)an bin. Mirovên pîr û kal wê, weke mirovna ku ew wê bi dîtîn û bandûra xwe re wê derkevina li pêş bin. Mirovên pîr û kal wê, weke çînek serdest a nava jîyane komê wê derkevina li pêş bê. Heta ku mirov dikarê wan weke serokna xweza ên ku ew rê şanî mirovên endamên komê ên din didin jî wan werênê li ser ziman. Wê ew weke mirovna serdest û piştî ku ew mirin jî wê weke mirovna ku ew bawerî bi wan were wê werina dîtin. Di vê çerçoveyê de wê, ew ji aliyekî ve wê, temenê wê têgîna bawerîyê ku wê di temenê wê de wê baviksalarî û dayiksalarî wê hebê bê. Piştî ku mijare aqil û ankû zanînê jî ew ket nava rewşê de wê, êdî wê rewşek nû wê bi wê re wê xwe bide dîyarkirin li holê. Wê rewşên afsûnî wê pêşbikevin. Ankû wê werina pêşxistin. Wê, bawerîya ku ew mirov wê piştî mirinê jî wê bijîn wê bi wan re wê pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de wê, li herêmê wê di gelek mezelên ji dema neolîtîkê ku wê ew wê werina kifşkirin û dîtin de wê, di wan de wê li rex mirovê ku ew mirîya wê tişt wê werina danîn li rex wî di mezela wî de.

Em ji rewşên demên neolîtîkê ên li kurdistanê ku ew pêş dikevin vê yekê wê, fahm dikin ku wê bi demê re wê civakbûn wê bi nirxbûna jîyane komê re wê bibê. Her wusa, wê di dewama wê de wê, were dîtin û kifşkirin ku wê komên ku ew dijîn wê, weke komna ku ew bi girêdana xwûnê ew bi hevdû ve girêdayî bin. Wê ew girêdanîya wan wê, di temenê nêzîkatîya wan ya li hevdû de jî bê. Wê di çerçoveya jîyanek bi hevdû re de wê, ew bi hevdû re wê bijîn.

Li herêmên botanê ên kurdistanê ku wê weke navenda *mezrabota û ankû mesopotamya* jî wê werina dîtin wê li wê, wê rewşên ji dema neolîtîkê wê pirr zû wê pêşbikevin. Î ro, gelek demên mezolîtîkê ên li dora duwanzdeh hezar salan ku wê weke dema wê werê li ser ziman wê, li herêmê wê di rengekî neolîtîkî wê pêşketin û pêşveçûn wê li wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê bi teybetî wê pêvajoyek pêşketinê a bi vê rengê a bi mirovî wê bi teybetî wê ji dema dawî a serdema peleolîtîkê ku wê heta dema mezolîtîkê û piştre dema neolîtîkê wê were wê, di dewama hevdû de wê di xateka ku wê di wê de wê mirovbûn weke di asta hemdemîya mirovê hemdem de ku wê pêşbikeve wê, were û pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werênê li ser ziman. Nîşanakên serdema neolîtîkê ên li herêmên kurdistanê û ankû mesopotamîya wê pêşketî bin. Piştî ku ev dem pêşketin û heta ku wê dema neolîtîkê li herêmên kurdistanê wê were ber dawîyê wê, êdî wê piştre wê li herêmên li dora anatolîa û hwd, wê li dora 6 û 5 hezar salan wê nîşanakên neolîtîkê wê xwe bidina pêşxistin. Lê gelek nîşanakên ku wê, weke ku ew li herêmên anatolîa û hwd pêşketina jî wê, weke nîşanakna pêşketî ên ji herêmên ber çemên diclê, xabûr û firatê ku ew hatina barkirin li wan herêman bin. Her wusa mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê hin herêmên weke herêmên bahre reş a roja me wê di wê demê de ku ew weke deverna jîyanê na ku wê, bi halîna qaşayê re wê av bilind bibê û wê di bin avê de bimênin û pê de wê, piştre wê weke ev herêmên anatolîya wê bi avê re wê werina dorpêçkirin. Wê di vê çerçoveyê de wê rewşeka wê ya pêşketinî a ji serdemên peleolîtîkê û hwd wê hebê.

Lê ku mirov bi ber herêmên kurdistanê ên weke elezîzê, meletî, semsûrê û hwd ve tê, wê hingî ya ku wê xwe bide dîyarkirin wê ji aliyê jeolojîkî ve wê weke ku wê were kifşkirin wê, di çerçoveyek jîyanî ku wê pêşbikeve de wê, pirr zû wê pêşketin wê li wan bibê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku ew herêmên li dora çêlê a roja me a kurdistanê, çolemerg û heta ku wê bigihijê ber

şîrnaxê û ji wê re wê li herêmên botanê wê belav bibê, wê bi sedan deverên ku wê li wan komê ên neolîtîkî ku wê li wan bicih bibin wê bibin. Ev herêm, teybetîya wan wê, ew bê ku wê avîbûna xwe wê ji çemên diclê, firat û xabûrê wê bigirê. Wê bi wê re wê pêşbikeve. Her wusa, çemê muradê û heta ku wê bigihijê çemê zapê û hwd wê di vê çerçoveyê de wê di xatekê de wê ev pêşketinên neolîtîkî wê li ber wan li keviyên wan bibin. Herêmên êlihê ên weke sason, beşîrî, raman û hwd jî wê li dora çemên van herêman wê pêşbikeve. Li herêmên kurdistanê ên botanê wê, di dewama wê de wê bi ber rojavayê kurdistanê ve wê ew herîkîn wê bibê. Li dora çemê firatê wê, were dîtin ku wê zêdetirî wê qadên jîyanê wê hebin. Ji herêmên kurdistanê ên weke Afrînê, marê, mimbicê û heta ku wê bigihijê Entebê û hwd wê li wan wê ev rewşek jîyane neolîtîkî wê bi zêdeyî wê li van herêman wê pêşbikeve. Herêmên li dora entebê, wê li wan wê heta ku w bigihijê herêmên Afrînê û herêmên ber çîyayê kurdan û ankû çîyayê kurmanc wê, di wê xatê de wê jîyanek bi komî wê pêşbikevê. Herêmên weke Rehayê ku ew navenda wan ya roja me ew diketina berçem de wê, ew li wan û li gelek deverên li dora wê, wê pirr zû wê jîyane neolîtîkî wê li wan pêşbikeve. Gelek şikeftên li herêma Rehayê ku hinek ji wan mana heta roja me wê, di wan de wê bihezaran salan wê jîyan û temenê wê hebê. Her wusa wê komên civakî wê li wan wê pêşbikevin. Di vê çerçoveyê de mirov, vê yekê wê werênê li ser ziman ku wê xate jîyanê wê li herêmê wê ji ber diclê û xabûrê wê bi ber firatê ve wê biherikê. Ev herêm wê weke herêmna wê pirr zêde wê germ jî bin. Wê ew herêm wê, qaşaya li wan wê zêdetirî wê zû wê bihalihê. Wê piştre wê axa wê zû zûwa bibê û wê temen û derfeta jîyanê wê li ser wê pêşbikeve. Her wusa, herêmên li dora wê, wê weke daristanên gûrbin. Bi teybetî, herêmên botanê ên weke li dora çîyayê gabarê û heta digihijê çîyayê sipî û hwd wê cih bi cih wê çîyakên piçûk wê hebin û wê li dora wan wê, kom bi bin wê jîyan wê pêşbikeve. Ev herêm wê li wan di nava daristanên wan de wê pirr zêde pazkovî û sawalên ku ew werina nêçîrkirin û hwd wê hebin. Ev jî wê, weke aliyekî ku wê, mirov wê bi teybetî wê li wê bihizirê bê.

Ji aliyekî din ve jî mirov,vê yekê wê kifş dike ku wê,ji nêçîrvanîyê bûhûrîna jîyane cotkarîyê wê, temenê wê li van herêman wê zêdetirî wê hebê. Ardnîgarîya herêmê wê, di vê çerçoveyê de wê derfetên wê hebê. Wê mirov kifş dike ku wê di demên jîyane neolîtîkê de wê mirov wê, deverên weke *´kozan´* wê ji xwe re wê bigirê û çê bikê û wê, sawalên barrî û ne kedîkirî wê wan di wan deveran de wê zant bikê û wê hin bi hin wê wan hin bi hin wê wan sawalan wê kedî û ahl bikê. Çanda *pêşxistina kozan*(*), wê weke çandaka pirr zêde kevn a li

----------

(*)Koz li kurdistanê wê weke deverna ku wê di şevê di bin rohniya heyvê de ku wê sawal di wan de wê werina girtin bin. Wê di wan deveran de wê şîrê wan ji wan were girtin û meyandin weke mast û ankû bê kirin weke panîr. Ev weke kevneşopîyeka civakî a kurdistanî a bi hezaran salan bê ku ew hê jî dem bi dem xwe dide domandin.

kurdistanê ku wê heta roja me jî wê malbatên cotkar wê pêşbixin bin. Ev jî wê, bi wan re wê weke çandaka ku wê bi wê, ew pêşî kerîyên sawalan digirin û piştre jî wan ahl dikirin û kedî dikirin. Li herêmê wê, di vê çerçoveyê de wê dema ku ev çanda kozan wê bi jîyane cotkarîyê re wê di çerçoveya kedîkirin û ahlkirina sawalan de wê pêşbikeve re wê, êdî wê mirov wê dabara wî wê, zêde ne girêdayî nêçîrkirinê bê. Wê nêçîrkirin wê ji rêya yekane a xwe bi wê jîyankirinê wê derkeve. Wê di vê demê de wê mirov wê, fêrbûna wî zêde bibê û wê gelek rêyên din ên weke xwe bi wan dabarakirinê wê pêşbixin. Bi wê re jî wê, bi demê re wê mirov wê ne tenê weke xwarinê wê goştê sawalên nêçîrkirî û ankû kedîkirî wê bixwê. Wê li rex wê jî wê, şînahîyan wê kifşbike. Wê bi nerîna xwe re wê bibînê ku ew sawal wê şînahîyê dixwê û ew ti tişt ji wê nayê. Ber vê yekê wê, ew jî wê ew wê kifş bike. Bi wê re wê, heta ku wê demekê wê weke sawalan wê biçêrê di nava kerîyên sawalên xwe yên ahlkirî û kedîkirî ên di kozan de.

Mirov wê di vê çerçoveyê de wê xwe bi awayekî vekirî wê pêşbixê. Mirov wê di nava rewşa jîyanê de wê, rêyên jîyanê û xwe jîyankirinê wê bi alimîna li ser dîtinê re wê, hin bi hin wê kifş bike. Wê bi wê re wê, wan jî wê pêşbixê. Minaq kifşkirina şînahîyan û çêkirina wan weke xwarinê wê, weke şoreşeka kifşkirina mirov a şînahîyê bê. Wê di pêvajoyên pêşî ên kifşkirina şînahîyê de wê mirov wê, weke sawalan wê di nava wan de wê biçêrê. Piştre wê, bi demê re wê fêrî berhevkirina wan bike. Yanî jî wê, yên ku ew nikarin herina derve û zikê xwe têr bikin wê, ji wan re wê were hanîn li hundûr ji aliyê yên ku ew diçina derve. Di nava sûret û wêneyên li hêtên şikeftê ên li dora qaxizmanê û hwd de ku ew hatina dîtin wê, biqasî sûret û wêneyên bi sadan sawalan wê, di nava wan de wê sûret û wêneyên mirovên ku ew bi sawalan re diçêrin jî wê werina dîtin. Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, jîyane mirov wê di vê çerçoveyê de wê, weke rewşeka ku mirov wê bi teybetî wê hilde li dest bê. Di

rewşa fahmkirina xwezaye herêmê de wê, rastîya ku wê derkeve li holê û wê were dîtin wê, di wê çerçoveyê de bê ku wê mirov wê di nava wê de wê pirr zêde wê derfetên jîyanê wê bi xwe re wê kifş bike û wê wan bijî. Rewşa şînahîyê û şînbûna wê ya li herêmê û pêşketina daristanên herêmê wê, dîroka wan wê heta berî demên peleolîtîkê jî wê herê, Di serdemên qaşayê ên berî peleoltîkê de wê ev herêm wê weke herêmek ji wan herêmên dunyê ên ewil bê ku wê li wê, wê şînahî wê pêşbikeve wê piştre wê wegerihê li daristanên pirr zêde gûrr. Şînahîyên ku ew li herêmê bûna wê li ser wan re jî wê, pêvajoyna dirêj ên bi xwezaya xwe re wê, derbas bikin. Pêvajoyên jîyane xwezayê wê, bi teybetî wê, were dîtin û kifşkirin ku wê di demên peleolîtîkê de wê, di rewşeka ku wê weke daristanên gûrr bê. Wê mirovê demê wê ê weke homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd, wê derfetek pirr zêde pêşketî a nêçîrkirinê wê di nava wê de wê ji xwe re wê bibînê. Wê di vê çerçoveyê de wê, ev rewşa derfetên zêde bê ku wê, herêmê wê ji mirovê demê û pêşketin û jîyane wî re wê bike weke navend û malgeh. Herîkînên li herêmê wê, di temenê wan de wê ev rewş wê hebin. Dema homo sapîens ji herêmên Afrîqa ew dihê herêmê wê, ew ji aliyekî ve wê van rewşên jîyanî ên herêmê wê bi xwe re wê kifşbike bê. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, heta ku wê dem wê were demên peleolîtîkê wê ew rewşên xwezayê û gûharîna ku wê di wan de wê bibê wê, zêdetirî wê bandûrên wan wê, li herêmê wê bibê. Hê di demên peleolîtîkê de wê herêm wê weke herêmek navend a jîyanî bê. Piştre jî wê heta ku wê dem wê were demên mezolîtîkê û neolîtîkê û hwd wê, ev rewşên pêşketinê wê di reng û şêwayekî pêşketî de wê, xwe bidina domandin. Ji nîşanakên ji demên neolîtîkê û berî wê mirov kifş dike ku wê demên neolîtîkê û jîyane wê, wê li herêmê wê pirr zêde wê ji ya ku em dizanin wê kevntir wê herê.

,

**Beş sê:**

**Di dewame pêvajoyên serdema neolîtîkê û civaketîya dema wê de dîroka pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê yên li kurdistanê**

Bêgûman ku em dîroka şariştanîyê, wê weke mijareka giştî wê hildina li dest, wê ji destpêka wê û heta roja me, wê dîrokek bi gelek hûrgilîyên wê civakî re wê were hanîn li ser ziman. Dîroka şariştanîyê, hanîna wê ya li ser ziman, wê di serî de rastîya pêşketina civaketîyê bi sazûmana wê re wê werênê hanîn li ser ziman. Bi teybetî ku em bahse dîroka şariştanîyê dikin, wê di cih de serdemên sûmerîyan wê werina berbîra me. Ev serdemên ku ew weke ´serdemên şariştanî ên destpêkê´ jî wê werina hanîn li ser ziman, wê di çerçoveyek afrîner de wê xwediyê xateka pêşketinê a bi xwe re bê. Pêvajoyên şariştanîyê, wê dîroka civakê a bi sazûmanî wê bi xwe re wê werênina li ser ziman. Heta roja me jî ku wê bahse têgîna şariştanîyê û pêşketina wê, sazûmana wê ya civakî, sazî û pîvanên wê û hwd, wê xate pêşketinê a nava diclê û firatê de wê were li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê dîroka şariştanîyê wê bi destpêka wê re wê wer li ser ziman. Pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê, wê pêşî ji vê herêmê wê bi awayekî pêşketî wê dest pê bike. Piştre jî wê di pêvajoyên şariştanîyê ên piştre de wê, herêm bi herêm, wê şariştanîyên nû wê xwe bidina dîyarkirin.

Di vê çerçoveyê de wê, heta roja me, wê herêm bi herêm wê dîroka şariştanîyê a ku ew pêşketî wê were hanîn li ser ziman. Li vir, bêgûman, hemû pêvajoyên şariştanîyê ku ew weke pêvajoyên jîyane civakî de weke nirxekê divê ku mirov wan hilde li dest. Di çerçoveya têgîna şariştanîyê de emê li vir, hemû şariştanîyan û xatên wan ên pêşketinê emê li vir wan neyênina li ser ziman. Di vê xabatê de emê xate şariştanîyê a li kurdistanê ku wê ji serdemên sûmerîyan wê heta roja me wê xwe bide domandin, emê wê ji xwe re wê bikina mijar. Wê wê, li vir, wê di serî wê werênina li ser ziman. Li vir, emê hewl bidin ku nerîneka giştkî a bi têgîna şariştanîyê û pêşketina wê re wê werênina li ser ziman. Di vê çerçoveyê de em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê gelek pêvajoyên şariştanîyê wê di vê xate şariştanîyê a li kurdistanê de wê di nava hevdû de wê derbas bibin. Bo vê yekê, di çerçoveyekê de wê di zikhevdû de wê werina li ser ziman. Ji xwe jî ev, divê ku ev wusa bê. Ber ku em nikarin pêşveçûnên şariştanî, wan ji hevdû cuda şîrove bikin û wan werênina li ser ziman. Li vir, çanda şariştanî ku wê li kurdistanê ji serdemên sûmerîyan û ankû berî serdemên sûmarîyan û heta serdemên sûmerîyan wê were hanîn li ser ziman, weke ***çanda hassûna***, wê weke navê çanda pêşî a şariştanî ku wê xwe

----------

(*)Çanda hasûna weke çanda çandiniyê jî mirov dikarê wê bi nav bikê

bide nîşandin bê.Ku hin bi hin, di çerçoveya jîyane civakî û pêşveçûnên de wê, rewşên weke çêkirina amûran, weke zerik, sênîk, cêr, kevçî, sevîl, cêrn û mêkût, destar, teşî û hwd ku ew dihên pêşxistin bin. Bi vê rengê wê amûrên destî ên civakî wê werina pêşxistin bê. Bi wê re jî ku wê, çandinî wê ji herêmên çolê wê bi ber herêmên deştê ve wê werê û zêde bibê bê. Bi wê re jî wê çanda samarra, wê li ber dîclê wê herêmên ku avî ku tên avdan û yên ku ew dihên çandin, pêşketin û dema wan bi xwe re ew dike ku ew werênê li ser ziman. Bi teybetî, herêmên neavî ku ew wê çawa wê werina çandin, wê bi xwe re de hanîn li ser ziman. Ev herdû herêm jî wê hinekî wê herêmên bej bin. Di lêkolînên ku ew li van herêmann hatina dîtin de wê, kûwarên ku ew hatina siwakirin, cêrn û cihên genim, bermehîyên sawalên kedî, hêkelên jinan û hwd, hatina dîtin. Ev jî wê, bermehîyên çanda van deman bin. Çanda hassûna û samarra, wê ji dema neolîtîkê û ber pêvajoyên şariştanîyê ve wê weke pêvajoyna civakî ên pêşketinê bin. Li dora 10 û 7 hezar salan de ev çand li kurdistanê li ber diclê û firatê dijîn. Piştî van herdû pêvajoyan wê li dora 6 û 5 hezar salan wê çanda tel-xelefê wê were dîtin. ***Tel-xelef,*** navê herêmeka rojavayê kurdistanê ya û di dema mîtannîyan de navê wê ***´gûzane´*** ya. Navê gûzane wê heta roja me jî wê di nava kurdan de li herêma botanê û herêmên rojavayê kurdistanê wê heta roja me jî wê ev nav wê were bikarhanîn. Çanda dema gûzane, wê çandeka pêşketî a li ser gundîtîyê re ku wê hin bi hin pêşveçûnên bi ber bajarvaniyê ve wê xwe bidina dîyarkirin bê. Dema ***çanda gûzane***, wê dema çanda pêşketina şariştanîyê a giring û pêşketî bê. Dema çanda gûzane, wê bi çêkirina xwarinê, pijandina nan, çanda bicihbûnê û hwd, wê pirr zêde wê pêşkeytî bê. Çanda xwedewendîyê, wê di vê demê de wê pêşketî bê û serdest bê. Nîşanaka wê jî li deverên rojava ku wê hêkelên xewedewendan ku wê werina dîtin. Piştre wê li başûr û bakûrê kurdistanê jî

wê werina dîtin. Wê çanda gûzane, wê bi dagirkirina herêmê ji aliyê komên pênaber re wê li dora 6 û 5 hezar salan wê dawî li çanda gûzane wê werê. Piştre wê çanda Abeyd, wê bi pêvajoyên şariştanîyê ê sûmerîyan û hwd re wê destpê bike. ***Çanda abeyd***, wê weke çandeka serdestîyê bê. Wê rewşên ramyarî wê pêşbikevin ku wê çend gund û ankû bajarokên ku ew pêşketina wê, di bin destekê û ankû têgîneka serdestî de wê bigihijina li hevdû. Di vê demê de wê rewşên ramyarî ên serdestîyê û çanda wê, wê di vê demê de wê werina li cem hevdû. Çanda bajarvaniyê û ya neolîtîkê, wê nîşanakên hatina wan berhevdû û çêbûna nakokîyan, wê zêdetirî wê di vê demê de wê xwe bide dîyarkirin û nîşandin. Piştre jî wê, xalkên ku wê bi çanda abeyd wê pêşbikevin, wê hêrîşî herêm û çanda gûzane bikin. Wê dagir bikin û wê hin bi hin wê, ew wê bikin ku wê ji holê rabikin. Lê weke ku emê li dora 5 û 4 hezar salan bibin ku wê, çanda gûzane ku wê çendî wê bê xwestin ku ew ji holê rabê jî lê wê li başûrê mesopotamîya û deverên wê, xwe bide domandin. Li bakûrê mesopotamîya, çanda gûzane, wê dibin dagirî û hêrîşên çanda abeyd de wê bimênê. Wê di vê herêmê de şerê şariştanî wê, çanda abeyd wê pirr zêde wê pêşbixê li herêmê bo ku ew xwe serdest bike. Lê ew, ew yek, nebê. Wê bi tememî serdest nebê. Serkevtina başûrê mesopotamya, wê temenê pêşveçûnên şariştanî ên çanda gûzane ên piştre jî bê. Ji aliyekî din ve jî wê, di xate çanda gûzane de wê ji dema neolîtîkê ve wê civakên kevn ên seretayî wê bi ber şariştanîyê ve wê pêvajoyên xwe wê bijîn. Di aslê xwe ya ku wê mohra xwe wê li rengê pêşketîna ku em î ro bi navê sûmer, wê dihênina li ser ziman, wê bixê wê ev bê. **Çanda gûzane**(*), wê weke çandaka herêmî a bicihbûyî bê. Ber vê yekê, wê ti hêrîş, wê nikaribin, wê ji herêmê bikin û wê bişikênin bê. Wê di wê xate çanda gûzane de wê, gûndkên neolîtîkî wê bi ber bajarokbûnê ve wê herin. Wê bi vê rengê, wê pêvajoyna şariştanî, wê bên jînkirin. Serdema şariştanî a çarem jî wê dema çanda ûrûkê bê. Ev dem û çand jî wê bi ji gûndîtîyê bi ber bajarbûnê ve wê pêşketin wê bibê. Destpêka çanda ûrûkê û dema wê, wê li dora salên 4500 û heta sê salan bê. Hinekî jî wê, çanda abeydê de wê, çîna serdest ku ew di dest de ew berhevkirineka mazin dide çêkirin, wê ew temenê pêşxistina rêveberîyên dagirkerî bin. Wê, ev rewş, wê gelek gundan wê ji holê rabike. Wê çanda kolederîyê wê pêşbixê. Lê weke ku bi mîtolojikî jî wê were ser ziman, wê tûfaneka ku ew çanda abeyd di rakê wê dawîyê li wê werênê. Piştî wê re wê dema çanda ûrûkê ku em dikarin wê, weke demeka çandî a şariştanî a hemdem jî wê werênina li ser ziman, wê li ser temenê çanda gûzane a berî çanda abeyd wê pêşbikeve. Hêza çanda ûrûkê, wê wê halandina çanda abeydê jî wê pêşbixê. Di roja me de wê,dîtina nîşanakên çanda abeyd di nava dema ***çanda ûrûkê***(*) de wê, ji aliyekî ve wê hem serdestîya çanda ûrûkê bide nîşandin û hem jî wê nîşanaka wê bê ku wê çanda abeyd wê di nava wê de wê bike ku ew bijî. Çanda başûrê mesopotamîya ku wê karibê bi bandûra çîya û ardnîgarîya ku ew xwe biparêzê, wê serdestîya xwe wê, biparêz. Di wê demê de wê weke ku wê di roja me de wê bê, wê xalkên ´fetîhçî´ û ´ dagerker´ weke tirkên roja me ku ew hatina kurdistanê û wê şerê serdestîya xwe bi xalkên herêmê ên weke kurdan ên aslî yên herêmê re didin, wê bibin. Dîroka herêmê, wê bi şer û pevçûnên bi vî rengî ên ku wê kûjarîya wan pirr zêde bê re wê tişî bê.

Di dewama wê de ku wê were dema çanda cemdet nasr´ bê. Ev dem jî wê li dora sê û du hezar salan wê bê. Di vê demê de wê pêşveçûnên şariştanî ên dema çanda ûrûkê wê werina bikarhanîn. Di dema çanda ûrûkê de arabokên ku ew ji pêşve bi hasp dihên kişandin û li şûn ve kesek û ankû dû kes ku wan dikarî li ser wê bisekin in li ser pîyan û ankû rûniştî, wê dema cemdet nasr de jî wê werina dîtin. Bineter, nivîsar û kêvalberên nivîkî ên weke nivîskên bizmarî jî ku ew dihên binavkirin, ên ji dema çanda ûrûkê wê di vê demê de jî wê werina bikarhanîn. Ev serdem, wê weke serdemeka şariştanîyê ê pêşketî bê. Di vê demê

------------

(*)Çanda gûzanê wê bi navê wê yê din wê ´çanda tel-xelef´ bê. Herêma tel-xelefe wê di dema hûrî û mîtannîyan de wê navê wê ´guzanê´ bê. Wê ev nav ji wê were girtin. Di nivîsên bizmarî ên ji marî hatina derxistina ên weke ´hurian and hurian language in tihe marî tekst´ de wê were kifşkirin.

(*)Çanda urukê wê çanda dema urukê wê ji wê bahs bikê.

de bajar, çanda bajarvanîyê, kûlekên weke yên dema babilîyan ku ew bi navê *´kûleya babil´* dihên bi navkirin û hwd wê di wê demê de jî wê pêşbikevin. Wê bawergeh û perwerdekirin li gorî nrxên demkî ku ew dihê pêşxistin, wê di vê demê de wê zêdetirî, wê pêşbikeve. Di vê demê de wê nivîsên weke bi vegotinî wê werina pêşxistin. Ankû weke çîrokan wê, bi devkî wê pirr zêde wê werina pêşxistin. Di vê demê de wê çanda nivîsê, wê zêdetirî wê pêşbikeve. Wê di vê demê de wê pirtûkxane, wê werina pêşxistin di parastgeh û ankû bawergehan de. Çanda bazirganîyê, çandinîyê, zanaatê, hesinkarî û hwd ku ew di dema çanda ûrûkê de pêşketibûn, wê di vê demê de wê zêdetirî wê werina pêşxistin û wê bên

jîyandin. Ji pîrranîya aliyên xwe ve wê çanda cemdet nasr, wê ji ya ûrûkê wê pêşbikeve. Wê ji wê temenê xwe bigirê. Wê nirxên wê demê wê di wê de wê werina pêşxistin û wê li ser wan re wê were jîyankirin. Çanda ûrûkê, weke ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman, wê çandaka xwedewendî ya. Çanda xwedewendên weke înanna û hwd, wê di vê demê de wê serdest b**ê**.

Herwusa, ku em bahse çanda hassûna bikin, em, divê ku vê jî di dewama wê de wê werênina li ser ziman wê, serdemên şariştanîyê ên destpêkê ku wê gav bi gav wê pêşbikeve wê bike nava xwe de wê, wê bi wê re wê pêşketina xwe wê bijî. *Şikefta hassûna* li bakûrê kurdistanê li bajarê wê yê roja me li farqînê ya. Li wê bi lêkolînên ku ew hatina kirin re wê, were dîtin ku wê, çandinî, kedîkirin û hwd, bi nîşanakên wan ên ku wê li wir wê werina dîtin re wê bê kifşkirin ku wê li dora 10 û 8 hezar salan wê pêşbikeve bê. Î ro jî wê li herêmê, lêkolînên ku weke lêkolînên ´erkolojikî´ ku ew dihêna kirin, di wan de nîşanakên ji şariştanîyên kurdistanî ên demên bûhûrî, wê werina dîtin, wê di derbarê wan û rengê pêşketina wan de jî wê têgîn û aqilekî wê bide me. Hin bi hin wê, piştî serdemên neolîtîkê û pê de wê pêvajoyên ku wê pêşbikevin, wê li ser esasê şêwayekî bi sazûmanî ê jîyanî re wê xwe bide domandin.

Pêvajoyên piştre ku wê bibin, wê weke pêvajoyên ku wê di dewama wê de wê bibin bin. Lê pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê, wê weke pêvajoyna giring ên pêşketî bin. Piştî pêşketina çanda ´tel-xelafê´ a şariştanî ku wê bi şêwayekê wê li şûna çanda kevnera a hassûna jî wê pêşbikeve li herêmê wê, di rewşa têgîna şariştanîyê de wê weke di rengê pêvajoyna din ên bi pêşketina jîyane şariştanî û hwd re wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, di aslê xwe de wê dema ku mirov çanda şariştanîyê wê bike ku wê fahmbike, çand, hûner û bi wan re aqil û hwd, wê weke sê gotinên bingihîn ên ku wê pêşveçûnan bi xwe re wê bidina dîyarkirin bin. Çi û çawa pêşveçûn bûna, wê di vê çerçoveyê de wê ev gotin bi pêşketina wan re wê bidina dîyarkirin. Pêşveçûnên li ser aqil û pêvajoyên aqil re wê bêgûman, wê di pêşketina pêvajoyên jîyane şariştanî û bi rêxistinkirina wê ya jinûve û jinûve wê aqil xwediyê weynek mazin bê. Her demê, wê bi pêşveçûnên demkî ên nû ên li ser aqil re wê ev rêxistinên sazîyî ên di nava jîyane şariştanîyê de wê bên kirin. Di şariştanîyên kurdistanî û ankû mesopotamîkî de wê rewşa çemên diclê û firatê wê weke rewşek dîyarker û kifşkar bê. Her wusa wê, ev çem wê navendîtîyê wê bileyizin. Weke ku çawa ku wê di pêvajoyên şariştanyê ên misrê de jî wê çemê nîlê wê weyn bileyizê. Her wusa, li deverên ku wê pêvajoyên şariştanîyê wê xwe bidina destpêkirin, wê di vê çerçoveyê de wê rewşên weke van rewşên bi şariştanîyên kurdistanî re ku wê çemên diclê û firatê wê weyn bileyizê, di pêvajoyên şariştanîyê ên misrê de wê nîl weyn bileyizê. Di pêvajoyên şariştanîyê ên li herêmên qafkasya û hwd wê çemên weke ên tuna û hwd wê weyn bileyizin û hwd. Wê bi vê rengê wê, bidomê.

Li herêmên kurdistanê ên rojavayê kurdistanê, bakûrê kurdistanê, başûrê kurdistanî û rojhilatê kurdistanê jî wê heman rewşên bi pêşveçûna şariştanî re wê weke herêmna navend bin. Çanda hassûna û piştre jî çanda tel-xelaf´ê wê li van herêman wê bigiştî wê pêşbikeve û wê ev herêm wê ji wê re wê weke navend bin.

Di rewşa fahmkirina têgîna çanda hassûna a kurdistanî ku wê weke ku wê gotineka ku ew bi wê *wê pêşveçûnên şariştanî ên li herêmên kurdistanê* û ankû mesopotamîya giştî wê werênina li ser ziman, çerçoveyek jîyanî a civakî ku ew pêş dikeve wê werê hanîn li ser ziman. Di wê çerçoveyê de wê di destpêkê de wê demên şariştanîyê ên destpêkê wê pêvajoyna çawa wê bijîn, wê çawa pêşketine û hwd wê werina hanîn li ser ziman. Li gorî ku mirov wê di roja me de wê kifş dike, wê li dora deh û heft kûzxaneyên cêrîn wê weke zerik, sênîk û hwd ku ew ji ji axê û ankû daran dihên çêkirin, wê werina dîtin. Ev jî wê weke çêkerîyna afrînerî ên bi destê mirov in ku ew wê di jîyane xwe de wê bikar dihênin. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê di demê wê çanda şariştanî, ya ku wê xwe daya pêşxistin wê bide dîyarkirin.

Serdemên şariştanî ên serdemên sûmerîyan, wê bi pêvajoyên dîrêj wê piştî serdemên civakên neolîtîkî re wê xwe bidina dîyarkirin. Her wusa, di aslê xwe de wê, pêvajoyên şariştanîyê, wê ji aliyekî ve wê bi têgîna sazûmanîyê re wê were li ser ziman. Bi kortasî, serdemên ji demên sûmerîyan û hwd mirov dikarê wan bi vê rengê wan werênê li ser **ziman**.

Serdemên şariştanî ên mezopotamya, ji dîrokê ve gelek gelên jihev cûda yên ku bi hevre jîn dibûn cihê wan bû. Di dîrokê de pir pênaberî jî biqasî ku mirov dibînê wê li herêmê bibin. Ji ber wan pênaberîyan jî wê, her timî di rêveberiya wê û pêşketinê wê de asteng pêvajoyên şer û pêvçûnên şariştanî. Ên bi pênaberî hatina, ne hiştina ku ew xatakê rastûrast di xwe de berdewam bike. Ev jî ji aliyê çandî ve ji wilo ya. Lê

çanda wê ya ku pêşketi ji, bi hizre xwe re pêşkeşî ji dîrok û mirovatiyê re kiriya. Gelek şaristanîyên mezin û bi nav û deng lê jîn bûna. Bi vê yekê re ji divêt ku mirov ji bîrneke û bêje ku di dunyê de wê ji ber van xosletên xwe wê bê cihê herî ku tê nasîna. Demên şaristaniyan yên weke yên sumeriyan, aqadan, babilan, Gûtîyan, qasîtîyan, hurî û mîtaniyan, asûrîyan, naîriyan, medan û hwd jîn bûna. Ji xaynî van hê wê gelêekû şaristanîyên din jî wê li axa mezopotamya li kok dana.

Di deme dawi ya qaşayê de hê ku dunye wilo zêde cemidi û mirovan ji ji wê cemidibinê di ravîn û dihatin, xwe di sipartina wir. Ji bo vê yekê, hinek cihê ku mirov weke cihên bi cih bûna demên neolîtikê ji bi navkê, li başûrê Kurdistanê li berçav dikevin. Piştre hin bi hin ku wê zûwabûn di axê de ji dibe, êdî hin bi hin li vê herême Kurdistanê çandin û bi herême Botanê û herêmên din re wê bi pêşdikeve. Li bakûrê kurdistanê ji wê, bi zêdeyî li derûdorê amedê, Rehayê û weke cihên ku jê re **Xirabreşkê**(*) û hwd, li wan dê li Mezopotamya hê di deme neolotikê de bi cih bûn dibe. Bi vê yekê re li başûrê kurditanê li ber çiyê Çemalû hê li gelek deverên din şûnpê ji bo vê yekê têne xuyakirin.

Ta deme ku cotkirin pêşkeve, ahlkirin û çêrandin bibe, jiyana gundîtiyê pêşkeve û nivîs were kifşkirin û were bi karanîn li ber diclê, firatê û bi teybetî jî li ber keviyên amede û li hin deverên başûrê kurdistanê bi cîh bûn dibe. Di wan deman de jiyane bajartiyê piştî pêşketina jîyane gunditiyê re bi pêşdikeve. Hin bi hin ew ji dibin. Awayê bajaran derdikeve hole. Bajar hin bi hin şîn di bin. Bi pêşketina gundan re deme pêşketina bajaran dest pê dike. Pêşketina bajaran ji bi çêkirina xanî û malên weke ku li govan têne çêkirin derdikeve hole. Derketin û pêşketina bajaran li kurdistanê berî zayînê di naqabîna 6000 û 5500 wan de dibe. Ev dem wê taqabûlî demên şariştanîyê ên dema sûmerîyan û hwd ên pêşketî wê bikê. Di vê pêşketinê de bi qasî ku tê gotin du çanda bi awa derdikevin pêş çanda *Abaîd û tel-xalaf* e.

Her weha piştî van pêşketinan, deme Urukiyan dest pê dike. Deme wan ji, deme şaristaniyê ya. Ev dem bi qasî ku tê fahm kirin di berî zayînê di naqanîna 4500 û 3500 wan de xwe dide ber çavan. Ev dem, demeke di hizir û di deme şaristaniyê de demeke pêşketiya. Di wê demê başûrê kurdistanê mirov karê bigiştî ji bi pêşketiya. Pêşketina urukiyan ne tenê di qada çandê de ya. Ji aliyên weke pêşketina teknolojiyê jî wê xwediyê rewşek pêşketî bê. Di deme urukiyan de cotkariya avî û karên madanê û çandin û di qada teknolojîyê û hwd de ew, pirr li pêşîn. Di *destana Gilgameş*(*) de wê, ji gelek aliyan ve wê pêşveçûn wê raxistin li berçavan. Baziganî jî bi pêşketiya. Çûn û hatinaka mezin di wê de ji bo bazirganiyê li mezopotamya pêşdikeve. Di wê demê de nivîs bi pêşketiya û di qada rêveberî û dewlete de qeyd kirin ji dest pê kiriya. Ji kêvalbarên wê demê ên nivîskî û ankû bineterên nivîskî ên ji vê demê, mirov vê yekê ji wan bi awayekî vekirî fahm dike.

Pêvajoyên jîyane şariştanî ku wê pêşbikevin, wê bi demê re wê li ser rewşa jîyane şariştanîyê re wê weke pêvajoyna afrîner bin. Dema ku mirov bahse jîyane şariştanî dike, wê di serî de wê rengê jîyane ku ew bi sazûmanî ew hatîya

----------

(*)Xirabreşkê herêmeka li dora bajarê bakûrê kurdistanê ê reheyê bê.

(*)Destana gilgamêş wê, destanaka herêmê a ji dema urukiyan bê. Wê navê gilgamêş jî di zimanê kurdî de wê were wateya ´mirovê weke ga gir´ û ankû ´mirovê weke gamêşekê gir´

pêşxistin wê bê kirin. Di vê çerçoveyê de weke ku mirov di dema urukîyan de wê dibînê wê, pêvajoyna şariştanî wê pêşketî hebin. Uruk, wê tenê wê weke bajarekî dema şariştanîyê ê dema sûmerîyan bê. Lê bi wê re wê bi demê re wê gelek bajarên din wê weke urukê, minaq weke marê, lagaş, kiş, ur, umma, Arappha û hwd wê hebin. Weke van wê bi dehan bajarên din wê hebin. Rewşa jîyane bajarîyê, wê lingekî giring ê pêşketina jîyane şariştanîyî bê.

Li mesopotamîya û ankû kurdistanê ku mirov xate jîyane şariştanî wê dihilde li dest û wê dike ku wê fahm bike, wê di vê çerçoveyê de wê bi demê re wê gelek demên şariştanî wê di nava hevdû de û ankû di zikhevdû de wê bijîn. Di vê çerçoveyê de wê di dema sûmerîyan de weke babilî, aqad, gûtî, qasît û piştre hûrî, mîtannî, med û hwd wê bi gelek rewşên ên herêmkî re wê hebin. Di xate jîyane şariştanî a li kurdistanê de wê, teybetîya wê ew bê ku wê di xatekê de wê tevî hemû pêvajoyên hêrîş û herîkînên li herêmê wê bibê. Hebûna sûmerîyan ankû weke ku mirov ji nivîsar û bineterên nivîskî weke navê wê dixwênê ´kengîr´î wê ew jî wê weke xalkna ku ew bi herîkînê wê hatibiina li herêmê. Ji welatê mesopotamîya û heta ku wê bigihijê hindistanê wê di qadekê de wê piştî ku wê dema şariştanîyê wê destpê bike û pê de wê, çûn û hatina xalkan wê destpê bike. Minaq, hebûna sûmerîyan, ku wê weke teorîyekê di derbarê wan de bê wê bawerkirin ku ew ji herêmeka ku wê li devereka ji meopotamya û heta

ku digihişt hindistanê wê di nava wê navberê de wê bijîya *´meluhha*” ku weke cihê ku wê sûmerî ji wê biherikina ber herêmên diclê û firatê bê.

Rewşa jîyane şariştanîyê ku mirov wê hilde li dest, mirov wê li ser rewşek jîyanî a şariştanî ku ew pêşketiya re mirov dikarê wê hilde li dest û wê werênê li ser ziman. Her wusa di dewama wê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê berî serdemên şariştanîyê wê serdemna civakî ku wê weke serdemên civake neolîtîkê jî wê werina bi navkirin wê bijîn. Di van deman de wê gûnd, dih û merg wê ava bibin. Ev serdema ku wê di wê de wê gûnd, dih û merg wê ava bibin û wê li wan wê hin bi hin wê jîyane gûndîtîyê wê pêşbikeve, wê bi wê re wê hin bi hin wê temenê jîyane şariştanî jî wê bê avêtin. Di aslê xwe de wê gûnd, dih û merga bin ku ew hin bi hin wê mazin bibin û wê bina weke bajaran. Bajarî, wê weke rewşeka teybet a ku mirov wê di vê çerçovey de wê, êdî wê weke çerçoveya rewşa jîyane civkaîya şariştanî wê hilde li dest bê. Wê di wê de wê li gorî destûr, zagon û rêgezan wê were jîyankirin. Wê bi wan re wê jîyan wê were bi sazûmankirin û adilandin. Lê ku em rewşên jîyane şariştanî wan bikin ku wan fahm dikin, em divê ku wê bi wê re wê pêşî rewşên jîyane civakî ên berî şariştanîyê wan hildina li dest. Li vir, bi wê re jî wê rewşa jîyane şariştanî wê bi wê re wê, wê çawa wê pêşbikeve mirov wê êdî wê fahm bike. Berî wê dema şariştanîyê, wê civakeyîya neolîtîkî wê bê jîyîn. Di dema civakeyîya neolîtîkê de wê kombûna bi civakî wê bibê. Wê bi civakî wê hin bi hin wê pêşbikevin. Wê totemên ku wê bi wan wê were jîyîn, wê ew bi têgînî wê werina afirandin. Di aslê xwe de wê ev totem, wê weke têgînna serdest wê hin bi hin wê pêşbikevin. Di serdemên destpêkê de wê, rewşên weke çandinîyê, berhevkirinê û hwd wê pêşbikevin. Dema ku wê berhevkirin û hwd, wê pêşbiekve, wê rengê jîyane şariştanî a bi serdestî jî wê pêşbikeve.

Di serdemên civake neolîtîkî de wê civak,wê bi rewş û jîyane xwe re wê bijî û wê pêşbikeve. Wê di xwezayê de wê bijî. Mirov, wê ji her aliyê ve wê, girêdayî xwezayê bê. Wê zadê xwe wê ji xwezayê wê bigirê. Bi demê re wê pêşketina çandinîyê, wê di çerçoveya pêşketina jîyane mirov re wê weke aliyekî giring bê. çandinî wê weke encama aqilekî jîyane civakî bê.

Mirov wê pêşî wê di nava jîyane xwezayê de wê fêrî ji wê sûdgirtinê wê bike. Her wusa, di pêvajoyên jîyane şariştanîyê de wê dabarekirin wê li ser encama kedên dest bê. Mirov, weke zindiyekî ku ew bidest afirandinê dike û pê de wê, bi dest adilandina jîyane xwe bike. Wê çandinîyê wê bike. Wê ahlkirin û kedîkirina sawalan wê bikê. Wê bi wê re wê şîvani wê pêşbikeve. Şivanî, wê rengekî jîyanî ê jîyane civakî ê berî jîyane şariştanîyê jî ya. Di nava civake kurd de wê, heta roja me wê, pergale wê ya bisazûmanî ku wê bi wê re wê li gorî xwezayê wê were jîyîn, jîyane koçerîyê ya. Jîyane koçerîyê, wê weke jîyane gûndîtîyê bê. Lê em li vir, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê du lingên jîyane koçerîyê wê hebin. Lingek, wê ***´jîyane zozana´*** bê. Lingê din ê duyem jî wê ***´jîyane deştê´*** bê. Jîyane zozana, wê bi tememî wê jîyane li xwezayê ku wê çawa wê bi wê re wê were jîyîn bê. Jîyane deştê jî wê, lingê jîyanê ê bajarvaniyê ê şariştanî bê. Wê herdû li rexhevdû û ankû di zikhevdû de wê bijîn û wê hevdûna xwe wê bi hevdû re wê bidina domandin û wê bênina heta roja me.

Jîyane civakî ku mirov wê wê pêşî wê werênê li ser ziman, mirov divê ku wan serdemên civakî ên neolîtîkê wan di serî de wan hilde li dest. Di aslê xwe de wê şoreşa jîyane civakî a dema neolîtîkê, wê bi xwe re wê bi pêvajoyên pêşketina jîyane civakî re wê pêşveçûnên dîrokî wê werênê. Civak, wê çerçoveya wê, bi nirxên wê re wê biafirê. Wê têkilîya xwezayê û ya mirov, wê di çerçoveya wê de wê were û pêşbikeve. Wê pêşî mirov, fêrî naskirin û sûdgirtina ji xwezayê bê. Bi wê re wê, bi sûdgirtina ji xwezayê re wê jîyane xwe wê bide domandin. Jîyane şivanî, rewşa çandinîyê, ahlkirin û bikarhanîna şînîyan û hwd, wê pêşbikeve. W bi wê re wê şînahî wê ji wê re wê sûd wê were girtin. Mirov, wê fêrî naskirina şînahîyan wê bibê. Bi wê re wê, fêrî çandînîya wan bibê. Jîyane civakî a ku ew di cihê xwe de ew rûnûştî heya, wê di çerçoveya wê de wê çawa wê mirov, dabara xwe bike, wê li ser wê re wê destbiavêjê xwezayê. Wê xweza, wê were kifşkirin. Wê çawa wê ji wê, wê sûd wê were girtin, wê ew were pêşxistin. Jîyane civakî, wê bi wê re wê, bi demê re wê, di çerçoveya pêşxistina hevbeşîyên xwe yên civatî re wê temenê jîyane xwe ya civakî wê biafirênê. Her wusa, rewşên jîyanî û naskirina wan û pêşxistina wan, wê bibê. Bi wê re wê mirov, wê amûrên xwe yên destî ku ew wan bikardihênê di jîyane xwe ya rojane de wê wan pêşbixê. Hin bi hin wê zerikên avê, sênîkên ku wê di wan de wê xwarinê bixwûn, kevçîyên xwarinê, cêrên avê, sevil û hwd wê werina çêkirin. Î ro jî ku em li herêmên kurdistanê digerihin, wê gelek nîşanakên wê yên

ku ew ji bin axê dihên derxistin û bi wê re jî nîşanakên wê yên ku ew hê di nava xalkê de dijîn, mirov wê rastî wan werê.

Di rewşa jîyane civakî de wê, bi vê rengê wê di awayekî pirr alî de wê mirov, wê li gorî pêwîstî û pêdîvîyên xwe yên jîyanî wê kifşkirina wê bike. Wê amûrên xwe parastinê wê pêşbixê. Amûrên weke yên ku ew di wan xwe xwarinê bixwê û ankû bi wan xwarinê bixwê wê pêşbixê.Bi wê re jî wê amûrên çandinîyê ên weke´gesn´ û hwd,wê ew wê werina pêşxistin.

Di rewşa jîyane komî de wê, bi demê re wê gelek rewş û tişt wê pêşbikevin. Ev jî wê, bi wê re wê weke rewş û tiştên ku wê bi wan re wê were jîyankirin bê. Serdemên civakî ên berî demên şariştanîyê ku mirov, li wan dinerî û bi wan re dihizirê, ya ku mirov wê kifş dike, wê pêşî wê çawa wê mirov dabare xwe bike û wê çawa bijî, wê li wê bihizirê. Wê li ser wê re wê pêşxistinan wê di jîyane xwe de wê bike. Bi wê re jî wê jîyane xwe wê pêşbixê. Jîyane civakî, wê bi wê re wê li ser wan pêşxistina re wê fêrbûn wê pêşbikeve. Biqasî zanîn û fêrbûna ku ew tişt bi wê re dihên pêşxistin û bikarhanîn, wê wilqasî jî wê zanîna ku mirov bi wê re dikarê têkiliyê bi hevdû re dênê wê pêşbikeve. Rewşên têkiliyê, salixkirinên wan weke li ser ziman û hwd re wê pêşbikevin. Ziman, wê rewşeka têkiliya civakî a hebûnî bê. Ziman, wê ji aliyekî din ve jî wê rengê wê bi aqil bê.

Em ku bahse civakê bikin û bi wê re bahse pêşketina wê bikin, em divê ku em bi wê re bahse zanînê bikin. Civak û *zanîn*, wê weke aliyekî ku wê bi hevdû re wê di çerçoveyek ahengî de wê pêşbikevin bin. Di rewşa jîyanê, salixkirinên wê û hwd de wê, di vê çerçoveyê de wê, ev were dîtin. Em dema ku rewşa civakê dikin ku wê werênina li ser ziman, em li ser têgîna gotina zanînê re wê têkiliyê bi wê re li jîyanê didênin. Ev jî wê, bi wê re wê di çerçoveyek fahmkirinî de wê temenê fahmkirinê wê biafirênê. Di rewşa civakê çendî ku wê, têgîn û wateya gotina zanînê wê bi wate bê? Li vir, em di vê çerçoveyê de wê jî werênina li ser ziman ku wê li ser gotina *zanînê* re wê rewşa civakê wê xwediyê rengekî pêşketinî bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê civak, di destpêka xwe de wê bi aqilê xwe re wê pêşketinên wê di jîyane xwe de wê pêşbikevin.

Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê rewşa civakê, wê li ser jîyanê re wê bi zanînê re wê pêşbikeve. Têkiliya nava civakê û zanînê, wê di serdemên destpêkê de wê, dema ku mirov bidest hizirkirinê dike, wê bi hişmendî, tefsîran û hwd re wê pêşdikeve wê were dîtin. Ev jî wê, di jîyane wî de wê, temenê pêşketina jîyane mirov a civakî bin. Di pêvajoyên jîyane civakî a berî jîyane şariştanî de wê, têgîna zanînê wê weke têgîneka hişmendîya civakî wê bi wate bê. Di vê çerçoveyê de wê civak û zanîn, wê hevdû bi wate bike. Di dema pêvajoyên şariştanîyê ku wê piştre wê pêşbikevin de wê, têgîna zanîn û civakê wê weke ku wê ew li bin wê bimênin. Her çend ku wê dem bi dem wê bahse zanîn û civakê wê bi hevdû re wê were kirin jî lê wê, wateya ku wê di pêvajoyên pêşketina demên şariştanîyê de ku wê li van gotinan wê were kirin jî wê, ji ya demên berî şariştanîyê ên bi jîyane civakî û pêşketina wê ya bi zanînê re ku ew dibê, wê cudatir bê. Di dema pêşketina pêvajoyên şariştanîyê de wê, gotina civakê wê bi şêwayna wê were gûharandin. Wê têgîna civake xwezayî wê di wê gotina civake dema pêvajoyên şariştanîyê de wê nebê. Wê di wê çerçoveyê de wê cihê gotina ´zanînê´ bixwe jî wê di wê de nebê. Li şûna gotina civakê wê gotina ´şariştanîyê´ bi awayekî ku mirov dikarê zorê de ku wê salixbike wê were bi wateya wê re wê were bikarhanîn. Di vê çerçoveyê de wê gotina şariştanîyê wê weke ku wê wateya gotina civakê wê li wê were kirin û wê ew were bikarhanîn. Bi wê re jî wê gotina zaninê jî wê, bi heman rengî wê di dema pêvajoyên şariştanîyê de wê ne gotina zanînê bê. Wê di dema civakê û pêşketina wê ya di jîyanê de jî wê, gotina zanînê wê hebê. Di dema pêvajoyên şariştanîyê de jî wê, gotina *´zanistê´* wê li şûna gotina *´zanînê*(*)´ wê pêşbikeve. Ya ku wê temenê gotina şariştanîyê û pêvajoyên wê yên pêşketinê jî wê bibê jî wê, di vê çerçoveyê de wê gotina zanistê´ bê pêşketina zanistan, wê bi awayekî, di aslê xwe de wê, di şêwayekî de wê rewşa cihê gotina zanînê a civakî wê dagir bike û wê hebûna civakê wê bike bin sehêta xwe de. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa pêvajoyên şariştanîyê wê li ser têgîn û pêşveçûnên zanistî re wê bi rê ve wê bimeşê.

Li vir, heta ku mirov wê rewşa pêvajoyên zanistê wan baş fahm nekê, mirov wê rastîya pêşketina şariştanîyê jî wê baş fahm nekê. Bi wê re jî heta ku mirov rewşa pêşketina civakê jî fahm nekê, mirov wê zaninê jî wê baş fahm nekê. Têgîna zanistê, wê di pêvajoyên şariştanîyê de wê, yan di rengê gotina ´bîrdozîyê´ de bê û yan jî wê di xizmeta têgîneka bi vî rengê de bê. Kengî zanîn derket asta zanistê, bi zanistî pêşxistin çêkir û afirandin pêşxist û pê de wê, di vê çerçoveyê de wê weke hêzek serdestî a li ser

serê civakê bê. Di aslê xwe de wê, di vê çerçoveyê de wê li ser rewşa têgînên weke yên desthilatdarîyê û hwd re wê, pirsgirêka têgîna şariştanîyê wê di fahmkirina têgîna civakê û zanîna wê de bê. Ev yek, wê bi dîrokê re jî wê xwe bi awayekî vekirî wê bide nîşandin. Dema ku mirov dîrokê dixwênê, her wusa mirov vê yekê baştirin dibînê. Her wusa, dema ku desthilatdarîyek, di çerçoveya desthilatdarîya xwe, serdestî û serwerîya wê de wê, bixwezê ku ew civakê bigûharînê û ankû dîzayn bike, hebûna wê herê bike û ankû tûna bihasibênê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê pirsgirêka civakê a di her dem û pêvajoyên şariştanîyê de ku ew wê dijîn jî wê xwe bide nîşandin û fahmkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê bi awayekî baş wê fahm bike û wê werênê li ser ziman ku wê rewşa civakê û weke têgînî civaketîyê, wê weke rewşek mejûyî a bi dîrokê re bê. Her wusa, li vir, dema ku

--------

(*)Gotina zaninê wê ji dema hûrîyan bê. Gelek nivîsên ji wan deman mana de jî wê bi rengê "za-an-ni-in" wê di wan de wê cih bigirê. Di nivîsên weke ji marî hatina dîtin ên weke bi navê ´hurian and hurian language in the mari tekst´ de wê, were ser ziman. Wekî din wê Creg Melchert wê di lêkolîna xwe ya bi navê “Cunneiform Luvian Lexicon” de jî wê ji bineterên nivîskî ên wê demê kifşbikê û bênê ser ziman.

mirov civakê, weke kirde û nirxa şariştanîyê wê şîrove bike, wê demê wê ya kifşkar wê ew bê. Lê dema ku civak, ne weke kirde û nirxa sereka ew hat şîrovekirin, têgînek ku ew bi navê netewîtîyê bê, welatîtîyê bê, desthilatdarîyê û hwd bê, wê hingî wê civak weke rewşek duyem a ku ew divê ku ew were sehêtkirin wê li wê were nerîn. Kî rengê ku ew bi wê rengê li wê hatîya nerîn jî ew a.

Rewşa pêvajoyên şariştanîyê, divê ku mirov wê di vê çerçoveyê de wê başî fahm bike. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê civak,wê weke nirxek û kirdeyek serekeyî bê.Piştî ku felsefe pêşket û pê de wê, her wua, wê di çerçoveyên têgînên desthilatdarî ên bi serdestî de wê nerîn û bibin.Bi demê re pêşketina kolederîyê bindestîyê, rewşa serdemên navîn ên faodalîyê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê di encama wê de wê pêşbikeve.

Pêvajoyên jîyane civakî, wê ji serdemên civake neolîtîkê û pêşveçûnên wê ve wê destpê bikê. Di aslê xwe de mirov, dikarê serdema civakî a neolîtîkî, weke serdemek destpêkî a ji pêvajoyên pêşketina jîyane civakî re wê werênê li ser ziman. Her wusa, têkiliya civakê, wê di vê çerçoveyê de wê bi hewirdora wê re wê çawa bê û wê çawa pêşbikeve û ankû wê pêvajoyek pêşketinê a çawa de bê, wê di vê çerçoveyê de wê were dîtin. Em dema ku van pêvajoyên civakî wan dikin ku wan fahm bikin, li vir ya ku ew dihê dîtin jî wê ew bê ku wê serdemên neolîtîkê, weke ku ew ji aliyê gelek dîrokzan û şîrovevanan ve jî dihê hanîn li ser ziman wê weke *şoreşeka* jîyane civakî bê.

Têgîn û gotina ***şoreşa neolîtîkê*** a civakî, ku mirov wê bikê ku wê fahm bike, mirov divê ku wê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê pêşî serdemên pêşveçûnî ên bi jîyane komî û pêvajoyên bingihînî ên civakî ku wê destpêka wan pêşbikeve ên weke serdemên peleolîtîkê û mezolîtîkê, divê ku wan jî wan baş fahm bikê. Ku em serdema neolîtîkê di çerçoveya jîyane civakî de wê weke şoreşekî wê herê bikin, em divê ku van serdemên ku temenê wê şoreşê dana çêkirin, wan ji hemû aliyên wan ve wan fahm bikin û wan hildina li dest.

Em li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman, li vir serdema peleolîtîkê, wê destpêka pêvajoyên civakî, wê bi awayekî seretayî wê di demên wê ên dawî de wê pêşketina wan bibê. Ji xwe, ya ku wê di çerçoveya bûhûrîna li dema mezolîtîkê de wê, temenê wê biafirênê jî wê, ev rastî bê. Dema ku em rewş û wateya bûhûrîna ji dema peleolîtîkê li dema mezolîtîkê baş fahm nekin bi sedemên wê re wê, hingî ew rewşa pêşveçûnî a mejûyî a demên neolîtîkê jî wê baş newina fahmkirin. Di awayekî de em, divê ku em pêvajoyên jîyane neolîtîkê û yên mezolîtîkê, di zikhevdû de û bi hevdû re di dewama hevdû de wan hildina li dest. Ev yek jî wê bi wê re wê rast bê ku ew were kirin. Bi teybetî pêvajoyên pêşveçûn jîyane civakî, di aslê xwe de wê, li herêmên ber firatê, wê ji ya ku em dizanin ku wê kevtir wê herê. Di vê çerçoveyê de wê, li herêmên kurdistanê ên ber diclê û firatê bi lêkolînên erkolojikî re wê nîşanak û birhanên weke bermehî û hwd, ku ew derdikevina li holê, vê dîroka ku em î ro wê weke ya neolîtîkê û hwd, ji dora *deh hezaran salan* û hwd didina destpêkirin, wê kevntir dibê. Her wusa, nîşanakên weke di kolanên li xirabreşkê û hwd de ku ew, li bakûrê kurdistanê ku ew derketina li holê de wê, rewşên weke yên bawergehî ku ew li dora *duwanzdeh hezar salan* ew hatina avakirin wê bên dîtin. Ev jî wê, rewşa têgîna civakî wê bi xwe re wê kevntir wê bibin. Li vir, em rewşa bi dîrokkirina rewşa dema neolîtîkê a civakî weke li dora deh hezaran salan ku em wê herê bikin, wê demê em divê ku em li gorî van kifşkirina û hwd, em destpêkên civakî ji serdema mezolîtîkê derbas bikin û heta dema dawî a serdema peleolîtîkê jî

wê bibin. Di vê rewşê de wê serdemên dawî ên serdema peleolîtîkê wê, weke demna ku wê di wan de wê pêvajoyên pêşveçûnên civakî bi kifşkirin, pêşketin û pêxistinên wan ên bi aqil re wê werina li ser ziman. Rewşa dema dawî a serdema peleolîtîkê wê, di vê çerçoveyê de wê weke serdemeka ku wê di mejiyê mirov de wê bi têgîn û rewşên jîyane komî re wê xiyalkirina me wê pirr zêde wê bi afrîner bê. Em dema ku bi mejiyê xwe re em, li vê demê de dihizirin em, di awayekî afrîner de wê dihzirin. Li vir, em vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, ev dema dawî a serdema peleolîtîkê wê, di xiyale mirov de wê, weke demeka ku wê hertimî wê hizrên bi vê rengê wê bi me bide afirandin bê. Kifşkirin, bermehî û rewşên jîyanî ên ji vê demê ku ew hatina kifşkirin, wê di vê çerçoveyê de wê rengê xiyalkirina mejiyê mirov a li wê demê wê xorttir bike. Wê di vê çerçoveyê de wê ji rewşekê zêdetir bi hizir wê derxê li pêş. Pêşveçûnên dema dawî a serdema peleolîtîkê, wê hertimî wê di dewama hevdû de wê pêşveçûnên demên mezolîtîkê, neolîtîkê û pêvajoyên piştre ên demên şariştanîyê û hwd, wê karibê cihê wan ên di demê de bide gûharandin.

Pêvajoyên destpêkê ên dema civakê, ku em li wan dihizirin bi dema neolîtîkê re em, bi rengê pêşketina wê re wê, dibînin ku wê kevntir wê herê. Her wusa, rewşa dema mezolîtîkê ku wê weke demek bûhûrîner bê, wê di vê çerçoveyê de wê ew wê têgînê bide me ku wê dema mezolîtîkê, wê weke şoreşek destpêkî wê hildina li dest di pêvajoyên pêşketina jîyane civakî û destpêka wê de. Pêvajoyên jîyane civakê, wê di serdema neolîtîkê de wê bigihijina wê astê ku ew di wê demê de wê amûrên xwe yên jîyanî wê pêşbixin û wê bijîn. Wê çandinîyê pêşbixin. Wê kedîkirin û ahlkirina sawalan wê pêşbixin û wê bi wê re wê temenê pêşketina malbatan bi hebûna kerîyên sawalan re ku ew xwedî na û ku ew li ser wan re ew dabara xwe ya malbatî dikin wê pêşbikeve. Ev pêvajoyên civakî ên serdema neolîtîkê, wê di vê çerçoveyê de wê rengekî pêşketina bi jîyane civakî a mirovî re wê bidina nîşandin. Pêvajo û ankû dema berî wê, a dema mezolîtîkê, wê ev pêvajo wê, temenê wan wê were avêtin di nava jîyane xwezayê de. Wê bi wê re wê serdema mezolîtîkê, wê di vê çerçoveyê de wê weke serdemeka ku wê dema ku mirov ji rwşa dunya zindîyan û ankû sawalan qût dibê û ew dikeve xate pêşketina jîyane weke mirovî de wê, hingî ew di wê çerçoveyê de wê çawa bijî, wê di vê çerçoveyê de wê bersivên wê di nava jîyane xwezayê de wê li wê were lêgerîn. Ev jî wê, destpêka wê di dema dawî a serdema peleolîtîkê û dema mezolîtîkê de wê, bibê bê.

Di vê çerçoveyê de em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê dema mezolîtîkê wê, weke demeka ku wê di wê de wê, di vê çerçoveyê de wê mirovê demê wê bikeve pêvajoya xwe naskirinê de. Wê hebûna xwe nas bike. Wê rewşa xwe wê nas bike. Wê jîyanê û xwezayê nas bike. Wê zindîyan weke sawalan wê ahl û kedî bike. Wê kerîyên sawalan wê ji xwe re wê bigirê. Li ser wê re jî wê, rewşa xwe ya jîyanî wê pêşbixê. Wê di vê demê de wê di mejî de wê girtin wê bibê. Wê pêşbikeve. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê di rewşekê de wê rewşa aqilê mirov wê xwediyê rewşeka ku ew bi wê pêş dikeve bê. Di vê demê de wê hîskirina li hevdû wê pêşbikeve. Lê ji wê zêdetirî wê di dema mezolîtîkê de wê hîskirina mirov wê ne tenê li hevdû wê pêşbikeve. Wê li tiştan, rewşan û zindîyan jî wê pêşbikeve. Ev rengê hîskirinê, wê hêstên pirr ji hev cuda wê di wê de wê hebin. Hêstên weke yên tirsê û hwd wê hebin. Minaq, di pêvajoya pêşketina hişê mirov de wê, mejiyê mirov wê tişta wê bi hebûna wan re wê bibînê. Lê wê nizanibê ku ew tişt çi ya û çawa ya. Wê hewl bide ku wê fahmbike. Wê nexwezê ku ew ji wê qût bibê. Têgîna fetîşîsmê a ku wê bi totem û anamismê re wê pêşbikeve wê di vê çerçoveyê de wê pêşbikeve wê girêdanîya mirov li tiştan, rewşan û hwd wê bide pêşxistin. Têgîna girêdanîyê, wê di çerçoveya rewşa fîzîkî û ankû fîzyolojîkî, bîolojikî û genetîkî ve jî wê temenê wê bi pêvajoyên pêşketina rewşa mirovî re wê hebê. Em divê ku rewşa têgîna girêdanîyê di vê çerçoveyê de wê bi rewşên fîzyolojikî, bîolojikî û genetîkî û hwd re wê hildina li dest. Ev rewşên weke rewşên girêdanîya mirova a bi rewş, tişt û hwd ve ku ew pêş dikeve, wê her wusa, wê di çerçoveya têgîna alimînê, fêrbûnê û hwd de wê, di temenê bicihbûna mirov û her wusa bûna xwedî cih de jî wê hebê. Mirov, wê têgîna cihê ku ew li wê bicih dibê û wê ji xwe re wê bike war û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê rewşên weke yên fîzyolojikî, bîolojikî û genetîkî û hwd wê di temenê wê de wê hebin. Mirov wê li ser wan re wê, van rewşên jîyanî wê bi xwe re wê pêşbixê. Di vê çerçoveyê de wê dema ku wê, ev rewşên bicihbûnê wê pêşbikevin, wê bi wê re wê rewşna jîyanî wê pêşbikevin. Mirov bicihê ku ew li wê dijî re wê di vê çerçoveyê di ji aliyên weke fîzyolojikî, bîolojikî û genetîkî û hwd ve wê ji du aliyan ve wê were girêdan. Aliyek, bi pêvajoyên jîyankirinê ên demdirêj re ya. Aliyê din jî wê li ser rewşa afrînerîya fîzyolojikî, bîolojikî û genetîkî û hwd re ku wê xwe di rewşa fîzîka mirovî de wê di laş û mejî de wê bide pêşxistin bi pêvajoyên pêşketinê re bê.

Rewşa jîyane mirov û pêşketina wê ya di cihê xwe de wê, di vê çerçoveyê de wê ji gelek aliyên fîzyolojikî ve wê temenê wê hebê. Em dema ku wê bi temenê wê ve wê hildina li dest divê ku em wê, di serî de wê ji temen ve bi van aliyên wê ve wê hildina li dest. Li kurdistanê, ev pêvajoyên pêşketina jîyane civakî, wê dîroka wan heta serdemên peleolîtîkê, mezolîtîkê û neolîtîkê wê herin. Em nikarin, rewşa pêşveçûnên li kurdistanê, di çerçoveyek tang de wan, hildina li dest. Bi teybetîya wê ya ardnîgarî û xosletên pêşketinê re wê hildina li dest.

Di vê çerçoveyê û rewşê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê li kurdistanê wê pêvajoyên jîyanî ên ku ew afirîna, wê ji yên herêmên din ên dunyayê ku ew pêşketina wê kevntir bê. Her wusa, wê rewşa wê ya xwezayî jî wê li ser xwe re wê pêvajoyên pêşketinê û peresendinê wê ji aliyê jeolojîkî, fîzyolojikî û hwd ve wê li ser wê re wê derbas bibin. Ya ku wê di rewşa ardnîgarîyê, şînahîyên wê de û hwd wê pirr zêde wê têrbûnekê wê bi dewlemendî wê bide çêkirin jî wê di aslê xwe de wê ev bê.

Rewşa ardnîgarîya herêmê, wê weke wê xwediyê rewşek wusa bê ku ew wê pêvajoyên peresendinê ên demdirêj wê li ser xwe re wê derbaskirina. Rewşa pêşveçûnên darîstanî û hwd, wê destpêka wan wê, heta serdemên destpêka peleolîtîkê û hinekî wirdetir ne demên şenozoyîkê jî wê herê. Piştî feleketên xwezayî ku wê pêvajoyên xwezayî wê nûka wê destpê bikin ji vê demê û pê ve wê, li vê herêmê wê di van deman de wê, piştre wê zûtirînî wê derfeta jîyane li ser ardê û ankû axê jîyanbûn wê pêşbikeve. Bi vê re mirov, dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê zûtirîn wê, derfetên jîyanê bi vebûna qadên jîyanê li herêmê re wê pêşbikevin.

Piştre jî wê, li herêmê wê di wê xatê de wê pêşveçûnên zindîyî û nezîndîyî weke nebat û ankû şînahîyan û hwd wê bibê. Bi demê re wê di demên pirr zû de wê daristan wê pêşbikevin. Li ser wan rewşên darîstanî re wê pêvajoyên demdirêj wê werina derbaskirin. Piştre jî wê, li herêmê ajal û sawal, bi kerîyan wê biafirin û wê pêşbikevin. Li herêmê rewşa jîyane û derfetên jîyanî wê di vê çerçoveyê de wê zûtirîn wê pêşbikevin. Ev herêm, wê di xatekê de wê di ahenge herêmên afrîqa û hwd ve wê temenê jîyanê wê pêşbikevin. Mirovê weke homo sapîens ku wê ji afrîqa û hwd wê were herêmê û wê li herêmê wê belav bibê jî wê, di temenê wê de wê ev rewşên weke derfetên jîyanî ên ku ew pêşketiyîna bin. Bi demê re wê ji dema homo habilîs û heta homo erectus û piştre jî heta dema homo sapîens û pêvajoyên homo sapîens *sapîens*, wê di pêvajoyekê de wê zûtirîn wê gûharîn wê di ardê de wê bibin. Wê kaş û çîyayên qaşayê wê zûtirîn wê bi halihin. Wê dem, wê ji dema serdema cemedê a **Pleistosen**´ê û pê de wê zûtirîn wê gûharên di wan de wê bi gûharînên di birehê de wê, di ahengekê de wê bibin. Wê her wusa wê halîna qaşayê wê zûtirîn wê bibê. Li gorî dema homo habilîs wê dema homo erectus, ku wê dema cûreyên weke homo ergasterîn wê di nava wan de wê hebê, wê zêdetirî wê xwedîyê qadên jîyanê ku ew bi halihêna kaş û çîyayên qaşayê re ew afirîna wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê belavbûna zêde a homo erectus, wê di vê çerçoveyê de wê bi şert û mercên dema wî ve wê girêdayî bê. Piştî wî re wê dem bi dem wê ev gûharîn, wê bibin û wê qadên ku wê derfetên jîyanê li wan hena wê zêdetir bibin. Heta ku wê dem wê werê dema homo sapîens, neandertal, mirovê şanîdarê û hwd, wê pirranîya qadên ku ew di bin kaş û çîyayên qaşayê de na, wê bihalîna wan re wê li wan derfetên jîyanê wê bibê. Sedemek ji wan sedemên herîkîna homo sapîens, bi van herêmên ber diclê û firatê ve wê, ew bê ku wê, bi halîna kaş û çîyayên qaşayê re wê gelek herêmên ku ew li wan dijî, wê di bin avê û bahrên avê ku ew diafirin de wê bimênê. Bo vê yekê wê bi giştî wê ji herêmên weke rojhilatê afrîqa û hwd ve wê, li ser herêmên weke cezayîrê, lîbya û hwd ve wê bi ber herêmên mezopotamîya û ankû kurdistanê ve wê biherikin û wê werin. Bi carekê re wê ew hatina mirovê demê homo sapîens ku wê gelek antropolog wê ew wê, weke *´dagirkirinekê´* ji aliyê homo sapîens ve jî wê bi nav bikin, wê di aslê xwe de wê di temenê wê de wê ev rewş wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê werê herêmê. Li herêmê, qadên ku ew derfetên jîyanê di berehîya giştîya herêmê Asya de wê zêdetirî wê hebin. Gelek herêmên li dora hîndistanê ku ew î ro dibin deryaya wê de na, wê di vê çerçoveyê de wê ew jî wê weke herêmna ku wê li wan derfetê jîyanê wê hebê bê. Lê bi halîna çîyayên qaşayê û bilindbûna avê re wê dibin avê de wê bimênin.

Dema ku mirov pêvajoyên jîyane civakê wan bikin ku em wan werênina li ser ziman, em divê ku wê jî, di serî de wê werênina li ser ziman ku ew ew pêvajoyên destpêkê, rengê pêşketina wan wê pirr zêde wê giring bê. Wê di vê çerçoveyê de wê, di pêvajoyên ku wê temenê jîyane mirovê hemdem homo sapîens sapîens ku wê biafirê û bi wê re wê di dewama wê de wê temenê jîyane mirovê homonîd ê ku ew dikarê amûran çê bike û biafirênê ku wê pêşbikeve, wê di vê çerçoveyê de wê, rengê pêşketina jîyanê ku wê di

dewama wê de pêşbikeve, wê bi xwe re wê werênê li ser ziman. Pêvajoyên serdemên peleolîtîkê û bi teybetî ên dema dawî a serdema peleolîtîkê, ji vê aliyê ve wê pirr zêde wê watedar bin. Em divê ku van deman baş fahm bikin. Di aslê xwe de wê, wê ev dem, di rewşa fahmkirina xate pêşketina civakê a piştre wê pirr zêde wê giringîyeka wan hebê. Dawî lê hatina serdema dawî a qaşayê, wê bi xwe re wê derfetên jîyane komî wê zêdetirî wê di nava xwezaye wê de wê pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de serdemên dawî ên peleolîtîkê, wê weke serdemna giring bin. Her wusa dema dawî a serdema peleolîtîkê, wê di wê de wê, rewşa jîyane komî biqasî ku mirov têdigihê, wê bigihijê atek pêşketî jî. Mirov, di serî de vê yekê wê fahm dike. Di vê çerçoveyê de wê bi demê re wê du sedem, wê dawiyê li li serdema peleolîtîkê wê werênin û wê dema mezolîtîkê bidina destpêkirin. Yek, şert û mercên hewayê û gûharînên di wê de na. Ku ew gûharin bi xwe re wê, xwezayeka bi pirr zindiyî û cûreyî a zindîyan wê, bi xwe re wê biafirênê bê. Wê daristan wê pêşbikevin. Wê bi wê re wê, rewşek jîyanî a teybet wê derkeve li holê bê. Bi vê re jî ew, gûharînên ku ew dibin, wê bi xwe re wê, gelek gûharînan di ardnîgarîyê û bi teybetî jî di rewşa şînahîyan de jî wê werênê. Wê peresendinê li ser rewşa fîzyolojîkî, bîolojikî û genetîkî a şînahîyan jî wê bi xwe re wê werênê li holê. Ji xwe, bi ya mirovan re wê, di wê demê de jî wê, ew bibê. Piştî ku mirovan di jîyane xwe de bidest bikarhanîna çêkirina xwarinê li ser êgir kir û û hwd, wê êdî wê ji wê demê û pê de wê, gûharînên mazin wê di fîzyolojîya mirov de wê bidê çêkirin.

Her wusa di dewama wê de jî wê sedema duyem a dawî lê hanîna wê serdemê wê, di pêşketinên bi vî rengî ên di nava jîyane komên homînan de bê. Her wusa wê di vê rewşê de wê pêşketina wan, wê di asteka pêşketî de wê were li berçav. Wê rewşa komê, wê hin bi hin wê bi hîskirin, hês û dem bi dem bi qatkên aqilî û hwd re ku wê tevger û xûyên xwe wê bidina dîyarkirin wê pêşketin wê di wê de wê, bibê. Aqilê ku ew bi hişbûyî ku ew pêşket û pê de wê, êdî wê ji wê demê û pê de wê dem bi dem wê mirovê demê wê bidest hizirkirinê wê bike. Ev jî, wê temenê wê bê dayin pêşxistin. Serdema mezolîtîkî ku wê piştî dawî lê hatina ya peleolîtîkê ku wê were û pêşbikeve, wê bi van xosletan wê pêşbikeve. Bi wê re jî wê, hin bi hin rewşên çandiniyê û jîyankirina ne tenê bi nêçîrkirinê re xwe jîyandin wê pêşbikeve. Minaq, wê di serdema mezolîtîkê de wê çendî ku wê mêr wê herê nêçîrê, wê jin jî wê di berhevkirinê de wê pêşbikeve. Berhevkirin jî wê li ser şînahîyan re wê, pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de wê jin, di aslê xwe de wê bê naskerê hewirdora xwe. Wê di rewşa wê naskerîyê de wê jin, wê hin bi hin wê zêdetirî wê derkeve li pêş. Ber ku rewşa naskirina şînahîyan û berhevkirina wan û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşek zanînî a xwezayî ku wê, nêzîkatîya mirov a bi armanca sûdgirtinê a li xwezayê jî wê bide kifşkirin bê.

Di rewşa naskirina cûreyên şînahîya xwezayê de wê ev rewş, wê weke rewşek teybet a ku mirov wê hilde li dest bê. Her wusa, di vê çerçoveyê û demê de mirov vê yekê jî wê bi başî wê kifş dike ku wê, di rewşa naskirina xwezayê de wê, di vê çerçoveyê de wê bi pêşxistina rewşa hewkirin û berhevkirinê re wê jin wê derkeve li pêş. Di awayekî de wê, li gorî vê rewşê wê, ya ku wê were dîtin, wê ew bê ku wê weke ku wê beşbûneka di xabate di jîyanê de a bixwezayî wê pêşbikeve. Mirov jî wê bi wê re wê xwe bide pêşxistin. Bi demê re wê, di vê çerçoveyê de wê di dewama wê de wê rewşên kifşkirina avdanê û bi wê re zêdetirî hilberendina şînîyan û bidestxistina ji wê, wê were kifşkirin. Ev jî wê, rewşên weke çandiniyê û hwd, wê bi demê re wê bi xwe re wê pêşbixê. Çandinî, wê weke rewşeka ku wê hin bi hin wê di dema mezolîtîkê de wê pêşbikeve bê. Di aslê xwe de wê, derfetên wê di serdemên dawî ên peleolîtîkê de wê pêşbikeve. Wê derfeta, naskirin û ahlkirina şînîyan jî wê, di wê demê de wê pêşbikeve. Lê dem heta ku wê were vê dema mezolîtîkê, wê bi pêşxistina wê re wê rewşa wê were pêşxistin.

Serdema mezolîtîkê wê weke serdemeka ku wê di wê de wê rewşa komê û cihê ku wê ew li wê dijî, wê weke bi ber gundîtîyê ve ku ew pêş dikeve wê bibê bê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa gûndîtîyê li ser hin rengên xosletên civaketîyê re wê di vê demê de wê pêşketina xwe re bi rengê xwe re wê bide dîyarkirin.

Di serdema mezolîtîkê de wê, rewşa jîyane komî a serdema peleolîtîkê ku ew pêşketîya û heya, wê bi ast û pîvanna weke ya bi xosletên civakî re ku wê pêşbikeve wê êdî wê pêşbikeve. Her wusa wê rewşa pêşketina wê re wê, ev bibê. Di vê demê de mirov vê yekê jî wê kifş dike ku wê weke ku hinek piç bi piç wê zanîn jî wê pêşbikeve. Di rewşên cihên jîyanî ên weke şikeftan de wê, rewşên weke xîzkirinên wêne û ankû sûretên sawalên ku ew dihên nêçîrkirin û hwd wê werina xîzkirin. Xîzkirin, wê weke rewşek teybet bê. Her wusa ev jî wê, bi demê re wê temenê, hinek têgînên weke tên fetîşîsmîkî jî bê. Di rewşa fetîşkirina tiştan, sawalan, rewşan û hwd de wê, di vê çerçoveyê de wê, weke rewşeka ku wê di vê demê de wê hebê

bê. Lê bi wê re wê, ev rewş, wê weke rewşeka ku wê mejiyê mirov wê kifş dike û wê li wê were hoyandin bê. Di vê çerçoveyê de wê ew hoyandin jî wê bi demê re wê xwe bi awayekî wê bide dîyarkirin.

Di rewşa çêkirina wêne û ankû sûretan de wê ev rewş, wê weke rewşeka jîyane komî a demên navîn û dawîn ên serdema peleolîtîkê bê. Lê di vê demê de wê, bi rengekî têgînî wê pêşbikeve bê. Her wusa, têgînên weke bi afsûnî ji wan bawerkirin û hêvîkirin û hwd, di encama armancên cûr bi cûr de wê pêşbikeve. Her wusa, rewşa pêşxistina ayînan di vê demê de wê di vê çerçoveyê de wê li ser wan rewşên xîzkirî wê di dema mezolîtîkê de wê pêşbikeve bê. Di vê demê de wê, nirxên çanda demên peleolîtîkê wê weke nirxna çandî ên têgînî û bawerî wê xwe di jîyanê de wê bidina dîyarkirin.

Di vê demê de wê têgînên weke afsûnî wê pêşbikevin. Her wusa, wê weke têgînên bi bawerîya li tiştan û her wusa ji wan hêvîkirin û li bendêbûna pêşxistina rewşan û hwd, wê pêşbikeve. Di vê demê de wê, têgîna afsûnî, wê di aslê xwe de wê weke têgîneka hizrî a ku wê pêşbikeve bê. Di nava wê têgîna afsûnê û ankû hizirkirina afsûnî de wê, ev rewş, wê hin bi hin wê xwe bidina dîyarkirin. Wê her wusa, wê bawerkirina bi wan tefsîr û ankû wêne û sûreyên sawalan wê pêşbikeve. Minaq li kurdistanê li gundên qaxizmanê ên weke çamûrîyê û şabanê ku ew li wan heta roja me, nîşanakên ji dema peleolîtîkê û mezolîtîkê wê li wê ew wê werina dîtin. Di hinek şikeftên li dora qaxizmanê de ku wê di wan deman wê weke cihên jîyane komî bûn, wê wêne û ankû sûretên hasp, ker, xezal û hwd, wê nêzî sed cûreyên sawalan ku ew wêne û ankû sûretên wan hatina xîzkirin wê werina dîtin. Heta ku wê, di nava wan wêne û ankû sûretên li hêtên şikeftê de wê wêneyê mirovekî ku ew jî weke sawalan diçêrê wê were dîtin. Ev herêma kurdistanê wê heta roja me jî wê li wê, wê gelek cûreyên sawalan wê li wê bijîn. Wê rewşa jîyane kurdên herêmê wê, weke rewşeka ku ew hertimî bi sawalan re dabara xwe dikin, çandinîyê dikin û şivanî di nava wan de pêşketîya bê.

Bi wê re jî wê weke wê li wê gelek herêmên din wê rewşên weke ya li dora qaxizmanê û li dora xwezaye gundên wê, wê hebin. Bi vê rengê, wê şikeftên ku ew mirov di wan demên peleolîtîkê û mezolîtîkê de mirov, di wan de bi komî dijîn wê hebin. Ji herêmên botanê ên weke cizîr û şirnaxê û heta ku wê bigihêjê êlih, heskîfê û hwd wê ev rewş li gelek deveran wê hebin. Her wusa, ev jî wê nîşanaka wê bin ku wê gelek herêmên van deveran wê weke herêmên ku wê di wan deman de wê bikomî wê li wan bijîn di şikeftan de bin. Em li vir, ji van wêne û sûretên sawalan ên li hêtên şikeftan ku ew hatina çêkirin, wê fahm dikin ku wê bigiştî di demên peleolîtîkê de wê mijara wan xîzkirinan wê hemû jî wê sawal bin. Lê wê piştre wê xîzkirina weke ya mirovan, bergkirina mirovan û hwd, di çerçoveya têgînên afsûnî ên ku ew hatina pêşxistin re wê bên pêşxistin bi xîzkirinan. Di rewşa jîyane komî de wê ev rewş, wê weke rewşna ku mirov dikarê wan bi teybetî hilde li dest bin.

Di rewşa fahmkirina rengê pêşketina aqilê dema cvakên destpêkê weke di dema neolîtîkê û hwd de wê, di vê çerçoveyê de têgînên weke têgînên afsûnî wê di çerçoveya rewşa bawerîya rengê demê de wê xwediyê wateyê bê. Wê di vê çerçoveyê de wê rewşa têgîna afsûnî, wê di çerçoveya rewşa têgîna fîzîkî, destlêdanê û her wusa, bi aqil li ser wê re hizirkirina ku ew dixwezê wê bi reng û awa bike û hwd ve wê, xwediyê wateyekê bê. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê çerçoveya têgîna rengkirin û awakirinê, wê li ser hizir re wê were li ser ziman. Minaq, di roja me de wê, bi têgîna afsûnî re wê weke ku wê were dîtin ku wê dema ku mirov tiştek tefkîrkir û hizirkir û got bile ew bibê! û hwd, wê ew tişt wê bibê. Di vê çerçoveyê de wê têgîna aqilê mirovî wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Li vir, ev rengê hizirkirina bi têgîna afsûnê ê roja me jî wê weke rengekî hizikirina li afsûnê ê pirr zêde ku ew ji jîyanê qût û tenê di temenê wê sawêrî û ankû xiyalkirin û hwd wê hebê. Lê ev rengê hizirkirina bi têgîna afsûnê re wê, weke rengekê hizirkirina afsûnî ê dema pêşketina felsefeyê û hwd bê. Lê berî wê, wê têgîna afsûnê a dema neolîtîkê ku wê weke rengê bawerîya wê û hwd jî bê, wê zêdetirî wê weke têgîneka ku wê ew bi xwezayê haşîûneşîr a. Di vê çerçoveyê de wê zêdetirî ew rewşa heşîrî û neşîrîya têgîna afsûnê a bi xwezayê re wê were dîtin. Di serdemên berê de wê, di vê çerçoveyê de wê di çerçoveya rewşa xwezayê de wê were hizirkirin. Minaq, dema ku mirov, ji tiştekî bi bandûr bû û pê de wê ew tişt, wê weke tiştekî ku mirov wê dikarê di vê çerçoveyê de wê hilde li dest bê. Di rewşa fahmkirina têgîna afsûnê de wê ev rewş wê xwe bide dîyarkirin.

Li vir, rewşa hizirkirina bi afsûnî, wê weke têgînekê wê were li ser ziman. Lê bi wê re em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê têgîna afsûnê, weke ku em di rengê hanîna wê ya li ser ziman a di

demên pêvajoyên şariştanîyê de wê bi hizirkirina mirov re wê têgîna pêşketina xwestek û weke rengê xwestekên mirov bûyîna wê, wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê têgîna afsûnê wê xwediyê wateykê bê.

Di nava civake kurd de wê têgîna afsûnê wê weke ku me di roja me de jî wê dibînin wê bi rewşek xwezayî re wê were hildan li dest. Her wusa, wê çendî ku wê weke têgînek serxwezayî jî wê were hanîn li ser ziman, lê dîsa wê ne zêde wê weke têgîneka serxwezayî wê were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê di rewşekê de wê werênina li ser ziman. Ev jî wê di çerçoveya pêvajoyên peresendina wê têgînê di nava civakê de û bi pêşketinên wê yên bi jîyane civakî re wê bibê.

Di serdemên civake neolîtîkê de wê li kurdistanê, wê zêdetirî wê ew têgîna afsûnê wê li pêş bê. Her wusa, wê di rewşa têgîna afsûnîya destpêkê a berî jîyane civakî a dema şariştanîyê de wê bi xwezayê re wê kifşkirin wê hebê. Di dewama wê de kifşkirina têgîna darêjkên afsûnî ku ew bo başkirin û dayîna şifadayînê û hwd re wê pêşbikeve. Lê bi pêşketina pêvajoyên şariştanîyê re wê, weke ku mirov di rewşa pêşketina têgîn û rewşên mîtolojikî û hwd wê kifş dike, wê bi tememî wê li ser têgîneka aqilî ku ew ji jîyanê qût re wê pêşbikeve. Têgîna afsûnê wê weke têgîneka ku ew rengekî hêzî dide û ankû rengekî hêzê ya wê, di destê mirov de wê di çerçoveya bihêzkirin û ankû bi hêzbûna mirov li ber hevdû wê bide dîyarkirin. Pêvajoyên şariştanîyê, wê hemû wê weke pêvajoyên şerkirina têgînên desthilatdarî ên bi civakê re bin. Di vê çerçoveyê de wê çawa wê xwe bidina serdestkirin, wê di vê çerçoveyê de wê di demên destpêkê de wê weke ku mirov bi têgîna afsûnê re wê dibînê wê, afsûnê bo xwe serdestkirinê wê bikarbênin. Ev wê xwe bide biriqandin li pêşveçûnên têgînî û mîtolojikî jî. Di roja me de wê, ew rewşa ku wê ew bikarhanîna têgîna afsûnê di pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê de bo xwe kirina serdest de wê, di demên felsefeyê û piştre ên zanînê de wê zanistên ku ew pêşdikevin û ankû ew dihên pêşxistin wê kar û erkûberpirsîyarîyê wê hildina li dest milê xwe. Di vê çerçoveyê de di roja me de wê, zanist, wê di şêwayekê de wê di xizmeta desthilatdarîyan de bê ku ew wê çawa li ser serê civakê wê baştirîn wê karibin xwe bi serdestî wê pêşbixin û bidina domandin bê. Zanist, di vê çerçoveyê de wê weke amûrekî serwerîyê û ku ew dihê xistin xizmeta wê pêşxistina serwerîyê de bê. Di vê çerçoveyê de wê ew rewşa zanistê wê di dema pêvajoyên pêşketî ên şariştanîyê de wê xwediyê wateyê bê.

Di serdemên destpêkê ên civakî de wê di vê çerçoveyê de wê têgîna afsûnê ku ew di leyizê wê piştre wê di serdemên şariştanîyê ên piştre de wê zanist û ankû zanyarî wê bileyizê. Di vê çerçoveyê de wê rewşek wê ya teybet wê hebê. Ji xwe wê, zanist û ankû zanyarîya roja me wê, ji nava wê pêvajoyên pêşketina afsûnê û hwd wê derkevin bin. Di pêvajoyên destpêkê de wê têgînêna afsûnê wê, wê bi rê û rêbazên dewlemend û cûr bi cûr wê pêşketina xwe wê bide jîyankirin. Herwusa wê di vê çerçoveyê de wê ew pêşketina wê, wê xwediyê rengekî pêşketinî a bi jîyane civakê re bê. Wê gav bi gav, wê bi pêşketina rewşên xwezayî re wê ev rewş wê xwediyê rewşek û têgînek heyînî a ku mirov wê hilde li dest bê. Di nava xwezayê de wê gihiştina têgîna xwezayê û rewşek sûdgirtina ji xwezayê jî wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê wateyê bê. Minaq, di rewşa kifşkirina çandiniyê de wê dema ku wê genim û hwd wê biçênin, wê pêşî û piştî çandin ku ew pêkhat û pê de wê berg û dûa bikin ku ew zadê xwe zêde û baş ji ardê hilênin. Piştî ku wê dema palayîyê wê were, wê hingî wê zadê xwe wê baş û zêde wê ji ardê wê hilênin. Wê ew jî wê hingî wê bawer bikin ku ew berg û ankû dûayên wan qabûl bûna. Wê wusa bawer bikin.

Di pêvajoyên jîyane civakî ên dema neolîtîkê de wê ev rewş, wê zêdetirî wê xwe bidina dîyarkirin. Her wusa, wê di vê demê de wê serdemna civakî ên bi vî rengî wê bi xwezayê re wê werina derbaskirin. Pêvajoya dema mezolîtîkê ku em dikarin wê ji gelek aliyên bi pêşketina wê re wê weke neolîtîka jêrîn jî wê werênina li ser ziman wê di vê çerçoveyê de wê weke pêvajoyeka ku wê di wê de wê kifşkirinên bi vî rengî wê werina kirin bin. Her wusa, wê kifşkirinên weke çandinîyê û hwd, wê werina pêşxistin. Hê di demên peleolîtîkê de wê mirov wê şînahîyan wê kifş bike. Di wan deman de wê ew ku ew derdikeve nêçîrê û ew dibînê ku ew sawal wan şînahîyên weke geya ew dixweê, ew jî wê weke sawalan wê biçêrê û wê wan şînahîyan wê bixwê. Wê bigihêjê têj û tahma wan. Pişte jî wê bi demê re wê, ew jî wê bina weke tiştna xwarinî ên mirov. Di vê demê de wê mirov, wê dema ku ew kifş dike ku ew wan şînahîyan dixwê û bi wan têr dibê û zikê wî zû wan dimihênê û weke goşt hewceyî zêde cûtinê jî nakê, wê ev rewş, wê zêdetirî wê piştre wê di jîyane mirov de wê çih bigirin. Piştî ku wê mirov kifş bike ku wê li ser êgir wê bidest pijandina goşt û hwd bike û wê bixwê, wê bi wê re wê, ev rewş jî wê weke rewşeka ku wê, temenê gûharînên mazin bê bi mirov re.

Piştî demên peleolîtîkê ku wê dem tê dema mezolîtîkê wê mirov, li wê çêkirina goşt û ankû tiştên din li ser êgir, wê gelek rewşên nû wê bi pêşxistina wan re wê li wê zêde bike. Di vê çerçoveyê de wê dema ku ew dihê dema neolîtîkê de wê ev rewş, wê hinekî wê nêvî bi nêvî wê bi sazûmanî wê werina pêşxistin.

Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa çêkirina xwarinê wê, hê di dema mezolîtîkê de wê bi hin bi hin rewşa berhevkirinê re wê pêşbikeve. Di vê demê de wê rewş, kes û tiştên ku ew ji wan re berg dihê girtin wê di destê wan de wê berhevkirin wê hin bi hin wê zêde pêşbikeve. Wê boraq û ankû weke korbanî wê tişt werina dayîn li wê. Di vê çerçoveyê de wê ev tişt jî wê, di vê çerçoveyê de wê bi armancekê wê werina kirin. Ew armanc jî wê bi armanca ku ew ji rewş û tiştên xirab were parastin, di hêrîşên sawal û ajalên mazin de ew karibê serkeve û new kuştin, ew di nêçîrên xwe xwe de ew serkevtî bê û hwd, wê di van çerçove û armancan de wê ew boraq û ankû korban wê werina dayîn. Ev rewşa dayîna boraq û ankû korbanê li rewş, kes û tiştna, wê bi demê re wê têgîneka serdest wê hin bi hin wê pêşbixê. Yanî bi gotineka din, wê wusa wê were hizirkirin û bawerkirin ku wê tiştek, kesek û ankû rewşeka ku ew hêza wê pirr mazin a, ew heya. Bi wê re jî wê ew hem karibê başîyê jî û xirabiyê jî ew bi wan bikê. Têgînên şamanî, wê di vê çerçoveyê de wê hebin. Bi wê re jî wê bi demê re wê ev rewş hemû wê weke rewşna ku mirov wan dikarê baş bi têgîna afsûnê re wan hilde li dest bin. Di vê çerçoveyê de rewş, kes û tiştekî ku ew dikarê wan ji rewşên xirab biparêzê, wê di vê çerçoveyê de wê di meji de wê bicih bibê. Lê li vir, wê di destpêkê de wê, ev tenê bi rewşa hêza mirov re wê bi sînor bê. Piştre jî wê mirov wê bi bawerîya xwe re wê ew wê pêşbixê.

Têgînên afsûnî wê bi demê re wê pêşbikevin.Wê bi wê re wê temenê hewkirina li nava hevdû û di nava hevdû de tevlîhevkirina tiştan jî wê bi wê re wê pêşbixê bê. Piştre wê bi demê re wê têgîna ji rewşên xwezayê sûdgirtin wê, çawa pêşbikeve û wê ev rewş heta ku wê were dema neolîtîkê û piştre ya pêvajoyên şariştanîyê wê di rengekî têgîna darêjkên afsûnî ên li ser şînahîyên xwezayî û hwd re de wê, çawa hewkirina bi tevlîhevkirinê wê were pêşxistin û hwd, wê ew pêşbikeve. Bi demê re çêkirina xwarinan, minaq ji kelendina genim û hûrkirina wê bi destar re wê kirina weke´savar´ û hwd, wê di vê çerçoveyeka hewkirinî de wê werina pêşxistin. Ev rewş hemû jî, wê bi demê re wê di nava jîyane mirov de wi demê re wê di dewama hevdû de wê werina. Minaq, weke ku wê çêkirina ava tirş û bo tirşkirinê kirina tiştan li nav wê û hwd, wê ev rewş hemû di vê çerçoveyê de wê weke rewşna darêjkî bin.

Rewşên bi vî rengî wê zêdetirî wê pêşbikevin. Wê werina pêşxistin. Ev jî wê, bi wê re wê nîşanaka wê bin ku wê çawa wê pêşketina wê çawa wê di nava hevdû de wê bibê bê. Her wusa di vê çerçoveyê û demê de mirov, dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, dema neolîtîkê, wê bi vê rengê pêşveçûnên giring ên civakî wê di wê de wê bibin. Her wusa em dikarin vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê dema neolîtîkê, wê weke demeka ku wê di wê de wê pêşveçûnên bi vê rengê ên civakî wê di wê de wê xwe bidina pêşxistin bê. Serdema civake neolîtîkê, em divê ku wê di vê dema wê ya pêşketinê de wê werênina li ser ziman ku wê bi pêşveçûnên ku ew bijî re wê, jîyane xwe wê bi reng û awa bike. Wê pêşketinên wê demê ku ew dijî, wê çerçoveya rengê pêşketina civakî a dema neolîtîkê wê bide dîyarkirin.

.

**Aqil û pêvajoyên şariştanîyê ku wê destpê bikin**.

Pêvajoyên şariştanîyê, ku mirov wan bike ku wan fahm bike û wan werênê li ser ziman, divê ku em dîroka civakê a berî pêvajoyên şariştanîyê jî wan di destpêka wê de wê fahm bikin û wan werênina li ser ziman. Li vir, bo fahmkirinaka baş di derbarê têgîna pêvajoyên şariştanîyê de wê ev giring bê. Di pêvajoyên şariştanîyê de wê, were dîtin ku wê çanda civakî a şariştanî, sazûmana civakî, rêveberî, sazîyên wê yên rêvebirinê û ên şariştanî û hwd, wê pêşbikevin. Bi wê re jî wê bi demê re wê her pêşveçûna ku ew dibê wê bi xwe re wê bi demê re wê, têgîn û çanda xwe wê bi demê re wê biafirênê û wê pêşbixê. Çand, wê li ser ya ku ew hatî pêşxistin û jîyankirin re wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, her tiştên ku ew hatina afirandin, wê di vê çerçoveyê de wê karibin ew werina hanîn li ser ziman.

Di destpêka pêvajoyên civakê de weke ku me hinekî li jor hanî li ser ziman wê, têgîna civakî wê pêşbikeve. Her wusa, di pêvajoyên pêşketina civakî de wê, çandinî, kedîkirin û ahlkirina sawalan, afirandina tiştan û hwd, wê bibê. Minaq, wê mirov, bi aqilê xwe re wê pêşnûmaya wê hizir bike û darêjka wê derxê li holê û wê çê bike. Ev jî wê bi aqil re wê bibin. Cotyarî, çandinî, şîvanî û hwd wê pêşbikevin. Dema ku em bahse van pêvajoyan bikin jî wê di serî de wê pêvajoyên pêşketina wan a li herêmên kurdistanê wê weke pêvajoyên herî kevn bin. Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov, dikarê vê yekê jî wê

werênê li ser ziman ku wê di rewşên lêkolînên erkolojikî de wê were dîtin û kifşkirin ku wê mirov, wê li dora 10 û 8 hezar salan wê çandinî wê were kirin. Di *şikefteya hassûna* a li dora farqînê de lêkolînên bi erkolojikî ku wê werina kirin wê di wan de wê di derbarê çanda hassûna û dema wê de wê têgîn aqilekî baş wê bide me. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê were dîtin ku wê çandinî, cotyarî û hwd, wê nîşanakên wê, wê ji serdemên neolîtîkê ku ew wekeli dora 10 hezar salan ew dihê bi dîrokkirin wê were dayîn destpêkirin.

Li vir, ez divê ku vê yekê jî werênima ser ziman ku herêmên li dora amedê ên weke ´erxanî´ û farqînê jî, li vir, divê ku mirov werêne ser ziman. Î ro, li van herdû herêmên wê, bineterên ku di ancama lêkolînên kolanê de derketina li holê di ***´şikefta hîlêrê´*** a li erxanî û li *´şikefteya hasûna´* a ku li farqîn**ê** ya, di wan de lêkolînên ku hatina kirin, daya nîşandin ku jîyana bicihbûyî û her wusa, karê çandîniyê, cotkariyê û her wusa xwedîkirina sawalgeriyê li van herêman pirr zêde zû pêşketîya. Nîşanakên ku derdiketina li holê ji van herdû şikefteyan, dana nîşandin ku jîyanê bicihbûyî li van herêmên pirr zêde zû pêşketîya. Jîyane bicihbûyî ya bi vî rengî ku çandînîyê û cotkariyê dike û sawalan xwedî dike, temenê wê heta dema nêzî 10 hezar salan diçêt. Herêmên ku weke nêzîkî ber çemê diclê ên weke Erxanî û farqînê, weke herêmna ku li wan temenê jîyanê û pêşketina wê zûtir pêşketîya ya.

Ev rewşa bi dîrokkirinê, wê taqabûlî dema neolîtîkê bikê. Bi wê re jî mirov, dikarê vê yekê weke rewşeka ku ew taqabûlî pêşveçûnên civakî ên demên berî pêşketina şariştanîyê jî wê werênê li ser ziman. Di rewşa têgîna fahmkirina rewşên pêşveçûnên civakî de wê, li herêmên kurdistanê, wê di vê çerçoveyê de wê nîşanakên giring wê bidina me.

Wê weke rewşek civakî wê bi wê re wê bi jîyane wê ya ku ew pêş dikeve re wê, rewş komîtîyê wê bi ber ya civaketîyê ve wê herê. Wê şikeft wê bi ber cihna hê sazûmankirî ên weke malan ku ew bi awayekî adilandî ku ew hatina çêkirin ve wê herin. Cih deverên ku bi komî li wan dihê jîyankirin, wê bi ber gûndîtîyê ve wê pêşbikevin. Komîtî, wê bi ber aşîrî û ankû klanîyê ve wê pêşbikeve. Herêm û deverên li nava amed û Rehayê wê bi lêkolînên ku ew li wan dihêna kirina re wê werina dîtin û kifşkirin ku wê li wan wê di van deman de wê çandinî wê li wan di van demên neolîtîkê de wê pêşbikeve. Her wusa ev herêm, wê weke herêmna ku mirov wan dikarê, weke herêmna ku ew ji çandiniyê û hwd re wê pirr zêde wê bi derfet bin. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê weke ku wê li kurdistanê genim, li herêmên din ên asya pirinç û hwd wê werê çandin. Rewşên weke çandinîya pirinç û hwd, wê piştre wê weke rewşekê wê pêşbikevê. Ev rewşa çaniniya pirinç, wê taqabûlî pêvajoyên şariştanîyê ên piştre wê bikin. Hema bêja wê pêvajoyên dema çanda hassûna, wê dawî li wê were, wê piştre ev cûreyên din wê pêşbikevin. Lê, li vir, em vê yekê jî wê werênina li ser ziman, biqasî ku mirov ji vegotin û gotûbêjên di nava kurdan de ku ew dibin, mirov ji wan fahm dike ku wê çandiniya garis jî wê, hema bêja wê biqasî dema çandiniya genim, wê kevn bê li kurdistanê ku ew dihê kirin. Heta ku wê, wê di hinek vegotinna de wê bê gotin ku wê garis, wê ji genim kevntir bê çandinîya wê. Vegotinên li ser *´nanêgaris(*)´* ku ew dihêna vegotin, wê di vê çerçoveyê de wê têgîneka mazin wê bidina me. Her wusa, nanêgarisî wê weke rewşeka ku ew hê zêde pêşketin nebûya wê li wê were nerin. Minaq, genim, wê ji garis bi hêjatir wê were dîtin û wê, bê gotin ku ´piştî ku genim hat çandin û pê de wê êdî wê garis, ne weke berê wê bê çandin. Wê genim, wê weke dagera ´dewlemendîyekê´ wê di nava civake kurd de wê di vê çerçoveyê de wê were dîtin û hanîn li ser ziman. Garis, wê weke dagera ´xalayê´ û dema birçîbûnê dihê dîtin. Dema ku x(**ğ**)ala bû, wê garis, wê were dîtin. Di vê çerçoveyê de wê, cûdahîyek di çerçoveya fahmkirin û şîrovekirina rewşan de jî wê li ser rewşên genim û garisê de wê werênina li ser ziman. Wê Xala, dema ku wê birçîbûn wê bibê û wê mirov nan û ankû zad ji xwe re wê nebînê ku ew bixwe, wê hingî wê ew were gotin.

Di gelek vegotinanên ku wê di nava civake kurd de wê were gotin ku wê, dema ku xala rabû, mirov nan ne didît ew bixwûn, wê hingî wê nanêgarisî wê çê bikiran û wê bixwaran. Di vê çerçoveyê de wê rewşa garis û genim, wê biheta hanîn li ser ziman. Bi gotineka din, wê genim zadê dema dewlemendîyê ba. Wê garis jî wê zadê dema xalayê ba. Wê di vê çerçoveyê de wê ew hatiban li ser ziman.

Li vir, di dewama wê de em gotinekê jî li ser rewşa sawalên weke meh, bizin, çêlek û hwd ku ew bi hesanî dikarîn werina kedîkirin û ankû ahlkirin jî em gotinekê bibêjin. Ev cûreyên sawalan, wê di serî de wê, weke ku wê heta roja me jî wê di nava kurdan de wê were ser ziman, wê, çêlîyên wan sawalan, wê pêşî wê hildan ji wan û hêlînên wan li malê û wê piştre wê ew sawal jî wê li dûv wan bihetan. Wê bi wê

rengê wê di deverekê de bigirtan. Wê dema ku wê şîrê wê bûba, wê şîr ji wê hildaban. Wê di vê çerçoveyê de ew bûba. Sawala ku wê şîr dida ew zûtirîn dihat ahlkirin û ankû kedîkirin.

Civake kurd, wê weke civakeke îstîsna ku ew ji dema neolîtîkê maya û xwediyê hinek xosletên wê yên ku ew ji wê demê û heta roja me ya ku ew, hê wan dijî ya. Bo vê yekê, şopandina rewşa wê ya civakî û fahmkirina xosletên wan yên jîyanî û wê di van waran de wê zêdetirî wê têgînan wê bidina me. Her

-------------

(*)´Garis wê piştî genoim re wê di nava kurdan de wê were ser ziman. Di demên wan ên berê de wê, garis wê weke nîşanaka ´xalayê wê were dîtin.

wusa di vê çerçoveyê de wê, weke rewşeka ku wê hertimî wê di rewşa xwe ya civakî de wê bijî bê. Ku hê ji demên weke yên neolîtîkê maya, çanda çandinîyê, cotyarî, şivanî û hwd wê di nava wan de wê pêşketî wê hebê. Di rewşa wan de mirov, vê yekê jî wê dibînê ku wê çawa wê zadên xwe yên zêde ku ew hatîya berhevkirin wê biparêzên wê rê û rêbazên xwezayî wê bikarbênin. Minaq, di hilandina genim de wê ´kûwar´ên wan hebin ku ew ji harîya sor dihatina çêkirin bê. Tanûr(harîya sor tê çêkirin)ên wan ên nanpijtinê wê hebin. Tifik(ji harîya sor tê çêkirin)ên(*) wan ku ew li ser xwarina xwe bi kelendinê û qalandinê li ser çê dikin wê hebê. Bi vê rengê, dema ku wan şînahîyên weke tivr, pîvaz û hwd ku wan diçandin, wê di binê ardê de wê cihên hînik ji hariyê wê çê bikiran û wê ew bixistanê bo ku ew di demek dirêj de ew hatiba parastin. Her wusa, pêşxistin û çêkirina gêsnan bo çotyarîyê, çêkirna dad û melhêban bo palayîyê, çêkirina adûdayan bo derxistina tiştên çandî ên di ardê de ew zêde kûr diçin bûn û hwd wê pêşxistan. Ev amûr û gelek amûrên weke wan, wê di vê çerçoveyê de wê hinek ji wan amûrên wê bi hezaran salan wê di nava civake kurd de wê werina bikarhanîn bin. Mirov, dikarê wan weke teknîkên xwezayî ku ew li gorî rewşên xwezayê ku ew kêrî wan werin ku wan çêkirina jî wan werênina li ser ziman. Di dema rewşa malbatên dema neolîtîkê de mirov wê dibînê ku wê ew ji xwe re wê van rewşan wê pêşbixin. Wê ji xwe re kûwaran çêbikin ku ew zadê xwe bixinê de. Di vê rewşê de wê ev rewş û gelek rewşên wê weke rewşna malbatî jî wê hebin. Em vê yekê wê, kifş dikin ku wê piştî pêşketina malbata dendikî di nava jîyane malbatî a komî de wê, ev rewş wê hin bi hin wê pêşbikevin. Her wusa, wê rewşên şînahîyên xwezayê wê, li şûna nêçîrê wê cih bigirin. Wê ji şînahîyan, çêkirina xwarinan wê û hwd, pêşbikevê.

Di vê rewşê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa pêşxistina rewşa jîyane civakî wê di vê demê de wê zêdetirî wê bibê. Dema neolîtîkê, wê weke demeka ku wê di wê de wê rewşên civakî wê pêşbikevin. Wê aqil wê pêşbkeve. Wê rewşa pêşketinên bi mejiyê mirov re wê zêde bibin. Di çerçoveya rewşa jîyane dema neolîtîkê û rewşên têgînî ên weke bawerîyên wê demê û hwd de ku mirov dihizirê, mirov rewşên giring wê di vê çerçoveyê de wê kifş bike. Mirovê ku ew bi xosletên xwe yên mirovî û civakî wê bi dest pêşketina xwe bike, wê bi demê re wê di mejiyê xwe de wê bidest hişkirinê wê bike. Di nava rewşa jîyane demê de wê mirov, wê ji nûka wê bidest hişkirina rewşan wê bike. Wê têkiliya rewşan wê li ser hişê xwe re wê bi hevdû re wê dênê. Her wusa wê di vê çerçeyê de wê rewşên nû wê derkevina li pêş.

Di rewşên nû pêşketina wan re wê rewşa pêşketina aqilê mirov wê di vê çerçoveyê de wê, pêşveçûnên nû wê bijî. Têkilîya nava rewşan ku wê were danîn, wê weke rewşek têkilîyî a giring bê. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa têkilîya rewşan a bi hevdû

-------

(*)Tifik wê weke tanurê wê ji hariyê were çêkirin. Lê wê tifik bo ku ew xwarin li ser wê were çêkirin wê were çêkirin.

re danînê, wê rewşek giring a bi hiş ku ew pêş dikeve bê. Minaq, di rewşa danîna têkilîya rewşan a bi hevdû re wê di rewşa aqilê mirov de wê bi xwe re wê bê temenê pêşveçûnên nû. Mirov, dihizirê. Hizirkirina mirov wê, bi mirov re wê pêşbikeve. Rewşa têkilîdanîna rewşan a bi hevdû re wê, weke aliyekî giring ê bi aqilî û ku mirov kirina bi plangerî dikê bê.

Mirovê demê, weke ku mirov di dema neolîtîkê de bi pêşketina wî re kifş dike, wê nûka wê di mejîyê xwe de wê rewşên bi hişî wê bijî. Wê rewşên weke dîtina xewnan wê bi wî re wê pêşbikeve. Wê serborîyên jîyanî ku ew dijî, wê bi bîrhanîna wan re wê, di mejî de wê weke ku ew wê kêlîkê dijî wê di xwe de wê wan bijî. Wê di rewşa dîtina xewnan de wê, mirov, wê di wê rewşê de wê rewşeka ku ew nikarê wateyê bide wan wê bijî. Wê di vê çerçoveyê de wê, di nava aqilê hişî ê di mejî de ku ew bi rewşan pêş dikeve û ya dîtina xewnan wê ji hevdû cûda nekê. Wê mirov, wê herdû rewşan wê bi hevdû re wê bijî.

Wê wan bi hevdû re wê weke hevdû encamên wan wê bijî di rewşa xwe ya jîyanî de. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de di rewşa mirîna hinek mirovên pîr ên komê de jî wê ev rewş wê xwe bide dîyarkirin. Wê ew bîrhanîna wan, wê weke ku ew li wir bin, wê di mejî de wê xwe bide dîyarkirin. Serborîyên ku mirov ew jîyankirina, wê di wê demê de wê hin bi hin ew xort bibin û xwe bide dîyarkirin. Di rewşa pêşketina hişmendîyê de wê, di nava rojê de ku ew li ser pîya dimeşê û ankû rûniştîya ku ew tiştekî dike, wê weke ku ew xewnê dibînê, wê ew wan bijî. Di vê çerçoveyê de wê di rewşekê de wê xwe bide dîyarkirin.

Ev rewş, wê dema ku ew werina jîyankirin, wê gelek rewşên ku ew wan fahm nekê, wê wan bijî. Lê di nava rewşê de wê, elementên ku ew wan nas dike û yên ku ew wan nasnekê, wê wan ji hevdû cûda bike. Minaq, ew dema ku ew xewnekê dibînê de wê gelek rewşan wê bi hevdû re wê bibînê. Di nava wan de gelek rewşan de wê, hinek rewş wê weke rewşna ku ew wan bi hişmendî nasnekê bin. Lê hinek ji wan rewşan jî wê, weke mirovna ku ew li dora wî na û ku ew wan di xewnê de dibînê û ku wî ew piştre di jîyanê de dîtin wê têkilîya wan bi hevdû re wê dênê, wê bibînê. Ev rewş wê, her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê, rewşek teybet wê di rewşa mejîyê mirovê ê hizirkirinê de wê derxê li holê. Di vê çerçoveyê de ew kirin ku ew, kirinna baş bin bi mirovekî ku ew ji nava koma wî ya ku wî ew bi wê dîtîya û ku ew mirov di jîyane wî de naqabîna wan nexweş bê û ku wî bi xweşî ew dîtîbê, wê demê wê di dema nerîna xwe de ku ew çendî nav û naqabîna wan nexweş jî bê, wê bi nerîneka bixweşî wê binerê. Di heman rewşê de wê vajî wê bibê. Wê mirov, wê li ser wê bihizirê. Ev rewşên ku wê ew bijî di mejiyê xwe de ew, ku bi dîtîna xewnan bin û ankû bi hişkirina di rengê xewnan de bin û hwd, wê bandûra wê pirr zêde wê di jîyane mirov de wê di derûnîya mirovê demê de wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa li vir, rewşên weke ku wê karibin nêzîkatîya mirov a li hevdû jî wê bidina dîyarkirin û nîşandin jî bin. Rewşa pêşketina hiş û bandûrên wê yên li jîyanê wê pêvajoyek dirêj a alimîna jîyankirina bi wê re wê bi xwe re wê bi vê rengê wê bide bûhûrandin. Mirov, heta ku ew fêrî wan rewşên aqilî dibê, wê di mejiyê xwe de wê, wan rewşan wê bi wê re wê bijî. Wê ji wan rewşên ku ew di mejiyê xwe de ew wan dijî wê bitirsihê. Ew ajalên ku ew di xewnê de dibînê û ew ji wî re weke wê bibîna sedema tirsê wê bibînê. Aqil, wê di vê çerçoveyê de wê rewşa tirsê wê bi xwe re wê bihişmendî wê pêşbixê. Pêşketina rewşa tirsê, wê weke rewşek teybet bê. Her wusa rewşa tirsê, wê weke rewşek teybet a ku mirov wê hilde li dest bê.

Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê fahm bike ku wê rewşa aqil, wê gavna mazin bi mirov, wê di jîyane mirov de wê bi mirov bidina avêtin. Her wusa, wê di vê demê de wê, mirov, wê hêst û hîsên weke tirsê wê nas bike. Wê bi wan re wê li ser aqil re wê bihişmendî wê hevnasînê bike. Ev jî wê, weke rewşek teybet a bi hişmendîya mirov re ku ew di jîyane mirov de ew pêşdikeve bê.

Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê aqil, wê di vê çerçoveyê de wê, pêvajoyên hizirkirina li rewşan, di çerçoveya têgîna parastinê, xaterîyê, başî û nebaşîyê de wê bihizirê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê wan kifş bike. Ev rewşên têgînî wê, rewşna têgînî ên ku wê mirov wê bi aqilê xwe re wê di destpêkê de wê wan bijî bê.

Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê rewşa aqil û têgînên bi vî rengî pêşketina wan, wê ew weke rewşna ku wê hin bi hin wê bi hişmendî wê ketina farqe bi hişî de wê pêşbixin bin. Li vir, hinek xûyên ajoyî ê weke xwedîbûnê û hwd, ku ew berê jî hebûna, wê ew li ser wan re wê hişbûna ku ew pêş dikeve, wê rewşek teybet a hişmendîyê wê bi xwe re wê derxê li holê. Mirov wê, di vê çerçoveyê de wê van rewşan wê bi xwe re wê kifş bike. Wê bi wê re jî wê, wan têbigihê.

Rengê têgihiştina vê demê wê, weke bi têgînê û nasînê re bê. Lê wê di destpêkê weke rewşa *xêva masîyê* bê. Mirov, wê tişta ku ew dît, wê di pêvajoyên xwe yên hişkirinê de wê, di dema ku ew dibînê de wê ew hişkirin wê zîndî bê. Piştre jî wê, ev rewş ku ew ji berçav çû, wê weke ku wê ew jî wê ji mejî winda bibê. Wê rewşek bi vî rengî wê xwe bide dîyarkirin. Ev sedema wê jî ew a ku hiş, hê ew ne zêde bihêz a. Çend ku têrîtî û tîrîtî wê bi xêvê re wê bibê di mejî de wê, hingî wê di dewama wê de û li ser wê re wê rewşa bibîrkirina piştî ku ew ji berçav windabû jî wê bibê. Lê wê, rewşa bîrkirin û ankû naskirina bi dîtinê re wê bi hişmendî wê êdî wê pêşbikeve. Rengê rewşa aqilê dema neolîtîkê wê di vê çerçoveyê de bê. Di aslê xwe de ev rengê hişkirinê wê di demên piştî serdema neolîtîkê ên destpêka pêvajoyên şariştanîyê de jî wê xwe bide dîyarkirin. Lê wê hin bi hin wê li ber demek bûhûrînê bê. Wê êdî wê, bi pêvajoyên dema şariştanîyê re wê ew were dîtin ku wê, mirov, bi xêvkirina xwe re wê di pêvajoyek bîrkirinê de bê.

Em ji rewşa endamên civake kurd ên ku ew di mejîyê xwe de ev pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê û berî wê ên dema neolîtîkê jîyankirina, fahm dikin ku wê xwediyê rewşek xêvî a xort bin. Di nava kurdan de wê weke teybetîyek wan ya sereka ku wê ew bi wê were zanîn û naskirin, wê di ji berkirin, xêvkirin û jibîrnekirinê de wê, ew pirr zêde pêşketî bin. Di vê çerçoveyê de wê, di pêvajoyên wan ên şariştanîyê ên ku ew dijîn de wê, ev rewş wê bi wan re wê were dîtin.

Li vir, em dikarin vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê rewşa aqilê mirov, wê di vê demê de wê pirr zêde wê di pêvajoyek giring de wê derbas bibê. Rewşên ajoyî ku ew wê li dora wan wê hişkirin wê pêşbikeve, wê bi vê rewşa li dora rewşên ajoyî pêşketina hişê re wê ajo jî wê weynekê wê bileyizê. Weke kevirê di nava avê de ê hişk û ankû weke hastûyê nava goştê laş wê, ajo wê di rewşekê de wê xwediyê weynekê bê. Lê hiş, wê di vê demê de wê, di nava rewşan de wê bi rewşên alimînê re wê hin bi hin wê pêşbikeve. Rewşên alimînê, weke ku em di pêvajoyên dema neolîtîkê de wê kifş dikin wê, weke pêvajoyên pêşî ên destpêkê ên hişkirinê jî bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê weynekê wê bileyizê. Hişê demê wê hin bi hin wê weke hişê ku ew di çerçoveyeka bi hevvekirinê de ku wê pêşbikeve bê. Minaq, çêkirina gêsnekê bo cotyarîyê, çêkirina kopalekî bo destê şivanekî, çêkirina kûlavekê bo şivanekî ku ew xwe bi wê germ bikê û hwd, wê ev rewşên ku wê, bi wan têkilîya wan ya bi hevdû re ku ew dihê danîn bê.

Weke pêvajoyên pêşî ê hiş, em di çerçoveya van deman de em, hinekî din jî em bi têgînên weke totemîsm, anamismê û hwd re ji aliyê aqil ve van deman em werênina li ser ziman. Wê giring bê. Wê ji aliyekî din ve wê, di pêvajoyeka peresendina aqil a bi ber pêvajoyên mîtolojîyê ku ew weke aqilê destpêka dema şariştanîyê ya jî wê, ew baştirin bi wê re û di dewama wê de wê were fahmkirin.

Pêvajoyên jîyane civakê ên destpêkê ku wê taqabûlî dema neolîtîkê bikin ku em dikin ku wan fahm bikin li kurdistanê, em dibînin ku wê çavkanîyek berfireh a jîyane civake neolîtîkê wê li kurdistanê wê were dîtin. Em vê yekê kifş dikin ku wê hema bêja li pirranîya herêmên wê, wê jîyane neolîtîkê, wê bi rewşên wê re wê pêşbikeve, em bi teybetî li herêmên botanê ên ber diclê û firatê, em weke navend divê ku em bigirin. Bi teybetî herêma botanê, wê di rewşa pêşveçûnên xwe yên bi dema jîyane neolîtîkê re wê li herêmê ku ew dibin, wê herêm weke navenedekê ji wan re wê pêşbikeve.Hinek ji wan herêmên botanê ku em dibînin weke deverna ku em î ro jî li wan nîşanakên jîyane dema neolîtîkê li wan dibînin li herêma botanê, wê herêmên weke berava şikeftê, girikê haçîyan, giryan û ankû girkê hemo, girê osê, girê hevşerîk, girê gûzirê, girê çemê halan, simakî, xarîf, kîkan, kotekan, girê kortik, newala danîk, girîhamî û hwd, bin. Ji bilî van herêman, em dikarin werênina li ser ziman ku wê zêdetirî wê herêm wê li herêmê hebin. Bi teybetî ji silopî û bi ber şirnaxê ve ku mirov diçê, wê were dîtin ku wê di wê qadê de wê gelek deverên weke deverên weke girikê bedro, nerwan, takyan, amarsawa, hazayî, girikê kûsê, girê tahalî û besorîn, girê bimrinê, serçemê û girê metrokê, cihê mizgefta nû, baswan û hwd, ku wê heta roja me jî wê nîşanakên dema neolîtîkê û ji jîyane wê, wê li wan hebin, wê werina dîtin. Ev herêm, wê çend ji wan herêmên ku ew bi teknîkekek ne zêde pêşketî jî ku ew hatina kifşkirin in. Lê ku mirov, bi awayekî rêkûpêk li ser herêmê diponijê û wê dike ku wê fahm bike, bi wê re mirov, gelek deverên ku wê di wan de nîşanak û bermehîyên dema neolîtîkê ku ew ku di dewama wan de jîyane şariştanîyê pêşketîya wê werina dîtin.

Li vir, di dema ku em vê pirtûkê li ser jîyane neolîtîkê a civakî û di dewama wê de pêşveçûnên şariştanî ku em di wê de di çerçoveya kurdistanê û ankû mesopotamîya de wê dinivîsênin, em bi wê re pêşveçûnên civakî ên di wê çerçoveyê de ku wê li ser xûyên civatî re wê heta roja me, wê bi civake kurd a herêmê re wê bijîn jî em, wan jî li berçav digirin û vê nivîsandina xwe didomênin. Civake kurd, weke civake ku ew heta roja me jî ew weke civakek ´çîyayî´´ dihê hanîn li ser ziman. Sedema wê jî wê, ew bê ku ew di xate jîyane xwe ya civakî de ew di jîyane xwe ya bi xwezayê re ku ew di isrerê de ya. Di vê çerçoveyê de em divê ku vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku wê, civake kurd, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşeka ku em dikarin, wê baş fahm bikin û bi wê re gelek xosletên neolîtîkî wan fahm bikin jî bin. Heta sedsale 20´an jî wê gelek malbatên kurd, wê di şikeftên raman ên li dora êlih û heskîfê de wê bijîn. Ev rewşa jîyane wan malbatên kurd di wan şikeftên ku wan bi demêê re ji xwe re kirina mal, nekû ew piştre çûna û ketina wan de. Ew xwediyê jîyaneka dayimî a ji berê ve ku ew di wan de dijîn bûn. Piştre jî wê, di nava civakê de wê, ev rewşa jîyane li raman a di şikeftên wê de wê, di nava civake kurd de jî wê, weke rewşna ku wê hertimî wê werina li ser ziman. Di nava pêvajoyên şariştanîyên ên dawî de wê, ew

rewşa wan, wê weke rewşek pirr kêm a li hemberî pêşveçûnên şariştanî wê bimênê. Ber vê yekê, wê ew rewşa wan, heta ku wê hinek mirovên ku ew dîrokê nizanin û nezanin, wê weke ´kemesîyekê´ jî wê werênina li ser ziman. Mirovê ku ew li gorî têgîna şariştanîyê mazinbûya, wê di rewşa jîyane wî de di her demê de wê têgîna populerîteyê wê her demê wê li pêş bê.Populerîte, wê ne tenê weke rewşek û têgiheka roja me û ankû ya serdema me bê ku ew pêşketîya bê. Wê weke xosletekî jîyane şariştanîyê wê di her demên wê û pêvajoyên wê de wê bi şêwayna vekirî û ankû girî wê ew rewşa wê hebê. Di vê çerçoveya vê têgînê de wê êdî wê nêzîkatî wê li jîyane mirovan wê biheta kirin.

Di rewşa fahmkirina serdema neolîtîkê û piştre pêvajoyên şariştanîyê de wê, pêşveçûnên destpêkê ên civakî wê fahmkirina wan wê giring bê. Ber vê yekê, bi giringiyek teybet, pêvajoyên civakî ên berî pêşketina pêvajoyên şariştanîyê ku ew dibin, fahmkirina wan, wê di vê çerçoveyê de wê têgiheka baş bide me. Li herêmên kurdistanê, di vê çerçoveyê de wê, weke ku wê çawa ku wê piştî pêvajoyên şariştanîyê wê destpêbikin û wê li her herêmên wê pêşbikeve, bi heman rengî wê wê di dema neolîtîkê de jî wê bi şêwayekî li pirranîya herêmên wê, wê jîyane neolîtîkî wê pêşbikeve. Her wusa di vê çerçoveyê de wê kurdistan, weke welatekî ku ew li giştîya wê, wê pêvajoyên jîyane neolîtîkî ên cûr bi cûr wê pêşbikeve bê. Di vê çerçoveyê de jî wê, di nava wê pêvajoya pêşketina jîyane neolîtîkî de wê herêma ber diclê û heta ku ew digihijê ber firatê, wê di çerçoveyek teybet de wê weke navendekê bê.

Her wusa, herêmên botanê, di vê çerçoveyê de wê, heta roja me jî wê di giştîya wê de wê, zêde wusa ti lêkolînên mazin ên ku wê bi awayekî rêkûpêk wê bi wê bixwezê rastîya demên wê bûhûrî fahm bike, ne hatîya kirin. Lêkolînên ku ew hatina kirin jî ew hemû jî wê bi armancekê wê werina kirin û ber vê yekê jî wê kêm û bi nîyet bin. Ber vê yekê, mirov nikarê zêde bawerîyekê bi wan werênê. Minaq, hin lêkolînên ku qaşo rejima tirk û sazîyên wê kirin, wê di vê çerçoveyê de wê hertimî cihê gûmanê bin. Mirov nikarê wan weke lêkolînna ku mirov bawerîyê bi wan werênê bin.

Ber vê yekê mirov, divê ku vê jî li berçav bigirê ku wê, lêkolînên ku wê werina kirin, wê çawa bi wan wê temenê ramyarîya desthilatdarîya ku ew li herêmê serdest a wê biafirênê û wê ji wê re wê bikina bingeh, wê di vê çerçoveyê de wê bi nîyet wê werina kirin. Di vê çerçoveyê de wê, weke lêkolînna ku mirov nikarê ji gelek aliyan ve wan, hilde ber cidiyetê jî bin.

Di awayekî bêalî û bi rêkûpêk de kirina lêkolînna de wê, rewşa herêmê û dîrok û mejûya wê ya demên bûhûrî wê baştirin wê werina fahmkirin. Minaq, rejima tirk li hemberî civake kurd şerê tûnakirinê di meşênê, herêmên ku ew kavil dikin û di xûrixênin jî wê herêmên dîrokî ên ku mirov dikarê ji wan dîroka herêmê ji wan binivîsênê bê. Di vê çerçoveyê de wê, çawa pêşîya wê dîroka herêmê li gorî rastîya wê ku ew werê nivîsandin wê were girtin, wê di wê çerçoveyê de wê di nava helwestê de bin. Ber vê yekê wê, bixwezin ku ew dîrok ne li gorî rastîya xwe, lê li gorî ´rastîyeka´ ew di mejiyê xwe de tefkîr dikin wê binivîsênin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê rastîya wê werênê li ser ziman.

Li herêmên kurdistanê, bêgûman em dema ku bi awayekî hesanî û ne zêde bi amûrên pîspor jî ku mirov lêkolînê dike, mirov wê rastîya wan herêmê wê dibînê ku ew çawa xwediyê dîrokek pirr zêde kevn û pirr alî û ankû pirr dîmenî na. Di vê çerçoveyê de dîrokzanîya wê herêmê jî wê bêgûman, ji mirov ast û pîvanekê ji mirov bixwezê ku mirov li er asta wan rêveberîyên herêmê û têgihên wan re bê.

Di rewşa fahmkirina dîroka herêmê a şariştanîyê de jî wê her wusa, bi wê rengê wê ew bi rastîya wê re wê were dîtin. Dîrok, çawa ew were nivîsandin, wê xwediyê bandûreka di wê çerçoveyê de bê. Mirov nikarê dîrokê tenê ji nivîsandinek zûwa bihasibênê û wê werênê li ser ziman. Divê ku mirov wê bi rastîya wê re wê, li ser esasê pêşketina wê re wê hilde li dest û wê werênê li ser ziman. Ya ku wê temenê pêşketineka rast a li gorî mejûya wê bê û wê bi xwe re wê rastîyê wê bide ravakirin jî wê, ev rastî bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê werênê li ser ziman nivîsandina dîrokê bi serê xwe weke mijarekê divê ku mirov wê hilde li dest û wê werênê li ser ziman. Bi teybetî em, dikarin binxat bikin û werênina li ser ziman ku wê pirsgirkeka pêvajoyên şariştanîyê û zihniyeta şariştanîyê a bi nivîsandina dîrokê re wê weke ku mirov wê kifş dike wê hertimî wê xwe bide dîyarkirin. Di aslê xwe de wê ya ku wê dîroka rojhilat wê ji destpêka wê heta roja me, wê bike weke dîrokek şer jî wê di temenê wê de wê, ji aliyekî ve ev nivîsandina dîrokî a bi zanebûnî şaş û binîyet nivîsandina wê, wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê, dîrok, ji nû ve wê bi awayekî rast di berçav de derbaskirinê wê hertimî wê ji me wê bixwezê. Ber vê yekê, giringa ku mirov serdemên civakê ên berî jîyane civake a dema şariştanîyê wan bi teybetî hilde li dest û wan

fahm bike û di dewama wan de li gorî rastîya wan pêvajoyên şariştanîyê ku ew weke ku ew pêşketina wan werênina li ser ziman û bidina dîyarkirin.

Li kurdistanê, wê biqasî wan şerên ku rejimên herêmê di roja me de li hemberî civake wê dimeşênin, wê weke giring jî wê nivîsandina dîroka şaş a herêmê bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê dîroka şariştanîyên herêm wê piştî pêvajoyên jîyane civakî a li herêmê wê, pirsgirêka wan ya sereka wê di van aliyan û hinek aliyên din ên weke van de wê xwe bide dîyarkirin.

Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê rewşa civake kurdistanê wê weke rewşek teybet bê. Li vir, em dema ku rewşa dîroka civake kurdistanê wê dihildinali dest bi mejûya wê re mirov, wê dibînê ku wê weke dîrokek civakî a herî kevn û xwediyê pêşketinên jîyane şariştanîyê ên pêşî bê. Di vê çerçoveyê de wê bi kevnerîya xwe re wê xwe bidê dîyarkirin. Lê bi wê re jî wê, biqasî wê kevnerî û dirêjehîya wê, wê wilqasî jî wê xirab hanîna li ser ziman û hwd, wê di nava wê de wê bibê. Li vir, di rastîya nivîsandina dîroka wê de wê, li vir, pirsgirêka herî mazin wê weke ku me hinekî li jor jî hanî li ser ziman wê bi fahmkirina jîyane civakî re wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, têgîna rast û ankû rastteqînîyê, wê herî zêde wê ji aliyê desthilatdarîyên vê herêmê ve wê werina bikarhanîn. Lê yên ku herî zêde wê ji wê dûr jî bin wê ew bin. Wê di têgihiştin û fahmkirina xwe de wê, hertimî wê ne di wê asta wê fahmkirijna dîroka herêmê û rastîyên wê yên dîrokî ên civakî û hwd de bin.

Li kurdistanê, di roja me de wê, weke pirsgirêkek herî mazin a zihniyetî a bi rejim û desthilatdarîyên ku wan herêm û civake kurd di nava xwe de parvekirîya wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê rengekî dîrokê ê bi acêb wê li gorî xwe wê werênina li ser ziman. Dîrok, dema ku ew hat xirakirin di nivîsandina wê de wê, hertimî wê temenê pirsgirêkên civakî û yên nêzîkatîyê jî wê biafirênê. Ber vê yekê, di giringîya nivîsandina wê de mirov, divê ku tevbigerihê û gava xwe biavêjê.

Em ku î ro, li rewşa civaketîya herêmê dinerin, em wê dibînin ku wê, pêvajoyên jîyane civakî ên pirr zêde kevn wê ku ew hena wê werina dîtin. Bi ser ve jî wê, pêvajoyên jîyane civakî a demên şariştanîyê wê hebin. Ev hemû jî wê di rastîyekê de wê hebin. Lê li vir, pirsgirêka rêveberîyan, wê hertimî wê dîroka civakan, wê xirabike. Wê di vê çerçoveyê de wê xelat wê werênê li ser ziman. Weke ku çawa wê dîroka civake kurdistanê û kurdistanê wê ti demê de wê nehêlin ku ew rast were hanîn li ser ziman. Di aslê xwe de ku ew dîroka wê were li ser ziman, wê ji serdemên peleolîtîkê, mezolîtikê û neolîtîkê heta roja me bi pêvajoyên şariştanîyê re wê werina hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê dîroka vê herêmê wê, di nivîsandina dîrokên şariştanîyên piştre ên ku wê pêşbikevin de jî wê weke qalib bê. Di vê çerçoveyê de wê, civaketîya wê ya ku ew pêşketîya wê, weke rastîyeka bingihîn wê were dîtin. Di vê çerçoveyê de hemû lêkolînên li ser dema neolîtîkê ên giring ên destpêkê wê li vê herêmê wê destpêkek wan ya giring û mazin wê hebê. Ev herêm, wê weke ku me hinekî li jor hanî li ser ziman wê, di demên peleolîtîkê de wê zûtirin wê kaş û çiyayên qaşayê ên li wê bihelihin û wê li herêmê temenê jîyanê wê biafirê. Herêma kurdistanê û ankû herêma mesopotamîya, wê weke herêmek ku wê ji hemû herêmên din ên dunyayê zûtirin wê serdema cemedê a **Pleistosen**´ê wê ewil(pêşî) wê herî zû wê dawî li wê were bê.Li herêmên din ên dunyê wê heta dema navîn a serdema peleolîtîkê jî wê serdema cemedê a Pleistosen´ê wê hebûna xwe bide domandin. Lê wê li vê herêmê wê pirr zû wê dawî li wê were. Wê axa wê, wê zûtirin wê zûwa bibê û wê temenê jîyanê wê li wê biafirê. Wê dema ku em dîroka herêmê a demên peleolîtîkê bi jeolojîkî ku em binivîsênin, emê di çeçroveya rastîya herêmê de em divê ku di çerçoveya pêşveçûnên bi ardnîgarî, darîstanî û hwd ên ku ew li herêmê pêşketina re em wan dikarin wan werênina li ser ziman. Serdema peleolîtîkê wê li herêmê wê weke serdemeka ku wê jîyan di wê de li herêmê pêşbikeve bê. Wê rengê jîyanîya li herêmê wê, weke jîyane bi komî ku wê hin bi hin ji nava xwe wê xosletên jîyane civakî wê bidê pêşxistin bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê bi rastîya wê re wê werênê li ser ziman. Dîroka pêşketina herêmê a bi rastîya wê re mirov dikarê wê werênê li ser ziman ku wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Li herêmên kurdistanê, mirov wê rastîyê kifş dike ku wê di dema dawî a serdema peleolîtîkê û dema mezolîtîkê de wê pêşveçûnên ku em dikarin di çerçoveya pêşveçûnên ewil ên dema neolîtîkê de wan werênina li ser ziman wê bibin. Her wusa, lêkolînên me yên li herêmên kurdistanê vê yekê bi awayekî vekirî wê radixina li berçav.

Di rewşa herêmên kurdistanê de wê, ya ku wê mohra xwe wê lêbixê, wê pêşveçûnên civakî ku ew pirr zû li herêmê dibin bê. Di vê çerçoveyê de em, dema ku li rewşên civakî dihizirin û bi teybetî jî ku em, li

pêşveçûnên li dema neolîtîkê dihizirin, em wê dibînin ku wê, her demê wê her pêşveçûna ku ew dibê û ankû dihê û derkeve li holê weke bi kifşkirinên erkolojikî û hwd re wê, rewşa kevnerîya jîyane civakî û pêşveçûnên wê, wê bi xwe re wê kevntir wê bibê. Minaq, weke ku wê, di demên dawî de wê li xirabreşkê ku wê bawergeha ku ew dihê dîtin û dîroka wê li dora duwenzdeh hezar salî wê were kifşkirin û hwd. Ev dema weke duwenzdeh hezar salî, wê weke dîrok û demek ku wê heta dema mezolîtîkî wê herê bê. Her wusa, li gorî kifşkirinên dîrokî, zanînê û felsefîkî û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê, wê kevnerîyê wê kevnrîyê wê kevntir wê bibê.

Di vê rewşê de mirov, vê yekê jî wê kifş dike ku mirov, dema ku mirov, herêmên kurdistanê wan lêdikolê mirov, di serî de rewşek civakî û pêşketina wê, ya teybetî dibînê. Lê li vir, em vê yekê wê werênina li ser ziman ku wê li herêmê wê bi teybetî wê jîyane herêmê û pêşveçûnên wê yên ku em di vê çerçoveyê de wê weke bi dudîmenî bin. Dema ku mirov dîmenekî ji wan nebînê û ankû piştgûh bike, mirov wê di fahmkirina xwe de wê bikeve kêmesîyê de. Ev jê ew a ku rewşa rengê jîyane civakî a ku ew li ser jîyane xalknasî û gûndînasî û ankû gûndîtîyê re ku wê, xwe di pêvajoyên şariştanîyê de jî wê bide domandin bê. aliyê din jî wê, weke ku wê, bi pêşveçûna pêvajoyên şariştanîyê re wê di rewşa pêşveçûnên desthilatdarî ên li herêmê bê. Desthilatdarîyên li herêmê wê, hertimî wê di rewşa herêmê de wê xwe ji rewşek metingerî a li ser serê xalkê wê xilas nekin. Di vê çerçoveyê de wê, hertimî wê temenê pirsgirêkên civakî û dîrokî ên ku wê hertimî wê rûbidin bin. Ya ku wê pirr zêde wê weke mudaheleyên mazin a li rengê jîyane herêmê û herîkîna wê jî bê, wê ev rastî bê. Di vê çerçoveyê de mirov, dema ku wê rastîya herêmê wê bike ku wê werênê li ser ziman, mirov nikarê wê tenê li ser hin rûdayînên desthilatdarî û pêşketinên wan re wê tenê werênê li ser ziman. Divê ku mirov wê, ji wê zêdetirî derbas bibê û rastîya civakeyîya herêmê bi dîrok û mejûya wê re wê hilde li dest û wê fahm bike.

Tabî li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku mirov bahse civaketîya li herêmê û pêvajoyên wê yên pêşketinê bikê, divê ku mirov wê rastîya wê ya dîrokî bi teybetî wê hilde li dest. Ber çi wê di rewşa fahmkirina civaketîya herêmê de wê demên civakî ên dema neolîtîkê û fahmkirina wan û pêvajoyên wan ên peresendinê ên bi ber jîyane dema şariştanîyê ve wê giring bê? Di serî de mirov divê ku bersivê bide vê pirsê û ji wê bersivê gav bidest avêtina fahmkirina rastîya herêmê bike. Ya ku wê bi xwe re wê rastîya herêmê wê bi başî wê bide dîyarkirin û fahmkirin jî wê ev bê. Em nikarin, bi rewşên desthilatdarî û hwd re bi sînor, rewşa dîroka herêmê û civaketîya wê bi mejûya wê re wê hildina li dest. Her wusa, pêvajoyên şariştanîyê ên li herêmê, wê hertimî wê bi xwûnî wê derbas bibin. Ber vê yekê ya ku em li herêmê dikarin bêjin ku dîrokek bi deh hezaran salan a bi pêvajoyên civakî re heya, lê em di derbarê jîyane wê de hûr û kûr ne zêde serwaxt in. Ber ku ew dîroka wê, hertimî bi tûfanên ku ew bi ser serê herêmê de hatina ew hatina tûnakirin. Di rastîyê de wê, ev rewş, wê rastîya herêmê wê bi awayekî vekirî wê pirr zêde wê baş wê bide dîyarkirin.

Di rewşa fahmkirina dîroka herêmê herêmê a civakî de wê di serî de wê di vê çerçoveyê de wê rewşa civaketîya wê, wê xwe bide dîyarkirin. Em î ro, dema ku bahse dîrok û mejûya wê ya civakî dikin, di serî de wê, li herêmê wê civake kurd, wê bi parasdtina nirxên xwe yên jîyanî ên navxweyî re wê di derbarê jîyane demên berê ên civakî de wê têgînek baş wê bide me. Di derbarê xosletên demên civake dema neolîtîkê de wê, xwediyê gelek xoslet û teybetîyên ku ew bi xwe re wan heta roja me wan dijî jî bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse wê bike û wê werênê li ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse wê jî bike ku wê jîyane civakê wê li herêmê, wê pêvajoyên wê kevn, wê heta roja me jî wê li ser xûy û rengê xwe bi rêxistina civakî û parastina wê ya heta roja me jî wê, xwe bide domandin.

Di vê çerçoveyê de em, dema ku li herêmên kurdistanê em rewşa gûndên herêmê bi ardnîgarî wan lêkolîn dikin, wê bi wê re wê were dîtin ku wê di pirranîya gûndên wê de wê nîşanakên civake dema neolîtîkê wê di wê de wê were dîtin. Em li axlabeyê gûndên herêmê wan rewşan kifş dikin. Bi wê re jî em dikarin vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê li ser rengên jîyanî ên weke bi pergale jîyane xwezayî a koçerîyê ku ew heta roja me, ew xwe dide domandin di nava kurdan de wê, gelek nîşanakên wan demên ewil ên civakî wê hebin. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê rengekî civakî ê dema neolîtîkê ku ew di dema pêvajoyên şariştanîyê û pêşketina wê de ku ew bi wê xwestina ku ew bi wê re bijîn pêşxistina. Ber vê yekê, wê jîyane koçerîyê, wê lingê wê bi navê ´jîyane deştê´ wê aliyê jîyane şariştanîyê û pêşveçûnên wê yên bi wê re wê werênê li ser ziman. Aliyê lingê duyem ê jîyane koçerîyê jî wê, rengê jîyane gûndîtîyê a ji destpêkê û heta roja me, wê bi xosletên wê re wê bide nîşandin û dîyarkirin.

Di aslê xwe de em, dema ku di vê çerçoveyê de çavekî li jîyane koçerîyê dixin, em li ser lingê wê yê bi navê ´jîyane zozana´ û ankû ´zozana´ re wê, rengê jîyane civaketîya dema neolîtîkê ku ew bi şivanî wan çawa li ser esasê kedîkirina kerîyên sawalan û bi wê re ku wan çawa dikir ku ew bijîn û hwd, mirov wê bi wê re wê ew wê kifş bike. Jîyane koçerîyê, gelek mirovên ku ew fahm nekirina û li ser wê gotin hanîna li ser ziman ew weke ´jîyane pênaberîyê´ hanîna li ser ziman. Lê di aslê xwe de ev gotina ´pênaberîyê´ wê ti carî wê nikaribê wê rewşa wê rengê jîyanê ew werênê li ser ziman bê. Dema ku mirov li ser wê dihizirê, her wusa mirov bi wê re wê jî kifş dike ku wê, gelek malbatên kurd ên mazin, wê ew wê koçerîyê bikin. Ev malbat jî wê, weke malbatên ku ew xwedîyê kerîyên sawalan bin. Herêmên kurdistanê ên weke serhadê, wê weke herêmna ku wê hinekî dûr bin ji herêmên ber diclê. Herêmên ber diclê wê weke herêmna ku wê şînahîya li wan, wê baştir bê. Sawal ku ew li wan diçêrin, zêdetirî û baştirî şîr didin û qalaw dibin. Wan jî bo ku ew bibê, wê her demsale ku ew weke *´demsale çûyîna li zozana´* jî ew dihê bi navkirin û ku wê şînahî wê pirr zêde wê hebê, wê sawalên xwe bidina dora xwe û wê werina herêmê û wê ji xwe re wê *´kozan´* çê bikin û wê di wan de bimênin. Piştî ku ew demsal bidawî bû, wê dîsa malên xwe bidan li hevdû û wê sawalên xwe bidan li dora xwe û wê biçûyan li malên xwe. Lê dema ew vêcarê di vegerîyan li malên xwe wê hinekî din jî wê dewlemend wê vegerîyaban. Wê zêdetirî wê şîr hildabin û wê ji wî şîrî wê zêdetirî wê mast, panîr û rûn û hwd, wê ji xwe re çêkiribin û wê bi xwe re wê werênin bin. Di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê ban. Ev rewşa bi jîyane koçerîyê ku ew bi kerîyên sawalên xwe re wê dibûhûrênin wê, weke ku ew bi nav dikin *´çûyîna zozana´* wê her demsalê wê domîya ba. Wê dûbare wê bikiran. Ev rewş, wê weke rewşek jîyanî a jîyane wan ba.

Di çerçoveya jîyane civakî a li kurdistanê de wê, di vê çerçoveyê de wê her demsalên ku ew li gorî ´tamheyvê´ û derketina wê dihata hasibandin, wê ew di rojên havênê de wê, ew wê biheta kirin. Di wê demsalê de wê, bi rohnîya heyvê wê herêm û dever wê, rohnî bûba. Ji wê rohnîbûnê re jî wê di kurdî de wê biheta gotin ´ sayîbûna bi rohnîya heyvê´ wê nav li wê biheta kirin. Di wê demê de wê ti kesek di malên xwe de wê nemaban. Wê herkesek li derve ba. Di wan rojên germ de wê, her malên kurd wê, ji xwe re wê ´taxtên ku ew li wan dirazihin bi malbatî´ wê çêkiriban. Wê arzêlên li ser rûniştinê wê çêkiriban. Wê di vê pêvajoyên şariştanîyên ên ku ew pêş dikevin de wê ev di nava civake kurd de wê pirr zêde wê pêşketîba. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman, rewşa jîyane gûndîtîyê ku wê weke rewşeka ku wê pirr zêde wê were nasîn û di nava wê rewşê de wê herkesek wê hevdû nas bike, wê di wê rewşê de wê pêşbikeve. Li kurdistanê, ev pêvajoyên jîyane civakê, hertimî ku mirov wan werênê li ser ziman, divê ku mirov, ji rewşên desthilatdarîyê hertimî cûda weke weke mijareka bi serê xwe wê hilde li dest û wê werênê li ser ziman. Li kurdistanê û ankû mesopotamya ku mirov wê, tenê li ser kirinên rêveberîyan re wê hilde li dest, wê di zane min de wê rewşa ku ew herî zêde wê nikaribê rewşa pêşveçûnên bi civakî ên herêmê werênê li ser ziman bê.

Rewşa gûndîtîyê û pêvajoyên jîyane civaketîyê ên li kurdistanê û herêmên wê, em divê ku wê di dewama wê de hê wê li ser wê bisekin in û wê werênina li ser ziman. Rewşa jîyane li gûndan, wê rewşek wê ya teybet wê hebê. Jîyane gûndan, mirov ku wê ji kîjan aliyê ve wê, bikê ku wê fahm bike, divê ku mirov wê werênê li ser ziman ku wê di vê çerçoveyê de wê, rewşek wê ya teybet wê hebê. Li kurdistanê, rewşa jîyane gûndîtîyê ku em bahse wê dikin, wê pêvajoyên wê yên pêşketinê ên ji dema neolîtîkê û bi vir ve wê di rewş û rengekî pêşketinî de wê, xwediyê rewşna heyînî bin. Li kurdistanê, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê li kurdistanê, wê ev rewş, wê weke rewşek teybet bê.

Di rewşa jîyane gûndîtîyê de wê, xosletên jîyane dema neolîtîkê wê hebin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê bi wê re wê werênê li ser ziman ku wê li kurdistanê wê ev pêvajo, wê di rewşek bi têgînî wê hin bi hin wê xwediyê rengekî pêşketinî û pêşveçûyînî jî bin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê li kurdistanê wê ev pêvajo, wê di çerçoveyekê de wê di ahengek pêşveçûyînî a di jîyane civakî de wê bibê. Li herêmên kurdistanê, em ku wê kîjan herêmê wê lê bikolîn, emê vê yekê wê, baş kifşbikin û wê fahmbikin ku wê, li wê herêmê wê jîyane neolîtîkî wê di dema neolîtîkê de wê li pêşketibê bê. Bi vê yekê re mirov, wê yekê jî bi wê re wê di dewama hevdû de wê werênê li ser ziman.

Em di pêvajoyên jîyane dema şariştanîyê de wê, rengê jîyankirinê ê li herêmê ku wê dikin ku wê fahmbikin wê, bi wê re wê ev jî wê werê dîtin ku wê xosletên dema civake neolîtîkê ku wê çawa li ser wan re wê peresendin wê pêşbikeve, mirov wê kifş dike. Li vir, wê di nava xosletên xwe yên yên xwezayî

û jîyanî de wê di rengekî pêşveçûyînî de wê, bijîyan. Teybetmendîya jîyane vê herêmê wê were dîtin û kifşkirin ku wê, xalkê vê herêmê wê di çerçoveya jîyane xwe de wê bihizirê bê. Her wusa, em di vê çerçoveyê de em nikarin tenê li ser rengê pêşveçûyînî û rêgezên şariştanî tenê re wê hilde li dest û wê fahmbike. Pêvajoyên şariştanîyê, wê bi xwe re wê, têgînên weke rewîst, zanîn, têgînên afsûnî û hwd wê pêşbixê. Di aslê xwe de mirov ku wê rewşa pêşveçûnên dema şariştanîyê li ser pêşveçûnên aqil re wê, dike ku wê fahmbike, mirov wê di vê çerçoveyê de wê kifş bike ku wê xosletên dema civake neolîtîkê ku ew pêşketina wê, li ser fahmkirina wan re wê rengekî pêşketinê wê xwe bide dîyarkirin. Minaq, em rewşa afsûnê li vir cardin wê bibîrbixin. Di rewşa têgînên totemîsmîkî û anamismîkî de wê, rewşa rengê afsûnî ku wê were dîtin, wê bi vegotinên dûvdirêj ên weke bi mîtolojîya dema sûmerîyan û hwd re mirov, wê dibînê wê pêşveçûnên wê bi serborîyan re wê were pêşxistin û ankû wê were li wê zêdekirin.

Pêvajoyên şariştanîyê, wê di vê çerçoveyê de wê, di serî de wê weke pêvajoyna ku wê di hişmendîya aqil de wê xwediyê nerînekê bin. Têkilîyên nava mirov de wê, li ser wê re wê werina sererastkirin û hanîn li ser ziman. Zanîn û piştre wê zanist wê pêşbikevin. Wê ev rewşa jîyanê wê bi xwe re wê sererast bikin. Di aslê xwe de wê, rewşa civakî ku wê ji gelek aliyan ve wê bi neyînî jî wê bide xirakirin jî wê ev rewş bin. Aqil, dema ku ew li ser raman, têgîn, zanîn û piştre weke felsefeyê pêşket û pê de wê were pêşxistin, di nava civakê de wê hîyararşîyê wê pêşbixê. Wê di vê çerçoveyê û rengê de wê bi awayekî wê qatbûnê wê bi xwe re wê pêşbixê. Hîyararşîya ku ew qat bi qat bi civakî di nava wê de li çînan belav dike wê, di vê çerçoveyêde wê, wê rastîyekê wê derxê li holê. Ev jî wê bi xwe re wê pirsgirêkên civakî wê werênê. Civak, wê di nava wan têgînên çînî û qatbiqatî de wê were tafisandin û fatisandin. Wê bêbêhn wê were hiştin. Wê nikaribê xwe bi pêşketina xwe re wê bijî. Di rewşa civakê de wê, di pêvajoyên şariştanîyê de wê, di aslê xwe de wê civak, wê di çerçoveya têgîn û tekoşîna parastina hebûna xwe de wê tekoşîna xwe ragihandina xwe bixwe jî wê bide. Hinekî wê, tekoşînên civakî ên di pêvajoyên şariştanîyê de wê, wateyek wan ya bi vî rengî jî wê hebê. Bi demê re wê hertimî wê pêşveçûnên nû wê di nava civakî de wê derkevin. Lê ew pêşveçûn, wê weke qat, beş û ankû çînna nû ên civakî wê werina hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê hîyararşîya civakî wê di aslê xwe de wê were pêşxistin. Hîyararşîya civakî, wê weke têgîneka têgîna dema şariştanîyê bê.

Pêvajoyên jîyane civakî ku em li herêmê ji dema civake neolîtîkê wê dihildina li dest û wê dikin ku wê fahm bikin wê, bi wê re wê her wusa wê di vê çerçoveyê de wê weke rewş û têgîneka civakî a ku mirov wê bi giringî wê hilde li dest bê. Pêvajoyên jîyane civake neolîtîkê, di aslê xwe de wê, wê weke pêvajoyna ku ew di çerçoveya civakê de wê çawa fêrbûn û wê were pêşxistin û wê bi wê re wê were jîyankirin û hwd, wê li ser wê re wê xwediyê rengekî pêşketinî bê.

Di dema civakê de wê, li gûndan wê mal wê pêşbikevin. Wê têgîna malê ku ew were kifşkirin, wê weke têgîneka giştî a mirovî a di çerçoveya parastina mirov de bê. Her wusa mirov, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, di nava rengê jîyane civakê de wî wateya malê, bi rewşa parastinê re wê xwe ewil wê bide nîşandin. Piştre jî wê, weke weke sazîyeka civakî a ku wê di wê de wê jîyan pêşbikeve wê were li ser ziman. Wê ev sazîya civakî, wê weke sazîyeka temenî a civakî bê.

Têgîna malbatê, wê di aslê xwe de wê, weke têgîneka ku wê piştre jî wê li gorî aqilê mirov wê reng û awa wê bistênê. Her wusa, wê di pêvajoyên şariştanîyê de ew pêşveçûnên ku wê weke bi kirmanan û hwd re ku wê, di vê çerçoveyê de wê bi vê aqilê wê werina pêşxistin. Mal, weke rastîyeka jîyanî a civakî ya. Di aslê xwe de wê, ya ku wê temenê têgîna civakê û pêşketina wê biafirênê jî wê di aslê xwe de wê ev rewşa jîyane malbatî bê.

Wê her sererastkirin, wê di pêvajoyên şariştanîyê de wê li ser rewşa malbatê re wê werina pêşxistin. Minaq, wê bi aqil, wê were bi hişkirin û wê hişmendîya wê were pêşxistin ku wê, di nava malê de wê kî bijî, wê têkilîya wan bi hevdû re wê çawa û wê çawa bijîn û hwd. Ev rewş hemû wê, di çerçoveya malbatê de wê, xwe bidina dîyarkirin. Di pêvajoyên piştre de ku wê, ol û hwd, pêşbikevin, wê weke têgînna bi zanînî wê ppêşî wê li ser rengê bi sazûmankirina rewşa malbatê re wê xwediyê rengekî hişmendî bin.

Dema ku bahse malbatê dihê kirin, wê di serî de wê têgîna rewîstê wê were berbîra me. Di wê çerçoveya têgîna rewîstê de mirov, wê rewşa ku wê bi rengê ku ew bi wê dijî wê, ew wê kifş bike. Dema ku mirov li ser rewşa rewîstê re wê hizirkirinê dike, wê weke ku wê berî têgîna rewîstê wê malbat jî wê nebê. Lê di aslê xwe de wê, ne wûsa bê. Wê hebê. Minaq, mirov dikarê dema neolîtîkê û civaketîya wê minaq bide û wê werênê li ser ziman. Berî wê dema mezolîtîkê û pêşveçûnên di wê çerçoveyê de ku ew

dibin mirov, dikarê wan werênê li ser ziman. Pirsgirêka fahmkirina rewşa mirov, têkilîya nava malbatî, ya dêûbav, zaro û dêûbavan, zaro û zaroyan bi hevdû re û hwd, wê ji gelek aliyan ve wê ew werina lêpirsîn. Di rewşa têkilîya wan ya bi hevdû re wê sînorê çi bê? Ev wê weke pirseka rewîstî wê hertimî wê were li holê û ser ziman. Rewşa rewîstê ku mirov wê dike ku wê fahm bike wê weke rewşeka giring û wê karibê weke rewşek dîyarker wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, kirinên ku mirov kirina û ku ew li mirov rast hatina, wê weke kirinên bi rewîstî jî wê were hanîn li ser ziman. Li vir, fahmkirina têgîna ´rastîyê´ û piştre ya ´başîyê´ hwd, wê weke rewşna ku mirov dikarê wan bi teybetî wan hilde li dest bê. Pêvajoyên şariştanîyê, wê weke pêvajoyna ku wê van gotinan wê ji xwe re wê weke têgînna aqilî ên kifşkar wê di çerçoveya weke pîvanna de wê bi wan re wê bijî.

Di rewşa fahmkirina rewşa têkilîyên malbatî ên berî pêvajoyên şariştanîyê de wê di vê çerçoveyê de wê gelek tişt wê werina li ser ziman. Li vir, em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, aqilê mirov wê, di çerçoveya pêşveçûnên wê de wê têgînên weke xwestekê û hwd, wê weke rewşna afrîner ên di navaroka wê de bin. Xwestek, wê di rewşa wê de wê, weke têgîneka dîyarker jî bê. Mirov çi dixwezê? Wê ew weke rewşeka ku mirov wê bike bê. Xwestek, wê weke rewşeka ku em wê divê ku wê li ser hebûna jîyanê û bûyîna jîyanê û de çerçoveya jîyanê de wê, werênê li ser ziman bê. Di rewşa têgîna xwestekê de wê, jîyan, wê bi hebûna xwe re wê weke rewşeka heyînî a ku ew bi wê re wê ji temenî ve wê ew wê bide pêşxistin bê. Rewşên têgînî ku wê pêşbikevin, wê di destpêkê de wê her kirin, wê weke kirinna ku ew bûyîna, wê werina zanîn û wê weke minaq, wê xwe bide dîyarkirin. Di pêvajoyên pêşî ên şariştanîyê de em li ser têgînên mîtolojikî re wê kifş dikin ku wê rewşa rewîstê û ya tirsê wê bi hevdû re wê were li holê.

Di rewşa pêvajoyên şariştaniyê de wê, ya ku wê werê dîtin ku wê bi demê re wê têgînên weke têgîna rewîstê û hwd ku wê pêşbikevin, wê reng wê bidina xate pêşketina wê civakî, Wê pêşî wê ji rewşna wê, wê biafirin rewşên rewîstî weke hişna. Piştre jî wê, bi wê rewşa xwe ya hişmendî re wê karibê sînorê kirin û nekirinê jî ew bi xwe re bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê rewşa aqil wê li ser têgîna rewîstê re wê di çerçoveya pêvajoyên jîyanê de wê xwe bide dîyarkirin weke temen.

Em ku li ser aqil re wê werênina li ser ziman, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, her tiştên ku wê weke têgîn, kirin, tevger û xûy û hwd ku ew bi hişî hatina dîtin û bi watekirin û hwd, wê weke rewşna çandî jî wê xwe bidina dîyarkirin. Şariştanî û çand, wê rewşna ku wê hevdû ji hevdû wê biafirênin bin. Em divê ku wan ji hevdû cuda werênina li ser ziman. Çand, wê her kirin, afirandin û pêşveçûnên bi aqil û hwd ku re dibin wê, çerçoveya wê bi xwe re wê bi afirênin. Çerçoveya têgîna çandê, wê çerçoveya hemû rewş, kirin, tevger, xûy, serborî, jîyankirin û hwd, ên di çerçoveya jîyanê de bin. Her dem, wê li gorî ast, reng û pîvanên xwe wê xwediyê têgîneka çandî a ku mirov wê dikarê ji wê fahm bike bê.

Çand û rewîst, wê di çerçoveya têgîna şariştanîyê de wê, ji gelek aliyan ve wê karibin, cih jî ji hevdû re bihêlin û pêşketina hevdû bi hevdû wê bikin. Lê di aslê xwe de wê çand, wê weke têgîneka bi hişmendî a hîmî bê. Li vir, divê ku ev xelat newê fahmkirin. Rewîst bi xwe jî wê, rengekî hişmendîyê ê li ser têgîna çandê re bê. Mirov, vê yekê dibînê ku wê piştî serdemên civake ddema neolîtîkê û pê de wê, çi were jîyankirin, wê ew bi demê re wê were bi têgihiştinkirin. Bi têgihiştinkirin wê di wê çerçoveyê de bê ku wê bi têgîna ´ya baş´ û ya ´nebaş´ çî ya ku ew ji hevdû werina vaqatandin bê. Rewşa fahmkirina têgîna başî û nebaşîyê wê di aslê xwe de wê di temenê wê de wê, ya bi ´fêdê´ û ne bi fêde´ ya ji jîyane mirov re wê ew hebê. Di vê çerçoveyê de wê ji aliyekî ve wê temenê wê li ser fêdebûnê bê. Lê wê aliyekî wê jî wê li ser rewşa têgîna aqilî a nirxî bê. Ew jî wê weke aliyekî ku mirov wê nikaribê bi gotina fêdeyê wê werênê li ser ziman. Têgîna fêdeyê wê hertimî wê weke têgîneka ku wê karibê mirov ji xate mirov a rast a jîyane mirov jî derxê bê. Têgîna fêdeyê, wê di aslê xwe de wê aliyekî ku wê jîyane civakê wê karibê ji hevdû ji civaketîya wê bi felişênê jî bê. Ber ku têgîna fêdeyê, di karê di mejiyê mirov de wê bike ku mirov tenê li xwe bihizirê û tenê ji xwe re bixwezê. Di vê çerçoveyê de wê têgîna ´egoyê´ wê di temenê wê têgîna fêdeyê de wê hebê. Fêdeya ku ew têgîna egoyê di temenê wê de ya heya, wê weke têgîneka fêdeyî ku ew di temenê wê nêzîkatîya ku mirov wê tenê li xwe bihizirê bê. her wusa di vê çerçoveyê de wê ev jî wê, weke ku mirov ji devê kurdên berê dibihîzê, wê karibê mirov ji mirovatiya mirov derxê bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek têgînî bê.

Di nava civake kurd de wê, di van waran de wê hinek nêzîkatî hebin. Em li vir, divê ku wê di çerçoveya mijare xwe de wê werênina li ser ziman. Bi hezaran salan wê çendeka wan hebê ku ew di çanda xwe de wê, hertimî weke ku ew li xwe dihizirin li yê li hemberî xwe jî ew bihizirin bin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, çanda wan ya mêhvandarîyê wê pirr zêde wê li pêş û navdar bê. Wê, dema ku ew zanibin ku ew hinek ji ciranê wan wê şevê xwarin li male wan çênebûya, wê karibin wê xwarina xwe ya ku wan çêkiriya bi wan re parve bikin. Ev wê, weke çandaka wan ya civakî wê xwe bide dîyarkirin. Di nava wan de wê, giringîdayîna çanda civakî, wê pirr zêde wê hebê. Her wusa, wê di çerçoveyek rêz û hûrmetê de wê hertimî wê ew wê hildina li dest û wê werênina li ser ziman. Ev jî wê, weke aliyekî giring ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman bê. Di warê çanda civakî de wê, zêdeyî li deverên weke gûnd û hwd, wê bi benên jidahî wê li hevdû girêdayî bin. Wê li hevdû wê bihizirin. Wê di her kirin û tevgerê de wê, bixwezin ku ew xwedî zanebûn bin. Bi wê re wê, di nava rewş û tevgerîyekê de bin. Wê civaketîya xwe wê di vê çerçoveyê de wê bi awayekî wê bi nirx wê bi xwe re wê di nava hevdû de wê bijîn. Çanda gûndîtîyê, wê weke çandeka jîyane çolê a nava civake kurd wê, pirr zêde wê pêşketî bê di nava xwe de. Heta ku mirov wê, nekeve nava wê de mirov, wê nikaribê wê bi başî fahm bike û wê werênê li ser ziman. Di şêwayê vegotin, hanîna li ser ziman, li civatên xwe li hevdû hisandin û hwd, wê weke çandeka wan ya civakî a bi mejûyî bê. Wê di vê çerçoveyê de wê, çanda civakê a li kurdistanê ku mirov wê bibîr dike wê di cih de wê têgîna civatîtîyê wê were berbîra mirov.

Di rewşa çandê de wê li kurdistanê, weke nirxek civakî wê kevneşopîyên wan wê pirr zêde wê bi giringî werina dîtin û wê hûrmetek mazin wê ji wan re wê were girtin. Wê ti kesek wê nikaribê wê j inava wê civakê derkeve dervî rêgezên jîyanî ên kevneşopîkî ên civakî. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê nirxên weke ´rêz´, ´hûrmet´, ´maf´, ´kevneşopî´ û hwd, wê weke van wê gelek gotinên ku wê ji temen ve wê nêzîkatîya wan wê karibin bidina dîyarkirin bin. Ev wê,w eke çanda wan ya civakî wê di her demê wê de wê hebê û wê were hanîn li ser ziman.

Ku bahse çanda civakî ew dihê kirin, wê di vê çerçoveyê de wê ew weke aliyekî giring wê ew werina hanîn li ser ziman. Li kurdistanê, wê çanda civakî wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Bi wê re jî mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê çanda civakê wê weke çandeka ku wê, di nava wê de wê di çerçoveyek sazûmanî de wê pêşveçûnên şariştanî wê pêşbikevin bin.

Heta roja me jî wê, li ser têgînên aqilî re wê di çerçoveya afirandina sazûmanên weke sazûmanên civakî ên bi desthilatdarî û hwd re wê, werina hanîn li ser ziman. Li vir, di aslê xwe de wê têgîna ku wê rêveberîyê weke astek şariştanî wê werênê li ser ziman, wê weke têgîneka ku ew ji têgîna civakê qût bê. Wê rastîya civakê bi ser serî ve berjêr bike û wê bi wê re wê li wê binerê û wê werênê li ser ziman bê. Ber wê, ev têgîn û nerîn, wê weke têgîn û nerîneka ku wê hertiştî wê di nerîna desthilatdarîyê de wê li wê binerê bê. Wê hebûna civakê jî wê, di wê çerçoveyê de wê li wê binerê. Bo vê yekê wê, her tiştê wê di perspektîfa desthilatdarîyê û çand û ramana wê de wê, li wê binerê û wê werênê hanîn li ser ziman. Ya ku wê weke rewşeka ku wê hin bi hin di pêvajoyên şariştanîyê de wê ji rastîya xate civakî a mejûyî wê qût wê civakê wê werênê hanîn li ser ziman jî bê wê, ev bê.

Di aslê xwe de wê, heta roja me wê di pêvajoyên şariştanîyê de wê temenê pirsgirêka hebûnî a civakan jî bê, wê ev rewş û têgîna desthilatdarîyê a bi vê rengê bê. Di rewşa wê de mirov, divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê pêvajoyên şariştanîyê, wê piştî pêşveçûnên civakî ji astekê û pê de wê, pêşbikeve bê. Her wusa, li vir, em vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku mirov ji kûve û çawa binerê, wê ew rengê nerîna mirov û rengê hanîna mirov a li ser ziman jî wê bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê pirsgirêkên şariştanî, wê weke pirsgirêkên nerînî bê.

Pêvajoyên jîyane civakî, wê li herêmên ber diclê û firatê û ankû li kurdistanê wê, pirr zû wê destpê bikin. Di vê çerçoveyê de mirov, dema ku wan pêvajoyan dike ku wan werênê li ser ziman, bi wê re em rastî gelek pêvajoyên şariştanîyê dihên. Di pêvajoyên şariştanîyê de wê, li ser xatên têgînî re wê ji serdemên sûmerîyan û bi vir ve wê xate êzdayî û hwd wê bi hezaran salan wê hebûna xwe pêvajo bi pêvajo wê li kurdistanê wê xwe bide jîyankirin û domandin. Di vê çerçoveyê de wê, rengê pêvajoyên olî ên ku wê pêşbikevin, wê weke rengekî şariştanî bin. Ol, wê, weke têgîn û sazûmanaka bawerîyê wê di nava jîyane şariştanîyê û rengê wê yê civakî de wê, weke rêgezek esasî bê. Di vê çerçoveyê de wê têgîna olê wê weke ya çandê wê li ser rewş û pêvajoyên aqil re wê xwediyê rengekî pêşketinî ên bi jîyane civakî re bin. Her wusa, wê di nava wê civakê de wê, di aslê xwe de wê çerçoveya wê civakê jî wê bi şêwayekê

wê bide dîyarkirin. Em li vir wê yekê jî wê di dewama wê de wê werênina li ser ziman ku wê piştî pêvajoyên jîyanî ên dema neolîtîkê û pê de wê, pêvajoyên civakî ên civakî ên dema şariştanîyê wê pêşbikevin. Di wê pêşketinê de wê, çanda wê ya civakî wê, wê pêşbikeve bê. Her wusa çanda civakî, wê rengê wê yê jîyanî ku ew çawa ya, çawa dijî û wê bijî, xwediyê çi rengên destûrî, zagonî û rêgezî ên jîyanî ya û hwd, wê ew jî wê bi wê re wê bi şêwayekî li ser rengê aqil û hişmendîyê re wê werina dîtin. Ti civak, wê ne bê rengên destûrî, zagonî û rêgezî ên jîyanî ya û hwd, bê. Wê, her rengê jîyane wê ya ku ew bû, wê weke rengekî çandî û ankû kevneşopîya wê, wê xwe di nava jîyane wê de wê di pêvajoyên wê yên şariştanî û hwd de wê bide nîşandin û wê temenê pêşketina wê, bi xwe re wê biafirênê bê.

.

**Di dewama pêvajoyên jîyane neolîtîkê de wê pêvajoyên jîyane şariştanîyê wê pêşkevin**

Di dewama pêvajoyên jîyane neolîtîkê de wan pêvajoyên jîyane şariştanîyê hanîna li ser ziman wê, rastîya xate pêşveçûna bi mejûya civakî û dîrokê re wê werênê li ser ziman. Her wusa mirov, dema ku wê wan pêvajoyan wê werênê li ser ziman, wê her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rengekî jîyanî bê. Jîyane civakî, pêvajoyên wê yên di dema neolîtîkê a zû û dereng de ku wê pêşbikevin wê, bi xwe re wê pêvajoyna nû wê bidina pêşxistin. Rewşa civaketîyê fahmkirina wê, wê di rastîyê de wê baştirin wê bike ku mirov wê fahm bike û wê werênê li ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê jîyane civakê, wê pêvajoyên wê, bi awayekî pirr-dîmenî bê. Em çendî ku di pêvajoyên zû ên pêşî ên neolîtîkê de wî di dema dema mezolîtîkê de wê pêvajoyek jîyane civakî a ku wê biber jîyane gûndîtîyê ve wê herê ku mirov wê kifş dike, wê bi heman rengî di dema dereng a neolîtîkê de jî wê pêvajoyên pêşketina jîyane gûndîtîyê û ankû weke ku em ji rewşê dikarin bi nav bikin wê, gûndên neolîtîkî ku wê pêşkevin, wê di şêwayekî ku wê, di hundûrê xwe de wê, jîyane şikeftê, wê bi awayekî peresendî ku ew bi wê re hebê wê xwe bi wê rengê re wê bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê jîyane şikeftîtîyê û ya gûndîtîyê wê di zikhevdû de wê di nava rewşa jîyane gûndên neolîtîkî de wê pêşbikeve.

Gûndên neolîtîkê wê di wan de wan wê şêwayekî jîyanî ê weke klanî wê pêşbikeve. Wê di cihê xwe de wê bijîn. Lê wê di nava jîyane xwe de wê bi wê jîyane komî ku ew heta wê demê jîyankirina wê, ji nava wê pêşketina jîyane malbatê wê li ser rewşa dayiktiyê re wê pêşbikeve û wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê, di temenê têgîna malbatîtîyê de wê, têgîna ku ew zarok ku ew dayik wan dihênê dunyê ku ew ji kê bavî na, wê ew jî dîyar bê, wê hebê. Bi wê re jî wê di rewşan de wî zelalî wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Di nava jîyane komê de wê ev nedîyar bê. *Pirrjinîtî û pirrmêrîtî*, wê di nava komê de wê hebê. Di nava komê de wê ya ku wê ya esas wê ew bê ku wê ew zaro wê ji kê bavê bê, ku ew nezelal bê. Lê di rewşa malbatê de wê, ev zelal bê. Her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê ev rewşa ku wê zelalî ku wê di wê de wê xwe bide dîyarkirin wê, temenê rewşa malbatîtîyê û pêşketina têgîna aîdîtîyeta wê ya ku ew pêş dikeve jî bê.

Di vê rewşê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê rewşa malbatê, wê di vê rewşê de wê weke rewşeka ku ew di nava wê de wê ew zelalî wê hebê bê. Wê zaro wê, dê û bavên xwe wê nas bikin. Wê di vê çerçoveyê de wê, ev zelalî wê hebê. Di nava malbatê û pêvajoyên wê yên pêşî de wê rewşên rêgezî ên weke yên jîyanî ên jîyane komî ku wê di çerçoveya rewşên weke têkiliyên zayendî û hwd de wê, di çerçoveya têgîna temenê malbatê de wê di destpêkê de wê bûhurîner bê. Piştre wê, her wusa wê li ser van rewşan re wê hin bi hin wê bi pêşketina rewşên weke rewîstê û hwd wê rengdayîna wan wê pêşbikeve. Rewîst, wê hertimî wê di destpêka xwe de wê şoreşgerî bê. Lê piştre wê bê weke zincîreka ku ew di destê xwe de dilgirê bê.

Pêvajoyên destpêkê ên malbatîtîyê wê di vê çerçoveyê de wê kifşkar bê. Wê hemû kifşkarî wê bi pêşveçûnên aqil re wê xwe bidina dîyarkirin. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, pêvajoyên aqil û pêşketina aqil, wê destpêka wan ji xîzkirinên li hêtên şikeftan û piştre ku wê di vê pêvajoyên jîyane gûndîtîyê de wê li ser keviran û hwd wê ew xîzkirin wê hebûna xwe wê bide domandin. Wê di dewama wê de wê wê ev pêvajo wê weke pêvajoyna ku mirov dikarê wan di vê çerçoveyê de wê hilde li dest bê. Pêvajoya jîyane gûndîtîyê wê, di wê de wê aqil wê heta astekê wê bi hiş wê pêşketî bê. Çêkirina amûran, çandinî û pêşxistina amûrên çandinîyê, çêkirina kûwaran bo tişî zadkirin û hilandina wê û hwd, wê ev weke rengna pêşketinî ên bi aqil û hiş re jî bin. Di vê çerçoveyê de wê mirov wê, bidest fêrbûna ku ew bi encamên aqilê xwe re ew bijî bê. Pêvajoyên aqil, wê ew xîzkirinên mirov, wê

piştre wê, bi awayekî pirr-alî wê di nava jîyane demê de wê pêşbikevin. Wê ew wê, temenê têgînên weke bawerîyê jî bin. Her wusa têgînên totemîsmê û anamîsmê wê pêvajoyên xwe yên seretayî û piştre ên pêşketî wê li dûvhevdû wê di van pêvajoyan de wê bijî. Pêvajoyên pêşketî ên bi totemîsmê û anamîsmê re wê bi destpêka pêvajoyên mîtolojikî re wê di zikhevdû de wê pêşbikevin.

Pêvajoyên têgîna mîtolojîyê wê weke pêvajoyna bi aqil ên bi rengê vegotinî bin. Wê weke pêvajoyên aqilê razber ê pêşketî jî bê. Vegotinên mîtolojikî, wê di jîyanê de wê weke wan nebê. Lê ew vegotin jî wê, di aslê xwe de wê di mejiyê mirov demê de wê bi şenberî wê xwediyê rengekî şenber bê. Minaq, di pêvajoyên şariştanîyê ên piştre de wê tirba nûh ku wê li Cizîra bota wê were çêkirin wê di qama sê mirovan de wê dirêj bê. Bi rastî nûh wusa dirêj bû di jîyane xwe de? Ev rewş û rewşên weke wê, em î ro jî ku em li vegotinên li nava kurdan dinerin, em di wan de wê rengê vegotinî bi awayekî vekirî wê dibînin. Di rewşek aqilî ku wê hertişt wê di wê de wê bi kirinî wê bi derfet bê wê were hizirkirin. Minaq weke ku wê bê gotin ku "*rûstemê zal, di rahişt çîya û didanî li ser çîyayan.*" Ev rengên vegotinî wê bi xwe re wê têgînekê di derbarê rengê pêşketina aqilî a demê de jî wê bidina me.

Pêvajoyên şariştanîyê ên piştre wê di vê çerçoveyê de wê ji aliyê aqilî, zanînî, ramanî û hwd ve wê, temen û çandaka wê, wê biafirê. Di wê çerçoveyê de wê, ev pêvajo, wê pirr zêde wê dîrêj wê pêşbikevin. Li herêmên kurdistanê ku em î ro jî rastî bi sedan şikeftên ji dema neolîtîkê ên ku ew di wan komên mirovên dema neolîtîkê di wan de jîyane na, wê li ser hêtên wan wê pirr zêde wê tefsîr û sûret û ankû wêneyên ku wan xîzkirina wê hebin. Ev jî wê, wê ji aliyekî ve wê weke têgînna bin. Mirovan ev xîzkirinên sûret û ankû wneyên sawalan û rewşên weke ên nêçîrkirinê û hwd, wê di mejiyê mirovan de wê bi hin wateyna wê cih bigirin. Di vê çerçoveyê de wê gelek tefsîrên sûretî û ankû wêneyî wê hebin. Ev jî wê temenekî pirr zêde baş wê ji rewşên pêşketina nivîsandinê û hwd re wê bo demên pêş wê biafirênin. Ji vê yekê ku mirov gav diavêjê mirov, zêde şaş û matmayî namênê ku wê li herêmê wê di demên pirr zû de wê, nivîs wê were kifşkirin û wê nivîsandin wê were pêşxistin. Ber ku wê her şikeftek wê, bi sûret û wêneyên xwe yên ku ew di hûndûrê wê de ew hatina xîzkirin wê, weke rewşna têgînî ku wê di mejî de wê temenê wê biafirênin bin. Piştre jî wê, di vê çerçoveyê de wê di dewama wê de wê tîpên wêneyî wê pêşbikevin. Tîpên wêneyê ku wê tiştên ku ew hena, wê ew her yekê weke bi wateyekê wê weke tîp wê werina pêşxistin û bi watekirin. Ev jî wê bi wê re wê pêşbikevin.

Di vê çerçoveyê de mirov li pêvajoyên piştre ên şariştanîyê dinerê ku wê di tefsîrên wan ên li herêmê de wê,bi şêwayekî wê ku wê ji wan sûret û ankû wêneyên xîzkirî ên li hêtên şikeftan wê gavê biavêjin û wê xîzkirina wê pêşbixin. Lê wê bi awayekî ku wê hinekî wê ji aliyê xwe ve wê li wê zêdebikin bin. Minaq, wan di mejiyê xwe de her sawal weke şêr, eylo, baz û hwd, bi watekirina. Di vê çerçoveyê de wê, ev temenê wê de bê ku wê dema ku wê di pêvajoyên şariştanîyê de wê keyek wê derkeve û wê bo ku ew mazin bide nîşandin, wê xwe bi şêr, eylo, baz û hwd wê tefsîr bike û ankû wê ew ji aliyê şêwirmendên wî ve wê bi wê rengê wê ew were hanîn li ser ziman. Ev tefsîrên ku ew di mejî de ew hatina salixkirin wê, temenê têgînekê jî bin. Wê bi demê re wê ew pêşbikeve. Wê ew rewşên weke salixkirinî wê, werina pêşxistin. Wê ew jî wê bi wateyî wê hin bi hin wê werina pêşxistin. Pêvajoyên peresendinê ên li ser wan xîzkirinên li hêtên şikeftan ku wê bi şîroveyên vegotinî ên totemîsmî, anamîsmî û piştre bi mîtolojikî wê bê kirin, wê di dewama wê de wê di pêvajoyên şariştanîyê ên piştre de wê, di vê çerçoveyê de wê bi şêwayna din jî ê weke bi afrînerî wê xwe bide domandin. Mirov, wê li ser xosletan re wê bidest hizirkirinê bike. Minaq, rewşa hizirkirin û tefsîrkirina mirovekî ku ew weke bazekî û ankû eyloyekî bibask(per) û ew difirê, w di vê çerçoveyê de wê pêşbikeve. Keyekî ku ew laşê wî, bi tememî wê weke laşê şêrekî û wê baskên eylo û ankû bazekî wê werina hizirkirin û wê bi wê hizirkirinê wê werina danîn li ser pişta wî, wê di vê çerçoveyê de wê were hizirkirin. Ev pêvajo, wê weke pêvajoyna ku mirov wan dikarê di vê çerçoveyê de wan hilde li dest bê. Pêvajoyên pêşxistina van rewşan wê, taqabûlî pêvajoyeka pêşketinî a bi aqil a pêşketî wê bike.

Pêvajoyên şariştanîyê ên ku wê ew pêşbikevin wê di vê çerçoveyê de wê temenekî wan hebê. Wê di dewama pêvajoyên pêşketina civake neolîtîkê de wê, pêvajoyên şariştanîyê wê xwe bidina pêşxistin. Wê têgînên weke totemîsmê û anamismê wê weke têgînna ku wê di dema civake neolîtîkê de wê pêşbikevin bin. Dîroka toteman, mirov dikarê wê bibê heta dema dawî a peleolîtîkê, piştre mezolîtîkê û di dewama wê de wê, bi pêşketina wê ya di dema neolîtîkê de wê werênê li ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de wê di dema neolîtîkê de wê bi civakî wê xosletên ku wê pêşbikevin, wê di vê çerçoveyê de wê di dewama

wa de wê li ser wan re wê bihişmendîya ku ew pêş dikeve re wê, pêşketinên dem şariştanîyê wê bên û bijîn.

Pêvajoyên dema şariştanîyê ên civatî, wê her wusa wê weke pêvajoyna ku wê bi aqil wê êdî wê pêşbikevin bin. Wê di wan de wê, çendî ku wê bi aqil wê kifşkirin û pêşxistin wê bibê, wê li ser wê re wê pêşketin jî wê bi demê re wê werina jîyankirin. Rewşên weke çandiniyê û hwd, wê ji nîşanakên li herêmên kurdistan ên weke ji şikefta hêlêrê, şikefta hassûna, herêma serêkahnîyê a rojavayê kurdistanê, marê, mimbicê, afrînê, Amûdê û hwd mirov kifş dike ku wê li dora 10 û 8 hezar salan de wê çandinî wê pêşbikeve li kurdistanê li ber diclê û firatê. Her wusa, tevî van herêmên ku me navê wan got, wê hinek herêmên din jî wê li herêma botanê, li herêma rojavayê kurdistanê, rojhilatê kurdistanê û başûrê kurdistanê wê hebin ku em, dikarin wan jî li vir bibîr bikin.

Di dema çanda hassûna de wê, ku em dikarin wê weke çanda civakî a dema neolîtîkê jî wê werina li ser ziman, wê rewşên çandiniyê wê li dûv hevdû wê pêşbikevin. Wê di aslê xwe de wê şoreşa çandiniyê wê di vê demê de wê di demên navîn û navî ên neolîtîkê de wê li kurdistanê wê werê kirin. Herêmên ber diclê û firatê ku ew zûwabûna û derfetek baş ji çandiniyê re wê biafirênin, wê bi rewşa avdayîna wan ji diclê û firatê û hwd wê, bi wê re wê pêşbikeve çandinî wê, weke rewşeka ku wê temenê pêşketina pêvajoyên şariştanîyê jî wê ji aliyekî ve wê bi xwe re wê biafirênê bê. Çendî ku ew pêşket û pê de wê, di dewama wê de wê berhevkirin wê pêşbikeve. Pêvajoyên şariştanîyê, wê piştî ku ew berhevkirin pêşket û pê de wê, bidest xirabûna wan bibê. Her wusa azwerîya bi xwestina bidestxistina wê berhevkirina zad û û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê, temenê pêvajoyê dagirkeriyê ên di demên şariştanîyê de jî wê bi xwe re wê biafirênê. Her wusa wê bi demê re wê, ketina farqe zêde afirandinê de jî. Ber vê yekê wê, girse wê weke ´karker´ wê li deverê wê werina bikarhanîn. Li ser serê wan jî wê weke çînna ku ew karnakin lê ku ew hevkarê wê afirandina ku ew girse dikê jî wê, oldar, leşker û rêveber bin. Ew wê, di vê çerçoveyê de wê bina weke barekî pirr zêde giran ê li ser milê wê girseyê jî. Wê di vê çerçoveyê de wê pêvajoyên şariştanîyê wê xwe bidina domandin.

Çanda civakî wê, hinekî jî wê li ser rewşa afirandina bi hevdû re, jîyankirina bi hevdû re û bi wê re pêşxistina hevbeşîyênn bi hevdû re bê. Wê di vê çerçoveyê de wê ya ku wê rastîya civakê wê werênê li ser ziman wê ev hevbeşî bê. Wê nirxên hevbeş wê, temenê wê biafirênê. Hevbeş bi watekirin û gihiştina wateyê, wê di vê çerçoveyê de bê. Minaq, tiştekî ku ew hatî salixkirin bi wateyî wê çawa ew bê malê girseyê, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wateyê bê. Di rewşa girseyê de wê ev wê bi demê re wê zêdetirî wê pêşbikeve. Pêvajoyên afirandinê ên weke çandinîyê û bi hevdû re jîyankirinê wê, temenê pêşxistina hevbeşîyan jî bê. Minaq ziman, wê weke nirxekî hevbeş ê li ser aqil û pêşketina aqil re ku ew pêş dikeve bê. Ziman, wê temenê têkilidanînê bê. Wek nirxek çandî a serdest wê ziman, wê pêşbikeve. Ziman û zanîn, wê bi awayekî li hevdû hoyandî wê weke du hevlingên hevdû wê hertimî wê bi hevdû re wê di pêvajoyên pêşketinê de bin. Di kîjanê de pêşveçûn bû, wê encamên xwe di yan din de jî wê bide nîşandin. Ev rewş wê, bi demê re wê zêdetirî wê were dîtin. Li ser wê re jî wê di pêvajoyên şariştanîyê de wê were jîyankirin. Pêvajoyên şariştanîyê, wê xwediyê têgîneka serdestî bê. Her wusa wê çandê weke ast û pîvaneka serdestî a bilind wê hilde li dest. Di vê çerçoveyê de wê çand jî wê, weke rewşek zêhnî wê di pêvajoyên şariştanîyê ên pêşketînê de wê ji temen ve wê xwediyê weyn û rolekê bê. Pêvajoyên jîyane civakê ku ew dihên jîyandin wê, bi wê jîyandinê re wê çawa û bi çi rengê ew hatîya jîyandin, wê ew rengê wê, wê were dîtin. Wê ew were dîtin bi hiş. Ev jî wê, ji aliyekî ve wê temenê pêşveçûnên bi aqilî ên bi demê re jî wê bi xwe re wê biafirênê bê.

Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman wê, rengê jîyanê wê xwe bi çandê re wê bide nîşandin. Mirov, di demên bûhûrî de ew çawa jîyankirîya wê ew wê bi wê re wê were dîtin. Çand, wê bi awayekî û rengekî wê şeklê wê jîyane ku ew hatî jîyankirin jî bê. Di vê çerçoveyê û rengê de jî mirov, dikarê wê werênê li ser ziman.

Di rewşa jîyane civakî de wê, bi demê re wê bi teybetî di pêvajoyên şariştanîyê de wê aqil wê derkeve li pêş. Wê aqil, wê bi wê re wê weke rewşek jîyanî a ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman bê. Aqilê mirov wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek heyînî a ku mirov wê karibê wê werênê li ser ziman bê. Jîyan û aqil, wê di çerçoveya pêşveçûnên şariştanî de wê, hevdû temem bikin di pêşveçûnê de. Aqil piştî ku ew pêşket û ew di nava wê de rengên pêşketinê ên nû ew derketina li holê û ankû hatina dîtin, wê bi wê re wê pêşketinên nû wê xwe bidina dîyarkirin. Civak, wê bi demê re wê bigihijê çandeka ku wê mirov

wê weke endamê civakê ku wê ew li vir ew li gorî wê bijî bê. Di aslê xwe de wê, di vê çerçoveyê de rewşa têgîna çandê wê, weke mijareka teybet a ku mirov wê hilde li dest wê çand, wê derkeve li pêş. Çand û şariştanî wê di harşîya xwe de wê xwediyê rengekî pêşketinî ê di jîyanê de bin. Çand, ku mirov wê ji kîjan aliyê ve wê hilde li dest wê, çendî ku wê weke mejûya civakê û ankû a jîyanê û mirov ku ew jîya ye ku wê were li ser ziman jî lê wê, weke têgîneka ku wê bi demê re wê bi aqilî wê kifşkarîyê wê di dest xê û wê pêşketinê wê bide dîyarkirin.

Çanda civakî a li kurdistanê, wê dema ku mirov wê di hilde li dest, mirov, wê hertimî dike ku wê bibê serdemên berî şariştanîyê. Ber ku ew di wê demê de destpê dikin. Wê piştre jî wê, di dewama wê de wê xwe bidina domandin.

Pêvajoyên ku wê, di dema şariştanîyê de wê bi şariştanî wê werina jîyankirin, wê piştre wê beş bi beş wê li herêman wê li hevdû wê zêde bibin û wê bi wê re pêşketinê wê bi xwe re wê bidina çêkirin û jîyankirin. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê pêvajoyên şariştanîyê wê, dem bi dem wê bi ast wê pêşbikevin. Her pêvajoya piştre a ku wê were, wê li ser ast û pîvane ku ew bûya û jîyane wê pêşketîya wê bibê û wê mazin bibê. Di vê çerçoveyê de wê di aslê xwe de wê, di dîmenê dîtinê de wê di awayekî geometrîkî de wê, rengê pêşveçûn û pêşketinê wê di pêvajoyên jîyane civakî de wê xwe bidê pêşxistin û domandin. Ya ku mirov, wê piştre wê di serî de wê werênê li ser ziman wê, pêvajoyên şariştanîyê ên ku ew dem bi dem bi astî wê xwe bidina domandin bin. Her wusa di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê rastîya wê ya bi pêşketina wê ya bi dîrokê re wê werênê li ser ziman.

Pêvajoyên jîyane civakî, ku mirov ji kîjan aliyan ve li wan dinerê, wê di vê çerçoveyê de bin. Em ji demên sûmerîyan û bi vir ve ku em li wan dinerin, wê dem bi dem wê bi ast û pîl wê xwe bidina domandin. Wê her dema piştre wê ji ya berî xwe ku ew hatîya jîyankirin û derbasbûya wê, biawayekî pêşketîtir jî bê. Wê pêvajoya nû, wê hinekî jî wê li ser rewş û encamên pêşketinên ên demên bûhûrî re wê xwe bide jîyankirin û domandin. Di vê çerçoveyê de wê bi alikarîya fahmkirinê û zanînê re wê ev rewş wê bi demê re wê xwe bidina domandin û werênina heta serdemên piştre ên şariştanîyê ku wê bi awayekî pirrdîmenî wê şariştanî wê pêşbikevin bin. Di rewşa pêşketina pêvajoyên şariştanîyê de wê, di vê çerçoveyê de wê rewşek jîyanî wê wê hebê. Li vir, em divê ku vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku wê jîyane civakî, wê di xoslet û xûyên xwe yên ku wê, di destpêkê de wê dana pêşxistin, wê piştre wê wan bizane bike û wê li ser wan re wê pêşveçûnên nû wê bi aqil wê weke encamên bi aqil ên li ser wê re wê bijî. Pêvajoyên şariştanîyê, wê di vê çerçoveyê de wê, her tişt di rewşeka bi hizirkirina di hizir û zanînê de bê. Ber vê yekê wê di şêwayekê de wê weke ku mirov dibînê wê, weke ku wê aqil li pêş bimeşê wê rewşek û dîmenek bi dîtinî wê xwe bide li berçav. Pêşxistina têgînên weke olî û hwd, wê di çerçoveyê de wê çawa wê li civakê û hwd wê bihizirin wê, bixwezin ku ew li gorî wê di xwe de wê adilandinê wê bikin. Sazûmanên civakî ên ku wê, bi pêvajoyên şariştanîyê re wê pêşbikevin, wê hinekî jî wê van têgînên weke di rengê têgînên bîrdozîkî de ku ew pêşdikevin wê, di rengê wan de wê pêşbikevin. Aqilekî ku wê bihizirê ku ´ew ji civakê re ya baştir dihizirê´ wê, pêşbikevê û wê li şûna wê bihizirkirinê re wê rengê xwe wê bide dîyarkirin. Temen û rengê pirsgirêkên civakî ên di pêvajoyên şariştanîyê de jî wê,di aslê xwe de wê bi van pêvajoyên hizirkirinê ên li şûnê re wê xwe bidina nîşandin û dîyarkirin.

Di pêvajoyên şariştanîyê de wê, aqil li pêş bê. Bi aqil re jî ku wê, wê hem weke temenê wê pêşketina aqil dema şariştanîyê û hem jî wê encama wê bê, wê keseyet wê biafirê. Keseyet, wê ji aliyekî ve wê, di temenê xwe de wê têgînek civakî a weke ya yawêtîyê û ankû aîdîyetê wê bihawênê. Têkiliya di nava rewşa keseyet û aîdîyetê de wê, di rewşa jîyane civakê û weke endamê wê xwediyê hebûnê de wê, xwediyê wateyekê bê. Di pêvajoyên şariştanîyê de wê, keseyet û têgîna aîdîyetê wê, derkevina li pêş. Her wusa, ya ku temenê têgîna aîdîyetê di afirênê wê civakatî bê. Ya ku wê temenê civakê jî wê biafirênê wê, bi dîrok, çand, aqil û ankû weke ku wê piştre wê were bi navkirin bi felsefe û hwd re wê were li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê di pêvajoyekê de wê xwediyê wateyê bê. Em nikarin, têgîna aîdîyetê û ya keseyetîyê di çerçoveya jîyane civakî a dema şariştanîyê de wan ji hevdû cuda bihizirin.

Pêvajoyên jîyane civakî ên şariştanîyê, her wusa wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek têgînî bin. Di rewşa civaketîya dema şariştanîyê de wê, rewşên weke çand, dîrok, rêveberî, felsefe û hwd, wê weke ast û pîvanna bilind ên binirxî ên şariştanî bin. Têgîna civaketîyê wê, bi pêvajoyên wê yên ku ew dijî re wê ew were li ser ziman.

Pêvajoyên jîyane civakî, wê di aslê xwe de wê di çerçoveyek têgîna aîdîyetî de wê di dema pêvajoyên şariştanîyê de wê bijî. Di şêwayekî de ew rengê komîya serdema peleolîtîkê, dema mezolîtîkê û ya neolîtîkê ku ew heya, wê di pêvajoyên şariştanîyê de wê bi ast, pîle û pîvanna din ên bilind re wê xwe bidina dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê, civakeyî, wê di pêvajoyên şariştanîyê de wê li ser têgîna ´win, ji kê na´ û hwd re wê rewûa civaketîyê û aîdîyetê wê bi hevdû re wê bide dîyarkirin û hanin li ser ziman. Têgîna bi gotina ´win, ji kê na´ wê, weke têgîneka malbatî jî wê hîs û hêstekê wê bide mirov. Her wusa, wê keseyet, wê li ser wê hêst û hîsê re wê xwe bijî û wê bide jîyandin. Di vê çerçoveyê de wê, li vir, wê weke rewşeka teybet wê, xwe wê werênê li ser ziman.

Têgîna civaketîyê, wê li ser têgîna aîdîyetê re wê xwediyê wê rewşa heyînî a civakî bê. Her wusa, wê mirov, wê di nava wê civakê de wê xwediyê nirxên xwe bê. Wê bi wê re wê xwe biafirênê. Xwe afirandina mirov a di dema şariştanîyê û pêvajoyên wê de wê, bi keseyetîyê re wê xwe bide dîyarkirin.Pêşveçûna pêvajoyêna jîyane civakî wê çerçoveya têgîna aîdîyeta civaketîyê jî wê bi mejûya wê re wê bênê hanîn li ser ziman. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têgîna civaketîyê û mejûya wê, wê di vê çerçoveyê de wê temenê wê hêsta aîdîyetîyê ku wê keseyet wê bi wê re wê xwe bijî û wê pêşbixê. Keseyet, wê di nava wê jîyane civakî de wê li xwe bihizirê, wê bi nirxên wê re wê bijî. Wê rêyên wê yên xwe hanîna li ser ziman re wê werênê li ser ziman. Di dewama têgîna gotina civakî aîdîyetê a weke ´win, ji kê na´ de wê, gotinên keseyetî ku ezîtî û ankû ezbûnîya keseyetî dihênina li ser ziman ên weke ´ez kî ma´ û hwd wê pêşbikevin. Li xwe lêpirsîn û ankû pirsîn wê, di vê çerçoveyê de wê têgîneka temenê keseyetîyê û lêpirsînîya wê bide nîşandin bê. Pêvajoyên jîyane civaketîyê wê di vê çerçoveyê de wê, xwediyê wê rewşa têgîna civakî pêşketî bin. Bi wê re jî wê keseyet, wê di dema wê de wê ”weke endamekî wê civakê” wê, xwe bigihênê wê keseyetîya wê civakê. Di aslê xwe de mirov, nikaribê keseyetîyê ji rewşa wî ya temenî a civakî dûr wî şîrove bike û wî werênê li ser ziman. Wê her rewşên xwe wê wê di vê çerçoveyê de wê bi keseyetî wê hebê. Di rewşa keseyetîyê de wê, keseyet wê weke rewşeka civakî jî bê. Çendî ku em nikaribin, civakê dervî endamên wê û pêşketina wan ya keseyeyî dûr şîrove bikin, bi heman rengî em nikarin keseyetê jî bêî civaketîya wî û temenê wî yê civakî wî şîrove bikin. Ji aliyê wê temenê ve wê keseyet, wê hêst, hîs, pêvajoyên pêşketinê, derûnî, civaknasî, pêvajoyên civaknasîya derûnî, derûnîya civaknasîyê û hwd wê di nava hevdû de wê bi awayekî pirr dîmenî wê bi xwe û civakê bi hevdû re wê bijî. Tabî, dema ku mirov van rewşan wan werênê li ser ziman, divê ku mirov wan, weke rewşna têgînî ên civakî jî wan werênê li ser ziman. Di rewşa civakê û pêşketina wê de wê, ev rewş wê weke rewşna têgînî jî wê, pêşbikevin.

Keseyet, wê di pêvajoya şariştanîyê de wê weke rengekî pêşketina wê ya civakî jî bê. Lê keseyet, wê hertimî wê di nava sînorê civak û nirxên wê, aqil û pêvajoyên wê yên pêşketinê de wê, bijî. Bi wê re jî wê hertimî wê keseyet, wê di rewşeka ku ew di nava rewşa xwe ya civakî de wê, ji xwe derbas bike de jî bê. Wê bi wê rengê wê xwe derbasî astek bilind li ser wê asta ku ew heya. Wê ew asta ku ew afirîya, wê hertimî wê keseyet wê, li ser wê re wê xwe perwerde bike. Wê bi wê re wê xwe biafirênê. Wê ew wê, pêşketina ku ew heya di wê demê de wê ew wê, bike malê xwe û keseyetîya xwe. Bi gotineka din wê, keseyetîya wê pêşketinê a civakî wê bi xwe re wê biafirênê.

Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, rengê pêşketina civakî a dema neolîtîkê wê li ser wê çerçoveya wê re wê bihişbûn wê bibê. Di vê çerçoveyê de wê hebûna mirov, wê were li ser ziman. Keseyet, wê di endamê civakê mirov de wê xwediyê pêşketina xwe bê. Pêvajoyên pêşketina civaketîyê wê bi wê re wê werina bicihbûn. Em dema ku rewşa civakê wê li vir wê hildina li dest wê, were dîtin ku wê civaketî wê weke ardnîgarîya pêşketina têgîna şariştanîyê û pêvajoyên wê jî bê. Lê wê têgîna şariştanîyê wê, wê hertimî wê li ser têgîna desthilatdarîyê û hwd re wê ji wê re wê weke têgîneka bi pirsgirêk jî bê. Wê civak, wê çawa wê pêşbikeve wê, di pêvajoyên şariştanîyê de wê, ev hertimî wê weke pirsgirêkek giring a şariştanî û têgîna wê jî bê.

Civak, wê çendî ku wê di têkiliyên nava wê de wê ew çûnûhatin û pêşketin wê bibê, wê bi wê re wê zanebûn wê pêşbikeve. Ji aliyekî din ve jî wê, bi rengên xwe re wê ew çûnûhatin û pêşketina nava civakê wê, weke têgîneka ku em bi nav dikin wê civaknasî bê. Civaknasî, wê hinekî jî wê navê wan rewşên wê yên ku ew dihên jîyankirin, têkiliyên wê yên navxweyî ku ew dihên danîn hwd bê. Her wusa têkiliyên nava civakê wê, ew li ser rengê bûyîna wan û afirîna wan re wê hişmendî wê pêşbikeve. Civaknasî wê, rewşa têkiliyên civakî ên navxweyî wê werênê li ser ziman. Her mirov, wê ji navikê ve wê, weke ku ew

çawa ku ew bi komê ve girêdayî ya wê di demên bûhûrî ên peleolîtîkê û mezolîtîkê û neolîtîkê de wê, di demên piştre ên pêvajoyên şariştanîyê de wê bi civakê ve wê, xwediyê heman girêdanîyê bê. Li ser rewşa têkiliyên xwe yên navxweyî ên civakî re wê mirov wê, xwediyê rengê xwe hanîna li ser ziman bê. Bi gotineka din wê mirov, wê xwediyê wê rewşa civaknasî bê. Wê mirov, weke zindiyekî ku ew dijî wê hertimî wê pêwîsîyê wê bi danîna têkiliyan bi hevdû re xwe re bi rengên civakî û mirovê re wê, dênê. Di vê çerçoveyê de wê ew wê weke pêdîvî û pêwîstîyekê jî bê ji wî û jî jîyane wî re. Civak, wê çendî ku wê pêşbikeve wê xwediyê girêdanîya xwe ya bi hanîna li ser ziman a bi civaknasî bê. Her wusa rewşa civaknasîyê, wê li ser rewşên têkilîyên civakî ên weke zayendî, ragihandînî, axiftinî û hwd re wê, xwe bide dîyarkirin. Mirov, wê di dema civakê de wê xwediyê rewşek têkiliyê a bi ziman re bê. Ziman, wê ji civakê re wê weke hebûnek stûnî a weke ramz bê.Ziman, wê rengê xwe hanîna li ser ziman, ragihandin û axiftina nava mirovan jî bê. Pêvajoyên pêşketina têkiliyên nava mirovan wê bi demê re wê biperisina li pêşveçûna bi ziman a di nava civakê de. Mirov, ew dema ku ew kirinekê dikê wê, bi demê re wê fêrî wê salixkirina wê kirinê bibê. Wê li ser rengê wê kirinê re wê, salixkirin wê pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de wê her salixkirin, wê bi xwe re wê weke rewşek axiftinî jî bê. Her kirinek wê, weke rewşek ragihandinî a axiftinî jî bê. Her afirandinek weke tişta ku ew heya, minaq weke çandinî û hwd, wê rewşek pêşxistina di jîyane de bê. Di aslê xwe de wê her rewşên bi pêşxistinî ên di jîyanê de wê, hinekî jî di çerçoveya rewşek têkilîdanînê û hwd de wê pêş bikeve. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa têkiliyên navxweyî ên civakî wê, hin bi hin wê pêşbikevin. Bi wê re jî wê werina salixkirin. Bi salixkirinê re jî wê, weke têgînna jî wê xwe bi hişmendî wê bidina dîyarkirin. Bi hişmendî wê weke aqil wê, xwe bide dîyarkirin. Pêvajoya têkiliya di nava rewşa fîzîkî a afirandinî û ya bi hişkirinê de wê, ev rewş wê di çerçoveya pêşketina rewşa têkiliyên navxweyî ên civakî re de wê, xwe bide dîyarkirin. Civak, wê her mirov wê weke endamê wê, wê weke zindiyna ku ew xwediyê rewşna têkilî ên ku ew xwe bi wê dihênina li ser ziman. Her ku mirov xwe hanî li ser ziman wê, di afirandina nava civakê de jî wê, xwediyê rewşek afrîner jî bê. Di vê çerçoveya têkiliya nava xwe afirandina mirov û ya civakê a di nava hevdû de mirov, hilde li dest. Wê ev têkilî, wê weke têkilîyeka hevdû afirandinê a mirov û civakê a bi hevdû re bê.

Di rewşa mirov û civakê de wê, rewşeka ku ew li hevdû hûnayî û hoyandî wê hebê. Ji ber vê yekê jî mirov divê ku wan bi hevdû re wan di vê çerçoveyê de wan hilde li dest. Her wusa mirov, dikarê di vê çerçoveyê de jî wê jî wê werênê li ser ziman ku wê civak, wê bi endamên xwe û têkilîya nava wan re wê xwediyê rewşeka xwe ya dayimî a ku ew bi wê pêş dikeve bê.

Di rewşa fahmkirina rewşa mirov de wê, di pêvajoyên şariştanîyê de wê, bi keseyetîyê re wê derkeve li pêş. Keseyet, wê, çendî ku ew xwe hîs bike, wê navenda xwe ya ajoyî, hêstî û têgînî wê bi xwe re wê biafirênê. Di vê çerçoveyê de wê, tişta ku wî hanî li ser ziman wê, hinekî jî wê ezîtîya wê keseyetîya mirov wê bi xwe re wê bide hanîn li ser ziman û bide dîyarkirin. Di pêvajoyên civakî ên dema şariştanîyê de wê, zanîn wê bi afirîna keseyetîyê re wê xwe di nava civakê de wê bi afirandina ya li ser keseyetîyê re wê bênê hanîn li ser ziman. Keseyet, wê weke rastîyeka civakî a ku ew pêşketîya bê. Lê wê keseyet wê, hertimî jî wê xwe bixwe wê bijî. Wê di vê çerçoveyê de wê, di rewşên ´serbixwe´ de wê hewl bide ku ew xwe bi qadaya xwe ya jîyanê a ku wê ji xwe re afirandîya re ew xwe werênê li ser ziman.

Têkilîya civak û keseyetîyê û ankû mirov û civakê wê, di çerçoveyek ku ew hevdû ji hevdû diafirênin de wê, xwe bide dîyarkirin. Keseyet, wê çendî ku ew xwe diafirênê wê, bandûra wê li civakê wê bi başî û nebaşî wê hebê. Wê di vê çerçoveyê de wê civak wê, wan rewşan wê di nava xwe de wê bide jîyankirin. Di rewşa têkiliyên navxweyî ên civakî de mirov dikarê hinekî jî li vir hinekî jî bi awayekî felsefîkî li wê bihizirê. Her wusa, rewşa felsefeyê mirov dikarê wê ji dû aliyan ve wê, hilde li dest. Di rewşa fahmkirinê û zanîna wê de ya. Ji aliyê din ê duyem ve jî wê, bi rewşa pêşxistinê re bê. Aqil û ankû zanîn wê, hertimî wê li pêşîyê wê bikê ku ew bide hizirandin bê. Di vê çerçoveyê de wê, çerçoveya jîyanî a bi xwezayê û gerdûnê û hwd de ku ew mirov, ew di wê de dijî wê, bike ku ew wê bi wê re wê fahmbikê.

Di rewşa fahmkirinê de wê, rewşa jîyankirinê wê, were dîtin. Lê li vir, em dikarin ji aliyekî din ve di vê çerçoveyê de nêzî mijarê bibin. Ew jî ew bê ku mirov, her tevgerên ku ew bên jîyankirin wê, weke rewşna civakî ên ku ew bûyîna û hena ku mirov karê wan werênê li ser ziman bên. Di vê çerçoveyê de wê, di aslê xwe de wê, di rewşa jîyankirinê de wê, piştî rewşa *hatî jîyankirin* de wê, li vir, wê felsefe wê bi têgîneka pêwîstînî û ankû determînîsmîkî wê nêzî rewşê bê. Têgîna pêwîstînî(û ankû determînîsma)ya civakî wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wê wateyê bê. Li vir, ez dixwezim gotineka Zerdeşt wê bibîr

bixim. Ew jî ew a ku ew heta roja me, wê di nava civake kurd de wê bi navî wî wê were hanîn li ser ziman ku *"wê mirov, wê berpirsîyarîya kirinên xwe wê di sûkra wî de bê"* bê. Ev rewş û têgîn ku mirov wê ji gav diavêjê wê, ew jî wê weke têgîneka ku mirov dikarê vê gotinên li ser kirinên mirov ên di nava civakê de wê werênê li ser ziman. Mirov, wê di vê çerçoveyê de wê, xwediyê rewşek heyînî a ku mirov wê werênê li ser ziman bê. Di rewşa fahmkirina jîyane de wê mirov, wê di nava jîyaneka ku ew mirov wê dijî de bê. Gotina *´jîyankirinê´* wê her wusa wê di xwe de wê li vir wê bi têgîneka *´ya ku ew hatî jîyankirin û ku ew bûya weke mejû´*ya re wê were li ser ziman. Di rewşa têgîna civakî de wê, li vir, wê civak, wê bi wê re wê xwe wê werênê li ser ziman. Minaq, em dema ku bahse civakê û ankû *kevneşopîyên civakî* dikin, wê bi wê re wê weke rewşeka ku mirov wê bahse rewşên ku wê di mejûya xwe de wê jîyankirina bikin bê. Mejûya civakê, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wê wateyê bê. Kevneşopî û hwd, wê rastîya civakê a bi mejûya wê re wê, werênê li ser ziman. Civak, wê xwediyê mejûyê bê. Her wusa, wê di wê çerçoveyê de wê li mejûya xwe binerê û wê bêjê ku ev ´rast a´ û ankû ´ev nerast a´ ku ew hatina kirin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê ew werina li ser ziman. Li ser rewşên ku ew hatina jîyankirin û ankû jîyankirî re mirov wê ya baş û nebaş, rast û nerast û hwd wê, ji hevdû cûda bike û wê ji hevdû wê wê vaqatênê. Wê di vê çerçoveyê de wê felsefe di jîyane civakê de wê xwediyê wateyekê bê. Li ser têgîneka hizirkî re mirov, dikarê wê bi têgînên weke rewîstê, çandê, hûnerê, wêneyê û hwd re jî wê werênê li ser ziman.

Aqil wê, hertimî di nava jîyanê de wê temenê rewşek lêpirsîner a ku ew pêş dikeve bê. Wê di nava rewşa civakê de wê, xwediyê rewşek heyînî a bi hişmendî bê. Hişmendî wê, di vê çerçoveyê de wê, ew were li ser ziman. Mirov, çi dijî û çawa dijî wê, ew bi têgînî wê were li ser ziman.Di vê çerçoveyê de wê bi demê re wê, her tişta ku ew hat jîyankirin wê, weke tiştekî ku ew hebê bê. Di nava jîyane civakê de wê mirov wê xwe bi pêşketina xwe re wê werênê li ser ziman. Ev jî wê, civakê bi xwe re wê weke ku wê pêşbixê bê.

Têgîn û gotina civak, ew dîtbarîya wê ya gotinî ku ew heya, wê her wusa wê weke rewşeka ku wê li vir, wê hertimî wê hebûna civakê wê bike ber nîqaşê de. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê gelek, civaknas û ankû civakzan, wê hizrên xwe wê li ser keseyetîyê re wê werênina li ser ziman. Wê keseyetîyê wê derxin û wê şîroveyên xwe wê bi keseyetîyê wê derxin. Li vir, civak, wê tiştkên ku wê hebûna laşê civakê wê bi xwe re wê werênina li ser ziman weke ziman, çand, wêje û hwd, wê weke têgînna dîtbar bin. Her wusa, wê li ser rewşa bûyî re wê weke rewşek fîzîkî a bêî hacm û rewşa fîzîkî a heyînî bê. Di vê çerçoveyê de wê weke darêjkek bi çerçoveyî wê were li ser ziman.

Pirsgirêka fahmkirina rastîya civakê wê, di her demê de wê weke ku wê hebê. Her wusa, lê wê ev rewş wê hebûna civakê ku ew heya, wê nikaribê bide gotin ku ew nîn a. Ber ku ew heya. Her wusa, weke rewşek fîzîkî a bêî zagonên rewşa fîzîkî a hişk û hwd bê. Lê wê çawa wê were fahmkirin wê, rewşa pirsgirêkên fahmkirinê wê xwe di vê çerçoveyê de wê bidina nîşandin. Em di çerçoveya têgîna aqilê kirinî de wê, li wê bihizirin. Her wusa rewşa dengekî, gotinekê, zanîneka ku ew di mejî de afirîya û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê were li ser ziman. Dema ku ew deng derket û ankû ew gotin ji dev derket û hat gotin û hwd, wê mirov nikaribê wê înkar bike ku ew nebûya. Dema ku mirov tayrekî bi çavê serê xwe li azmana dibînê ku ew di berçavê me re derbas dibê mirov, piştî ku ew derbas bû û ji ber nerîna çav winda bû û pê de mirov, wê nikaribê bêjê ku ew tayr ji ber nerîna çavên me ve derbas nebûya. Ew rewş, wê weke rewşek bûyî wê xwediyê rewşek heyînî bê. Mirovekî ku ew jîyanbûya û piştre kalbûya mirîya wê, ew ji berçav winda bê. Ku ew ji berçav windabû, mirov wê nikaribê bêjê ku ew mirov hîç ne jîya ya û ankû ew nebûya. Ber ku ew bûya. Ew jîya ye. Piştre jî ew mirîya. Ev pêvajoyên ku wî mirovî ew jîyankirina, piştî wî re wê li ser wê rewşa jîyankirina wî re wê bibê. Di nava civakê de wê, rewşa bi vê rengê jî wê wusa bê. Her wusa wê civak, wê xwediyê wê rewşê bê. Em li vir divê ku vê yekê jî wê di dewama wê de wê werênina li ser ziman ku wê civak wê, ew kirina ku ew bi wê û navê wê hat kirin, wê weke kirinek civakî bê. Lê tenê ku mirov wê kirinê wê weke kirineka civake wê herê bike, tenê gihiştîna wê têgihiştinê wê têrê bikê? Bêgûman wê têrê nekê. Ji wê zêdetirî jî ew divê ku ew bibê malê civakê. Li vir, ku mirov li ser rewşa wê ya civakî re wê hizirkirinê dikê mirov, bi wê re wê jî kifş bikêhevbeşbûn wê weke aliyekû lingekî civakbûnê bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, hinek girêdanîyên wê hebin. Lê bi demê re wê çendî ku pêşketin wê bi aqil bibê, wê ben û girêdanên wê, wê zêde bibin, di zikhevdû de wê pêşbikevin û wê bi hevdû ve wê girêdanîya xwe jî wê bidina çêkirin. Di vê çerçoveyê de wê, *ji ye*

*hesan bi ber ya tevlîhev ve* wê pêvajoyek wê were şopandin. Di rewşa jîyane civakî de mirov, vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê têkiliyên civakî wê, li ser rengê wê yê civakî re bin. *Rengê civakî,* wê weke gotineka dîtbar bê. Her wusa, wê li vir, wê rewşa jîyane mirovan wê di çerçoveya jîyane civakî û ankû giştîya jîyane civakî de wê derkeve li pêş. Wê li vir, wê li dora têgînekê û hwd wê gihiştina hevdû wê bibê. Di pêvajoyên şariştanîyê de wê rewşa civakî wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Li dora têgînekê gihiştina li hevdû wê, tenê temenê kifşkarîya wê têgînê ku ew di destê desthilatdarîyê de wê bide pêşxistin. Bi wê re jî wê ew desthilatdarî wê, hertimî wê bi wê re wê ji serî ve wê kifşkar bê. Di rewşa jîyane civakî de wê, her wusa wê rewşa aqil ku ew tevlî jîyanê de dibê û ew pêşketina wê bide çêkirin wê, weke rengekî pêşketina jîyane civakî a dema şariştanîyê jî bê. Her wusa wê, her tişt wê, li ser wê re wê xwediyê wê rewşa pêşketinê bê. Wê aqil wê, kifşkarîya wê, bi pêşxistina wê re wê hebê di rewşa jîyane civakî de. Têkilîya aqil û civakê wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek heyînî a bi jîyanê re bê. Li vir, di aslê xwe de mirov ku wê, rewşa aqil û pêşketina wê, li wê dinerê mirov bi wê re wê yekê jî wê kifş dikê ku wê ew xwediyê wê rewşa heyînî a bi jîyanê re bê. Jîyan, wê her demê wê di xwe de wê pêşketinan wê bi aqil wê bide çêkirin. Bi gotineka din mirov, weke ku bi pêşketina felsefeyê û hwd re dibînê wê di dema şariştanîyê de wê *zanist* wê pêşbikeve, ku ew bi xwe re pêşveçûnên jîyane civakî dide dîyarkirin.

Pêvajoyên jîyane dem şariştanîyê wê, di wan de wê aqil wê weke zanistî wê pêşbikeve. Minaq, di pêvajoyên destpêkê û hinekî piştî yên destpêkê ên dema şariştanî de wê, têgînên weke stêrzanîyê, falzanîyê û hwd wê pêşbikevin. Ev jî wê, weke têgînna bi çerçoveyî ku wê, di çerçoveya aqilê demê ê şariştanîyê de wê rengê pêşketinê bê. Pêvajoyên destpêkê ên şariştanîyê, wê bi têrbûna têgînên weke totemîsmê û anamîsmê û ji wan derketina li holê mîtolojiyê û hwd wê, di vê çerçoveyê de wê nîşanaka pêvajoyên şariştanîyê a bi ast û pîle bê. Her wusa pêvajoyên şariştanîyê wê, di wan de wê, di serdemên wê yên ku ew di wan de mîtolojî pêş dikeve û pê de wê rewşek teybet a ku mirov wê hilde li dest wê pêşbikeve. Mîtoloji, wê rengê aqilê ciwanîya civaketîya dema şariştanîyê bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek teybet a ku mirov wê werênê li ser ziman bê.

Pêvajoyên şariştanîyê ên ku ew li kurdistanê jîyana wê, pêvajoyên şariştanîyê ên ku wê piştî dema neolîtîkê wê bibin wê serdemên sûmerîyan û piştre bin. Ev demên şariştanîyê, wê êdî wê weke demna şenber ku mirov wan dikarê li ser rengê pêşketina wan hindik zêde werênê li ser ziman bin.

Serdemên şariştanîyê ên sûmerîyan, wê weke ku wê di wan de wê derkeve li pêş wê sazûmaneka civakî a bi ast û rada wê derkeve li holê. Wê sazûmana ku ew dihê û derkeve li pêş wê, bi sazûmanaka têgînî a li ser olzanîyê re ku wê were pêşxistin bê. Her wusa, bawergehên dema sûmerîyan ên weke ´zagûratan´ wê, weynek mazin û dîrokî wê di pêvajoyên xwe de wê bijîn. Her wusa serdemên civakî ên ku wê di van deman de wê bijîn jî mirov, dikarê wan di çerçoveyek bi aqilê pêşketî de wan werênê li ser ziman. Wê di vê çerçoveyê de wê, nivîs wê pêşbikeve. Her wusa şariştanîya sûmerîyan, wê teybetîya wê ew bê ku wê weke şariştanîyek û ankû pêvajoyek şariştanî a ku wê di wê de wê nivîs û hwd wê pêşketibê bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê serdemên sûmerîyan wê bi demê re wê, li herêmê wê weke serdemna şariştanî ên pirr zêde wê pêşbikevin. Ji herêmên kurdistanê û ankû mesopotamîya û heta ku wê bigihijna herêmên din ên asya, afrîqa û nivgrava araban û hwd, wê di qadaka berfireh de wê temenê jîyanê bi hemû cûreyên wê re wê zêdetirî wê hebin. Her wusa nîşanakên wê jî hena ku wê di wan deman û demên berî wan de wê ´çolên kumê´ ku ew di roja me de afirîna wê weke herêmna bi daristan û şariştan bin. Wê temenê jîyanê ê pêşketî bin. Wê ev herêm jî wê, di vê çerçoveyê de wê di dewama van herêmên din de wê, xwediyê wate û giringîyekê bin ku em dikarin wê jî wê werênina li ser ziman bê. Herêmên mesopotamîya wê, giringîya wan wê ji çemên diclê û firatê wê werin. Ji xwe, dema ku bahse jîyane li kurdistanê dihê dihê kirin wê, gotina ´mezrabota´ û ankû ´mesopotamîya´ wê derkeve li pêş. Gotina mesopotamîya wê di kurdî de wê temenê wê li ser gotina ´mezrabota´ bê û wê were wateya *´jîyane ku wê di nava herdû çeman de rûdaya´* bê. Bi wê re jî wê, heta roja me jî wê gotina mezrabota wê di nava kurdan de wê li kurdistanê wê weke herêma ber diclê û heta ku ew li ser xate rojavayê kurdistanê re wê bigihijê ber çemê firatê bê. Di vê çerçoveyê de wê, di mejiyê kurdan de wê, dîsa wê wateya wê jîyane li nava herdû çeman bê. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê gotina mesopotamîya wê, di vê çerçoveyê de wê di xwe de wê weke navê pêşketina jîyanî bê. Jîyane di nava herdû çeman de wê, weke rengekî jîyanî ku wê di xate xwe de wê, li ser rewşa pêşketina ji jîyane komî û heta dema jîyane civakî û hwd wê, xwediyê rewşek peresendinî

a bi xwe re bê. Em di vê çerçoveyê de wê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê jîyane li herêmê wê, di vê çerçoveyê de wê, li ser xate civakî de wê xwediyê xate pêşketinî bê. Em ji rewşa civake kurd a demên destpêkê ên şariştanî ku ew hê nûka ji demêna neolîtîkê derbasî dema pêvajoyên şariştanîyê bûna wê, di wan deman de wê xwediyê rewşeka ku ew hertimî wê bi xwezayê re dijîn bin. Ber vê yekê, wê gotina *´xalkê çîyayî(*)´* wê hertimî wê bo civake kurd wê were bikarhanîn. Gotina ´xalkê çîyayî´ wê, weke gotineka ku wê rastîyeka jîyane civakî a dervî pêvajoyên şariştanîyê wê weke bi jîyane koçerîyê û hwd re a li kurdistanê wê werênê li ser ziman.

Di rewşa pêşketina jîyane civakî a li herêmê de wê, rewşên ku wê pêşbikevin wê, di vê çerçoveyê de wê weke rewşna têgînî wê piştre wê xwe bidina dîyarkirin. Minaq weke ku me bi gotina ´msopotamîya´ re hanî li ser ziman hinekî li jor wê, rewşa jîyane li ber çemên diclê wê werênê li ser ziman. Dema ku em gotina ´mesopotamîya´ bi koka wê re wê dahûr dikin em, dibînin ku wê di wê çerçoveyê de wê, rengekî jîyanî ê civakî wê bi wê re wê were li ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov, dema ku gotina mesopotamîya wê dahûr dike, mirov wê bi derûnîya ku ew dide me, mirov bi wê e dikeve zorê de ku wê, li ser hinek têgînên desthilatdarî re wê werênê li ser ziman. Zêdetirî û baştirî ev gotin xwe bi rengê jîyane civakî re ew dihê hanîn li ser ziman. Pêvajoyên jîyane civakî ên li ber diclê û firatê wê, di vê çerçoveyê de wê bi mejûya xwe re wê di navaroka vê gotinê de wê werina li ser ziman. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê gotina mesopotamîya wê, weke rengekî jîyanî bê. Di aslê xwe de bi rengê ku mirov wê ji mejiyê mirovê ji civake kurd wê fahm dikê wê, bi awayekî jîyane civakî a berî jîyane civakî a pêvajoyên jîyane civakê ên dema şariştanîyê re wê, weke ku wê bi xwe re wê werênê li ser ziman. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê gotina mezrabota û ankû mesopotamîya wê, di nava kurdan de wê li kurdistanê wê hertimî wê *navê wê herêma berdiclê û heta ku wê bigihijê ber firatê li ser xate rojavayê kurdistanê* re wê werênê li ser ziman. Bi teybetî wê, wê di demên pêvajoyên şariştanîyê û pêvajoyên jîyane wê ya civakî û pêvajoyên wê yên pêşketinê de wê ev rengê wê yê weke navê wê herêma berdiclê û heta ku wê bigihijê ber firatê li ser xate rojavayê kurdistanê wê, xwe bide hanîn li ser ziman. Di vê demê de wê, weke ku wê wateya gotinê wê di çerçoveya pêşketina sînoran a bi jîyane şariştanîyê re wê, were tangkirin. Di vê çerçoveyê de wê rewşeka wê ya teybet wê hebê û wê xwe bide dîyarkirin.

--------

(*)Gotina ´xalkên çiyayî´ berê ji kurdên berê re tê gotin. Ber ku ew li çîyayan pirr zêde dijîn û jîyane xwe bi wê rengê pêşdixistin.

Jîyane civakî wê li herêmê ku wê pêşbikeve wê, bi awayekî vekirî wê mohra xwe wê li rengê pêşveçûyînên navaroka gotina mezrabota û ankû mesopotamîya jî wê bixê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê zêdetirî wê têgînek civakî wê derûnîya wê, xwe di çerçoveya gotina mesopotamîya de wê, bide dîyarkirin bi jîyane li kurdistanê a civakî ya li nava çemên diclê û firatê bixê. Em ku hewl bidin jîyane pêşveçûnên civakî ên li kurdistanê wan fahm bikin em nikarin wan di çerçoveya hinek serdestîyên desthilatdarîyî ên demkî ku ew li herêmê bûna û çûna wê, fahm bikin û wê hildina li dest. Wê rewşa jîyane civakî wê, bi xwe re wê di çerçoveya civakeyîya li ber diclê û firatê de wê, di xate xwe ya jîyanî a li herêmê de wê xwediyê reng û awayekî pêşketinê bê. Pêşveçûnên civakî ên dema şariştanî wê, çendî ku wê karibê weke pêşveçûnna civakî ên zelal wê, dema şariştanîyê wê werina hildan li dest? Di aslê xwe de wê, ev pirs wê, hertimî wê xwe bide dîyarkirin. Di rastîya civakî de wê, di pêvajoyên şariştanîyê de wê têgîn û ankû hizirkirinên weke bi destûrî, zagonî, rêgezî û hwd wê derkevina li pêş. Wê di vê çerçoveyê de wê, ev werin û pêşbikevin. Di rewşa pêvajoyên destpêkê ên demên şariştanîyê de wê, ya ku wê mohra xwe wê li wê bixê wê pêşveçûnên civakî ku ew hê bi bandûr û derûnîya civaketîya dema neolîtîkê û hwd ku ew pêş dikevin wê bixin. Di vê çerçoveyê de wê, rengekî civakî wê xwe bide pêşxistin. Ber vê yekê, wê di awayekî de wê, ev rengê pêşveçûna şariştanî ê destpêkê wê, weke rengekî jîyane civakî ku ew ji ya civaketîya dema neolîtîkê peresendina wê bûya li wê demê bi wê re wê, di şêwa û rengekî de wê xwe bide dîyarkirin. Her mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman, wê di aslê xwe de wê weke ku wê çawa ku wê dema ku wê mirov ji xwezayê bi qûtbûna xwe re wê beyenîbûnekê wê bijî wê, bi heman rengî wê di pêvajoya bûhûrîna li demên şariştanîyê û di jîyankirina wan de wê pêvajoyek beyenîbûnê a ji rastîya civakî a destpêkê ku wê bi wê ji wê dûrketinê wê bi xwe re wê hin bi hin di pêvajoyên piştre ên şariştanîyê de wê bijî. Ber vê yekê ya ku wê, her timî wê, li ser têgînên desthilatdarî re wê, tenê hewl bê dayîn ku wê civak û hebûna civakan û rastîya wan wê werina fahmkirin.

Li vir, di dewama wê de mirov, divê ku vê yekê jî wê, werênê li ser ziman ku wê civaketî, wê di demên şariştanîyê de wê bi ast û pîvana bi aqil re wê pêşbikeve. Her wusa mirov dikarê wê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê civaketî wê li herêmê wê pirr zêde wê zû wê pêşbikeve. Di pêvajoyên şariştanî ên li herêmê de mirov dikarê wê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, li herêmên kurdistanê û ankû mesopotamîya wê were dîtin ku wê, wê zûtirîn wê destpê bike. Her wusa, nîşanakên civakeyîyê ên ku wê li herêmê li ser rewşên weke çandiniyê û hwd re mirov, dikarê wê yekê wê werênê li ser ziman ku wê, heta li dora deh û heşt hezaran wê herê. Her wusa wê, di vê demê de wê, bi demê re wê xwe bide dîyarkirin.

Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê li ser xate pêşketina civakeyîyê re wê civake firatê û ankû ya civake diclê wê, pêvajoyên xwe yên pêşketinê wê bijî. Her wusa mirov dikarê vê jî wê werênê li ser ziman ku wê civaketîya li herêmê wê, di çerçoveyek pêvajoyên wê yên civakî ên ku wê di dewama hevdû de wê bi şêwayekî peresendinî wê, xwe bidina dîyarkirin wê, bi wê re wê xwe bide nîşandin. Civaketîya herêmê wê, her wusa wê weke civaketîyeka ku mirov wê divê ku wê di serî de wê di xate pêşketina wê re wê, hilde li dest.

Wê ji demên neolîtîkê û pê de wê, li herêmê wê temenekî pêşketî ê jîyanî wê pêşbikeve. Ber vê yekê wê, ji wan demên dawî ên neolîtîkê û piştre û pê de wê, rewşên pênaberîya li herêmê wê pêşbikeve.

Têgînên weke ku wê bo dema sûmerîyan wê werina gotin ku wê bê gotin ku ´wê, bi pênaberî wê hatina li herêmê wê bibê´ û ankû ´sûmerîyan jî wan, pênaberî herêmê kirina ji herêmna din û hwd jî wê, di vê çerçoveyê de wê, têgînna ku wê, mirov dikarê wan di vê çerçoveyê de wan fahm bike bin. Minaq, em dema ku wê dema sûmerîyan wan lêkolîn dikin wê, bi wan re em dibînin ku wê rewşên weke pîşeyê wê pêşketî bin. Minaq, cotkar ”engar”, bexçîvan ”Nûkarîb”, şivan ”sipad”, masîvan ”sûkadak”, aşvan(xwarinçêker) ”nûhadim”, hesikar ”simuğ”, merengoz ”nangar”, Berderîvan ”tibîra”, berber û ankû kindar”kinda”, cilşiştinkar ”aslak”, Yê ku tiştên weke cêran û hwd çêdikê ”´pahar”, hêtlêker ”gidim” û hwd bê. Weke van mirov dikarê gelek gotinên ku em ji zimanê sûmerîyan û ankû zimanê dema sûmerîyan kifş dikin wê, weke navê pîşeyna jî bin. Her wusa mirov dikarê vê jî wê, di dewama wê de wê werênê li ser ziman ku wê ev rewşên weke rewşên çêkerîyê ên di jîyanê de ku wê, afirandinê wê bi destî wê pêşbixin wê, pêşbikeve. Di serdemên sûmerîyan wan de wê, rewşên bi vî rengî wê zêdeyî wê pêşbikevin. Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku em bahse dema sûmerî(´kingir´)yan dikin em, di wê têgîhiştinê de na ku em bahse demeka bi hezaran salan a weke serdema şariştanîyê dikin. Ev demên şariştanîyê ên li herêmê wê weke demna ku wê li herêmê wê pirr zêde wê, xwediyê rewşna têgînî ên ku mirov dikarê wan werênê li sr ziman bê. Ev rengên gotinên ku me hanîna li ser ziman wê, weke gelek gotinên din ên ku em ji zimanê dema sûmerîyan wê kifş dikin, wê bi şêwayekî morfolojikî û ankû dengzanîyî wê, di nava kurdîya roja me de wê, rewşên zimanî û gotinî û rêzimanî û hwd ên ku taqabûlî wan dikin wê, hebin. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa zimanîya wan deman, mirov wê *zimanê firatî* ê weke kurdî de wê, xwe bide dîyarkirin. Li vir, di aslê xwe de wê navên herêmê ên kevn weke ku ew di kurdî de hena, wê giring û dîrokî bin. Ev navên herêman wê ji wan deman bin. Minaq, weke navê ´nisêbînê´ a roja me ku wê di dema sûmerîyan de wê weke ´nisibîsê´ wê were bi navkirin û li ser ziman û hwd. Zimanên herêmî wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Navê sawalan minaq ên mehê ´mih´, masîyê ´masî´, gayê ´ga´ û hwd wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê navên wê demê wê xwe wê bidina dîyarkirin. Di rewşa ziman de wê, di demên sûmerîyan de wê were dîtin ku wê, zimanekî wan ê pêşketî wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê di serdema sûmerîyan de wê, weke demeka pêşketî wê xwe bide dîyarkirin. Serdemên şariştanîyê ên li kurdistanê wê, di vê demê de wê pêvajoyna pêşketî ên şariştanî wê bijîn. Di dema çanda hassûna û ankû samarra de wê, li vê herêmê wê, demek pêşketî a bi jîyane civakî re wê bê bûhûrandin. Em ku wê werina dema çanda ûrûkê, wê di dema çanda ûrûkê de wê, rewşa jîyane çanda demê weke ku mirov ji destanên wan ênn demkî ên weke yên ´destana gilgamêş´ û hwd mirov kifş dike ku wê di rewşek civakî a pêşketî û bi ast de wê bijîn. Navê ´gilgamêş´ em di wê demê de û di demên hinekî piştre ên hûrî û mîtannîyan de jî di bineter û ankû kêvilbarên wan ên nivîskî de rastî wan dihên. Di kurdîya roja me de jî wê, weke ya wê demê wê gotina ´gilgamêş´ wê were wateya ´ê gir weke ga´ û ankû gir weke gamêşekî´ û hwd re wê xwediyê wateyê bê. Gotina*´gir´* û ankû *´gil´* wê di wate bi cûsseya xwe re ku mirov gir û ankû mazin û zaxm bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê werê li ser ziman. *´Ga´* wê weke sawalekê wê pirr

zêde wê gir bê. Ew girbûna gav wê d çerçoveya şibandinekê de wê bi gotina *gilgamêş* re wê were li ser ziman.

Di rewşa *çanda dema ûrûkê* de wê, di vê çerçoveyê de wê gotinên weke şibandinê ên bi vê rengê ên weke bi gotina ´gilgamêş´ re wê zêde wê werina bikarhanîn. Ev jî wê, nîşanaka zimanekî razber ê bi têgînî ku ew pêşketîya jî bê. Di vê demê de wê, hê ew zimanê nivîsê ê weke şibandinê li ser sûret û ankû wêneyan re wê were bikarhanîn. Lê hin bi hin wê, weke ku mirov bi tîpan û hwd re wê bibînê wê zimane dageran û hwd wê pêşbikeve.

Ji pêvajoyên şariştanîyê ên dema sûmerîyan mirov wê jî kifş dike ku wê masîvanî wê pêşketî bê. Her wusa minaq wê ji xwe re wê kiştan wê çê bikin. Kişt wê, bi gotina ´ma´ re wê were li ser ziman. Gotina ´ma´ wê, heta roja me jî wê, di kurdî de wê di wateya ´avê´ de wê were bikarhanîn. Meşandina wê jî wê bi ´lah´ wê were li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, ev wê were dîtin. Bi wê re jî wê, were dîtin ku wê, kedîkirina sawalan û pêşxistina wan wê, zêdetirî wê pêşketî wê derkeve li pêş. Minaq, mirovên ku ew garanên wan ên sawalên mazin hena wê gotina ´gûdnîga´ wê werê li ser ziman. Mirovên ku ew ew sawalên weke mirişkan û hwd re ku ew alaqadar dibin ”ûşandû´ jî wê, di vê demê de wê pêşbikevê. Ev rewş hemû wê, bi xwe re wê wê jî wê, bidina nîşandin ku wê di reng û şêwayekî de ew rewşên ahlkirin û kedîkirin wê, weke rewşeka bisazûmanî a bi jîyane civakê re wê pêşbikeve û ankû wê were pêşxistin. Ev dem wê, di dema sûmerîyan de jî wê weke xwedîyê sazûmanaka pêşketî a ku ew pêşketîya bê. Di vê demê de wê, bi wê re wê di ahengekê de wê were dîtin ku wê karê destî ê weke hêkelqûsanîyê ”alangû” jî wê pêşketî bê. Ji xwe wê, hê di demên civake neolîtîkê de wê ev rewşên weke çêkirina hêkelkên piçûk û ankû hinekî mazin wê hebin. Bi wê re wê karê hêkelqûsanîyê û ankû wê nivîsanîyê wê bi hevdû re wê di rewşekê de wê bimeşê. Wê kevirên nivîskî ku wê di roja me de weke ´nivîsên bizmarî´ dihên bi navkirin wê û ku ew di wê demê de wê weke ´dûp´ werin bi navkirin wê werina pêşxistin. *´Nivîsandin´* jî wê, bi gotina ´sar´ wê werê bi navkirin. Mirovên ku wan kevirên nivîsên bizmarî çê dikin û ên ku ew wan dihêlênin weke ”gadûbba” wê ji hevdû cûda bin. Wê di vê demê de wê têgîna xwedanî(milkîyetê) wê weke ya malbatîyê ku ew ”şêgit” dihê bi navkirin wê hebê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê, ev rewşên ku ew pêş dikevin wê, weke rewşna rûniştî wê xwe bi awayekî wê li ser zimanê wan ê ku ew heta roja me li ser kevirna hatîya û dihê xwendin wê ji wê were fahmkirin. Di vê demê de wê rewşa falvanîyê û ankû falmeyîzendinê û hwd wê zêdeyî wê pêşketî bê. Falmeyzêker û ankû falvan ku ew weke ”maşşûgidgid” wê, di vê demê de wê weke xwediyê rengekî pêşketînî ê bi sazûmanî bê. Mirovên falmeyzêker wê di vê demê de wê zêdeyî wê hebin û wê xwediyê bandûrekê jî bin. Di vê çerçoveyê de wê, rewşa wan wê, di vê demê de wê weke rewşek civakî a rûniştî wê xwe bide dîyarkirin. Di dewama wê de wê rewşên weke ´kapirîg´ ku ew taqabûlî gotina ´afsûnkar´ dikin wê hebin. **`Kapirîg**´ wê, ji navaroka gotinê jî wê were fahmkirin ku wê gotina ´pîr´ wê di hundûrê wê de wê hebê û ev jî wê weke ku ew di kurdîya roja me de wê hebê wê di wateya ´mirovê pîr´ de bê.Di kurdî de wê ***´pîrig*´ *wê, hebê û ev jî wê ji mirovê ku ew di rewşên başkirin, aqildan û bi şînahîyan çêkirina dermanan re ku wê navdarbê bê.*** Heta roja me jî wê ji mirovên bi vê rengê re wê gotina ´pîrig´ wê were bikarhanîn. Di gotina pîrig´ê de wê, li gorî têgîn û têgihiştina wê ya di nava civake kurd de bi zimanê kurdî ku ew heya wê, ji jinên pîr ên nawserî xwe re wê ev gotin wê were bikarhanîn. Di temenê vê gotinê de wê, weke ku mirov ji demên berê jî wê, fahm dike wê gotina ´pîrekê´ wê weke navê jinê wê hebê. Pîrek, wê bi têgîna xwe re wê, jina ciwan û ankû dema xwe ya ciwanîyê derbaskirîya wê were li ser ziman. Lê ku ew ji wê re hat gotin *´pîrig´ ew hingî wê, weke jineka ku ew pirr zêde pîr a û ew bizane ya* û herkesek serî li zanebûna wê dixê bê. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê di dewama wê de wê jî wê werênê li ser ziman ku wê, ev rewş û karên ku me li jor navê wan hanî li ser ziman ku wê, di çerçoveyek menewîyetê de wê ji wê demê wê xwediyê rengekî pêşketînî wê hebin. Wê di vê çerçoveyê de wê were dîtin ku wê kar û xabatên ku ew hena û dihên pêşxistin wê, di çerçoveyek têgînî a menewîyetê de wê, xwe bidina nîşandin. Ev jî wê bide nîşandin ku wê, karên têgînî ên weke menewîyetê û hwd wê pirr zêde wê pêşketî bin. Wê di vê çerçoveyê de wê li rewşên dûnyayî û aqilî û hwd wê were hizirkirin.

Di nava rewşên jîyanî de wê di vê çerçoveyê de wê, weke ku mirov kifş dike wê jinên bizane ku ew mirov serê li zanebûna wan dixê û ew pîrig´ in wê pêşbikevin. Ev jî wê, di aslê xwe de wê, di dema şariştanîyê de wê, pirr zêde wê weke mirovna ku ew başîyê di nava civakê de belav dikin bin. Lê bi wê re jî mirov dikarê li ser koka vê rewşê jî wê, werênê li ser ziman ku wê pîrig´ wê, ew afsûnkarên dema

neolîtîkê jî bin. Ew jî wê, di vê demê de wê, derkevina li pêş. Ji xwe em dema ku wan li wan dihizirê, wê bi demê re wê were dîtin ku ew wê ev jin wê di nava civakê de wê di wan demên destpêkê ên civakî de wê pirr zêde wê derkevina li pêş. Her wusa jinên ´pîrig´ wê weke ku ew di dema neolîtîkê û civakîya dema neolîtîkê de ew li pêş in bi gotina xwe re wê, piştre wê di demên destpêkê ên şariştanîyê de jî wê, ew li pêş bin. Wê ew hertimî wê şikeftek wan ya ku ew di latn bilind de ew hatîya qawartin û ew di wê de dijîn wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê di nava civakê de wê, bi wê devera ku ew di wê de dijîn re wê, di nava civake wê li kurdistanê wê pirr zêde wê derkevina li pêş. Her wusa mirov dikarê vê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê ev rewşên ku em, wan dibînin wê, weke rewşna civakî wê piştre wê pêşbikevin. Di serdema neolîtîkê de wê, ev weke afsûnkar wê, werina dîtin.

Di aslê xwe de wê di dema jîyane civakî a dema şariştanîyê de jî wê ev bi wê re wê, derkevina li pêş.Ber ku ew wê, weke jinna pirr zêde pîr ku ew *´her tiştî dizanin´* wê derkevina li pêş û wê werina zanîn bin. Ew wê, bi wê rengê wê di nava xalkê û ankû civakê de jî wê werina zanîn. Ew di dema civaketîya şariştanî de wê, ew bi wê dîtina çareserîyan pirsgirêkên mirovan û xalkê û dîtina dermanan nexweşîyên mirovan û civakê re wê derkevina li pêş. Wê ew wê, weke mirovna zane wê derkevina li pêş. Di nava kurdan de wê, heta roja me wê di çerçoveyek bi vî rengî wê were gotin ku wê, weke ´mirovên herî bizane´ wê ew werina serî li wan dan ku ew çareyekê û ankû dermenakê ji derdê mirovan re bibînin.

Li vir, em divê ku vê yekê jî wê werênina li ser ziman ku wê, di demên şariştanîyê ên destpêkê de wê, ev rewş wê pirr zêde wê derkevina li pêş. Mirovên ku ew bi rwşên xwe yên weke dîtina çareyan û ankû dermanan re wê derkevina li pêş wê hebin. Ti kesek wê ji wê dîtina wan ya çareyan û ankû dermanan ji derd û nexweşîaya mirov re wê newaqif bê. Yanî wê ew newê zanîn ji aliyê mirovan re. Bi wê re jî wê ew wê di vê çerçoveyê de wê, hertimî wê, weke bi hebûna xwe re wê ´nepenîyekê´ jî wê, biparêzên. Ew jî wê, temenê wê têgînê bê ku ew weke ´afsûnkar´ werina dîtin û ankû werina hanîn li ser ziman. Di nava civakê de wê, piştî pêvajoyên demên şariştanîyê ên destpêkê wê, ev rewş wê zêdetirî wê xwe bidina dîyarkirin. Her wusa wê, ev rewş wê, weke rewşna teybet bin. Ev mirov, wê di her warê de wê serî li wan wê were xistin. Wê hem rêz û hûrmet wê ji wan re wê were girtin û hem jî wê ji wan wê were tirsîn. Di vê çerçoveyê de wê, ew bi rewşek ku ew di mejiyan de temenê hinek tevlîhevîyan jî na wê, xwe bidina dîyarkirin. Di nava civakê de wê ev rewş, wê bi demê re wê derkevina li pêş. Her wusa têgînên weke bi afsûnî ku wê werina pêşxistin û ankû *´darêjkên afsûnî´* ku ew bahse wan dihê kirin weke bi dermanî û hwd wê, ew wan pêşbixin. Wê ev ji wan wê were hêvî kirin. Di wan mirovan de wê cewherek wê hertimî wê were lêgerîn. Ev mirov, wê weke mirovna ku ew dema ku ew dihên dunyê jî wê ew weke mirovna ´bijartî´ ku ew dihêna dunyê wê werina hanîn li ser ziman. Wê bahse wan wê were kirin.

Bi teybetî wê, ked û ne hindik aqilê van keseyetên bi vê rengê ên ku ew bahse wan dihê kirin wê, di pêşveçûnên dema şariştanîyê de jî wê hebê. Wê pirr zêde wê ked û zanîna wan wê di temen de wê hebê. Ew, weke mirovna ku ew pêşketîna û waqîfî hinek nepenîyan û ankû sûrran bûna wê, werina hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, ew wê weke bi aqilekî re wê di nava civakê de wê werina hanîn li ser ziman. Di nava civakê de wê, heta roja me jî wê ev jinên bi vî rengî wê, weke ´pîrig´ û ankû ´pîrebî´ jî wê werina bi navkirin û hanîn li ser ziman. Ev rewşa derketina jinan li pêş wê, di aslê xwe de wê weke çandaka civakî a li herêmê ku em dikarin temen û koka wê di nava pêşveçûnên civakî ên dema mezolîtîkê û neolîtîkê de li wê bigerihin bin.

Heta roja me wê li kurdistanê wê weke kevneşopîyeka bi nirx û pîroz a jina kurd wê *´kevneşopîya hemewîyê´* wê, hebê. Kevneşopîya hemewîyê wê, weke kevneşopîyeka civakî ku wê ti kesek ji wê derbasîyê nebê bê. Wê herkesekê ku ew endamê wê civakê ya wê, bi wê ve wê were girêdan. Wê li gorî rêz û hûrmeta wê kevneşopîyê wê bijî. Ev kevneşopî wê, bi teybetî wê weyn û rola jinê a di nava civakê û pêşketina jîyanê de wê werênê hanîn li ser ziman. Her wusa mirov dikarê wê yekê jî wê werênê li ser ziman ku wê ew jinên afsûnkar û ankû ´pîrig´ wê, bi wê re wê weke xwediyê wateyekê bin. Wê ew wê, ew wê kevneşopîyê wê biparêzên. Ev jin wê, li ber diclê û firatê wê, hertimî wê li pêş bê. Di çanda li kurdistanê û ankû mesopotamya de wê ev kevneşopîya ku ew jinê pîroz dibînê wê, pirr zêde wê di wan de wê li pêş wê pêşketî bê. Bêgûman ev rewş wê di her demê de wê, temenê wê bê ku wê jin wê bi teybetî wê ji gelek aliyan ve wê were hildan li dest.

Di pêvajoyên şariştanîyê ên li herêmê de wê, ev çanda vê kevneşopîyê wê di afirandina çandek civakî a ku wê, di wê de wê jin xwediyê wateyek mazin û bi rêz û hûrmet bê, wê were pêşxistin. Her wusa wê ev

çand wê li herêmê wê, dîroka wê, wê heta serdemên neolîtîkê ên li herêmê wê herin. Em ku li ser xate pêşketina mejûya civakî re wê meşê bi dîrokê re dikin em, wê dibînin ku wê li herêmê wê heta serdemên neolîtîkê wê ev rewş wê bi temen wê herê. Di aslê xwe de em, ku rewşa civakê hildina li dest li herêmê, em divê ku wê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku mirov, divê ku ji destpêkê ve wê, civakê wê weke di xateka peresendina civakî de wê pêşbixê û wê hilde li dest bê. Her wusa mirov di vê çerçoveyê de wê, weke ku wê çawa ku wê di dewama komên peleolîtîkî de wê demên mezolîtîkê û neolîtîkê wê bi pêşveçûnên civakî re wê li herêmê wê werênê li ser ziman mirov, di wê çerçoveyê û dewamê de mirov divê ku wê domandinê bi heman rengê li ser xate pêşketina civakî re wê ji dema neolîtîkê û pê de jî wê, bide destpêkirin û wê bi awayekî peresendinî li ser xate civakê re wê werênê li ser ziman. Li vir em, divê ku vê yekê jî wê, werênina li ser ziman ku wê civakîtî wê, di dema ku ew pêş dikeve de wê, li herêmê wê qalibê xwe de wê, xwediyê xatekê ku ew xwe bi wê re didomê bê. Em vê yekê, dema ku rewşa mejûya civake dihildina li dest û wê dikin ku wê fahm bikin em, di wê de wê yekê bi awayekî vekirî wê kifş dikin. Wê gelek nîşanakên ji dema neolîtîkê wê di vê çerçoveyê de wê di nava vê xate civakî de wê, xwe bidina dîyarkirin û nîşandin. Serdemên civakî ên piştre wê ji dema çanda hassûna û heta dema çanda ûrûkê û hwd de jî wê, ev rewş wê werina dîtin.Çanda civakî a li herêmê wê di vê warê de wê, bi fahmkirina xwe re wê karibê gelek tiştan di çerçoveya fahmkirinê de bide me. Pêvajoyên piştre jî wê, di çerçoveya civakî de wê, di vê çerçoveyê de wê xwe bidina dîyarkirin. Her wusa rewşên civakî ên ku em wan bi awayekî teybet wan dikin ku wan fahm bikin wê, bi xwe re wê çandakê wê bidina nîşandin. Xate çanda civakî a ji dema neolîtîkê û heta serdemên destpêkê ên pêvajoyên şariştanîyê wê di vê çerçoveyê de wê hebin. Rewşa civakî wê, her wusa wê di vê çerçoveyê de wê zêdetirî wê ji me bixwezê ku em wê di çerçoveyek xwezayî de wê fahm bikin. Rewşa têgîna civake neolîtîkê mirov, di aslê xwe de ku wê bi awayekî baş di rewşa wê ya herêmî de wê, bi pêşketinên wê re wê, ne hilde li dest û wê fahm nekê, mirov wê bi awayekî vekirî û baş jî wê nikaribê rewşên civakî ên piştre ên demên şariştanîyê jî wê jî wê fahm bike. Di vê çerçoveyê de wê rewşa civakên aslî ên herêmê wê di xwe de wê gelek rastîyên dîrokî û mejûyî wê di xwe de wê bivêşêrên. Em wan rastîyan di dewama hanîna li ser ziman a pêvajoyên şariştanîyê de wan, divê ku em pirr zêde baş fahm bikin.

.

Çavkanî;

*Childe, Gordon(1925); The Dawn of European Civilization
*Childe, Gordon(1929); The Danube in Prehistory
*Childe, Gordin(1930); The Bronze Age
*Childe, Gordon(q935); New Light on the Most Ancient East
*Childe, Gordin(1935); Prehistory of Scotland
*Childe, Gordon(1951); Man Makes Himself )
*Cilde, Gordon(1940); Prehistoric communities of the British Isles
*Childe, Gordin(1942); What Happened in History
*Childe, Gordon(1945); Progress and Archaeology
*Heredot(484-425 f.Kr.): "historie"
* "Gilgamesh(ca. 2210–2000f,kr.): "gilgamesh epiken"
* Kremer, Samuel Noah (1956): "history begin at sumer
*Wegner, Ilse(Berlin, in March 1999, ): “Introduction to the Hurrian Language”
*Sasson, Jack M.(1966): “Hurrian and Hurrian Names in the Mari tekst”
Ocalan, Abdullah; Ji dewleta rahip a sûmeran heta olên yekxwûdayî
* Kremer, Samuel Noah 1961): "Sumerian Mythology"
*Marks, Karl(1867): "Kapital 1."
*Freud, Sigmund(1938): "Moses und die Monotheismus"
* Homeros (ca 800 f Kr.): "iliaden"
* Zarathustra (cirka 1000 f.Kr.): "avesta"
* Ahmed Khani (1650-1707): "Men û Zin"
*Eells, T. D. (2007). History and current status of psychotherapy case formulation. I T. D. Eells (red.), Handbook of psychotherapy case formulation. 2. utg. (s. 1–45). New York: The Guilford Press.

**Abdusamet Yigit, kurdistan, cizîra bota,**

**,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,**